



K.T.

Zanîngeha Dicleyê Enstîtuya Zanistên Civaî

Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî

Beşa Ziman û Çanda Kurdî

Teza Doktorayê

**TAYBETMENDIYÊN ZIMANNASIYA KURDÎ
(KURMANCÎ) DI KOVARA HAWARÊ DE
(FONOLOJÎ û MORFOLOJÎ)**

Resul Geyik
18940302

Şêwirmend
Prof. Dr. Hasan Tanrıverdi

Diyarbakır 2022

T.C.
Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Doktora Tezi

**HAWAR DERGİSİNDE KÜRTÇE (KURMANCÎ)
DİLBİLİMSEL ÖZELİKLERİ
(FONOLOJİ VE MORFOLOJİ)**

Resul Geyik
18940302

Danışman
Prof.Dr. Hasan Tanrıverdi

Diyarbakır 2022

TAAHHÜTNAME

SOSYAL BİLİMLERİ ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dicle Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Taybetmendiyên Zimannasiya Kurdi (Kurmancî) di Kovara Hawarê de (Fonolojî û Morfolojî)**” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimleri Enstitüsü arşivlerinde saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

05/05/2022

Resul Geyik

PÊŞGOTIN

Mijara taybetmendiyên zimannasiyê mijareke wer berfireh e ku mirov, dema dikeve nav vê mijarê, xwe di nava şaşmayineke mezin de dibîne. Ji ber vê sedemê, kar û xebatên berê, û lîteratura heyî carinan nikarin guherînê fahm bikin, bisenifînin û şîrove bikin; herwiha carinan nakokî carinan jî wekhevî (hevparî, hevşibî) û carinan jî temamkirina pêvajoya analîzkirin, fahmkirina zimên di her astê de derdikeve pêşiya însanan. Helbet mirov dikare hem guherîna zimên ya devkî hem jî ya niviskî bibîne. Guherîna zimanan di nav xwe de temasa zimanan, deyingirtina peyvan, wendakirina herfan, guherîna hevoksaziyê wekî kirde, lêker û bireserê û hwd. ku gelek pêkhatayên zimên dihewînin. Taybetmendiyên zimannasiyê jî di gelek beşên zimên de bi awayekî xwezayî derdikeve pêşiya însanan.

Hevokeke pir navdar ya Wittgenstein heye: Sînora zimanê min tê wateya sînora dinyaya min. Mirov dikare bibêje ku peyv hêmana herî biçûk ya biwate ye. Ji ber giringiya mijarê, mirov dikare li ser giringiya taybetmendiyên zimên gelek fikir û ramanên din jî bibîne. Lê ziman bi xwe her daîm bala însanan kişandiye. Digel ku hinek kesan ev cudahî xweş ditîne û qebûl kirine, hinek kesên din dema ji guherînê haydar (bihay) bûne, bertekên xwe nîşan dane yan jî hinek kes pê aciz bûne û hêstên cuda jiyane. Ya rast, cudahiya zimên bixwe, ne karekî çewt e. Lê belê, dibe ku, ji ber şert û mercên heyî, ew taybetmendî ne bi dilê civakê bin jî (Aitchison, 2001; 260). Bertekên însanan li hemberî taybetmendî û cudahiya zimên di nav gelek civatan de derketiye. Bo mîsal, mirov dikare gelek mînakên şexsî ji bo kurdî yan jî bo îngilîzî bi rehetî bi bîr bixe: Bo mînak dema medyaya kurdî nû dest pê kir, gelek kesên navsere peyva “spas dikim” qebûl nedikir. Di gelek civatan de, însan carinan bi henekî carinan bi hêrs hestên xwe îfade dikirin û yên heyî tercih dikirin. Herwiha di van salên dawî de gelek nûçe li ser cudahiya zimên hatin amadekirin, ji ber vê hikûmeta Îngîlîstanê li hemberî hikûmeta

Amerîkayê bertek nîşan dide¹. Nêzîkatî û qebûlkirina zimanan dibe ku ji ber sedemên cuda bin, lê tiştê giring ew e ku ev cudahî ciyê xwe bigire û ji aliyê bikarhêneran (gel) ve bê pesendkirin û bikaranîn.

Zimannasê Danîmarkî Otto Jespersen gotiye “divê bo zimanê prîmîtîf yê ku ji peyvên pir dirêj pêk hatine û bi dengên diwar tije ne, ji bo rehetiya wan, ji dêvla telafûzê gotinê bifikirin” (Jespersen, 1922: 421). Dema mirov bi vî awayî binirxîne, tiştê mirov îddîa bike ew e ku hinek zimanên, skandînavî wekî yên swêdî, fînî û norveçî zimanên stranan in û ew taybetmendiya xwe hê jî ne bi tevahî lê bi awayekî gorî xwe parastine. Lê belê zanîn ku gelek zimanên din jî guherîne û her ziman hewl dide xwe sivik bike, loma gelek zimanan xwe ji van taybetmendiyên ku Jespersen îddîa dike xelas kirine yanî bikarhênerên zimanan tercîha peyvên kin, dengên hêsan û axaftinê kirine.

Ziman tim di nav tevgera guherînê de ne. Çavdêriyên li ser van guherînan û lêkolîna li ser wan di xebatên zimannasiyê de xwedî cihekî giring e. Ji bo fahmkirina vê jî, divê zimên baş bê nirxandin. Mirov ji ber wendakirina çand û standartên zimên xemgîn in. Ji vê perspektîfê, mirov dikare wiha jî bibêje: sebebê cudahiya zimanan ew e ku nîfşên ciwan ne xwediyê şiyar û nasîna kîtekîten zimanî ne, û ev nîfşê ciwan ne axêverê weha ye ku bi awayekî tund girêdayî zimanê xwe be û wî zimanî rast diaxivin. Zarok bi tenê pir tembel in û dema ziman bi kar tînin, ew rêya herî rehet bi kar tînin. Parêzgerên ku ziman bi her awayî û bi tiştên kêr dibînin, gelo ew tişt di zimên de rast in an çewt in pirsek e ku divê bê nîqaşkirin (Burridge & Bergs, 2016:5). Dema ku bikaranîna zimên di nav her nîfşan de pêk tê, lezbûn û cûreya çêbûnê ji hev cuda ne. Dema mirov li taybetmendiyên zimên dinêre, mirov ne tenê cudahiya zimên dibîne, di heman demê de tiştên girêdayî çanda ku tê de ne û bandora rewşa tiştên ku wê demê pêk hatine jî dibînin. Cudahiya zimên di heman demê de guherîna rewşa mirovahîyê jî dide. Kramersch (1994: 6) balê dikişîne ser ka çawa di ziman û çandê de bi hev re tê girêdan diyar dike ku ziman hebûna çandê îfade dike. Loma ziman û çand bi hev ve girêdayî ne.

¹<https://www.nytimes.com/2013/10/14/business/why-do-they-dislike-americans.html>

Cudahiya ziman diyardeyek e ku bi demê re di taybetmendî û bikaranîna ziman de guherînên mayînde çêdibin. Hemû zimanên xwezayî diguherin, û guherîna ziman bandorê li hemû warên bikaranîna ziman dike. Cûreyên cudahiya zimên di nav xwe de cudahiyan fonetîk, morfolojîk, semantîk û yên hevoksaziyê derdixin. Loma taybetmendiyan zimanan xwe di zimannasiyê de jî nîşan didin.

Armanca vê xebatê, bi tespîtkirin û nirxandina taybetmendiyan zimanê Kovara *Hawarê*, nîşandayina taybetmendiyan fonolojîk û morfolojîk di kovara *Hawarê* de ye. Helbet divê xebatên diyakronîk li gorî dema xwe bînin fahmkirin. Bikaranîna zimên di wê demê de bandorê li ser mirovan jî dihêle. Guherînên fonolojîk û morfolojîk, balkêş in û divê ev taybetmendî ji ber çî çêbûye û cudahiya wan çî ne bê dîtin. Loma xebatên berê ji bo analîzkirin û xebatê derfeteke mezin in, lê tunebûna xebatên kurmancî jî zehmetiyeke mezin e.

Di vê pêvajoya giring de bi saya perwerdeya doktorayê, min derfet dît ku ez xwendinên sistematîk li ser zimannasî û guherîna zimên ku çawa bandorê li binbeşên fonolojî û morfolojîyê dikin bikim. Pêvajoya xwendekariya min a doktorayê hem ji aliyê xwendin û nîqaşên encambexş û hem jî ber berhemdariya akademîk ve ji bo min pêvajoyeke gelek giring bû. Bi saya vê xebata zimannasiyê, gelek valahî û pirsgrêkên girêdayî zimannasiya kurdî- kurmancî bûn sedema nîqaşkirin û lêhûrbûna wan.

Ji bo vê pêvajoyê, di serî de, ez dixwazim ji şewirmendê xwe Prof. Dr. Hasan Tanrıverdi re spas bikim ku bi piştgirî û baweriya xwe motivasyona min zêdetir kir û min teza xwe li ser mijareke giring nivîsî. Divê ez heqê mamosteyên xwe Prof. Dr. Tahirhan Aydın, Doç. Dr. Hayreddîn Kızıl, Doç. Dr. Hacı Önen, û Doç. Dr. Ahmet Kırgan bidim ji ber di vê pêvajoya nîqaş û lêkolîna mijara min de ku hertim ez bi wan re di nav ragihandinê de bûm û bi saya piştgirîya wan biwespbûna vê xebatê çêtir bû. Herwiha ji bo nêrîn û rexneyên kêrhatî ez dixwazim bi dil û can spasîyên xwe ji hevalê xwe Patrick Taylor re bikim. Ez dixwazim ji Prof. Dr. İbrahim Seydo Aydoğan re spasîyên xwe bikim ji ber wî her du xalên bandora “rojavayîbûn” û “îdeolojiyê” li ser taybetmendiyan zimên pêşniyaz kirin û pêşniyazên wî gelek kêrhatî bûn û valahiyeke

mezin nîşan da. Spasiyên xwe ji hevalên xwe re dikim ku bi xwendina dawî pêşniyazên xwe asta vê xebatê bilindtir kirin. Herî dawî jî ez spasiya keça xwe Şevîn Nîl'ê dikim ku di vê pêvajoya demdirêj de bi her awayî li ba min bû.

Resul GEYİK

Amed (Diyarbakır), 2022

KURTE

Hemû ziman di nav demê de ji ber sedemên cûr bi cûr diguherin û ev ji nîşanî me dide ku ziman jiyandar in. Qeydkirina van taybetmendiyan karekî zehmet û demdirêj e. Lê ji ber rê û rêbazên ji bo taybetmendiyan zimên tespît bikin hene û bi lêkolîna materyalên devkî û nivîskî mirov dikare van cudahiyan û taybetmendiyan bihevde û bi awayekî akademîk li ser wan bixebite. Helbet ji bona bidestxistina karekî akademîk û sistematîk, divê gelek kes û pisporên qadên cuda bi hev re bixebitin ku tiştan bi dest bixin.

Problemên herî mezin ji bo kurmancî hebûna gelek cûreyên cuda ne; tunebûna xebatên berê weki referans, wendabûna gelek çavkaniyan, tunebûna zimanekî nivîskî ku wekî standart di nivîsê de bê hîlbijartin, tunebûna xebatên li ser vê mijare û hwd. hewce ye ku rêgezên zimannasiya giştî bîr nîrxandin û paşxana zimannasiya kurmancî jî ji vê zanistê dûr nekeve û têkiliya wan bê dîtin. Helbet analîzkirina zimanê kurmancî li gorî taybetmendî, qûral û qeîdeyên zimannasiyê demê dixwaze. Analîzkirina korpûsa *Hawarê* û ya dema xwe gelek taybetmendiyan giring yê fonolojîk û morfolojîk dide me ku em dikarin di vî 90 salên dawî de taybetmendî, cudahî û guherînan bibînin.

Di vê xebatê de, taybetmendiyan zimannasiya *Hawarê* di cudahiya zimên de, û cudahî û cûreyên zimên wekî du binbeşên giring in ku mirov divê bibîne bê ka taybetmendiyan kovarê çawa ne. Ji bo vê sê car *Hawar* hate xwendin, nîşe hatin derxistin, peyv û agahiyên ne wekî hev hatin berawirdkirin. Wekî rê û rêbaz ji ber analîzkirina taybetmendiyan zimên, metoda danberhevê ji bo vê xebatê hate bikaranîn. Ji ber cudahiyan zimannasiyê bi awayekî nivîskî dibin delîl, mirov dikare taybetmendiyan zimên beş bi beş bibîne û binirxîne.

Di her hejmarê de, dane hatin tespîtîkirin û taybetmendiyan heman daneyan hem di hejmarên din de û hem jî bi bikaranîna niha hatin berhevdayîn. Dawiyê agahiyên

hemû hejmaran li gorî serekeyên ku hatine senifandin hatin organîzekirin û li gorî binbeşan hatin organîzekirin.

Di encama vê xebatê de, hate tespîtkirin ku di nav sedemên bandorê li cudahiya zimên kirine bi taybetî *werger* û *bûyerên civakî* ne. Herwiha, zimanê wê demê ji ya niha bi gelek awayî xurttir e. Mentiqa zimên rasttir e. Gelek peyvên ku wê demê dihate bikaranîn lê niha tune ne hatin tespîtkirin. Taybetmendiyên zimên bi du binbeşên lînguîstîkî hatin dayîn û şîrovekirin. Taybetmendiya zimanê *Hawarê* carinan ne tenê guherîn e lê dibe ku bi qelsbûn û wendabûna gelek peyvan jî be û guherîn bi awayekî neyinî biçe.

Peyvên Sereke: Cudahî, Zimên, Zimannasî, Kurmancî, Fonetîk, Morfolojî

ABSTRACT

As known very well, all languages experience language change which is a continual period they go through and the best evidence to show us the liveliness of it. It is an ardent task to record and note down these linguistic features. Naturally, due to the existing scanning *methods of the language and the oral and written materials, it is likely to analyze, observe* and document the language change in basic tenets of the linguistics. In order to carry out an academic and systematic work, the collaboration of the experts and academics from the field and multidisciplines are required.

The main problem that are encountered are as follows: not existence of the previous reference works of the issue, not existence of the written materials, not having a standardized language already in writing system and etc. In this sense, to establish something new requires the relationship with the General Linguistics and a variety of analyses supported with numerous examples. Without forgetting such works necessitate long time and patience, the new works should be supported with the existing ones. Comparing the *Hawar* corpus with the present day enables us to see the main changes in basic linguistic tenets of the language by which the whole picture can be obtained.

In this study, the linguistic features of Hawar in linguistic diversity, and the differences and types of languages are considered as two important subsections that one should look at regardless of what the features of the journal are. For this *Hawar* was read three times, notes were drawn; words and information were not compared equally. As a method due to the comparison of two various time were chosen, the comparative method was used for this work. Since linguistic differences become evidence in writing, one can see and evaluate the linguistic features piece by piece.

In each issue, data were identified and a linguistic feature of the same data was collected both in other issues and in current usage. Finally the data of all the numbers

were organized according to the headings that were classified and organized according to the subdivisions.

As a result of this study, it was determined that among the reasons influencing the change were especially “translation” and “social events” along with some others. Moreover, the language of that time is much stronger than that of now. The logic of language is more accurate in which the influence of other languages are not seen in it which makes it a pure language. Many words that were used then but are no longer exist. Linguistic features were given and interpreted in two linguistic sections namely. Language change is sometimes not only a change but can also go negatively with the weakening and loss of many words.

Keywords: Change, Language, Linguistics, Kurmanji, Phonetics, Morphology

ÖZET

Bilindiği gibi, her dil farklı sebeplerden ötürü değişim yaşar ve bu da bize dilin canlılığını gösteren en büyük alandır. Bu dilbilimsel özellikleri kaydetmek uzun süreli ve yorucu bir iştir. Elbette var olan dil tarama yöntemlerinden dolayı, yazılı ve sözlü dil materyalleri sayesinde, bu dilbilimsel özellikleri incelemek, gözlemlemek ve dökümanlaştırmak mümkündür. Doğal olarak akademik ve sistematik bir çalışma yapmak için alanda tecrübeli ve uzman birçok kişinin multidisipliner katkıları önemlidir. Sahada karşılaşılan en büyük problem günümüzde önceden yapılmış referans çalışmalarının olmaması, pek çok çalışmanın yazılı olarak bulunmaması, yazılı standart dilin olmaması, bu konuda spesifik çalışmaların olmaması vb. şekilde karşımıza çıkmaktadır. Bu konuda genel dilbilim kurallarının iyi incelenip Kurmanccayla ilgili kuralların iyice analiz edilip belirlenmesi önemlidir. Bu çalışmaların uzun süreceği ve dil çalışmalarının sabır gerektiren işler olduğu unutulmadan yeni çalışmalarla öncekiler güçlendirilmelidir. 90 yıl önceki Hawar verileri (korpusu) günümüzle kıyaslanınca temel dilbilimsel özellikler bütün resmi görebileceğimiz bir şekilde karşımıza çıkmaktadır.

Bu çalışmada, dilbilimsel özellikler, *Hawar'da* mevcut olan özellikleri karşılaştırmak için görülmesi gereken iki önemli önemli alt bölüm olarak yer almaktadır. Bunun için *Hawar* üç kez okundu, notlar alındı; kelimeler ve bilgiler eşit olarak karşılaştırıldı. O dönemîn dilbilimsel özelliklerinin incelenmesinde, yol ve yöntem olarak bu çalışmada karşılaştırmalı yöntem kullanılmıştır. Çünkü dilsel farklılıklar yazılı olarak kanıt haline geldiğinden, değişimi parça parça görmek ve değerlendirmek mümkündür.

Her sayı için veriler belirlenmiş ve aynı verilerin hem diğer sayılarda hem de mevcut kullanımda bu özellikler incelenmiştir. Son olarak tüm sayıların verileri, alt bölümlere göre sınıflandırılmış olup başlıklara göre düzenlenmiştir.

Bu alıřma sonucunda dilde eřitlilięe etki eden nedenler arasında zellikle “eviri” ve “toplumsal olaylar” ile birlikte bařka nedenlerinde yer aldıęı tespit edilmiřtir. Üstelik o zamanın dili, řimdikinden ok daha glü ve zengin olduęu dilbilimsel zellikler aısından tespit edilmiřtir. Dilin mantıęı daha zgndr ve dięer dillerin etkisinde kalmamıřtır. O zamanlar kullanılan ama artık unutilan ve yok olan pek ok kelime tespit edilmiřtir. Dil zellikleri fonolojik ve morfolojik bakımdan iki dil blmnde verilmiř ve yorumlanmıřtır. Dilin zellikleri bazen sadece bir deęiřiklik olmayıp dilin zayıflaması ve pek ok kelimenin kaybolması ile birlikte olumsuz bir biimde de olabilmektedir.

Anahtar Kelimeler: Deęiřim, Dil, Dilbilim, Kurmancca, Fonetik, Morfoloji

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE	V
ABSTRACT.....	VII
ÖZET	IX
NAVEROK.....	XI
LÎSTEYA TABLOYAN	XVII
LÎSTEYA ŞIKILAN.....	XIX
KURTEBÊJE	XX

DESTPÊK1

ÇARÇOVEYA GIŞTÎ - MIJARA LÊKOLÎNÊ.....	10
SÎNOR Û PIRSGIRÊKÊN LÊKOLÎNÊ	13
ARMANCA XEBATÊ	16
METODOLOJÎ	17

BEŞA YEKEM

SEDEMÊN CUDAHÎ Û TAYBETMENDIYÊN ZIMÊN

1.1. Faktorên Polîtîk.....	30
1.2. Faktorên Teknolojiyê.....	32
1.3. Faktorên Çandî.....	33
1.4. Faktorên Civakî.....	33
1.4.1. Aborî	34
1.5. Faktorên Exlaqî.....	37
1.6. Faktorên Zimanên Din	38

1.7. Sedemên Din.....	41
-----------------------	----

BEŞA DUDUYAN

CÛREYÊN TAYBETMENDIYÊN ZIMANNASIYA FONOLOJÎ Û MORFOLOJİYÊ

2.1. Fonolojî	46
2.1.1. Asîmîlasyon (Assimilation)	48
2.1.2. Dîsîmîlasyon (Dissimilation)	48
2.1.3. Metatez (Methathesis)	49
2.1.4. Sistbûn (lenîsyon – lenition)	49
2.1.5. Yekkirin, Bihevgerêdan (Merger)	50
2.1.6. Parçebûna Dengan (Split)	50
2.1.7. Wendabûn (Loss)	50
2.1.8. Lêzêdekirin (Insertion)	51
2.2 Morfolojî	53
2.3.1. Taybetmendiyên Morfolojîk	53
2.3.2. Analîza Jinûve	58
2.3.3. Cûreyên Guherînê	60
2.3.4. Berhevkirin (Compounding)	61
2.3.5. Pêvekirin (Affixation)	61
2.3.5.1. Vegerandin (Backformation)	62
2.3.6. Vegerandin (Conversion)	62
2.3.7. Kurtkirina Peyvan (Abbreviation)	62
2.3.8. Herfên ewil yê Peyvekî (Acronyms)	63
2.3.9. Tevlihevkirin (Blending)	63
2.3.10. Gelemperîkirin/Hevparkirina Tiştan (Commonization)	64
2.3.11. Dubarekirin (Reduplication)	64
2.3.12. Deyngirtin (Borrowing)	64
2.3.13. Wendakirina Peyvan (Losing Words – Lexical Mortality)	66
2.3.14. Pasîfbûna Peyvan (Obsolence)	67
2.3.15. Kuştina Peyvan (Verbicide)	68

2.3.16.	Kêmkirin (Reduction).....	68
2.3.17.	Hevdengî (Homonymy).....	69

BEŞA SISÊYAN

HAWAR Û DANÊYÊN GUHERÎNA ZIMÊN

3.1.	Naveroka <i>Hawarê</i>	72
3.2.	Sedemên ku Bandorê li Taybetmendiyên Zimannasiya <i>Hawarê</i> Kirine.....	76
3.2.1.	Erdnigarî (Coxrafya) û Varyasyon.....	77
3.2.2.	Bûyer û Faktorên Civakî	81
3.2.3.	Werger û Rojavayîbûn	83
3.2.4.	Îdeolojî	92
3.3.	Alfabe.....	94
3.3.	Rêziman	104
3.4.	Ferheng.....	110
3.4.1.	Peyvên Ferhengokên <i>Hawarê</i> li Gorî Hejmaran.....	114
3.5.	Standartîzasyon	119
3.5.1.	Fonolojî	125
3.5.1.1.	Taybetmendiyên Herfên Dengdêr	125
3.5.1.1.1.	Guherîna “o” û “u”yê.....	127
3.5.1.1.2.	Guherîna “û” û “o”yê.....	128
3.5.1.1.3.	Guherîna “o” û “a”yê	129
3.5.1.1.4.	Guherîna “ê” û “î”yê.....	130
3.5.1.1.5.	Guherîna “e” û “i”yê	131
3.5.1.1.6.	Guherîna “î” û “ê”yê.....	133
3.5.1.1.7.	Guherîna “i” û “o”yê.....	134
3.5.1.1.8.	Guherîna “î” û “e”yê.....	135
3.5.1.1.9.	Guherîna “î” û “ê”yê	136
3.5.1.1.10.	Guherîna “û” û “î”yê.....	137
3.5.1.1.10.	Guherîna “i” û “û”yê.....	138
3.5.1.1.12.	Guherîna “i” û “u”yê.....	139

3.6.1.1.13. Guherîna “a” û “e”yê	140
3.6.1.1.14. Guherîna “e” û “o”yê	141
3.6.1.2. Guherîna Herfên Dengdar	143
3.6.1.2.1. Guherîna “q” û “k”yê	144
3.6.1.2.2 Guherîna “h” û “y”yê	145
3.6.1.2.3. Guherîna herfa “v”yê bi “d”, “y”, “m” û “b”yê re	146
3.6.1.2.4. Guherîna herfa “w”yê bi “b”, “h”, “k” û “y”yê re	148
3.6.1.2.5. Guherîna herfa “z” û “j” yê	150
3.5.1.2.6. Guherîna herfa “j” û “ş”yê	153
3.5.1.2.7. Guherîna herfa “j” û “s”yê	155
3.5.1.2.8. Guherîna herfa “j” û “c”yê	155
3.5.1.2.9. Guherîna herfa “y”yê bi “h” û “k”yê	156
3.5.1.2.10. Guherîna herfa “h”yê bi “y”, “v”, “w” û “d”yê	157
3.5.1.2.11. Guherîna herfa “l” û “r”yê	159
3.5.1.2.12. Guherîna herfa “t”yê bi “s”, “d” û “j”yê re	161
3.5.1.2.13. Guherîna herfa “b” yê bi “v” û “k”yê re	162
3.5.1.3. Guherînen îstîsna û kêmtê dîtin	163
3.5.1.3.1. Guherîna “f” û “v”yê	163
3.5.1.3.2. Guherîna “k” û “y”yê	164
3.5.1.3.3. Guherîna “w” û “y”yê	165
3.5.1.3.4. Guherîna “g” û “h”yê	166
3.5.1.3.5. Guherîna “v” û “f”yê	167
3.5.1.3.6. Guherîna “s” û “ş”yê	168
3.5.1.3.7. Guherîna “g” û “k”yê	168
3.5.1.3.8. Guherîna “m” û “n”yê	170
3.5.1.3.9. Guherîna “ş” û “ç”yê	170
3.5.1.3.10. Guherîna “g” û “c”yê	171
3.6.1.1. Avêtina Herfan	174
3.6.1.1.1. Avêtina Herfa “i”yê	174
3.6.1.1.2. Avêtina Herfa “ê”yê	174

3.6.1.1.3. Avêtina Herfa “û”yê.....	175
Avêtina Dengdêran	175
3.6.1.1.4. Avêtina Herfa “n”yê.....	175
3.6.1.1.5. Avêtina Herfa “h”yê.....	176
3.6.1.1.6. Avêtina Herfa “r”yê	176
3.6.1.1.7. Avêtina Herfa “w”yê.....	177
3.6.1.1.8. Avêtina Herfa “y”yê.....	177
3.6.1.1.9. Avêtina Herfa “d”yê.....	177
3.6.1.1.10. Avêtina Herfên Cuda	178
3.6.1.1.2. Guherîna Peyvan	178
3.6.1.1.3. Kurtkirin.....	178
3.6.1.1.4. Lêzêdekirin.....	181
3.6.1.1.5. Taybetmendiyên Cudahiya Dengan û Varyasyon.....	182
3.6.1.2. Varyasyon	185
3.6.1.3. Peyvên Guherî û Wendabûyî	188
3.6.2. Morfolojî.....	194
3.6.3.1. Peyvên ku bi Pêşgira “têr”ê re Hatine Çêkirin.....	203
3.6.2.2. Peyvên ku bi Peyva “xudan”ê Hatine Çêkirin	204
3.6.2.3. Peyvên Çêkirî.....	205
3.6.1.4. Peyvên ku bi peyva “kêm-”ê hatine çêkirin.....	206
3.6.1.5. Peyvên bi peyva “dilê” hatine çêkirin.....	207
3.6.1.5.1. Ji Dêvla Peyveke Guherîna Peyvekê Din	210
3.6.1.5.2. Guherînên Peyvan	217
3.6.2.4. Daçek.....	218
3.6.2.4.1. Şaşnivîsîn an jî bi hev re Nivîsîna Daçekan.....	219
3.6.2.4.2. Daçeka “dî”ya ku hatiye avêtin.....	221
3.6.2.5. Wendabûn	222
3.6.2.6. Peyvên Wenda.....	223
3.6.2.6.1. Peyvên ku wendabûnê lê wateya wan tên zanîn	223

ENCAM

ÇAVKANÎ	241
MALPER	253
PÊVEK.....	254
GENİŞLETİLMİŞ ÖZET	287

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1. Guherîna “o” û “u”yê	127
Tablo 2. Guherîna “û” û “o”yê	129
Tablo 3. Guherîna “o” û “a”yê	130
Tablo 4. Guherîna “ê” û “î”yê	131
Tablo 5. Guherîna “î” û “e”yê	132
Tablo 6. Guherîna “î” û “ê”yê	133
Tablo 7. Guherîna “î” û “o”yê	134
Tablo 8. Guherîna “î” û “e”yê	135
Tablo 9. Guherîna “î” û “û”yê	136
Tablo 10. Guherîna “î” û “û”yê	137
Tablo 11. Guherîna “î” û “û”yê	138
Tablo 12. Guherîna “î” û “u”yê	139
Tablo 13. Guherîna “a” û “e”yê	141
Tablo 14. Guherîna “e” û “o”yê	141
Tablo 15. Guherîna “q” û “k”yê	145
Tablo 16. Guherîna “h” û “y”yê	146
Tablo 17. Guherîna herfa “v”yê bi “d”, “y”, “m” û “b”yê re	147
Tablo 18. Guherîna herfa “w”yê bi “b”, “h”, “k” û “y”yê re	150
Tablo 19. Guherîna herfa “z” û “j” yê	151
Tablo 20. Guherîna herfa “d” û “z”yê	152
Tablo 21. Guherîna herfa “j” û “ş”yê	154
Tablo 22. Guherîna herfa “j” û “s”yê	155
Tablo 23. Guherîna herfa “j” û “s”yê	156
Tablo 24. Guherîna herfa “y”yê bi “h” û “k”yê	157
Tablo 25. Guherîna herfa “h”yê bi “y”, “v”, “w” û “d”yê	159
Tablo 26. Guherîna herfa “l” û “r”yê	161
Tablo 27. Guherîna herfa “t”yê bi “s”, “d” û “j”yê re	162
Tablo 28. Guherîna herfa “b” yê bi “v” û “k”yê re	163

Tablo 29. Guherîna “f” û “v”yê	164
Tablo 30. Guherîna “k” û “y”yê	165
Tablo 31. Guherîna “w” û “y”yê	166
Tablo 32. Guherîna “g” û “h”yê	166
Tablo 33. Guherîna “f” û “v”yê	167
Tablo 34. Guherîna “s” û “ş”yê	168
Tablo 35. Guherîna “g” û “k”yê	169
Tablo 36. Guherîna “m” û “n”yê	170
Tablo 37. Guherîna “ş” û “ç”yê	171
Tablo 38. Guherîna “g”û “c”yê	171

LÎSTEYA ŞIKILAN

Şikil 1. Astên Dîrokî yê Zimên	9
Şikil 2. Derketina Zimanekî di nav Nifşan de	18
Wêne Mîr Celadet Alî Bedirxan	288

KURTEBÊJE

AS: Aleykum Selam

BFF: Best Friends Forever

B.Z. : Berî Zayînê

CAB: Celadet Alî Bedirxan

IMHO: In my Humble Opinion

KBL: Kirde Birêser Lêker

LOL: That's laugh out loud

OMG: Oh my God

P.Z.: Piştî Zayînê

SLM: Selam

SVO: Subject Verb Object

HWD. : Her Wekî Din

DESTPÊK

Di dîroka mirovahiyê de, belkî “ziman” dîyardeya herî kevn û kompleks e. Ziman di her qada jiyanê de wekî çand, folklor, sinema, siyaset, medya, bazirganî, reklam, xebatên akademîk û gelek qadên dîtir de cihekî pir taybet û giring digire. Herdem însan pêwistî û daxwazên xwe bi saya zimên îfade kirine û ketine nav ragihandinê û yan jî hewl dane ku ragihandinê bidin dest pê kirin. Tu kes û civak tune ku bê ziman bijîn. Bendewarî, daxwaz, hest, fikir, raman, nêrîn jî her dem di hiş û dilê mirovan de teqez hatine guhertin û diguherin. Ev guherîn jî berî her tiştî xwe di zimên de nîşan didin. Loma, xebata zimên ji bo lêkolîneran bi xwe xebateke pir balkêş e ji ber baweriya xebateke hûrgilî û berfireh wê gelek tiştên veşartî derxe û em ê di derheqê zimanê xebatê de xwediyê agahiyên nû û giring bin. Cudahiya zimên taybetmendiyeke xwezayî ye ku di hemû zimanan de tê dîtin. Ziman, ji ber ku ji aliyê însanan ve tên bikaranîn candar in. Mirov li gorî îfadekirinên xwe yên demkî û bi gelemperî bêhişmendî, taybetmendiya xwe ya candariyê derbasî zimanê xwe dikin. Ziman hertim û bênavber diguherin (Akmajian and et al. 1995: 297; Keller, 1994: 2). Saussure (1959: 77) dibêje “dem her tiştî diguherîne; û tu sebeb tune ye ku ziman ji vê zagona gerdûnî xwe xelas bike”. Ev jî bi awayekî xwezayî taybetmendiyên nû têdixe nav zimên û hinek tiştan jî diguherîne. Her ziman li gorî xwe diguhere, hinek ziman taybetmendiyên xwe diavêjin, hinek jî wan kurt dikin. Hinek ziman dengên xwe diguherînin hinek jî dengên dawî diavêjin. Hinek ziman guherînan di wateya peyvan de pêk tînin, hinek guherînen cuda di hevokan de pêk tînin. Helbet ji ber ku ev guherîn pir hêdî pêk tên, tespîtkirina van taybetmendiyên zimên di zimannasiyê de ne rehet e. Hinek taybetmendiyên zimên di guherîna de 400 salî digirin û hinek jî di navbera 3 meh û 30 salî de dikarin xwe nîşan bidin. Mirov nikare pêşiya cudahiya zimên bigire an jî “dema guherîna” texmîn bike. Herwisa dibe ku ew taybetmendiyên cudahiya zimên li herêmekê pêk bên lê li herêmeke din pêk neyên. Wekî ku xuya ye zimanên ku ji aliyê însanan ve tên axaftin bi awayekî

rêkûpêk nayê bikaranîn û bi awayekî xwezayî dem bi dem qûral (rêzik; rêgez) û qaîde tîn dîtin. Herwiha, cudahiyên zimên xwe hêdî hêdî nîşan didin. Ziman dikarin hêdî hêdî biguherin û pêş bikevin (Harya, 2016: 105). Di ser re, ziman, her wekî berê û herdem, di rewşeke herikbar a domdar de ye, îro jî - her çend dibe ku em her gav pê hay nebin jî (Burridge & Bergs, 2017: 4). Lê bi her awayî ziman tîn bikaranîn û ev jî dibe sedema guherîna xweza û cudahiyên taybetmendiyên zimên ku tîn tercîhkirin.

Guherîna zimên diyardeyek e ku tê de taybetmendiyên zimên ên wekî fonetîkî, leksîkî, hevoksazî û semantîkî encama guherîna pêwîstiyên e (Murtiana, 2012: 104). Xebatên guherîna zimên ji aliyê beşa Zimannasiya Dîrokî (Zimannasiya dîakronîk) ve tê xebitîn, senifandin û şopandin. Zimannasiya dîrokî li ser gelek binbeşên cuda; wekî guherîna dengên, deyngirtin, guherîna analojîk, metoda berawirdkirî, avakirina zimên, senifandina zimannasiyê, modelên guherîna zimên, guherîna semantîk, guherîna peyvî (leksîkî), têkiliyên genetîk, filolojî û prehîstoryaya zimannasî disekine (Campbell. 1998: 84). Ev beş û binbeşên cuda xwediyê taybetmendiyên cuda ne û cudahî û guherînên wan ji hev cihê ne.

Bloomfield (1933: 347) li ser taybetmendiyên zimên fikirên xwe wiha îfade dike: Pêvajoya tespîtîkirina taybetmendiyên guherîna zimannasiyê tu car bi awayekî rasterast nehatiye dîtin. Ev pêvajo pevajo ye ku mirov nikare bi zelalî dema guherînê tespît bike û lê belê mirov dikare nexşeya guherîna dengên an jî tiştên din ji ber demên berê derxe. Guherîna dengên an jî guherîna hevoksaziyê jî bi rastî gelek dijwar e. Loma divê korpûseke berfireh bi kronolojîyê bê amadekirin da ku mirov bikaribe van taybetmendiyan bi sedemên wekî erdnîgarî, civakî, aborî yan jî zimanên din bibîne. Hebûna perwerdeyeke bînavber wê rehetîyeke mezin bida zimannasan lê mixabin destê me de xebat kêmtir in. Di ser re, di dîroka zimannasiyê de gelek zimannasan bawer dikir ku guherîna zimên ne pêkan e ji ber ku guherîn nedihate dîtin. Sedemên din jî haydarbûna (bihaybûna) taybetmendiyên zimanê standart tunebû, lê varyasyonên herêmên cuda hebûn. Bi kurtahî wekî Aitchison (2001: 42) dibêje “guherîna zimên ne nexweşî ye.” Ji ber ku ziman tiştêkî ne statîk e û hertim dikare biguhere. Ew wekî pêlên behrê derin û tîn, lewma normal e ku biguherin û taybetmendiyên xwe li gorî sedemên

derveyî biguherînin. Herwiha ziman herdem di nav guherînê de ye niha jî ev guherîna ku em li ser diaxivin ji ber hinek sedemên taybet di nav pêvajoya guherînê de ye. Ev guherîn carinan wekî varyasyonê carinan jî wekî nediyaî û tevliheviyê pêk tê

Guherîna zimên asayî û sistematîk e (Shukla & Connor-Linton, 2014: 288). Mirov dikare vê guherînê ji destpêka matbeaye heya roja me bişopîne. Xebatên ku hatine çapkirin nîşanî me didin ku ziman di nav salan de diguherin û ev jî ne razeke veşartî ye. Guherîn di her ziman, zarava û devokan de li gorî sedemên xwe, xwe nîşan didin. Guherîna ziman carinan û bi taybetî di demên serhildanên civakî û siyasî de derdikevin û ew dikarin bi awayekî berbiçav pêk bên (Finegan, 1999: 454). Her bûyerên ku pêk tên taybetmendiya zimên diguherînin û yên nû têdixin nava zimên. Loma her dem li gorî xwe zimên ji nûve diafirîne. Loma divê ziman li gorî dema xwe bê nîrxandin.

Li gorî Aitchison (2001: 6-7) di teoriya guherîna zimên de sê ihtîmal hene ku divê bêne nîrxandin; ew her sê dikarin bi gelemperî ji bo hemû zimanan bên bikaranîn an jî tenê li ser yekê bêne bikaranîn.

Ya ewil, ihtimala yekem hilweşîna hêdî ye, wekî ku bi gelemperî di sedsala nozdehan de hatibû pêşniyarkirin. Gelek zanist bawer dikirin ku zimanên Ewropî ber bi kêmbûnê ve diçin ji ber ku ew gav bi gav bêjeyên xwe yên kevn wenda dikin. Ya duduyan, dibe ku ziman hêdî hêdî ber bi rewşeke karîger wêrar biçe. Dibe ku em bibin şahidê xelasiya zimanên herî zindî, ew bi zimanên heyî re li gorî hewcedariyên demê, xwe adapte bikin û li ser rûyê erdê bimînin. Îhtîmaleke sisêyan ev e ku ziman di rewşa pêşveçûn an hilweşînê de dê di rewşeke hevşibî de bimîne.

Helbet ev her sê tenê nînin, lê ew ihtîmalên gelemperî û berbelavbûyî ne. Her ziman li gorî derfê, tercîh û biryarên civakî yan jî yên siyasî rêya xwe digirin. Gelek mînak hene ku ziman ji ber hêza civakî û siyasî xelas bûne, û gelekî din jî hewl didin ku

xwe xelas bikin. Li gorî Zeynep Korkmaz (1970: 97), ziman bi gelemperî du celeb guherînan pêk tîne:

1. Ji xwe, bi awayekî xwezayî,
2. Bi rêya mudaxeleya mirovan û dayîna formekî.

Mirov dikare ya ewil wekî wêrarbûnê binirxîne. Ji ber ku ev guherîn bi awayekî xwezayî ye, û ew dibe wêrarbûn. Wekî mirov dizane wêrarbûn di nav xwe de faktorên navxweyî û derveyî dihevin. Sedema duduyan jî ji bo her zimanî gelek giring e; ji ber ku ev mudaxale dikare/in ne rast bin û yê ne rast dikarin hin tiştan tevlihev bikin û rewş û hêza zimên paşve bikişîne. Herwiha ku ev biryar ji aliyê saziyeke fermî pêk bê, hingê ew dikare ciyê xwe jî bigirê lê dema mirov rewşa kurdî bi taybetî kurmancî binirxîne, nebûna saziyek an akademiyeke kurdî rewş û xetereya vê têdixe nav rewşeke hessas. Gava yek, piştî bikaranîn û qebûlkirineke demdirêjî ya rastnivîsa kovara *Hawarê* binêre, mirov dikare wan xebatên rêziman, ferheng û rastnivîsê bi xwe jî wekî mudaxeleyeke bi destên mirovan nîşan bide. Ev mudaxele jî taybetmendiyên zimanê Hawarê ji nûve çêdike.

Zimannasên demên dawî û yê îro, heya ji destê wan tê bala xwe didin xebatên guherîna zimên û ew heya ku dikarin guherîna zimên qeyd dikin da ku bi awayekî belgekirî guherîna tê şopandin bisenifînin, binirxînin û şîrove bikin. Sapir (1921: 147) kesê ewil bû ku gotibû “herkes dizane ku ziman guherbar e.” Berê bala gelek kesan ne li ser van cûre xebatên zimên bû, heta Wolfram (2006: 333) dibêje ku heya pêşketina sosyolînguîstîkê, anku heya 50 sal berê jî kar û xebatên guherîna zimên ne giring bûn. Lê niha ev mijar di qadê de li gor gelek kesan xwedî qîmet e.

Guherîna zimên, wek ku li jorîn hate behskirin, di heman demê de mijara zimannasiya dîrokî (diyakronik) ye jî: Zimannasiya dîrokî bêtir li ser guherîna zimên ya di demê de û girêdan û têkiliya zimanekî bi yê din re dihevin. Hemû ziman di demê de bi awayekî li gorî sedemên cuda diguherin. Helbet ev guherîn ne bi lezginî ye, hêdî hêdî pêk tê. Herwiha guherîna ziman ne bi awayekî rasthatinî ye. Dema ku taybetmendiyên zimanan tê nirxandin gelek tişt wekî sedemên guherînê, cûreyên guherînê û nêzîkatiyên

gelemperî derdikevin pêşberî mirovan. Ev giş di demên dirêj de pêk tên, loma divê xebatên çavdêrî, lêkolîn, berhevkirin û berhevdarîyên jî li gorî demên dirêj bênê kirin da ku ev guherîn bên dîtin. Di jiyana mirovan de, guherîn ewqas hêdî hêdî pêk tê ku gelek kes vê guherînê bi awayekî zelal nabînin. Gûherînen ku pêk tên pêlê bi pêlê (hêdî hêdî) ne, guherîn bi taybetî di sîstema fonolojîk û hevoksaziyê de tê dîtin (Fromkin et al, 2002: 534). Wekî tê dîtin, guherîn li gorî zimanan derdikeve holê. Bi guherîna civakê re, ziman jî diguhere. Ji ber teknolojiyên nû ku di jiyana mirovan de cihekî girîng digirin, jiyana mirovan, bertekên mirovan, edetên mirovan û zimanê mirovan diguhere û ew dê bêtir jî biguherin. Guherîna civakê di heman demê de wekî cudahiya zimên jî tê dîtin. Ev cudahî ji ber ku di axaftin û ragihandina mirovan de carekê xuya nabe, mirov nikare bi rehetî taybetmendiyên zimên yên nû û cudahiyan demildest bibîne. Wekî Shigemoto (1996:1) dibêje mirov ewqas girêdayî zimanên xwe ne ku pêkan e ew guherînan nebînin, ev dişibe nêzîkatiya mirovan ji bo zarokên wan ku fahmkirina pêşveçûna wan şolî dike. Lê ziman teqez diguhere, loma ziman ne statîk e, ew diyardeyeke guherbar e. Hertim ziman li gorî dema xwe taybetmendiyên nû digire û aktîf e. Ev guherîn demkî ye, ew li gorî wê heyama ku mirov tê de dijîn te dîtin. Herwiha, du nîşên li du hev dikarin ji hev fahm bikin lê cudahiya di navbera 4-5 nîşan de gelek diyar e.

Dema civakek ji ber şeran, ji ber sînoran, ji nexweşiyekî dibe du cî û ji hev dûr dikevin, hingê cudahî bi rehetî xuya dibe. Di nav heman zimanî de, hinek binyadên zimannasiyê bi adaptasyona xwe têdikevin meyla guherînê. Wekî mînak, guherînen gelemperî bêtir di peyvan û watesaziyê de pêk tê û cihê herî kêr guherîn pêk tê ji rêziman û hevoksazî ye. Loma cudahiya deng û fonolojiyê ya herî zêde ye.

Fasold (2014: 315) îddîa dike ku ziman ji ber bersiva pêwistî û rewşên ku tênê guhartin di nav demê de diguhere û xwe di hin qadên zimên de bi taybetmendiyên nû jinûve ava dike. Guherîn bi çend kesan dest pê dike, bi piranî ketober e û dawiyê jî berbelav dibe. Ziman wekî tê dîtin jiyanbar in û di nav demê de diguherin. Mirov dikare bibêje ku guherîna ewil di mêjiyên zarokan de dest pê dike û dikare demkî be. Lê ev guherîn di civakê de pir hêdî bela dibe belkî sê çar nîş bi rehetî nikarin van guherîna bibînin. Ev guherîn wekî ji nû ve zayîn e, wekî destpêkeke nû ye. Herçiqas ev guherîn

hêdî hêdî pêk bên jî, rêjeya guherînê dibe ku pir mezin be. Helbet bandora gelek tiştên navborî hene û li her deverî bandora faktorên ji hev cuda ne. Di nav demê de, ev guherîn dikare bê astekê ku mirov nikaribe bibêje ev her du peyv heman peyv in an jî xwediyê eleqeyeke mezin in. Loma zimannasên dîrokî li ser rê û rêbazên çareseriyên ku bikaribin di navbera zimanên de têkiliyan deynin û bi pêş bixin dixebitin. Zimanê ku di xebatên qeydkirî de hatine komkirin dikare pêşxistina van xebatan pêştir bibe.

Karê çavdêrî û qeydkirina cudahiya zimên dive ji çavkaniyên folklorik, klasîk, modern, xebatên nivîskî û devkî û li gorî ziman û zaravayan bê kirin ku mirov bikare wêneyeke temam û hevgirtî bibîne û bi nêrîneke berfireh vê guherîna qeyd bike. Dema mirov guherîna zimên dibîne, hişmendiya neteweyekê bi awayekî candar derdikeve ber mirovan. Guherîna jiyanê rihê zimên e. Cudahiyên herêman, tercîhên heyî û taybetmendiyên ji ber sedemên cuda di zimên de xwe bi awayekî resen derdixe.

Li Îraqa nûjen a îroyîn deverên arkeolojîk heye ku wekî xirbeyên birca kevnar a şeş-qat tê nasîn, ku li Mezopotamyaya kevnar rawestiyaye û navê wê ziggurata Babîlê an îro jê re dibêjin Qûleya Babîlê (Zaluchu, 2019: 266). Di çîroka qûleya Babîlê de, hemû însan bi zimanekî diaxivîn heya ku qûle xera dibe û gelek zimanên nû jinûve derdikevin û ziman li dinyayê berbelav dibin. Kes baş nizane ka ev çîrokeke rast e yan na, kuleya Babîlê hebû yan jî tune bû, lê em baş dizanin ku ev 7000-8000 hezar zimanên ku îro hene paşxana xwe ji demên berê yan jî kevnar digirin û derin demê kevn. Lê pirsê giring ev e, gelo hejmara zimanên çawa zêde bû/ye?

Di heyama koçberiya mirovan de, nifûsa dinyayê kêm e bû. Loma komên ku bi zimanekî diaxivîn û xwediyê çandeke hevpar bûn li gelek cihan û di gelek tiştan de ji çîrokên ku zarokan têdixistin xew heya jiyanê rojane xwediyê şibandinekê bûn. Dawiyê ev ji hev veqetiyên, zimanên wan di nav xwe de bi parastina tiştên eslî yên zimên ve bûn zimanên parçeyên biçûk. Her çiqas koçberî dewam bike û însan derbasî deverên xwediyê hewa û rewşên nû bibin jî, zimanên nû hinek tişt ji zimanên kevnar wergirtin. Lê ji ber ku mirov ji hev dûr ketin, heta hatin teverkirin û ji xwe re rêyeke nû dîtin û wisa jî ziman jî bi wê rêya nû hate dîtin bû amraza ragihandinê. Ev sedsalên ku di şert û

mercên cuda de jiyân, xwarin û vexwarinên nû ku bûne parçeyek ji jiyana wan a rojane, çanda cîranên nû ku rast hatin, bandor li ser zimanan kir. Di destpêkê de tiştên nû xwe di zimên de wekî telafûz û peyvên bi wateyên nû, hevoksaziya ku bi zimanê din re tevlîhev bû nîşan da. Ev giş bi awayekî xwezayî bûne sedemên hinde ku zimanek ji eslê xwe dûr bikeve û wekî zimanek nû bikeve jiyana mirovan. Her çiqas civak mezin bû jî ji cudahiya zimên wisa zêdetir bû. Di roja îroyîn de, gelek zimannas hewl didin û li ber xwe didin ku wê pevajo ya hatiye jiyîn bibînin, wê nexşe bikin heta ku wan bi hûrgulî heya zimanê bavûkalan û protozimanan pêşkêşî însanan bikin. Loma zimannasiya dîrokî li vir dibe xwediyê giringiyeke mezin. Koma zimanan ku bi awayekî ve girêdayî hev in, ji malbateke zimên tîn û di vê malbatê de gelek şax û malbatên biçûktir û cudatir de cî digirin. Tiştê zehmet û giring analîz û bicîkirina tîkiliya zimanan e. Peyvên xwedî dengên wekî hev gelek tiştan îspat nakin, dibe ku peyvên deyngirtî bin ku ji heman kokê hatibin yan jî ew bandora zimanekî serdest û berbelav bin. Tîkiliya van dangan dikare tiştên wekî hev û cuda nîşanî me bide. Ji bo teşhîskirina malbata zimanan, rêziman û hevoksazî û peyvên wekî cînavk, peyvên mirova(n)tiyê, hejmarên zimanên cuda û hinek peyvên wekî hev delîlên şênber û çêtir didin mirovan ji ber ku ew kêmtir derbasî zimanên din dibin. Bi xebitîn û berhevkirina van taybetmendî û guherîna dangan bi awayekî sistematîk, zimannas dikarin pêwendiya zimanan, wêrarbûna zimanan ka di kîjan demê de çawa pêk hatiye û binyada zimanên berê derxin holê. Wêrarbûn helbet ji dêlewa dabeşkirineka statîk dabeşkirineka dînamîk derdixe pêşberî mirov û cudahiya binyadên sosyalbûnê bûye sedema ve rewşê ku antropolog dabeşkirinê dîsa bifikirin û hinek antropolog jî hinek tiştan red bikin (Johnson & Earle, 2000:3).

Zimannas dikarin delîlên dîrokî yê din wekî koka erdnigariyê yan jî jiyana însanên ji demên antik ku kîjan peyvên orjînal û kîjan peyvên deyngirtî bi kar anîne jî derxin. Helbet ew xebateke demdirêj e. Di ser re, ji ber ku emrê mirovan carinan têrî tespîtkirina taybetmendiyên zimên nake normal e ku mirov nikaribe hinek tiştan bidest bixe.

Dema avakirina malbatên zimanan, zimannas rastî du problemên giring tîn. Yek ji wan ew e ku tu rêyeke zelal tune ye ku mirov biryar bide dê kîjan ziman li kîjan şaxa

darê de cî bigire, yanî zimanek gelo ziman e yan jî zarava ye, yan di bin kîjan komê de ye. Mînaka herî balkêş swedî ye. Swêdî wekî zimanek tê pênasekirin herwiha zaravayên swêdî ji hev ewqas cuda ne ku du kesên ji zaravayên cuda nikarin ji hev fahm bikin. Lê ji aliyekî din jî gelê Swêdê û Norveçê herçiqas du netewên cuda jî bin ji ber ku dîrokeke wan a hevpar heye û gelek salan bi hev re jiyane, ew bi rehetî ji hev fahm dikin. Swêdî ji bilî zimanê neteweyî yê Swêdê, di heman demê de, zimanê fermî yê Fînlândiyayê ye jî. Li gel du guhertoyên norwêçî yên xwedî statuya fermî wek zimanên neteweyî: Bokmal û Nynorsk. Ji hêla hevoksaziyê ve, ev ziman hema hema yek in (Faarlund, 1972: 2)

Li ser mijara ziman û zarava nêrînên cûr bi cûr hene. Li gorî Haugen (1966) zimanê îngilîzî di navbera “ziman” û “zaravayê” de tu cudahî çenekiriye. Haugen îddîa dike ku ev peyva zaravayê ji Ronensansê hatiye girtin. Bi rastî em dikarin ji ber bandora çanda yewnaniyan cudahiya îngilîzî di navbera “ziman” û “zaravayê” de binirxînin. (Hudson, 1996: 31). Di yewnanî de peyva diyalektê “patois” e, lê peyva *diyalektê* bêtir dişibe peyva fransî ya “dialecte”, loma pêkan e ku ev peyv ne yewnanî be lê frensî be. Şîroveya Haugenî ev e ku cudahiya “ziman” û zaravayê” dikare di “mezînbûn” û di “prestîjê” de bê dîtin. Ji aliyekî ve ziman, ji ber hebûna hêmanên zimannasiyê, ji zaravayê mezintir e. Ji aliyê din jî prestîja zimên ji ya zaravayê zêdetir e. Zarava wekî zimanê ku di bin standartan de, xwediyê statûya kêr û piranî jî forma *rustîk* (çolter; gundewar) û xwediyê prestîja kêmtir e. Zarava bi piranî wekî formeke zimên e ku ji normên xwe derketibe jî dikare bê qebûlîkirin, yanî wek jirêderketina norma standart an jî ya rast ya zimên e (Chambers and Trudgill, 1998: 5).

Bi hin awayan, wekî li jor hate nîşandayîn û vegotin, tişteki normal e ku ziman diguherin. Beriya her tiştî, ew di nav nîşan de bi axaftin û têkiliyên xwezayî di navbera dê û bav û zarokan de derbas dibin. Helbet ev guherîn ne wekî hev e. Lê belê zimannas dibînin ku hemû ziman bi demê re - her çend bi rêjeyên cuda jî be - diguherin. Wekî mînak, dema ku japonî di ser 1000 salan de hindik diguhere, îngilîzî tenê di nav çend sedsalan de gelek diguhere (wêrar dibe)². Gelek axêverên îroyîn nivîsên Shakespeareê

² https://www.nsf.gov/news/special_reports/linguistics/LanguageandLinguisticsIntroduction.pdf Special report - Language and Linguistics Introduction - mêjû û dema gihîştinê 14.05.2021 seet 04:07

yên sedsala XVIan dijwar dibînin û *Çîrokên Canterbury*'a Chaucerê ya sedsala XIVê hema hema xwendina wan ne gengaz e.

Loma cudahiya di navbera ziman û zaravayan dibe meseleyeke polîtîk, fikirên netewî terka taybetmendiyên zimên yên resen dikin. Wekî mînaka swedî û norveçî ji hev fahm bikin jî, dikarin wekî du zimanên cuda bên pênasekirin, tê îddîa kirin ku kurmançî û zazakî ne wekî du zaravayên zimanekî wekî du zaravayên biyanî ku ya duduyan (zazakî) girêdayî zimanekî din (îranî) tê nasîn. Ji ber vê, bersîva pîrsa “li ser rûyê erdê, çend ziman heye/hene?” dikare di navbera 2500 û 8000an de biguhere, ev jî li gorî kesên ku zimanan dijmêrin diguhere û nêrînên şexsî dikare têkeve pêşiya nêrînên zanistî. Zelalkirina pênaseya ziman û zarava ne hêsan e loma hejmara ziman û zaravayan jî nediya e.

Problema din jî em çiqas herin destpêka dara malbata zimanan, delîlên derheqên zimên de qels û kêmtir dibin. Loma agahiyên nediya, nêrînên nezelal derdixin pêşiya mirovan û ew wan didin sekinandin. Ev jihevkirina demkî têkiliya zimanan heya derekê nîşan dide, ev jî tê wateya ku zimanên malbatên cuda dibe ku di astekê de bi hev ve girêdayî bin. Ji bona mirov bikaribe vê cudahiye bibîne, em mecbûr in destxet û xebatên çapkirî binirxînin. Herwiha di navbera zimanên cuda de, bi şiklekî dibe ku têkilî hebe, ji ber hebûna TV û internetê êdî ziman bi rehetî bandore li hev dikin û piştî demekê ziman ji hev tiştan digirin û însan van tiştan bi kar tînin.

Em dikarin zimanan li gorî halê orîjînal ku jê hatine wekî dara zimanan bisenifînin. Ger em bîna li ser rewşa kurdî – kurmançî, tê zanîn ku zimanê kurdî zimanekî îranî ye wekî farsî û ev her du ziman berî demekê dirêj ji hev qetiyane, lê gelek tiştên hevpar û wekî hev jî vedihewînin. Koka her du zimanan proto-îranî ye (texmînî 1500 BZ) û dawiyê jî cihê xwe di Îraniya Rojavayî de digire. Lê gelek zimanên Awrûpî û Asyayî ji zimanê proto-hîndo-ewrûpî tên.

Grafîka Haig (2004: 16) bi awayekî vekirî dîroka guherîna zimên nîşan dide

Astên dîrokî

Zimanên bi piranî hatine pejirandin

Îraniya Kevn Farsiya Kevn (6–4c.bc);

Îraniya Rojavayî

Îraniya Navîn Farsiya Navîn, Partî

(4/3ss.BZ–8/9ss.PZ)

Îraniya Modern Farsî

Kurdî

Beluçî

Avestaya Kevn, Avestaya nû

(12c.–6c.bc, dîrok ne teqez e)

Îraniya Rojhilafî

Soxd, Xotanî

Paştû

Pamir

Ossetik

hwd.

Şikil 1 Astên Dîrokî yê Zimên

Wekî mînakekê balkêş, di guherîna hevoksaziyê de di rêza Kirde Lêker Bireserê (Subject Object Verb), dikare di zimanên modern yê Indo-Aryanî de nêzî rêza KBLê (SVO) bibe, bicîkirina lêkerê di dawîya hevokê de di Sanskrîtî de tê dîtin. Ji ber vê, di zimanên dîrokî de ku rastiya wan hatiye pesendkirin ne diyar e ka ber bi ku ve diçin û wê biçin, herwiha ne diyar e ku dê ber bi demên borî ve jî biguherin (Comrie.1997: 90).

ÇARÇOVEYA GIŞTÎ - MIJARA LÊKOLÎNÊ

Mijara vê lêkolîna “taybetmendiyên zimannasiya kurmancî” yê kovara *Hawarê* ye. Guherîna zimanan tiştekî pir xwezayî ye û ti ziman nikarin xwe ji vî tiştî dûr bixin an jî xwe jê biparêzin. Hemû ziman hertim di nav pêvajoya guherînê de ne. Ziman wekî tê zanîn tiştekî candar e, candarbûna wê girêdayî bikaranîna însanan e. Însan jî hertim têdikevin bin bandora rewş û bûyerên siyasî, dîrokî, çandî û civakî. Ev rewş û bûyer jî dibin sedema afirandin û wendakirina hinek hêmanên zimên; ji dangan bigirin heya hevokan. Mirov wê guherîna berê di navbera kesan de dawiyê jî di civatê de dibîne. Loma em ê hewl bidin vê guherînê û taybetmendiyan di xebateke nivîskî de, yê di kovara *Hawarê* de li gorî xebatên diskirîptîfî tespît bikin, analîz bikin, û li gorî daneyên

nivîskî yê heyî wan bidin ber zimanê niha da ku rêjeya taybetmendiyên zimanê Hawarê derkeve û bê dîtin.

Saussure (1915:6) wiha behsa giringiya xebatên nivîskî dike û li ser giringiya xebatên nivîskî û çandan disekine:

Mijara zimannasiyê ji hemû diyardeyên axaftina mirovan pêk tê, çî yê hov an neteweyên şaristanî, çî jî yê serdemên arkaîk, klasîk an hilweşandî. Di her serdemê de divê zimannas ne tene li ser axaftin û zimanê geş lêkolînan bikin, lê divê ew li ser hemû awayên vegotinê yê din jî bifikirin. Herwiha, ev ne her tişt e: ji ber ku ew bi gelemperî nikare rasterast li ser axaftinê bisekine, ji ber ku tenê bi navgîniya wan ew dikare bigihîje biwêjên dûr di dem an cih de, pêdivî ev e ku ew nivîsên nivîskî bîn nîrxandin.

Li gorî Saussure, divê zimannasî wiha be ku di vê nîrxandinê de em dikarin sê xalên giring yê ku zimannîsiyê sînordar dîkin bibînin.

Divê çarçoveya zimannasiyê;

- a) danasîn (şayesandin) û şopandina dîroka hemû zimanên ku tene dîtin, ku ew tene wateya şopandina dîroka malbatên zimanan û heta ku ji dest tê ji nû ve avakirina zimanê zikmakî yê her malbatî;
- b) destnîşankirina hêzên ku bi domdarî û gerdûnî ne û bi hemû zimanan bi kartên, û bidesxistina qanûnên gelemperî yê ku hemû diyardeyên dîrokî yê bi taybetî dikarin bîne kêmkirin;
- c) sînordarkirin û danasîna xwe (zimannasiyê).

Wekî tê dîtin, şayesandina zimannasiyê ji danasîn û şopandina zimanên din dest pê dike da ku em bikaribin têkilî û pêwendiya zimanan bi hev re bikin û metodolojiya zimanan bi hev re rast derxin. Armanca giştî gihiştin û avakirina binyada zimanên sereke yê her malbatan e da ku zimannas bikaribin guherînen dîrokî bişopînin. Xala duduyan tespîtîkirina hêzên guherîna zimên in ku ew jî wê ji bo derxistin û bidestxistina qanûnên zimên bikêrhatî ne. Helbet ew faktorên demkî û gerdûnî rehetiya senifandina taybetmendiyên zimanan jî didin. Xala sisêyan dibe xala herî dijwar ji ber ku

sînardarkirin û danasîna zimannasiyê ne hewleke rehet e û her dema ku mirov bixwaze kûrtir biçe, hûrgilî zêdetir dibin. Mirov nikare zimanekî an jî xebatên zimannasiyê ji hev veqetîne, mirov nikare guherînen ku berê pêk hatine ji rewş û forma îro veqetîne. Mirov nikare sedem û faktorên ku hewlê didin ji hev veqetîne. Xuya ye ziman tiştêkî hevger û temamker e, anku ziman bi gelek tiştan girêdayî hev e. Dema mirov li sînorbûna zimanan dinêre, bi rehetî dibîne ku hinek tiştan guherîna xwe qedandine û hinekan hêj ev guherîn neqedandine; hinek tiştan hin taybetmendiyên xwe avêtine û hinek hin taybetmendiyên xwe diparêzin. Loma dema ku mirov hewl bide zimanekî li gorî dema xwe sînor bike, ew ê tenê bibe xebateke senkronîk a dema xwe û wêrarbûna zimanan di hin tiştan de diyar in û di hin tiştan de jî ne diyar in.

Dema Saussure (1915: 6) hewl dide pênaseya zimên ji antropolîjiyê bike, ew dibêje divê ev zanist bêtir li gorî nêrîna celebê xwe bê nirxandin, ji ber ku ziman rastiyeke civakî ye. Tiştê ku divê li vir bê nirxandin ev e ku ziman rastiya civakî ye, divê ev rastî çawa bê nirxandin? Mirov çawa nêzî zimên bibe ku bikaribe bigihîje rastiyên zimanan û çanda ku bi hev re ne. Ji ber sedemên cûr bi cûr wekî çand, teknoloji, xweza û hwd. giş bi hev re bandorê li tiştan dikan. Hebûna civakê xwe di zimên de nîşan dide. Zimannas heke bikaribin van tiştan rast binirxînin wê demê dê bikaribin faktorên zimên, rêje û şopa guherîne jî derxin holê.

Ji ber ku *Hawar* rastiya civakê ya dema xwe bi awayekî vekirî pêşkêş dike, giringiya *Hawarê* derdikeve holê. Rastiya civakî bi awayekî nivîskî ji Misrê heya Kafkasan bi saya *Hawarê* berbelav dibe û gele kurd dibe xwediyê agahiyên cûr bi cûr. Ew giş bi nivîsê pêk tê, îro jî em dikarin wê demê, bi nêrîn û perspektîfên roja me bibînin, binirxînin û têkiliya her du demên berê û niha ronî bikin. Encameke din ev e ku nivîsandina kêr nûnertiya tiştê ku bê temsîlkerin dike, loma meyla ku wê bihêztir bi kar bîne jî dibe bingeş. Rêzimannas tu carî di balkişandina forma nivîskî de kêr namînin. (Saussure, 1915: 30)

Guherîna zimanan di zimannasiyê de mijareke wiha ye ku bûye navenda gelek lêkolînan û zimannasan serê xwe pê re êşandine, lewre ziman bi guherîna civakê û

hişmendiya wê re tim xwe adapte dike û lêkolîna li ser van guherînan herwiha rêyê li ber vedike ku mirov guherîna hişmendiya civakê jî fahm bike. Di vê guherînê de herweha bandora coxrafîk û têkîliya zimanan jî heye ku ji ber sedemên nêzîkiyê an jî danûstendina bazirganî û çandî pêk tên. Saussure (1915: 209) ji bo vê rewşê wiha xwe îfade dike: *Sedem ne giring e; ya giring ew e ku veqetîn di dîroka zimanan de roleke mezin dilîze û gelo bandorên wê ji yê li cihê ku berdewamî xuya dike cîyawaz in?*

SÎNOR Û PIRSGIRÊKÊN LÊKOLÎNÊ

Ji ber ku guherîn di hin qadan de hêdî hêdî û di hin qadan de jî bi lezgînî pêk tê şopandina guherîna zimanekî tiştêkî ne hêsan e. Dema guherîn pêk tê mirov bi gelemperî ji guherînê haydar in, lê nizanin ka gelo wê ew guherîn pêk bîn an neyên, gelo ka ew guherîn li ser formê pek tê yan di hevokê de pêk tê, ewê pêvajoya guherînê biqedîne yan neqedîne. Ji bilî dijwarbûna şopandina guherînê, dijwariyeke din jî, tunebûna xebatên li ser guherîna zimên in. Li ser teoriya cudahiya zimên di zimanên din de gelek pirtûk, xebat û gotar hene û lê li ser cudahiya zimanê kurmancî mixabin, tu xebat rasterast li ser vê mijare tune ne û gelek kêmasiyên mezin ne tenê li ser mijarê lê li ser xebatên zimannasiya kurdî (kurmancî) jî hene. Rasterast bi kurmancî çend gotar hene lê ne berfireh in (bnr. xebatên Salih Akın³; Ergin Öpengin⁴). Loma sînora vê lêkolînê tenê 13 salên weşandina kovara *Hawarê* ye. Berî û piştî *Hawarê* jî, hinek kovar, rojname û xebatên din jî pêk hatine lê sînora *Hawarê* sînoreke bingehîn e.

Di vê xebatê de, hinek pirsgirêk û astengiyên ku nehatibûn hizirkirin jî hate dîtin. Varyasyon, devok û zarava bi xwe dikare taybetmendiya gelemperî derxe. Ji ber ku nivîskarên *Hawarê* giş ne ji heman herêmê ne, loma tercîh û hîlbijartina pêyvên wan jî li gorî perwerde, paşxan û erdnigariya wan diguherin. Wekî mînak peyveke ku ji aliyê

³ Guherînên di Zaravayê Kurmanciyê de: Pirsgireka Zayend, 2010: 195

⁴Parastin û Guherîna Zimên: Destpêkek bo Çarçoveyên Teorîk ên Parastin û Guherîna Zimên û Hin Împlîkasyonên Wan li ser Rewşa Zimanê Kurdî, Kovara Zendê, Zivistan 2007

Celadet Bedirxanî ve tê bikaranîn dibe ku ji aliyê nivîskarekî ji bajarekî din neyê bikaranîn.

Rewşeke din a ku divê di guherîna zimên de bê îfadekirin jî hinek guherînên ku li deverekê qediyane dikarin û dibe ku li hin deverên din pêk nehatibin. Loma ji bo vê rewşê jî divê îstîsna neyên piştguhkirin, lê ji aliyê din ve jî bikaranîna nivîskî jî wekî referans bê dîtin û nîşandayîn. Di xebatên akademîk û çapemeniyê de pêkan e ku nêzîkbûna peyv û qalibên zimanan nêzî hev bin. Herwiha di helbestekê de yan jî di romanekê de helbestvan û nivîskar azad in ku peyv, gotin û qaliban li gorî ziman, devok û li gorî çanda xwe hilbijêrin. Wekî mînak em baş dizanin ku torî hevokên xwe bi dengê “a”yê diqedînin wekî “wera, hera, bixwa” lê li aliyê din jî peyvên wekî “were, here, bi xwe” tê bikaranîn. Di ser re li Colamêrgê hin caran lêker bi peyva “-it”ê diqede wekî, “Xwedê ji te razî bit”, “riya te vekirîbit”. Romanên Torî an yên Medenî Ferho çawa ji aliyê peyv û qaliban ve temsîla devoka torî dikin, herweha hin qalibên nava Mem û Zîna Xanî jî temsîla devoka Colamêrgê dikin. Lê di kurmanciya standart an jî ya axaftina rojane de wekî “Xwedê ji te razî be” û “riya te vekiri be” tên bikaranîn. Ev mijara cudahiya taybetmendiya zimên di xwezaya xwe de mijareke pir berfireh e û senifandina li gor herêman pêwîstiyêke pir mezin e. Hem li zanîngehan û hem jî hinek aktîvîstên zimanê kurmançî hewl didin ku zimanê li deverên cuda tê bikaranîn, bê analîzkirin û nexşeya ziman, zarava û devokan bê derxistin û çapkirin. Xebata Muhammed Hussên⁵ û xebatên tezên ku ji aliyê zanîngehan tên amadekirin pêngavên berbiçav, giring û giranbûna ne.

Tezên li ser kovara *Hawarê* hatine nivîsîn wiha ne;

⁵<https://zimannas.wordpress.com/>

Ronayî Önen li Zanîngeha Îstanbul Bilgiyê teza xwe bi navê “*Di Avakirina Vegotina Neteweya Kurd De Rola Ziman: Lêkolînek li Ser Kovara Kurdî Hawarê (1932-1943)*” nivîsiye. Mijara tezê ziman û netewesazî ye. Ev tez di sala 2012an de hatiye nivîsîn. Şêwirmendiya vê tezê Prof. Dr. Bülent Bilmez kiriye.

Tezeke din a mastirê bi navê “*Kovara Hawarê û Bandora wê ya li Ser Zimanê Kurdî*” ji aliyê Süleyman Çetin ve li Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê hatiye amadekirin. Tez di sala 2016an de hatiye nivîsîn. Di tezê de bandora rêziman, alfabe û ferhengê li ser zimên hatiye nixandîn. Şêwirmendê vê tezê Prof. Dr. Mehmet Zeydin Yıldız e.

Li zanîngeha Van Yüzüncü Yılê tezeke din li ser *Hawarê* ji aliyê Dilaver Döğër bi navê “*Bêjara Neteweparêz di Kovara Hawarê de*” hatiye nivîsîn. Mijara tezê vegotina neteweparêzî ye. Tez di sala 2017an de wekî teza mastirê hatiye nivîsîn. Doç. Dr. Nesim Sönmez şêwirmendiya vê tezê kiriye.

Li zanîngeha Bingölê Sewim Hatun Sürücü tezeke mastirê bi navê “*Lêkolînek li ser Çîrokên Osman Sebrî yên di Hawar û Ronahiyê de*” di sala 2019an de amade kiriye. Mijara tezê çîrokên Osman Sebrî ne. Doç. Dr. M. Zahir Ertekin şêwirmendê tezê ye.

Emin Bozan li Zanîngeha Mardin Artukluyê di sala 2019an de bi navê “*Çîroka Kurmancî ya Modern di Kovara Hawarê de*” hatiye amadekirin. Mijara tezê di konteksa modern de çîroka kurmancî ye. Tez ji aliyê Emin Bozan ve hatiye nivîsîn. Şêwirmendê vê tezê Doç. Dr. Mustafa Öztürk e.

Tezeke mastirê ku li Zanîngeha Dicleyê hatiye nivîsîn ev e; “*Nivîskarên Kovara Hawarê û Cihê Wan di Edebîyata Kurdî da*. Ev tez ji aliyê Oktay Altun ve hatiye nivîsîn. Ev tez di sala 2020an de hatiye nivîsîn û parastin. Şêwirmendê tezê Prof. Dr. Hasan Tanrıverdi ye.

ARMANCA XEBATÊ

Armanca vê xebatê, di serî de, tespîtkirina rêzik û qaîdeyên guherîna zimanê kurmançî ye. Ev rêzik, qaîde û qanûnên zimên in. Gelo rêzik û qaîdeyên heyî wê çawa bibin qanûnên zimên? Ji bo bibe qanûn divê ji aliyê herkesî ve bê pejirandin û bikaranîn. Loma tespîtkirina taybetmendiya zimanê kurmançî di kovara *Hawarê* de armanca me ya mezin e ku bi awayekî îspatkirî cudahiya zimên ya bi daneyên wê demê bê nîşandayîn. *Hawar* di navbera 1932 – 1943yan de wekî 57 hejmar di nav şertên zor û zehmet de derketiye. Îsal sala 89an e ku di ser destpêkirina kovarê re derbas bûye. *Hawar* kovareke çandî û wêjeyî ye. Celadet Ali Bedirxan (h. 1: 1) wiha dibêje

Hawarê siyaset ji civakên welatî re hiştiye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zanîn, hiner û sinhetê de de bixebitin

Armanca bingeşê tespîtkirina taybetmendiya zimannasiyê di qadên fonolojî û morfolojîyê de ye. Di zimannasiyê de, guherîn di çar beşên bingeşê wekî fonetîk, watenasî, hevoksazî û morfolojîyê de pêk tên. Ji bona ku guherîn bi awayekî şênber bê dayîn, bikaranîna daneyên nivîskî wekî delîlên berbiçav wê di vê lêkolînê de gelek tiştan derxe. Xebata şopandina guherîna zimên xebateke hûrgilî ye. Tespîtkirina cudahiyan di kurdî de ne wekî hinek zimanên din hêsan e. Mirov dikare bi rehetî di îngilîzî de here pêşiya 1000 salî û zimanê niha û yê berê bide ber hev lê di kurmançî de, ji ber kêmbûna xebatên nivîskî ev tiştekî zehmet e. Nebûna perwerdeyê jî rê li ber girtiye ku standarta nivîskî zû bi cîh bibe. Lê belê, digel vê jî, ji ber ku nivîskar bi awayekî otodîdakt ji hev du fêr bûne, di kurmançiyê de, pêvajoyeke balkêş ya standartiyê peyda dibe. Loma berhevdayîna tiştên biçûk dişibe karekî hûrgilî da ku bi komkirina tiştên hûr wêneya tevahî derdikeve holê. Ev tiştên biçûk gelek giring in. Divê mirov bizanibe ku ev tiştên biçûk çawa rast bûn nirxandin ku tevna guherînê ya ku bê çêkirin rast be. Herwiha tespîtkirina guherîna deng, wate, sentaks û morfolojîyê karekî tevlihev e û dema guherînê hertim ne zelal e ji ber ku guherîn li her derê (deverî) ne wekî hev in, carinan guherîna li deverê qediya, li deverê din qet pêk ne hatiye. Loma cudahi dibe taybetmendiya herî balkêş.

Tiştêkî pêwîst ê ku divê ev xebat bibe sebeb jî lêhûrbûna kronolojiya cudahiya zimanê kurdî û zaravayên wê di kovara *Hawarê* de ye. Ji ber ku zimannasiya dîrokî, enstîtûyên zimanên zindî, fakûlteyên edebiyatê yên xwedî beşên ziman û edebiyata kurdî, weqf û saziyên zimên projeyên kronolojiya zimên derdixin. Di ser re, rê û terciha zimên xwediyê giringiyeke gelek mezin e, yanî ka neteweya kurd çawa ziman û hêmanên heyî hîlbijartîye.

METODOLOJÎ

Di vê xebatê de wekî çavkanî ew çapa kovara *Hawarê* ya ku ji aliyê Weşanxaneyê Belkiyê ve hatiye çapkirin hate hîlbijartin û bikaranîn. Weşanxaneyê kovar wekî çapa duduyan di sala 2012'an de çap kiriye. Hemû hejmarên kovarê tê de cî girtine û latînzekirina nivîsên aramî hatine kirin. Di weşana J&J'yê de, beşên alfabeya aramî wekî halê orjînal e, nivîsên alfabeya aramî nehatiye latînzekirin. Xebata me ji lêkolîn, berhevdayîn û analîza agahiyên ku di kovarê de hatine berhevkirin pêk hatiye. Ew dane wekî agahiyên çawanî (qualitative) ne.

Ji bo metodolojiya taybetmendiya zimannasiya guherîna zimên bi gelemperî sê metod hene:

1. Metoda berawirdkirî (Comparative Method)
2. Analojî (Analogy)
3. Binyadkirina Navxeyî (Internal Reconstruction)

Me kovara *Hawarê* (57 hejmar) analîz kir û xebatên zimên yên ku tê de ne bi awayekî şeyasandinê (descriptive) îfade kir. Ji xwe xebat û lêkolînên şayesandinê (descriptive researches) hewl didin ku pirsgerêkeke lêkolînê bi awayekî baş bişayesînin. Xebatên şayesî cûreyên lêkolînê ne ku dikarin tiştêkî wekî rewş, bûyer, nifûs an jî têgehekê li gorî xebatê binirxînin. Ev cûre xebat bêtir bala xwe dide ser pirsên wekî çi, çawa, kengî û li kû derê? Ew li ser sedeman nasekine. Ji ber ku em ê bikaranîn û guherînên di navbera 1932 – 1943yan bi awayekî şayesandinê (diskirîptîf) analîz bikin, wê hûrbûn û analîza me bêtir li ser bikaranîna wê demê be ka ew çi bûne û li gorî dema niha taybetmendî çi ne. Helbet rêjeya cudahiyan dikare di her demê de biguhere.

Rêbazeke vê lêkolîne statûya deskirîptîf e ku armanca wê jî tespîtkirina bersivên pirsan e ku di xebatê de hatine pirsîn û bi vî awayî armanca berhevdayîna daneyan e. Daneyên ku tên analîzkirin dikarin agahiyen gelemperî derxin holê. Dûvre mirov bikaranîna analîza deskirîptîfê⁶ rêya lêkolîneke kûrtir vedike. Mirov dikare bi analîzên xwe êdî daneyên xwe bike parçeyên cuda û li ser bisekine. Mirov dikare helbet bi rêzimana şayesandî (prescriptive grammar) jî bixebite wekî ku xuya ye *prescriptive* li ser tiştên heyî naxebite, lê li ser tiştên divê hebin disekine. Aitchison (2001: 14) dibêje ku “gramerek wekî ya Lowthî, ku rêzikên çêkirî di nav de radiwestîne ji bo ferzkirina hin standartên keyfî li ser “rastbûnê”, rêzimanê deskirîptîf e, ji ber ku ew rêzikan li ser mirovan pêşniyar dike”. Dema mirov rêzimana *preskrîptîfê* binêre û bixwaze bikaranîna rêgezên li ser însanan ferz bike, mirov rastî du tiştan tê; yek, mirov li hemberî guherîna zimên derdikeve, ku ev mirov çî hîs bike jî mudaxeleya zimên e; ya duduyan jî însan dema zimanê xwe ji bo xwe îfade bikin, wê bi kar tînin, tercîhên xwe bi xwe dikin û çawa xwe rehet hîs bikin bi vî awayî xwe îfade dikin.

Aitchison (1999: 14) bi gelemperî nêrîna xwe ya rêzimana preskrîptîf û deskirîptîfê wiha dinirxîne:

Rêziman û rêgezên zimannasan ne preskrîptîf in lê diskriptîf in, ji ber ku ew, wan tiştan dinirxînin yê ku mirov bi rastî dibêjin. Ji bo zimannasan, rêgez ne rêzikên keyfî ne ku ji hêla rayedarekî derveyî ve têne ferzkirin, lê ew kodkirina prensîbên binhişî yan jî peymanên ku ji hêla axêverên zimanek ve têne şopandin tên qebûlkirin. Zimannas formên axaftin û nivîskî wekî pergalên veqetandî, têkildar, û axaftinê yê zimên jî giring û bingeîn dibînin û wan dinirxînin.

Ji ber ku em ê korpûsa *Hawarê* ya dema hatiyê nivîsandin bixebitin û li ser lêkolînên wê demê bisekinin, bikaranîna metoda şayesandinê (descriptive method) ji bona teswîrkirina wê demê xwediyê giringiyeke mezin e da ku cudahiyan û taybetmendiyên zimên nîşanî me bide. Herwiha mirov dikare rêzikên ku wê deme

6

<https://www.formpl.us/blog/descriptive-research#:~:text=Descriptive%2Dsurvey%20research%20uses%20surveys,of%20employed%20professionals%20in%20Maryland.>

hebûne û niha wenda bûne yan jî hatine guherîn bibîne û wan li gorî metoda presiprîktîfê bibîne û binirxîne, lê rewşa guherînê tiştekî xwezayî ye loma ev guherîn jî divê bêne qeydkirin. Modela çavgerandinê “**scan pattern**” jî bi kar hatiye ji ber ku armanca wê şayesandina wan agahiyan e ku berê hebûne û hêj jî berdewamiya xwe didomînin. Tiştên ku tên nirxandin li gorî rewş û şertên dema xwe tene nirxandin. Lêkolîner nakevin nav ti hewldanan ku agahiyan biguherînin (Karasar, 2012).

Em ê her du beşên zimannasiyê (fonetik û morfolojî) binirxînin. Di her hejmara *Hawarê* de guherînên hatine dîtin li gorî hejmaran ji aliyê lêkolîner ve hatine qeydkirin, lê ew agahiyên guherînê wê di binbeşên fonolojî û morfolojîyê de bîr analîzkirin û senifandin. Cûreyên guherîna peyvên hevware yan cûreyên din jî hatine dayîn da ku haydarbûneke mezin li ser guherîna lêkolîne pêk bê. Herwiha ev jî nîşan dide ka candarbûna zimên çawa xwe di zimên de bi çî taybetmendiyên xwe derdixe. Mirov bi xwe dibe şahîdê bandora rewş û bûyerên dîrok, çand û şaristaniyê. Wekî mînak, dema mirov peyvên nû yên dema şerê Cîhanê ya Duduyan dibîne şaşmayîneke mezin li ser xwendevanan rû dide.

Binyadkirina Berawirdkirî

Dema ku tu axêverên zimanekî nemînin, yan jî ti pexşan nemîne wê demê zimannas ji bo ku bigihîjin zimanên wendabûyî dîsa bi berhevkirina zimanên bingeh (wekî zimanê dê û dapîr) dikin. Bi saya berhevdarîyên tiştên wekî hev û yên ji hev cihê mirov dikare gelek tiştan derxe hole. Di zimannasiyê de, ji bo bîdestxistina van tiştan, zimannas bi gelemperî li hejmar, endamên laşî (parçeyên laşên mirovan) dinêrin da ku têkiliya wan bîdestxin.


Wardhaugh (2006: 229) li ser giringiya peyvên mirovantîyê (xizimtiyê) - nêrînên xwe wiha pêşkêş dike.

Awayekî balkêş ku mirov di jiyana rojane de ziman bi kar tîne ev e ku mirov behsa xizmên xwe cûr bi cûr bike. Ji ber vê yekê ne ecêb e ku lîteratureke berbiçav li ser termînolojiya xizimtiyê hebe, ku diyar dike ku mirov li deverên cihêreng ên cîhanê çawa bi xwîn (an jî bi eslê xwe) û zewacê behsa xizmên xwe dikin. Sîstemên xizimtiyê taybetmendiyeke gerdûnî ya zimanan e, ji ber ku

xizimbûn di rêxistina civakî de pir giring e. Hin pergal ji yên din pir dewlemendtir in, lê hemû faktorên wekî zayend, temen, nifş, xwîn û zewac di rêxistina wan de bi kar tînin.

Rêzimana zimanekî di her nifşê de ji nûve û dîsa bi guherînên biçûk derdikeve û diafire.

Zimanê Mezinan ê ji Hundir → Zimanê Mezinan ê ji Derve



Zimanê zarokan ê ji hundir → Zimanê zarokan ê ji derve

Şikil 2. Derketina Zimanekî di nav Nifşan de

Wekî di grafîkê de jî xuya ye, zarok zimanê ku hîn dibin û diaxivin ji mezinên xwe (zimanê ji derve/external) werdigirin. Ev zimanê ku ji derve tê girtin dibe zimanê hundir (navxweyî/internal). Zarok zimanê ku ji devre digirin li gorî fahmkirin û kapasîteya xwe digirin û bi kar tînin, wisa jî pêvajoya wergirtinê pêk tê.

Nêrîna ku zarok bi domdarî li zimanê xwe bandorê dikin di dawiya sedsala borî de berbelav bû (Aitchison, 2001: 201). Sedema vê nêrînê jî guherîna dengên bû, ji ber ku bawerî ew bû ku transfera zimên bi dengên pêk dihat û ev jî dibû sedema guherîna axaftina zarokan (Paul, 1880; Whitney, 1883; Passy, 1891).

Heke ziman ji hêla zarokên her nifşî ve bêkêmasî bê fêrkirin û fêrbûn, wê gavê ziman neguherin. Guherînên di zimanên de bi tenê xeletiyên sivik in, ku di nava nifşan de karektera zimên bi tevahî diguherîne. Li ser vê mijarê Henry Sweet wiha dibêje: Xortanî wekî demeke wisa xuya dike ku tê de gelek guherînên zimên derdikevin holê (1899: 204). Loma xort û ciwan zimên çawa bi kar tînin hinek tiştan girêdayî zîm^ön derdixe.

Bi tevahî, bandora zarokên biçûk li ser guherîna zimên gelek kêr e û ev jî ne tişteki ecêb e. Zarok komên civakî yên bibandor çênakin. Guherîn di nav komên civakî de dest pê dike dema ku mirov bê hişmendî û bi nezanî teqlîda endamên koma dora xwe

dikin. Cudahiya teşeyên axaftina dêûbav û zarokan hingê dest pê dike dema ku her du nifş komikên civakî yên cihêreng nas dikin.

Gelo dema zimanê civakê yê axaftinê ku biguhere çi pêk tê? Dema wergirtina zimên de, divê guherînek pêk bê ji ber ku ev di mêjiyê şexsan (takekesan) de pêk tê, guherîn dikare demildest pêk bê yan jî neyê. Heger ev guherîn bi wî kesî re bimîne dikare wenda bibe yan jî bêwate be. Lê divê ew guherîn di nav civakê de belav bibe. Ev belavbûyîn jî girêdayî ragihandina kesane. Ragihandin dibe sedema hevragihandinê. Forma nû ya ku hatiye guherîn ji aliyê kesane û di nav nifşên nû de divê bê bikaranîn. Hinek tişt her daîm diguherin hinek tişt jî wenda dibin.

Herwiha ev guheztin (iletim/transmission) carinan ne têkûz e, du sedemên giring ev in: Şaşiyan gelemperî û analîza dubare.

Şaşiyan Wergirtina Zimên

Zarok dema zimanekî hîn dibin dixwazîn zimanê bav û kalên xwe biaxivin, an jî ew dixwazin zimanê ku di civakê de bêtir tê bikaranîn bixebitînin. Herwisa ew hewl didin ku têkevin nav ragihandinê û gelek tiştên nû û amrazên li gorî zanebûna xwe bi kar bînin da ku bikaribin têkevin nav ragihandinê û zimanê xwe yê hundirîn û zimanê mezinên xwe yê derveyî bikin hevyeke. Ji ber ku dema ev pêvajoyên pêk tê bi çî awayî pêk bê jî, dê û bav û zarok ji hev fahm dikin û ragihandin didome. Lê herwiha carinan peyv an jî hevokên şaş dimînin û di navbera kesane de dawiyê jî di nav civakê de cihê xwe digirin.

Hinek mînakên gelemperî

1. Şaşbikaranîna kirde û lêkerê
2. Bilêvkirina şaş
3. Şaşbikaranîna peyvane di nav konteksê de
4. Şaşiyan daçekan (Ez li male tîm - ji -).
5. Qertafên şaş tîm bikaranîn
6. Şaşiyan zayendê

7. Tevlihevkirina dem û hokerên demê. *Ez tēm do, Ez do tēm.*
8. Şaşıyên rêzimanê
Ez-xwar-im. Min xwar
9. Şaşıyên qertafên yekjimarî û pirjimarî - Çend pisîk/an hêk/an xwar/in.

Sedema duduyan jî analîza dubare (reanalysis) ye. Zarok hinek qaliban tevlihev dikin û şaş bi kar tînin, ev jî di nav demê de bi şaşî cihê xwe digirin. Kesên xwedî zarok van tiştan dibihîsîn û ji van tiştan aciz nabin û vê guherînê wekî tiştêkî normal digirin. Heger ev tişt ji aliyê endamên malbatê bê bikaranîn û pesendkirin di nav demê de dikare belav bibe. Hinek zarok dema marûzî bikaranîna rast dimînin bêhemdê xwe dibin xwediyê derfeta rastkirina şaşıyên xwe. Lê ev her car ne pêkan e, car caran ew qet rastiya şaşıyên xwe nabihîsin.

Analojî sedemeke din e. Wateya analojîyê ev e: birêkûpêkkirina komê formên nerêkûpêk e (Hickey, 2006: 3). Zarok hinek rêzik û qaîdeyan bi gelemperî bi kar tînin. Ew rêzikeke ku bêhemdî derbasî formên din jî dibe. Bi awayekî xwezayî şaşî cihê xwe di zimên de digirin û ev guherîna ku di destpêkê de ji aliyê kesekî ve bê dîtin jî û midaxele hatibe kirin jî mirov di dawîya dawî de nizane ka ew guherîn di zimên de dê çî bigire yan jî negire.

Ez Şevîn **im** → Tu Şevîn **im** → Ew Şevîn **im**

Ev pace **yim** → Ev pace **ye**

Kontakta zimanan ragihandina kesane û helbet ew di bin bandora hişmendiya kesane dimîne. Zanebûna ku ji aliyê gelek tiştan ve hatiye çêkirin di dema axaftinê yan jî ragihandinê de dibe sedema xwe-îfadekirina şexsî û guherîneke nû. Mirov dikare vê ragihandinê wekî duzimaniya ne têkûz bi nav bike. Di vê demê de, zarok dîsa ji mezinên xwe zimanekî derveyî digirin û zimanê xwe yê hundirîn û nû diafirînin. Herwiha ev jî di civakê de bi heman şiklê pêk nayê. Mirov dikare du gundê ji hev cuda weke nimûne bide. Axafîn û peyvên du gundên nêzî hev jî dikarin ji hev cuda bin. Bajarê Mêrdînê dikare ji bo cudahiya devokan bibe mînakê pirreng, ji ber ku devokên Nisêbinê,

Midyadê, Dêrikê, Qoserê û Stewrê cuda ne. Carinan însan henekê xwe bi peyvên devokên din dikin, heta gelek zêde henekê xwe dikin ku êdî bêhişmendî ew pêyv di nav civatê de ciyê xwe digirin.

Bandora zimanan li ser zimanên din gelek hene. Ji ber ku ev bandor di gelek salan de cihê xwe digire, ew bi hêsanî naye dîtin. Ev bandor dikare peyvî, biwêjî, fonetîkî yan jî bi awayekî din be. Mirov dikare bandora erebî, tirkî, farsî li ser kurmancî ji ber temasa wan bi rehetî bibîne.

Gelek guherîn hertim hene.

-miş-miş → Navê min sîlmîşke, kapî açmîşke

Cudahiya axaftin û nivîsê jî divê bê nirxandin. Makîne û cîhazên qeydkirina dengên ev derdora sed sal in têne bikaranîn, piraniya danayên (data) heyî nivîskî wekî pexşanî yan jî helbestkî ne. Ji bo kurmancî, piraniya materyalan helbestên dîwanan in, nivîskarên navdar wekî Melayê Cizîrî, Melayê Bateyî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran. Ev jî derfeta xebat û çavdêriya analîzkirina zimên dide me. Ev analîz wekî tê dîtin bi saya xebatên nivîskî ne, lê zimanê devkî giringtir e, heger tu derfetên din tune be, divê em bi taybetî zimanê nivîskî analîz bikin.

Mirov dema li zimanên din dinêre bi rehetî dibîne ku destnivîs, çavkanî, xet yan jî nivîsên berê li ber destê wan hene bi rehetî dikarin hemû formên guherîna zimanê xwe bibînin û zimanê xwe şîrove bikin.

Bo nimûne dîroka pêşveçûn û guherîna îngilîzî (Baugh, A., C., & Cable T., 2002: 146) mînakeke

berbiçav e.

- | | |
|----------------------------------|------------------|
| 1. Îngilîziya kevn | (450-1100) |
| 2. Îngilîziya navber | (1100-1450) |
| 3. Îngilîziya modern ya destpêkê | (1450-1700) |
| 4. Îngilîziya modern | (1700-heya niha) |

Wekî tê dîtin, guherîna îngilîzî li gorî heyam an jî serdeman hatiye kirin. Di navbera her serdemî de 650, 350, 250 û 319 sal hene. Salên guherîna salan her diçe kêmtir dibe û ziman ji hev cuda dibe. Hevoksazî diguhere, bilêvkirina peyvên ber bi sivikbûyîne ve diçe, peyv kurttir dibin û wateyên nû digirin. Mixabin ji bo kurdî û zaravayên wê, niha xebateke berfireh û akademîk ku van taybetmendiyan derxe, guherînan bisenifîne û ji hev veqetîne hêj tune ye.

Çavkaniyên zimannasiyê yên dîrokî yên kurdî tenê digihijîn çend sed sal berê niha, ji ber vê yekê ne rehet e ku mirov guherînên rêzimanî yên bingehîn ên zimanên Îranî yên Rojavayî bi kurdî bişopîne (Jugel, 2014: 1). Hinek sedemên giring ji bo vê rewşê rasterast girêdayî wendabûna destxetan, pirsgirêkên girêdayî çapxaneyê û derengmayîna xebatên nivîskî ne. Wekî tê zanîn li gelek welatên Rojava, xebatên bi şiklî tene parastin. Loma ew dikarin guherîna zimanên Rojavayî bi rehetî bişopînin. Mînaka herî giring û mezin ew e ku guherîna Încîlê ye. Ji bona şopandina derxistina taybetmendî guherîna kurdî jî, ji ber kêmasiyên xebatên nivîskî yên çapkirî, em bi texmînî wextên guherîna zimanan di her cûreyan de li gorî berhemên nivîskî tespît dikin.

Mînaka herî balkêş ji bo guherîna herfan ji dema zimanê Sanskrîtî heya îro herfa “p”yê ye. Di Sanskrîtî de “pater” di îngilîzî de bû ye “father”, di almanî de bu ye “Vater” û mirov dikare di zimanê farsî, tirkî û kurdî de peyva “peder”ê bibîne. Guherîna herf an jî denga wekî mînaka ‘p’ û ‘f’ yê, di dema dirêj de pêk tê û ev guherîn li hin cihan hêj neqediya (Akmajian and et al, 1995: 307).

Herfên kurmancî yên ku wenda bûne yan jî hatine avêtin jî hem di demên berê de hem jî di demên nêz de pêk hatine û hêj jî didomin.

Mînak 1

Hinek mînakên ku hatine guhartin:

Yekşembî → Yekşemb → yekşem

Yekşembî → Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda (Garzoni) 1787

Yekşemb → Hawar (Celadet Elî Bedîrxan) 1932

Yekşem → Peyva roja me de tê bikaranîn

Mînak 2

Sard → sar

Di vê mînakê de herfa “d”yê ketiyê. Guherîn bi ketina dengekî pêk hatiye û gelek peyvên ku bi herfa “d”yê qediyane herfa ‘d’yê wenda kirine û guherîna xwe bi vî şiklî pêk anîne.

Mînak 3

Bab → bav

Li hin herêmên kurdîaxêv, guherîna herfa “b”yê bûye “v” û guherîna “b”yê guherîna xwe qedandiye. Peyv hem bi devkî hem jî bi nivîskî jî kurttir bûne. Wisa jî hinek “dem” û qalibên rêzimanê ji holê rabûne.

Bi gelemperî wekî di her zimanî de tê dîtin, cudahiya zimên di her zimanî de xwe bi taybetmendiyên xwe nîşan dide. Wekî pêşniyaz divê xebatên zimên yên senkronîk li gorî tema û mijarên demkî pêk bên da ku cudahiya zimên a hemdem jî bê şopandin û dîtin.

BEŞA YEKEM

SEDEMÊN CUDAHÎ Û TAYBETMENDIYÊN ZIMÊN

Însan hertim di nav hewldana fahmkirina tiştên dora xwe de ne; tiştên xwezayî, çandî, sistematîk û ji xweber bandorê li ser jiyana mirov û zimên dikin. Ev daxwaza fahmkirina dinyayê di serî de fahmkirina jiyanê bi xwe ye. Loma kesên li ser zimanan dixebitin jî her daîm bi van tiştan re mijûl in. Herwiha mamoste, nivîskar û zimannas jî di nav karê zimên de cihekî giring digirin. Bi awayekî ecêb, em dikarin bibêjin zimannas niha sedemên rast ên ku bandorê li ser zimên dikin, kêm fahm dikin (Akmajian and et al, 1995: 316). Li ser rûyê dinyayê hemû ziman diguherin û ev jî tişteke ku mirov nikare xwe jê dûr bixe. Ev guherîn ne yekalî ye. Dîroka zimên guherînê bi vî şeklî nîşan dide: peyvsazî, dengsazî, morfolojî û sentaks (PBS, 2005). Tespîtkirin û şopandina taybetmendiyên zimên, ji ber ku dema guherînê ne dîyar e di nav jîyana rojane de ne rehet e. Guherîn carinan bi bandora medyayê pir zû pêk tê carinan jî di navbera 30 – 80 salan de pêk tê. Ev guherîn dibe ku di asta şexsî de jî bimîne û guherîn neyê ferqkirin. Lê tiştekî aşkere li ber çavan ew e ku ziman herdem diguherin. Herwiha hinek ziman dimirin û hinek jî geştir û mezintir dibin.

Li gorî Aitchison (2004: 135-150) ji bo cudahiya zimên çar sedemên giştî hene

1. Moda û tevgerên ketober
2. Hêmanên biyanî
3. Pêwistiyên sosyal
4. Kubarî

Mirovên ku di asta cuda ya statûya civakî de cih digirin, îfadeyên rewşa civakî, peyv û hevokan ji hev cuda fahm dikin. (Finegan & Rickford, 2004: 62). Loma kes nikare xwe li ber fahmkirin û îfadekirina însanan bigire, wekî ava diherike, riya xwe dibîne ziman jî ji xwe re adaptasyonên nû çêdike. Ew ji ber candarbûnê dibe sedema cudahiyên xwezayî. Rêjeya cudahiyê dikare ji devereke ber bi devereke din ve biguhere

û şiklê guherînê li hîn cihan hêdî be û li hin deveran jî zû be di ser re sedemên guherînê jî ne wekî hev bin. Tu kes hemû sedemên guherîna zimên nizane (Fromkin et al, 2002: 536). Lê guherîn wekî çavkanî dikare ji devereke ber bi devereke din ve bi sedem û baş têkeve nav guherînê (Jones & Singh, 2005). Guherîn bê navber pêk tê û wê her û her pêk bê. Loma lezbûn û devera ku guherîn pêk tê loma ev dikare bibe sedema girtina taybetmendiyên nû û cudahiya wan. Gelek sedem carinan yên wekî hev carinan jî yên cuda li deveran bi awayekî resen dikarin derkevin pêşberî mirovan. Li ser vê mijarê R. L. Trask (2009: 1) fikirên xwe wiha pêşkêş dike.

Ji ber ku zimanê me hertim diguhere, her nifş jî hev hinekî cuda diaxivin. Û ne tenê zimanê me: hemû ziman her daîm diguherin. Tu ziman tune ye ku neguhere. Ev rastiyeke ku hûn dikarin jê bawer bin.

Zimannas ji bo guherînê sê faktorên giring û gelemperî nîşan didin (Dubois, 1994; 507). Ev sê faktor ev in: coxrafi, dem û sedemên sosyal. Lê herwiha gelek sedemên din jî hene. Ji ber ku bandora her sêyan li ser yên din in, ev bi awayekî xwezayî rêyek û nêrîneke nû didin me gişan.

Zimanê ku îro tê axaftin û yê berî sed salî dihate axaftin jî hev cuda ne. Bandora demê ji ber gelek tiştan wekî asta xwendinê, amûrên ragihandine wekî TV, radyo, înternet, rojname û hwd. bikaranîna teknolojiyê, îcadên demê, politîkayên demkî bandorê li demê dikin û hêmanên zimên diguherînin her wekî ku bandorê li dinyayê dikin.

Tiştê balkêş ku mirov bifikire ev e: heke ziman ji ber hinek tiştan neguhere, gelo wê çawa be? Bo mînakî herçiqas zazakî (kirmanckî) bi zimanên cîran re têkiliyekê çêbike jî, mirov dikare bibêje ku ji serdema îraniya navîn û vir ve di warê rêziman û peyvên mîratê de binyada xwe pir baş parastîye (Keskin, 2015: 105). Loma mirov dikare bibêje kirmanckî jî ber ku li ciyê xwe sînordar e, axêverên wê bi zimanên din xeber nadin û ji ber xweparastina herêmî naguhere. Helbet ti xebat li ser vê mijarê - li gorî lîteratura heyî kêma in. Lê dema mirov bi metoda Saussure (1915; 78) li mijarê binêre, mirov dikare îddîa bike ku dem û zimên naguherîne. Ew wiha dibêje: “Heger me ziman

di wextê xwe de bêyî civata axêveran bihesibanda, bo mînak bi çend sedsalan kesekî îzolekirî bifikirin - dibe ku em guherînek nebîn; dem dê bandorê li zimên neke”.

Dema zimannas di demê de guherînê difikirin helbet divê faktorên din jî binirxînin. Loma Saussure metafora “kişikê” (setreng) dişibîne zimên. Her hereket û hemleyên zimên, wekî hereket û mudaxeleyên zimên in. Her gaveke nû bi xwe re tiştên heyî diguherîne. Êdî rêz diguhere, her tişt bi awayekî serbixwe cudahiyê çêdikin, lê dema mirov bi tevahî lê dinêre herçiqas guherîn bi şiklê jî be form û sîstema zimên xwe diparêze. Lê di heman demê de jî guherînen biçûk jî pêk tên. Dema mirov van guherînen kişik û zimên dide ber hev, gelek tiştên wekî hev derdikevin ku mirov bikare guherînê binirxîne.

Şîroveya Saussure (88) wiha ye:

- (a) Di her lîstikê de tenê yek pişkek kişikê tê guherîn; bi heman awayî di zimên de, guherîn tenê li hêmanên hîlbijartî bandor dikan.
- (b) Tevî wê yekê, tevger li seranserê xwe li ser sîstemê xwedî bandorek e; ne mimkûn e ku lîstikvan texmîna bandora tewra berfireh bike. Guherînen nirxî yên encamdar dê, li gorî şert û mercên neyînî, pir cidî, an jî giringiya navîn bin. Tevgereke diyarkirî dikare tevahiya lîstikê wekî şoreşeke mezin biguherîne û dikare parçeyên ku yekser têkildar nebin jî têxe bin bandora xwe. Me tenê dît heman tişt ji bo zimên jî pêkan e.
- (c) Di kişikê de, her tevger bi tevahî ji hevsengiya berê û ji ya paşê xwe cîyawaz e. Guherîna ku pêk hatiye ne aîdî her du rewşên berê û paşê ne: tenê rewş giring in.

Yek ji tiştên balkêş ku tê dîtin ew e; bi rastî guherîn di carekê de di her cûreyên zimên de dernakevin, ew parçe parçe derdikevin holê. Her guherîn di nav demê de rê dide guherîneke din. Herwiha guherîna demekî (ya di wê demê de pêk tê) dibe ku gelek balê nekişîne lê piştî demekî din mirov dikare wê guherînê binirxîne û bandora wê bibîne. Dema mirov ji deverê diçe yekî din ev guherîn dîsa bi rehetî tê dîtin. Ev guherîn rê didin encam û rewşên nû ku berê nehatibûn fikirîn. Di vê metaforê de hem di kişikê hem jî di zimên de tiştê nediyar ev e ku mirov nizane gelo dê encama dawî çî be û çawa be? Gelo ew tevgera ku dest pê kiriyê dê biçe serî yan na? Ji ber ku em baş dizanin ku li hin herêman guherîna herf û peyvên qediyane û li hin cihan jî neqediyane.

Bo nîmûne, li du herêmên kurmancîaxêv (Serhed û Deşt), em dibinin ku du formên cuda têne bikaranîn, yek ji wan guherîye, lê ya din wek xwe maye, an jî di pêvajoya guherînê de ye;

Serhed → babê min

Deşt → bavê min

Lîsteyeke mezin a faktorên civakî hene ku di derbarê pêwendî û belavbûna guherînên zimanî de hatine vekolîn: çîna civakî, emir (temen), zayend, etnîsîte, dahat, perwerde, bawerî, meyla zayendî û hwd. (Dubois, 1994; 171). Faktora civakî ku tê wateya bandora çandên biyanî yên ji latînî, frensî, amerîkî, avusturalya, hindî û yên din, rêya yekta ku takekes diaxivin cudahiya zimên jî zêdetir dike. Ferheng û bêjeyên ku mirov bi kar tîne bi cih, temen, zayend, asta xwendinê, rewşa civakî ve girêdayî ye (Mantiri, 2010:2). Faktorên civakî dikarin têkevin bin bandora çavkaniyên biyanî yan jî yên çanda ku tê de ne.

Bandorên gelemperî bo cudahî û resenbûna zimên wiha ne:

- Çîna civakî
- Emir (temen)
- Zayend
- Çand
- Dîn
- Siyaset
- Ekonomî
- Erdnasî
- Zarok
- Hevragiandina zaravayan
- Teknolojî

Wekî baş tê zanîn, gelek sedemên giring û cûr bi cûr ji bona resenbûna zimên hene, yê gelemperî jî tevgerên siyasî, pêşveçûnên teknolojîk, faktorên civakî, çandî û exlaqî ne.

Mantiri (2010: 2) sedemên cudahiya zimanan wiha nîşan dide:

- Faktorên Siyasî (polîtîk)
- Faktorên Civakî
- Faktorên Çandî
- Faktorên Teknolojîk
- Faktorên Exlaqî

Faktorên gelemperî yê ku di vê xebatê de wê bên nirxandin wekî jêr in;

1.1. Faktorên Polîtîk

Gelek caran faktora herî balkêş û bibandor faktora siyasî ye. Mirov mecbûr dimînin koçî cihekî din bikin an jî ji ber welatekî din têdikevin rewşa dagirkerîyê ku welatê bihêz bandorê li ser wî welatî, niştecih û hemû qadên jiyana wan dikan. Dema mirov diçin welatekî din, dest bi hînbûna zimanekî nû dikan û zimanê ku berê bi kar dianîn êdî ji bo ragihandinê kêmtir tê bikaranîn. Bi taybetî dema zarok derbasî cihekî nû dibin, zimanê xwe kêmtir bi kar tînin û dawîyê ev çewtîyên ku nû derdikevin derbasî zimanê zarokan dibin, di nav civata wan de tê bikaranîn û talîya talî zimanê wan diguhere (Aitchison, 1991; 109).

Ji bilî guherînên zimên ku ji aliyê koçberîyê, yan jî şer derketine, siyaset jî di her qada axaftina civakê de cihekî gelek giring digire. Bo mînak, di nav salên dawî de, haydarbûna meseleyên girêdayî hawirdorê cihekî giringtir digire û ev bi xwe jî bûye sedema çêkirin, lêzêdekirin an jî bikaranîna peyvên nû. Gelek tevger, sazî û komên jîngehparêz ji bo parastina dinya, xweza û jîngehê hewl didin ku lîteratura xwe ava bikin ku xwe bi rehetî pê-nase bikin.

Mînak

- hawirdor
- çavkaniyên binerd
- çavkaniyên sererd
- ekolojî
- ekolojiya çandî
- ekolojiya zimanî
- jîngeh
- herêmparêzî
- jiyanên jîndar
- pîrsgirêkên hawîrdorê
- germbûna globalî (gerdûnî)
- paqijkirina germiyan
- ekosistem
- flora
- fauna

Xuya ye ku zimanê siyasî jî li gorî pêşveçûn û bûyerên nû şiklê xwe digire û peyvên nû diafirîne, yan jî peyvên heyî bi wateyeke nû têdixe nav zimên. Hinek peyvên ku di zimanê kurdî de cih girtine wiha ne; peyva “*penaxwaz*” mînakeke gelek balkêş e. Îngilîzîya wê “*refugee seeker*” e û tirkîya wê “*sığınma arayan kişi*” yan jî “*sığınma talep eden kişi*” ye.

Mantiri (2010:2) dibêje faktora siyasî, ku ji ber êrişên biyanî, koçberî û kolonîbûnê dibe sedema cudahiyê. Di van salên dawî de, ji cihguhertina însanên herêmên cuda wekî ji Rojhilata Navîn bûye sedema guherîna zimên û bikaranîn û hînbûna zimên. Wekî mînak gelek fêrxwaz û xwendekarên biyanî (di heman demê de penaber in) ji gelek welatên biyanî ji ber sedemên cihê hatine niha li Tirkîyeyê, li beşên TÖMERê ku perwerdeya tirkî dide tên perwerdekirin û ziman hîn dibin.

Herwiha tevgerên siyasî û çandî, gelek xebatan pêk tînin û xebatên wan bi xwezayî zimên diguherîne. Mirov dikare di ferhengan de gelek mînakên navborî bibîne û peşkeş bike.

Bo nimûne;

- karsaz
- penaxwaz
- wezareta dadmendiye
- wezareta karên derve
- penaber
- serbajar

1.2. Faktorên Teknolojiyê

Ev teknolojiya ku herdem diguhere û zû diguhere carinan ji bo bikaranîna zimên zehmetîyan derdixe û carinan jî însanên di navbera nişên nû de nikarin bi hev re têkevin nav ragihandeneke nû û bi rehetî ji hev fahm bikin. Sedema herî balkêş ku van tiştan bi awayekî zû jî diguherîne teknolojiyên nû ne, bi taybetî jî “înternet” bi xwe ye. Di her zimanî de gelek peyvên nû ji înternetê derbasî zimanan dibin. Hevokerê ku divê bê analîzkirin dibe ku ev be:

“Do êvarî, dema min di înternetê de çet (chat) dikir, hinek kesan ez hek (hack) kirim.”

Wekî tê dîtin peyvên “înternet”, “çet” [chat] û ”hek”ê [hack] ji îngilîzî derbasî zaravaya kurmancî bûne û pir tînin bikaranîn. Yan jî peyva “Google”ê êdî di her zimanî de bi wateya “lêgerîn” an jî “lêkolîne” tê bikaranîn û di gelek ferhengan de jî ciyê xwe girtiye. Faktora teknolojîk li gorî Mantiri (2010:2) bi vî şeklî tê pênasekirin; ew tê wateya pêşveçûnên bilez ên teknolojiya agahdariyê, pîşesaziyê, hilberînan û aboriyê. Li wir bi tenê peyvên nû yên ku guherîna zimanî diafirînin hewce dikin.

Kinkirina zimên jî dibe sedemeke guherîna zimên, gelek kes ji bona ragihandineke lezgîntir hewl didin ku peyv û hevokên xwe kintir binivîsînin. Ev guherîn di nivîsandina e-mail, peyam an jî di asta nivîsê de rû dide. Yoskowitz (2011) dibêje ku

gelek peyvên ku ji aliyê mîlyonan ve tên bikaranîn êdî meşrû dibin û li ferhengan tên zêdekirin wekî LOL, BFF, IMHO û OMG (that's laugh out loud, best friends forever, in my humble opinion and oh my God). Di Kurmancî de, AS (Aleykum Selam), Slm.

1.3. Faktorên Çandî

Ev tê vê wateyê ku komek ziman li pêşberî televîzyon, radyo, fîlm, muzîk, kovar û modayê li komeke din dikevin (Mantiri, 2010:2). Xebatên ku ji çandê derdikevin wekî yên çandî tên qebûlkirin û di gelek xebatên akademîk de jî “hêmanên çandî” gelek tên dîtin.

Lado (1964: 28) dibêje, bêyî fahmkirina çanda zimên, ku ziman parçeyeke wê ye, wê tu car hînbûnek rast çênebe. Ji bo fahmkirina têkiliya di navbera zimên û çandê de, bandora dorhêlî ya wan a li ser nêrîna çandî û dîrokiya civakî giring e. Ragihandina bingeşîn û belkî ya herî tevlihev bêgûman ziman e ku ev jî kombûna peyvên ku tên ba hev wateyên cuda çêdikin.

1.4. Faktorên Civakî

Wekî tê dîtin faktorên civakî (sîyasî, aborî û teknolojik) dibin sedema guherîna civakî û ev jî dibe sedema afirandina zimanêke civakî û nû. Mirov dikare bibêje û îddia bike ku civak diguhere û ev civak jî ji ber ku tiştek candar e, bandora xwe di ragihandina zimên de, di nivîs û diskûrsa lîteraturê de derdixe. Di her civakê de, hinek însan xwedîyê prestîja civakî û hêza aborî ne, hinek jî ji van kêr dimînin. Guherbarên (*Îng. variable; Tr. değişken*) wiha û gelemperî, di nav civakê de xwe di nav kar, asta perwerdeyê, dahat (*Îng. income; Tr. gelir*), xanî û sîteyên jîyanê û di tiştên hwd. de xwe nîşan dide. Mirovên bi astên cuda yên statûya civakî tiştan ji kesên din bi awayekî cudatir fahm dikin û bertekê nîşan didin û peyvsazî û frazên xwe cudatir bi kar tînin (Finegan & Rickford, 2004, 62). Li her welatî, asta dewlemendîyê derfetê dide hin tiştan û pêşîya hin tiştan jî digire. Kesên ku perwerdeyeke baş wergirtibin, bi awayekî rehetî zimên bi kar tinîn û tûrikê peyvên wan jî pir mezin e û dema diaxivin mirov haydarbûna wan a bikaranîna peyv û rêzimanê bi rehetî dibine.

Gelek xebat, lêkolîn û nêrîn nîşanî me didin ku di nav civakeke biçûk de jî cudahiya temenê axêveran, zayend û etnîsîteyê bi tevahî ne wekî hev in û xwedîyê sedemên cuda ne. Bi saya ragihandin, perwerde, xwendin an jî hevragihandinê mirov êdî peyvên nû hildibijêrin û bi kar tînin. Herwiha ev bi xwe jî sedemeke giring e ku guherîna zimên pêk tîne. Carinan hinek peyv di nav heman malê de jî nayê fahmkirin û însan ji hev wate û bikaranîna peyvan dipirsin.

1.4.1. Aborî

Bandora aborîyê li dinyayê ti car wenda nebûye û bi awayekî xwezayî bandorê li ser qeder û rewşa welat, herêm û şexsan dike. Ev bandor jî xwe wekî “hêza aborî” nîşan dide. Helbet ev hêz li her derê bi hêzeke din û cuda derdixe holê. Ji ber ku aborî parçeyeke giring ya çandê ye, çî li devereke biçûk çî li devereke mezin û bi nifûseke mezin be, hertim aborî civakê diguherîne. Ji ber ku zimanê ku di perwerde û bazarê de tên bikaranîn geştir dibin, lê yên ku nayên axaftin hêdî hêdî qels dibin û carinan jî wenda dibin. Bi taybetî jî zimanên mînor yan jî yên herêmî wenda dibin. Ziman ku di jiyana rojane de, di bazarê de û di perwerdeyê de tê bikaranîn, bi awayekî xwezayî li gorî pêwistî, şert û mercên nû peyvên nû derdixwin û têdixin nav zimanê xwe. Bikaranîna teknolojiyê jî gelek peyvên nû li zimên zêde dike. Em baş dizanin û dibînin ku rewşa aborî çawa bandorê li zimanên îngilîzî, çînî û erebî kiriye û ji hejmara peyvan bigirin heta bikaranîna wan zêdetir kiriye. Pirs Marschakê (1965; 136) zimanên îroyîn û yên paşerojê ku tên zanîn çima wiha ne û çima wiha bûn. Ev pirs rasterast girêdayî vê mijarê ye. Hebûna nêzîkatîyên aborî û rewşa sosyolînguîstîkê girêdayî hev in ku mirov bi rehetî dikare têkilîya aborî bi zimanê civakê de bibîne, bo mînak ev dikare wekî “bitcoinê” bê dîtin. Mirov dikare bitcoinê wekî *pereyê sanal* jî pênase bike. Ev mijar di civakên pêşveçûyî de bêtir derdikevin pêş û bêtir bala însanan dikişînin. Ji ber ku ne tenê kesên pir dewlemend yanî zengîn, her kes bi awayekî xwezayî li rêyên nû digerin ku bikaribin pereyên xwe biparêzin. Helbet bankayên taybet û yên dewletê hene lê gelek însan naxwazin pereyên xwe li bankeyan bihêlin û li rêyên din digerin ku ji kesan bigirin heta dewletan ti kes derheqê mîqdarê pereyê wan nizanibin û bi saya rêyên wiha yên dijîtal dikarin mîqdara pereyên xwe veşêrin. Loma “înternet” û “mentîqa

pereyên sanal” derfeteke nû dide însanan ku pereyên xwe hem zêde bikin û hem jî biparêzin.

Li ser têkiliya aborî û ziman di 30 salên dawî de, gelek nirxandin û xebat hatine nivîsandin. Û hêj jî ev neseke niye û berwedam e. Ji ber ku her daîm tiştên nû derdikevin xebat neseke niye.

Hayek (1988: 106) vê têkiliyê wiha şîrove dike.

Pêdivî ye ku bazirganî, koçberî û zêdebûn û tevlihevbûna nifûsê tenê çavên mirovan venekirîye, di heman demê de, zimanê wan jî wendakiribe. Ew ne bi tenê bû ku esnaf bêguman rastî wan hat, û di rêwîtiyên xwe de carinan, zimanên biyaniyan fêr bûne. Lê divê vê yekê ew neçar kiribe ku li ser wateyên cuda ên bêjeyên sereke bifikirin, û bi vî awayî dîtînen cihêreng yên nû di derbarê meseleya herî bingeîn de bizanin.

Bo mînak

- Kompûter
- Înternet
- Telefon
- Telefonên Destan (telefonên mobîl)
- Televîzyon

Çend peyvên kurdî û îngilîzî û tîrki derbarê komputer û bernamêya teknolojiyê de.⁷

KURDÎ	ENGLISH
gihîn	access
xala gihînê	access point
gihînbarî	accessibility

⁷<https://aqilmendkurd.com/threads/peyven-derbare-teknolojiyeda-a.237/>

gihînbar	accessible
hesab/ajimêr	account
ajimêrê/hesêb filitandin	account recovery
çalakî	action
çengela çalakiyê	action hook
çalak	activate
akkirin	activation
emaila çalakkirinê	activation email
polîtîkaya reklamê	ad policy
adapter	adapter
pêvek	add-on
navnîşan	address
benda birêvebirînê	admin bar
panela birêvebirinê	admin panel
rêvebir	administrator
sazkariyên pêşketî	advanced settings
reklam	advertisement
vîrusreklam	adware
alfahejmarî	alphanumeric
vîruskuj/antîvîrus	antivirus
sepan	app
xuyang	appearance
sepan	application
tomarkirin	apply
pejirandin	approve

arşîv	archive
tu bi rastî jî dixwazî	are you sure you want
qad	area
argûment	argument
rêze	array
gotar	article
hişê xwedestî/ hişê çêkirî	artificial intelligence
rêjeya rûberê	aspect ratio
pêvek	attachment
taybetmendî	attribute
deng	audio
rastandin	authentication
sepana rastandinê	authenticator app
nivîskar	author
nûkirina bixweber	auto renew
avatar	avatar

Herwiha tiştên nû ku li gorî pêwistiya însanan derdikevin dibin sedema afirandina peyvên nû û sedema guherîna zimên.

1.5. Faktorên Exlaqî

Faktorên exlaqî ew in ku derbarê geşedanên dawî yên dij-nîjadperestî û jîngehparêzî de ne (Beard, 2004). Zimanê ku di nav civatê de tê axaftin li gorî civatê di pêwendiya exlaqî de diguhêre. Bo mînak hevoksazîya kesên ku li gund û bajaran dijîn ne wekî hev in û xwe bi awayekî cuda îfade dikin. Helbet ev guherîn di nav kesên xwende û nexwende de jî xwe bi awayekî vekirî nîşan dide. Nêrînên nijadperestî, olî

jîngehparezî, jiyana çolter û çanda bajarvaniyê cihên afirandina nêrînên nû ne. Dema mirov referans û nirxên civakê bifikire nirxên exlaqî jî cihekî mezin digirin.

Di her nîfşî de, bilêvkirin wêrar dibe, peyvên nû ji zimanên din tên wergirtin an jî ji nû ve tên çêkirin, wateyên hinek peyvan diguherin, dev ji wateyên xwe berdidin û wateyên nû digirin. Herwiha morfolojîya peyvan jî ji vê guherînê kêmtir namîne û para xwe digire; yan geştir yan jî kintir dibe. Rêjeya guherînê ji herêmekê ber bi herêmekê din ve diguhere, ev guherîn hêdîtir an jî lezgîntir jî be dîsa bi sedemê pêk tê (Jones & Singh, 2005). Zanebûna agahî û sedemên guherîna zimên ji bo kesên ku di nav kare zimên de ne giring e. Ev ji bo zimannasîyê mijareke jênegir û pir giring e. Zimannas li vê mijarê ji bo nêzîkatiyên diskriptîfê jî dinêrin û vê guherînê wekî tişteke xwezayî dipejirînin û dizanin ku teqez sedemên guherîna zimên hene. Helbet zimannas bi awayekî dîrokî li ser guherînê sekinîne û guherîna zimanê xwe û zimanên têkildar û netêkildar şopandine û xwestine ku çarçoveya vê guherînê derxin hole.

1.6. Faktorên Zimanên Din

Ev faktor wekî di beşa faktorên siyasî de jî hatin nirxandin dibe ku wekî hev bin an jî ji hev cuda bin. Sedema herî giring û berbelavbûyî ji zimanekî “**deyngirtina peyvan**” e. Mirov bi rehetî dikare mînakên jêr di her zimanê de bibîne:

Pîzza

Qehwe

Hamburger

Cîns (jeans)

Her çiqas deyngirtina peyvan pir berbelavbûyî jî be, hemû peyvên ku hatine girtin dibe ku di zimên de cî negirin gelek ji van peyvan di zimên de wekî demeke kurt tên bikaranîn û di nav demê de gelemperî jî di demekê kurt de wenda dibin. Cîgirtina peyvan bi gelemperî dema peyva deyngirtî tiştekî nîşan dide û ew peyv jî di wir de tûne be wekî peyva pîzzayê ciyê xwe digire (Aitchison, 2001: 32).

Guherîna Konteksê (civak, çand, mekan)

Bi gelemperî tê îddîa kirin ku ziman di sê rewşan de diguhere: guherîna ji xweber (spontan), deynigirtin û xweferzkirin (Jones & Esch, 2002: 123). Guherîna ji xweber tê wateya ku guherîn di nav demê de pêk tê, nayê wateya ku guherîn bi armancek çêdibe lê bi hebûna hevragihandinê pêk tê ji ber ku ti car du kes wekî hev xeber nadin (Jones & Esch, 2002: 123). Herwiha ji ber ku însan di pêwîstiya afirindina peyv û îfadeyên nû de ne hertim guherîna ji xweber dê pêk bê. Deyngirtin qebûlkirina taybetmendiyên zimanên biyanî û têgehên nû ji zimanekî din e. Xweferzkirin bi rêya îşgalkirin yan jî dagirkeriya civatek qelstir û bi zextdayîna zimanê hêza serdest ji bo tune kirin û wendakirina çanda wan derdikeve. Diamond (1993: 2) dide zanîn ku bi saya plansazî û polîtîkayên zimên plansazkerên zimên dixwazin ziman û komên zimanên kêmaran di nav ziman/ên fermî ku didin xwendin û axaftin yê netew-dewletan asîmîle bikin.

Le herwiha tenê şexsek an jî kesek bi xwe jî têdikeve nav tendansa axaftin û nivîsek cuda ku bikaribe xwe li gora konteksên pêwîstî û cuda îfade bike. Ev bi xwe jî dibe sedema cudahiya guherînê. Ev guherîn berê bi wî/wê re dest pê dike dawiyê bi kesên ku pê re têkildar in didome. Carinan bi saya medyayê carinan bi saya karê wî/wê kesan hêdî hêdî guherîn ciyê xwe digire û dibe parçeyekî zimên.

Her daîm û bi piranî guherîna zimên wekî tişteke pêwîst tê dîtin lê ev di eslê xwe de diyardeyek sosyal û normal e. Her daîm di navbera însanan de ragihandinek heye û ev ragihandin bi awayekî xwezayî zimên diguherîne. Ji ber ku ragihandin li her derê wekî mal, kar, dibistan, trafik, înternet li her derê ku herî kêr du însan hene pêk tê. Însan bêhemdî têdikevin nav hewldana şibandina zimanê ku bi kar tînin. Ev şibandin rehetiyek dide însanan. Mirov dikare vê şibandinê di qadên fonolojî (devok), peyvên ku tên bikaranîn, rêzimanê (têşenasî û hevoksazî) û di vegotinê (discourse) de bibîne. Herwiha ev guherîn di navbera astên sosyal de bêtir tê dîtin, her çiqas ast bilind dibe asta guherînê jî diguhere û tiştên ku hatine guhertin dema mirov tiştên berê û yê wê demê bide ber hev xuya dibin.

Hewce ye mirov behsa çanda ciwanan jî bike. Jiyana mirovan di çandê de, çawa têdikevin nav ragihandinê, çawa xwe di civakê de bi cî dikin girêdayî nirx û beştarbûna ciwanan e. Endîşeya wan ji bo çand û medyayê, nêrîn û jiyana ciwanan û nirxên wan diguhere. Hebûn û avakirina nasnameyê giring e ku ciwan zimanê ku bi kar tînin, muzîka ku guhdarî dikin heya cil û bergên klasîk û yên modern giş ji malê bigirin heya dibistana ku derin dibe qada avakirin û îfadekirina wan. Thurlow (2003: 50) dibêje ku “xort bi piranî ji aliyê mezinên xwe şaş têne fahmkirin û hêza wan a ragihandinê kêmtir dibe, bêtir dibe û tê redkirin. Bi awayekî xwezayî di navbera ciwan û mezinan de pirsgerêkên biçûk û yên girêdayî nifşên cuda derdikevin. Nifşên ciwan bêhişmendî dema ku hewl didin nasnameyeke nû ava bikin di her astê de (ziman, muzîk, cil û berg, teqlîd û hwd.) *deyngirtineke çandî* pêk tê û êdî diguhere. Dema mirov çanda mezin ku bi saya TV û înternetê digihîje bifikire bi rehetî dibîne ku çiqas cudahiyeke mezin pêk tê. Globalîzebûna çandê – bandora li ser çanda ku girêdana dinyayê û însanan dike li ti cihan qeyasî ku di şiklê guherîna têkiliyên ciwanên dinyayê û mijara nasnameya wan de dixuyê xuya nabe (Solomon & Scuderi, 2002,13). Rastiya ku tê dîtin ew e ku çand ji aliyê însanan, çanda ku bi awayekî sosyalî ava dikin, diafirînin û hertim dicerîbînin diguhere. Medya, muzîk, TV, internet, moda û tiştên din di jiyana ciwanan de roleke mezin dilîze. Çanda berê hêdî hêdî diguhere û zimanê jiyanê jî helbet nikare xwe ji vê guherînê biparêze.

Bo mînak

Guherîna teknolojiyê dibe sedema gelek tiştan ku yek ji van jî amûrê muzîkê “blur” e ku şivên berê li ber pezê xwe li bilûra xwe dixistin. Niha ev tişt hema hema nema, ji ber ku êdî şivan xwediyê telefonên desta yên bi girêdana înternetê 3G û 4Gyê ne. Guherîna teknolojiyê çandê jî diguherîne. Cudahiya zimên xwe di hemanên çandî de jî xuya dike.

Gava mirov li *Hawarê* dinêre, bi awayekî aşkere diyar dibe ku di her hejmara kovarê de giringiya zimên derdikeve pêş xwendevanan. Ziman bi xwe hêmana herî giring ya netewbûnê ye. Dema ku zimanek bi her awayî bê bikaranîn wê demê wê axêverên zimanan wê têkiliya xwe bi zimên re bi awayekî xurtir çêbikin û wê xwe bi wî

zimanî re girêdayî hîs bikin. Ji ber ku di navbera ziman û çandê de têkiliyeke taybet heye, Celadet Alî Bedirxan jî di her xebatê de û her cûre nivîsê de carinan bi awayekî vekirî û rasterast carinan jî bi awayekî veşartî û îndîrekt giringî û pêwîstiya fikra netewebûnê diparêze. Ji nivîsên çandî bigirin heya helbestan, ji pêwîstiya çêkirina alfabeyê bigirin heya fableke zarokan ji nûçeyên şerê cihanê bigirin heya helbestên klasîk yên Melayê Cizîrî, dema mirov *Hawarê* dibihîsê baş dizane ku ev xebateke wisa ye ku hewl daye rihê netewebûnê çêbike. Hacî Qadirê Koyî ji bo zarokên Bedirxanîyan mamostayetiye dike (Pekim, 2020: 36) wekî peyrewê Ehmedê Xanî ye. Ehmedê Xanî wekî yekem kesê fikra nereteweperweriyê parastiyê tê zanîn, Hacî Qadirê Koyî jî wekî yekem kesê tê nasîn yê ku neteweperwerî wekî modernîst parastiyê. Ew bi xwe bi helbestên modern tê nasîn û li ser bavê Celadet Alî Bedirxan, Emîn Alî Bedirxanê bandor kiriye. Loma bandora fikra neteweperweriyê hem ji ber kesên navborî û ji ber malbata mîrekiyê bi awayekî rengê xwe di kar û xebatên malbatê de jî xwe derdixe. Li ser vê, hinek xalên wekî *Alfabe*, *Rêziman* û *Ferhengî* ve tercîh û guherînên di *Hawarê* da bîne pêşkeşkin.

1.7. Sedemên Din

A) Rehetbûna Bilêvkirinê

Her dever zimanê ku bi kar tîne li gorî sedemên resen tê wê asta ku tê de ye. Lê hinek ji wan zimanê ku bi kar tînin bi gelek cudahiyan bi kar tînin. Mînakek ku li derdora Mêrdînê pir tê bikaranîn kurtkirina peyva “vêşê” ye. Ev kurtkirina “vê sibehî” yan jî “ev sibehê” ye. Kurtkirina peyvan herdem axaftinê rehet dike.

Gornistan → goristan

Hilweşîna herfa “n” yê rehetiya telafûz dide.

Mînakek din jî ev e:

min got → mi go

wekî tê dîtin min got herfên “n” û “t” yê hatine avêtin û axaftin zelal bû ye.

B) Şîrovekirina ji nû ve

Guherîna zimên dikare di cûreyên cuda de derkeve hemberî me. Ev guherîn jî li her herêmî bi şiklekî cuda pêk tê.

Bo mînak avêtina daçekan mînakek giring e û wiha ye.

Avêtina daçekan (ez li malê me → ez mal im).

Li herêma Serhedê gelek berbelavbûyî ye.

Ji bilî şîrovekirinê jinûve hinek tişt di nav demê de hêdî hêdî diguherin ev guherîn jî li gorî sedemên cuda pêk tên û dawiya dawî dema guherîna xwe diqedînin li derekê disekin. Peyva “îro”yê ku wiha hatiye guherîn bi avêtina herfan xwe nîşan dide; herfa “z”yê bûye “j” û dawiyê jî wenda bûye.

Bo nimune

Îroz → îroj → îro

Her çend ji kesên ku naxwazin zimanê wan biguherin û ji vî tiştî aciz bin jî, ev mînak parçeyek ji pêvajoyek sererastkirina demdirêj e ku bi sedsalan li pirjimarên îngilîzî bandorê dike (Baugh, A. C. & Cable, T., 1993: 81). Loma dema zimanek diguhere teqez hinek kes ji her deverên cuda dikarin bertekên xwe nîşan bidin. Lê hertim bikaranîna gelemperî bi ser dikeve. Ne ecêb e ku nifşa berê di têgihiştina ciwanan de pirsgirêkan bijî, her çend ku ev veguherîn niha ji xortan wêdetir jî belav bûye (Aitchison, 2001: 193). Lê ev rewş dîsa di astên din de jî tê dîtin. Tiştên ku xort, navsere û kal û pîr marûz dimînin ne wekî hev in. Cudahiya fahmkirinê bandorê li avakirin û afirandina zimên ya şexsî jî dike û takekesiya mirovan dibe takekesiya zimên. Loma bikarhêner di zimên de li wekhevî û şibandinê digerin. Bi gotineke din, ziman di nav hewla ji holê rakirina cihêrengiya bêwate de ye û avahiyên zelal û rasterast tercîh dike (Aitchison, 2001: 178). Bidestxistina tiştên hevpar û hevşîb dibe armanca rehetbûna fahmkirin û ragihandinê.

Cudahiya zimên dibe ku ji hêla faktorên civakî, wekî mînak, moda, bandora biyanî û hewcedariya civakî ve derkevin. Lêbelê, heya ku ziman ji bo guherînek taybetî “amade

ne be”, ev faktor nikarin bibandor bin (Aitchison, 2001: 197). Teqez hinek tişt divê bihêz be ku guherîna zimên kontrol bike û têxe bin bandora xwe. Peyvên nû û yên guherî çiqas bêm bikaranîn hêza guherînê û cîgirtina peyvan jî zêdetir dibin. Gava ku guherînek di zimanekî de pêk tê, ew dikare zûtir be, ji hêla faktorên civakî û zimanî ve bikeve halekê hêdî yan jî paş vegere (Aitchison 2001: 161). Mirov nikare ji bo her peyvê û lezgîniya guherîna wê texmîn bike. Ji bo vê şopandineke demdirêj an jî texmîneke baş pêwîst e. Hinek guherîn cihên xwe digirin û hinek jî nagirin. Mînakê jêr ev du sal in di jiyana herkesî de cihêkî giring û mezin digire wê berbelavbûn û cihgirtina peyvekê ji ber gelek kes bi şopê ketine yan jî bi nexweşiyek gerdûnî (covîd-19) hinek tiştan bi awayekî rehetir bide me.

Bo mîsal

Hebûna vîrusa koronayê peyva “berpoz”, “rûpoş”, “girtê” û “berpoş”ê xiste zimanê me. Nêzîkatîyên însanan li hemberî guherîna zimanan ne wekî hev in. Hinek însan bêhemdî wan guherînan bi kar tînin, hinek însan bi zanebûn van tiştan qebûl nakin. Di demên berê û niha li hemberî guherîna zimên gelek berxwedan çêbûne û hene; hinek kes vî tiştî wekî “dagirkeriya têgehane û peyvên çêker” dinirxînin û heya ji destê wan tê dixwazin peyvên ku di tûrikê wan de cih girtine bêne bikaranîn û peyvên nû tercîh nakin. Tercîhkirina peyvan ji aliyê kesên ku paşxana wan di warê zayend, temen an jî perwerdeyê de cuda ye dikare biguhere.

Di vê xalê de, tiştê giring ku dive neyê piştguhkirin, hebûna akademiya zimên li gelek welatan encamên cuda dide. Ev akademî ji bo zimên biryaran digirin û biryaran didin, mudaxeleyê zimên dikin, hin tiştan jî zimên derdixin ku zimanekî zelal yan jî pêtî hebe heta car caran xebatên peyvan çêdikin û van xebatan bi pêş dixin. Ev akademî dikarin rojname, kovar û pirtûkan jî derxin. Mirov dikare xebatên ku ji aliyê zanîngeh, kom, weqf û saziyan tên amadekirin û çapkirin wekî nimûne nîşan bide. Lê tiştê herî giring ew e ku tu kes nikare zimanê axaftinê ku ji aliyê gel ve tê bikaranîn carekê de yan jî demildest biguherîne. Helbet guherîna zimên bi bikaranîna wê di perwerhiyê de pêk tê. Heger ew biryarên ji aliyê saziyên navborî hatine girtin di pirtûkên ku bêm bikaranîn dê cî bigirin, wê guherîna zimên bi saya perwerdeyê pêk bê. Di ser re, tiştê ku li vir

xwedyê giringiyek giranbuha ew e ku guherîna zimên di axaftinê de çêdibe û ev guherîn jî ji aliyê sazî, weqf, zanîngeh an jî komeleyan nikare bi axaftinê bê kontrolkirin lê bi pirtûkan, vîdeoyan an jî bi aplîkasyonên telefonên bîaqîl dikarin mudaxeleya axaftinê bikin. Helbet medya, perwerdehî zimanê însanan diguherîne, lê tiştên çapkirî heya derekê bandore dike û zimanê însanan bi rehetî naguhere. Divê perwerdeyek berfireh hebe ku guherîn pêk bê. Guherîna deng, ku di îngilîzî de vi tiştî wekî *sound change* binav dîkin, pêvajoyek fonolojîk e ku ji aliyê hemû axaftvanên zimanekî yan jî zaravayekî tê dîtin û pejirandin. Dengên ku tên bikaranîn di nav demê de wekî pêlên behrê ji kesekî derbasî kesekî din dibe ku ev di nav demê de ji aliyê herkesî wekî hev bi şiklekî tê bikaranîn. Helbet ev tiştêkî demdirêj e û ev nişka ve pêk nayê.

Dûr, dur, dwir, dîr (Behrooz Shojai⁸)

Xwîn xûn, xîn

Gûz, guz, gîz

Rûn, run, rîn

Helbet pîrbûn û cudahiya peyvên dewlemendiyeke mezin e. Ji bo standartîzasyonê gelek nîqaş hene ku kîjan peyv dê bê hîlbijartin. Gelek kes peyvên herêma xwe tercîh dîkin lê divê mijarê de hewce ye ku peyvên bêtir tên bikaranîn û yên ku ji xwe ji ber medyaya devkî û nivîskî de di nav gel de tên bikaranîn bê tercîhkirin. Helbet peyvên ku li gorî îhtiyacên jiyana rojane, peyvên ku ji wergera zimanên din ku bên çêkirin dê hebin. Lê termînolojiya zanistekê û ya jiyana rojane wê ji hev hinek cihê bin.

⁸ Notên Dersên Mastira Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, 2015

BEŞA DUDUYAN

CÛREYÊN TAYBETMENDIYÊN ZIMANNASIYA FONOLOJÎ Û MORFOLOJIYÊ

Di her zimanî de, cûreyên taybetmendî û cudahiya zimên hene. Ev di asta peyvî (leksîkî), wateyî (semantîkî), dengî (fonolojîk) û hevoksaziyê (sentaksî) de ne. Ji ber ku ev çar beş wekî binbeşên zimannasiyê ne, mirov dikare asta guherînê wekî cûre binirxîne. Di vê xebatê de heya ji destê me bê em ê guherîna zimên di asta nivîskî de bi bikaranîna gotar, helbest û cûreyên ku hatine bikaranîn û bi nimûneya *Hawarê* binirxînin û bi sedemên wê deme re şîrove bikin. Ev lêkolîn wê li ser du qadên zimannasiyê bin; fonolojî û morfolojî.

Mirov dikare tenê bi mînakekê jî guherîna zimên di gelek zimanan de bibîne û bi taybetî em dikarin mînaka zimanê îngilîzî bidin û binirxînin ka çawa di demê de fonolojî, morfolojî û peyvsazî guheriye û hêj jî diguhere. Bi awayekî normal, wêrarbûna her zimanî ne wekî hev in û ji ber hebûna materyalên bi nivîskî û dengî qeydkirî ne. Şopandina guherîna hinek zimanan jî rehetir e.

Mînaka Îngilîzî

Dema Shakespeare: *What thinkest thou?*

Îngilîziya Modern: *What do you think?*

Wateya Kurmancî: *Tu çi difikirî?*

Guherîna Hevoksaziyê: Lêkera alîkar “do” di hevoksaziya nû de zêde bûye

Guherîna Morfolojîk: Qertafa lêkerê

Guherîna Peyvî: Peyva “*thou*”yê êdî bi kar nayê.

Di vê hevoka navborî de, guherîna hevoksazî yê di asta rêzimanê de, guherîna morfolojîyê di peyva “think”ê û guherîna peyvê jî wekî li jor hatiye nîşandayîn bi guherînek tevayî xwe nîşan dide; peyva “*thou*”yê bûye “you”. Vê guherînê gelek dem girtiye û gelek dem derbas bûye heya ku terciha însanan pêk hatiye.

Xuya ye guherîn dikare tenê bi hevokekê jî bê nîşandayîn, lê di navbera vê guherîna navborî de nêzî 400 sal hene. Ger mirov ji bo vê guherînê demek kin bişopîne guherîn bi vî şeklî xuya nake lê 400 sal têra xwe daneyan dihevine û dide lêkolîner û zimannasan.

Guherîna zimanan di her astên zimannasiyê de pêk tên:
fonetîk, fonemîk, morfolojîk, sentaktîk, semantîk, pragmatîk.

2.1. Fonolojî

Fonolojî di warê zimannasiya dîrokî de belkî qada herî pir pêşketî ye (Burridge, 2016: 76). Ji ber ku cudahî û guherîn bi piranî bi fonolojîyê dest pê dike, giringiya vê beşê pir balkêş e. Bandora zimanên ku wekî erdnîgarî nêzî hev in helbet bi awayekî xwezayî ji ber danûstandin, têkiliyên civakî û mecbûrî pir e. Kurmancî û zaravayên din jî ji ber sedemên ku hatin îfadekirin bi zimanên cîran rê têkildar in û şop û bandorê li ser hev dikin, bi taybetî tirkî, erebî, rûsî, ermenîkî û farsî her daîm bi zaravayên kurdî re têkildar in.

Guherîna zimên bi du awayan belav dibe: ji derva bi navgîniya civakekê, û ji hundir ve bi saya zimanekî (Aitchison, 2001: 84). Wekî tê dîtin çavkaniyeke derveyî civak e, sedemeke hundirîn jî ziman bi xwe ye. Ev her du jî herdem bi hev re di nav ragihandinê de ne. Aitchison (2001: 84) dibêje ku gelek kes bawer dikin ku guherîna dengî bandora xwe bi hevdemî li ser hemû peyvên di zaravayekî de hene dike. Herwiha

ev fikireke kevnar e ku bandora xwe li ser zimannasan kiriye. Niha baş tê dîtin ku ji bo guherînekê ku di hemû peyvvan de cihê xwe bigire demek dirêj pêwîst e û her deng jî li gorî dengên din yan jî herfên din cihê xwe diparêze. Guherîna dengên di her zimanî de heye, di hinekan de herf têne avêtin, di hinekan de nayên gotin an jî bi herfên kelijandinê têne zêdekirin. Di her zimanî de rewşa herfan cuda ye.

Bo mîsal:

Dur, dûr, dîr, dwir⁹

Ya ku meseleyan hîn balkêştir dike (lê di heman demê de aloztir jî dike) ev e ku di navbera van astên cuda de hin hevragihandin heye, da ku guhertina li ser astekê dikare li ser astên din jî guherînekê pêk bîne. Gava ku, wekî nimûne, erozyona fonetîkî dibe sedema wendakirina herfên dawîn, ev bi gelemperî hem ji bo morfolojî û hem jî ji bo hevoksaziyê encamên cuda dide, ji ber ku (di mijara zimanên germanî de) herfên dawîn cihê paşpirtikên tewangbar in (yên ku îşaretê fonksiyonên rêzimanî û têkiliyan dikin) (Burridge, 2016: 13).

Cudahiya dengî belkî guherîna herî berbelav û berfireh e ku dibe sedema guherîna fonetîk û fonolojîkê. Ev di heman deme de **guherîn, kurtkirin, asîmîlasyon û taybetmendiyên** din jî di nav xwe de dihevin. Ev guherîn jî guherîna parçe yan jî dengên peyvvan nîşan dide.

Di vê binbeşê de, em ê bi hûrgulî hin pêvajoyên herî hevpar binirxînin, bi taybetî yên ku bandorê li wêrarbûna dengên dikin. Ew dikevin sê cûreyên sereke: wendakirina dengên, lêzêdekirina dengên nû û guherîna dengên mewcûd. Di vê pêvajoyê de a) dengên kevn dikevin – wenda dibin; b) dengên nû derdikevin, û c) dengên kevn têne guherîn.

⁹Notên Dersên Mastira Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, 2015

2.1.1. Asîmîlasyon (Assimilation)

Asîmîlasyon pêvajoyeke dengnasiyê ye ku tê de parçeyek diguhere û ji nêz ve dişibe cîranên xwe (Smith, 2003: 320). Yanî asîmîlasyon guherîneke dengî ye ku tê de hin fonem (bi gelemperî konsonant an dengdêr) diguherin û dişibin dengên din ên nêz. Pêvajoyek fonolojîkî ya hevpar a di nav zimanan de, asîmîlasyon dikare di hundirê bêjeyek de an di navbera bêjeyan de çêbibe.

Bi nimûne

gazing → gazing → gazing

dîsan → dîsa

ruh → rih

xwînriz – xwînrij

şermisar – şermezar

mehzuwan – mehzuban

çiman - çima

2.1.2. Dîsîmîlasyon (Dissimilation)

Di fonetîkê de peyveke giştî ji bo pêvajoya ku du dengên cîran kêmbin wek hev (Bye, 2011: 1408). Di fonolojîyê de, bi taybetî di nav zimannasiya dîrokî de, veqetandin diyardeyek e ku tê de konsonant an dengdêrên hevşib di peyvekê de kêmtir dişibin hev. Di îngilîzî de, veqetandin bi taybetî bi konsonantên lîkîî (liquid consonants) yê wekî / r / û / l / gava ku ew di rêzekê de çêbin, hevpar e.

Dîsîmîlasyon, wekî ku ji navê wê jî diyar e û tê fahmkirin, diyar dike ka deng çawa diguhezin da ku kêmbin, mîna dengên din ên li derdorê. Sedema li pişt berbelavbûnê ne diyar e, her çend hin zimannas wê vedigirin bi wê yekê ku mirov dikare heman çalakiya masûlkan (muscle) a bi pîrsgirêk bibîne. Ji ber hereketkirina masûlkan hundirê devê mirovan hin dengên diguherîne. Her dengê ji cihekî cuda derdikeve. Hebûn û bikaranîna qasan jî herwiha hinek tiştan diguherîne. Loma êdî deng ji hev dûr dikevin

Mînak;

girover → gilover

bira → bila

2.1.3. Metatez (Methathesis)

Metatez veguhastina deng an tîpan di peyvekê de an jî bêjeyên di hevokekê de ye. Bi gelemperî, ew behsa pevguheztina du an zêdetir beş an hevokan dike, ku wekî metateza cîran an metateza herêmî têne zanîn. Her çend hin zimannas formên metatezkirî wekî cûreyek xeletiyên axaftinê bibînin jî, ji hêla dîrokî ve, hin ji wan forman gav bi gav bûne nîşanek zimanî ji bo guherîna ziman (Carr, 2008: 12).

Bo mîsal;

berf/befr

cîran/cînar

destgirtî/dergîstî

dinêrim, dinihêrim, dinerim, dirênim

2.1.4. Sistbûn (lenîsyon – lenition)

Fikira ku hin cûreyên guheztina nimûneyên celebek giştî a guheztinê ne ku jê re "sistbûn" tê gotin, û bi hev re guherînên ku dengdêr dikarin tê de derbas bibin derdixin (Honeybone, 2008: 1). Lenîsyon navê lawazbûna giştî ya denga e. Bi vê pêvajoyê re, parçeyan kêmkirina bikaranîna vebêjer vedigirin, û dibe ku ew bîne kurtkirin - xala dawîn a lenîsyonê wendabûne. Guherînên wiha gava deng di pozîsyonên arûzê de ye bi awayekî qels çêdibin.

Guherînên fonetîkî di rastkirina fonetîkî ya fonemê de, an di belavkirina allofonên fonemê de rastkirinan çêdike, lê di jimara foneman de an di têkiliyên di navbera wan de tu astengî çênake.

Hevîn → evîn

2.1.5. Yekkirin, Bihevîgîrêdan (Merger)

Dema du an jî zêdetir fonem dibin yek fonem, ji vê pêvajoyê re yekkirin (bihevîgîrêdan) tê gotin. Têgeha 'hevîgirtin'ê tê wateya her çend du tiştên cihêreng be jî, ji nêz ve têkildar in (Maguire, 2014: 230).

Mînaka yekkirinê;

hin heval → hevalîn (Behdînî)

semensa → weke yasemîn

2.1.6. Parçebûna Dengan (Split)

Parçebûna seretayî (primary splits) dema ku allofonên fonemek ji wê fonemê vediqete û bi fonemek cihêreng re dibin yek, çêdibe (Burridge, 2017: 92). Ji ber vê yekê peyvên ku di destpêkê de heman fonem girtibûn bi yên cihêreng diqedin.

Mînak;

tu

tîr

tax

tîxûb

2.1.7. Wendabûn (Loss)

Gava ku em diaxivin, em rêyên kurt hildibêjêrin, bi gelemperî dengdêrên nekêşandî dihêlin û konsonantan diavêjin (Burridge, 2017: 77): mirov dikare wendabûnê bi gelemperî di varyasyonan de bibîne.

Mînak

ewe → ew,

agir → ar

heşîn → şîn

heyiv → hîv

Binêherim → Binêrim

2.1.8. Lêzêdekirin (Insertion)

Gava ku dengê zêde di navbera du yên din de tê zêdekirin, ev rewşa lêzêdekirinê derdikeve. Ew pêvajoyek e ku tê de dengdarên ku ne li ser rûyê dengnasiyê derdikevin (Žygis, 2010: 111).

Mînak

gî → giş

yektî → yekitî

Guherînen fonolojîk an jî guherînen bilêvkirinê dikare di telafûzên her peyvan de bi taybetî telafûzên dengên taybet de derdixe. Nêrîneke eleqedar ya varyasyona fonolojîk bi piranî di hawirdora fonetîkê de deng derdikevin. Sê çar cure guherînen fonolojîk hene û giş rast in.

Mînak;

Cûr bi cûr – cûr be cûr

Dih – dihi – doh

Welê – wilo

Nih – nûh – nû

Weko – weku – wekî

Guherîna herfan dikare bibe rehetî jî û bibe pirsgirêk jî; bo mînak ûrûsan di sala 1917an de alfabeya xwe ji ber dijiwariya bilêvkirinê guhertin. Tirkan alfabeya xwe di 1928an de ji aramî kirin latîni û Celadet Elî Bedîrxan jî alfabeya kurmancî ya bi aramî kir latîni. Helbet hinek deng bûn pirsgirêk û di kurmancî de hêj jî hinek pirsgirêk hene. Lê adaptasyonek hertim heye û însan bi nivîsê xwe îfade dîkin û peyamên xwe ji însanên din re dişînin. Loma herfên bi pirsgirêk din av demê de cihê xwe digirin.

Prensîbên dengên (Rebecca, 2019: 67) wiha ne;

- Guherîna deng ne xwediyê bîreke gelemperî ne û her carê bi heman şiklê pêk nayên.

- Guherîna dengan rêzimanê paşguh dike dikare bi awayekî taybet pêk bê.
- Guherîna dengan bêistîsna ne
- Guherîna dengan tişteki neçar e û herdem pêk tê

Bi demê re deng dê wenda bibin, yê nû dê di axaftinê de xuya bibin, û yê kevn dê teşe biguhezin. Pîrsa “çima ev çêdibe?” bala însanan dikişîne. Sedemên ku bi salan ji bo guherînên dengdêr û dengdar hatine pêşniyaz kirin wekî sedemên berpirsiyar pir û pirreng in. Teoriyên destpêkê yê di derheqê guherîna dengan vê yekê bi guherînên di avahiya anatomîkî ya organên xwe-îfadekirinê ve girêdidin. Karaktera etnîkî teoriyeke din a popûler bû. Zimannasên pêşîn jî îddîa dikirin ku mercên erdnigarî û hewa li ser pergala deng bandor dikin, nemaze têgihiştina ku bi rengek hewayê diwar dengên hişk derdixin (dengên hişk tu carî bi zelalî nehatin diyar kirin). Parçeyeke delîl ji bo van teoriyan tune ye (Aitchison, 2001: 97).

Cudahiya fonolojiyê tu car ne yekalî ye. Di her cudahiyê de, ziman ji hêla komek zextên bi hev re ku ji bo guherînê kar dikin dibin sedem.

Wekî mînak;

fîzyolojîk (hilberîna ziman)

sîstematîk (pergala zimanî ya bi pêkhatiyên têkilker re)

psîkolojîk (pêkhatina zîhnî ya axaftvanan)

civakî û siyasî (civaka axaftinê û şexs, hawîrdora civakî-siyasî) û derveyî (têkilî û deynkirin). Li vir em tenê li hin ji van faktoran radiwestin (Burridge & Bergs, 2017: 97):

- Hêskirin (Simplicity)
- Guherîna ji ber temasa zimanan (Contact induced change)
- Zexta Binyadî (Structural Pressure)
- Guherînên Civakî (Social Change)

Zimannasên pêşîn destnîşan kirin ku xuya ye serhildanên civakî (epîdemî, şerên navxweyî, şoreş, krîzên aborî) bi demên guherîna giring ya zimannasiyê bi hev re derdikeve. Wekî mînak, Mirina Reş ya hevdemî digel çend guhertinên mezin ên ku di wê demê de di îngilîzî de pêk hatin (Burridge & Bergs, 2017: 100). Ji ber bandora

bûyerên mezin, bandora wan jî di demeke kurt te tê hîskirin û dîtin. Ev bandor jî, loma xwe di zimên de derdixe holê.

2.2 Morfolojî

2.3.1. Taybetmendiyên Morfolojîk

Mirov bi saya hevokan dikevin nav ragihandineke rojane û her tiştê ku dixwaze îfade bike, tîne ser zimên û herwiha ev hevok ji peyvan çêdibin. Însanek der dora deh hezar peyvan dizane lê van peyvan betir ji bo fahmkirinê bi kar tînin. Wekî tê texmînkirin zarokekî şeş heft salî derdora 13.000 hezar peyvan dizane (Pinker, 1999: 3). Dixwazî zarok dixwazî mezin dema însan peyvan bi kar tînin armanca ewil xwe-îfadekirin e. Loma axivêr hewce dibîne ku ji bona xwe baştir îfade bike, peyvan bi gelek cûreyan bîne ba hev û xwe baş îfade bike. Herçiqas asta xwendinê zêde bibe, hejmara peyvan yên ku tên îfadekirin jî zêde dibin û zêdebûna rêjeya xwendinê bikaranîna peyvan zêde dike. Di pêvajoya ragihandin, îfadekirin û axaftinê de, peyvên ku tên bikaranîn roleke mezin dilîzin. Loma hewce ye bi zanistî ev peyv bîn nirxandin. Ji bona nêrîneke tekûz bidest bikeve pîsporên zimanan xebatên xwe di nav xwe de dîkin beşên cuda. Beşa zimannasîyê ya ku li vir derdikeve pêşberî mirov morfolojî ye. Morfolojî weke zanist, xebata peyvan e, morfolojî li ser çêbûna zimên û têkiliya wan di nav heman zimanê de disekine û bi awayekî zanistî wan têkiliyan dinirxîne, şîrove dike û teorîze dike. Peyva morfolojiye ji zimanê yewnanî tê û **morf** di wateya **şikil, têşeyê** de **olojî** jî di wateya **xebata tişteki (-nasî)** ye.

Morf + olojî

(têşe +nasî)

Beşa rêzimanê ya ku binyada têşeyên peyvan bi taybetî li ser binyada morfema dixebite morfolojî ye (Crystal, 2008: 314). Ji ber ku parçeyeke rêzimanê ye, mamoste dikarin di nav dersan de jî bidin an jî bi hev re wekî mijarek hevgirtî bidin. Li gorî Marchand (1969:1) peyv yekîneya herî biçûk e, serbest e, nikare ji hev veqete û ya bi wateyê ku di nav hevokê de hessasbûna cihguhartinê ye. Tiştê ku pir bala mirovan dikişîne ku peyvek di nav xwe de gelek wateyên cuda dihevine, û li gorî cihê peyvê

peyama ku di hevokê de tê dayîn diguhere. Morfolojî xebata sistematîk ya guhertina pêwendîdar di form û wateya peyvan de ye (Haspelmath, 2010: 335). Loma ev pêwendî xebata heyî diguherîne. Helbet morfolojî ji hêmanên rêzimanê ne îzolekirî ne û fonolojî û sentaksê hem bi awayekî senkronîk û hem jî bi awayekî diyakronîk bi hev ve girê dide (McMahon, 1994: 69).

Morfolojî bi binyada bêjeyê û çêkirina peyvan re têkildar e. Ji aliyekê ve, ew bi morfolojiya infleksiyonê (kêşana peyvan) re mijûl dibe, wekî afîrandina formên bêjeyê, wekî pirtûk (yekjimar) li hember pirtûk + an (pirjimar). “Pirtûk” ne peyvek nû ye, û ew ê berambera (têkela; entry) wê di ferhengê de tune ye. Belê, ew tenê formek nû ya peyva pirtûkê ye (an lexeme). Li aliyê din, morfolojî her wiha li awayê çêkirina peyvan (leksîmeyan) dinêre ka pêvajoyên wekî zeliqandin / affixation (mînaka mimkunê û ne + mimkun), tevlihevkirin *compounding* (mînak kaxez + dîwar = kaxezdîwar), birrîn *clipping* (sarinc> sarinc) û hwd. ev her du warên morfolojiyê li ser zimên bi bandor in (Burridge, 2016: 106).

Nêzî 150 salên dawî, morfolojiya infleksiyonê di zimannasiya dîrokî û teoriya taybetmendiyên zimên de baldariyek giring dîtiye. Bi taybetî, her sê aliyên sereke yên taybetmendiyên morfolojîk divê bêne nirxandin û xebitîn: ji nû ve şîrovekirina binyadê, analojî (an vekêşana binyadê) û tîpolojiya morfosenaksî (veguheztina zimanan ji cûreyek rêzimanî ya din) (Burridge & Bergs, 2017; 106).

Morfem parçeya herî biçûk ya zimên e. Mirov dikare di pênaseya morfemê de rastî ev her sê kriteran bê: (1) watedarbûna peyvê yan jî parçeya peyvê heye, (2) parçebûna parçeyên biçûk ku tê de ne guhertina wateyê derdikeve û (3) heman wateyê di hemû cûreyên lêkeran de jî bibîne. Yanî wate di morfeme de tu car wenda nabe. Ji ber ku parçeya herî biçûk e mirov bi rehetî dikarin bifikirin ku wate wenda bibe yan jî biguhere. Tiştê zêde ew e ku morfem her tim wateya xwe di nav xwe de diheve.

Bi saya morfem, pêşdaçek û paşdaçekan mirov dikare bi hêsanî peyvên nû çekin. Ev dikarin wekî navdêr, hevalnav, rengdêr û lêkernav her cûre bin. Bi saya van hejmaran peyvan zêde dibin û wateyek zelaltir jî didin.

“Mase” navdêr e û di heman deme de morfemek e.

“Qelew” rengdêr e û ji morfemekê pêk hatiye.

“-an” morfema pirjimariyê ye

“-dar” morfema çêkirina rengdêran e.

Her çar morfemên ku li jor hatine dayîn dikarin wekî morfemên cuda bên qebûlkin.

Di peyvên jêr de hejmara morfeman diguherin

Azad, Azadî, Azadîxwaz

Azad yek morfem.

Azadî du morfem.

Azad+î+xwaz sê morfem.

Ji îngilizî, em sê mînakên bidin:

Cat, horses û judges

Cat 1 morfem

Horses 2 morfem

Judges 3 morfem

Wekî di mînakên jor de jî tê ditîn hejmara morfeman di her zimanî de bi heman mantiqê tê bikaranîn.

Yeketeşeyên Peyvkî (Lexical) û Rêzimanî (Grammatical)

Mirov dikare di yeketeşeyên peyvî de wateyê rasterast bibîne. Yeketeşeyên rêzimanî parçeyên peyvê ne wekî daçek, gîhanek, herfên kelijandinê yan jî qertafên pirjimariyê di navbera koka peyvê û qertaf û peyvên din de pêwendiyê çê dike. Yılmaz (2017: 42)

Yeketeşeyên peyvên wiha disenifîne:

Yeketeşeyên peyvî: Navdêr, lêker, rengdêr (kur, hatin, sor)

Yeketeşeyên rêzimanî: Daçek, gîhanek (li, û)

Morfema Serbest (Free Morpheme)

Morfemên ku tenê wekî peyvek bi wate ne morfemên azad/serbest in. Pêwistiya tu herfên kelijandinê yan jî pêşgir an jî paşgirekê nake. Ev morfem weka koka bêjeyan jî têne nasîn ku bi sere xwe jî maneya wê heye (Kanî, 2017: 43). Yeketeşeyên ku dikarin bi tena sere xwe weku peyv bixuyên, weku yeketeşeyên serbest tên pejirandin (Yılmaz, 2017: 44). Di morfemên serbest tê dîtin ku peyvek in û wateya wan ji aliyê kesan ve rasterast tê fahmkirin. Bi tu pêşgir an jî paşgiran re ne girêdayî ne. Yanî morfem peyv bi xwe ne.

Bo mînak: av, rê, hewa, saet, li, di, ji, qels, nerm, hişk... hwd.

Di hevoka “cîran çûn malê” de *cîran*, *çûn* û *mal* morfemên serbest in.

Morfema Girêdayî/Bestî/Berbend (Bound Morpheme)

Morfemên ku nikaribin tena sere xwe bî bikaranîn û ne xwedîyê wateyek zelal in ku bî bikaranîn morfemên girêdayî ne. Ev cûre morfem bi morfemên serbest re tî zêdekirin û wateyek nû derdixin.

Roj-ava-yî	rojawayî
Ber-xwe-dan	berxwedan
Kar-xezal-ek	karxezalek

Mirov dikare hejmara yeketeşeyan zêde bike.

Bo mînak

Dest	yek yeketeşe
Dest – nimêj	du yeketeşe
Dest – nimêj – girt	sê yeketeşe
Dest – nimêj – girt – in	çar yeketeşe

Ket

Ketî

Ketin

Ketinber

Ketindar

Pêketî

Pêketin

Serketin

Dûrketin

lihevketin

Bihevketî

Lihevbûyî

Lihevketî

Lihevxiştî

Lihevcombûn

Lihevhatibûn

Lihevnehatinî

Qertafên Peyvsaz (Derivational Affixes) û Qertafên Peyvkêşane (Inflectional Affixes)

Hinek daçek dema li koka peyvê tîr zêdekirin wateyek nû derdikeve holê loma wekî yeketeşeyên peyvsaz hatine binavkirin. Ev peyva nû ku bi dest dikeve êdî peyveke nû ye û xwedî wateyeke nû di nav xwe de dihevwîne.

Got

Gotin gotin xweş gotinên nû gotinên pêşyan

Gotiyê

Gotar gotarbêj gotarvan gotardirêj

Gotegot gotegotkirin

Gotûbêj gotûbêjker

Anîn ser gotine

Bi nîvdevî gotin

Gotin dirêj kirin

Anîn ser gotina xwe
Gotinên giran gotin
Di guhên hev de gotin

Aramî û *bêaramî* peyvên dijwate ne ev dijwatebûn bi pêşgira nerênî “bê”yê çêbûye.

Mîn û dijmin
Kew û mêkew
Al û heval
Gotin û pêşgotin

Wekî di mînakên jor de jî hatine dayîn pêşgir an qertaf wateyê diguherînin û peyveke nû li zimên zêde dikin û hişmendîya zimên a mirovan him dibe xwedî nerînek nû û him jî dibe peyveke nû ku mirov di nav hevokan de wekî berên dara fikîyan bi kar bîne. Bi pêşgira “dijber”ê wateya dijwateyê, bi qertafa “mê”yê wateya zayendê, bi ya “hev”ê wateya bihevrebûnê û bi ya pêşî wateya demen berê bi awayekî îfadekirina zimên lezgîntir dike. Ev mînakên jor bixwe jî nîşanî me didin hebûna yeketeşe, morfem, peyv, daçek, paşgir, pêşgir û hêmanên peyvan rehetîya îfadekirinek şexsî di asteke kognîtîf de dide mirovan.

Mînak

Ji dêvla peyva “kesên ku mafên me diparêzin” mirov dikare peyva “mafperest”ê
Ji dêvla peyva “çêlika maran” peyva “çêlemar” rehetîya zimên bi zelalî didin me û axaftinek bi peyamên tekûz herikbarîya fikir û ramanen didin.

2.3.2. Analîza Jinûve

Ziman têkiliya di navbera axaftvan û guhdaran de ye. Di serê axaftvanan de, hin raman hene û vana di peyv û hevokan de kod dikin. Ev peyv bi rêya hewayê, li ser kaxizê, bi awayekî elektronîkî an jî dîtbarî ji "guhderan" re tene şandin. Guhdar mecbûr in ku van peyv û hevokan fahm bikin û wan di hevokan de deşîfre bikin.

Guherînên morfolojîk xwe bêtir di reha peyvê de nîşan dide û pêwîst e bê dîtîn. Ev dikare di forma lêker, rengdêr, navdêr, hoker, cînavk an jî di daçekan de bibe.

Minak

Bêt → bê

- **Asta paradîgmâtîk (guherîna rêzimanê)**

Min cîranan dîtî~~n~~ → Mî cîran dîtîn

Wê sevan xwarin → Wê sêv xwar/in

Min sê gotar~~an~~ xwend → min sê gotar xwendin.

Di her sê mînakên de jî, bi lîstîna lêkerê em dikarin yekjimarî û pirjimariya biheserê bibînin.

Şîrove

Dît → yekjimar e

Dîtîn → pirjimar

Xwar → yekjimar e

Xwarin → pirjimar e

- Analîz û sentezkirina mînakên

Ez hez dikim te → ez ji te hez dikim.

Wekî tê dîtîn hevoksazî di rêza peyvan de derdikeve û şûna lêkerê di hevoka ewil de li orteya hevokê ye lê di ya duduyan de li dawîya hevokê ye.

her roj → herro

(her du peyv biyekkirinê bûne peyvek nû lê wate diyar e)

Wekî xuya ye, ziman bi awayekî morfolojîk jî û bi awayekî xwezayî di nav demê de taybetmendiyan nû digirin û cudahiya zimanan li gorî şert û mercan pêk tên. Loma rêgezên morfolojîk jî wenda dibin, lê tê zêdekirin an jî diguherin.

Bo nimûne:

Guhdank

Jiyandar

- **Avakirina analojîk**

Binyada lêkerên bêrist dikare bê nîşandayîn
(biraştin-dibirêje)

- **Yekjimarî – pirjimarî**

Saçlarımı kestirdim. (Min *porên* xwe kurt kirin/da jêkirin)

Boğazlarım ağrıyor. (*Qirikên* min diêşin)

Wekî di mînaka tirkî de tê dîtin, “por” û “qirik” wekî pirjimar tên qebûlkirin û di hevokê de bi vî awayî hatine bikaranîn.

2.3.3. Cûreyên Guherînê

Guherîna peyvan piranî guherîna wan peyvan nîşan dide yê ku îro tên bikaranîn û yê nîşên berê bi kar tînin. Dibe ku hinek peyv wekî hev bin û wateyê biguherînin, carinan jî hinek peyv wateya xwe wenda dikin û êdî bi şiklekî nû tên bikaranîn. Di gelek zimanan de mirov bêtir peyvan kurtir an jî kintir dikin.

Gotin parçeyên herî berbiçav ên her zimanî ne, û mirov bi gelemperî têdikevin bin bandora hêla rastiyan meraqdar û eleqedar dibin da ku têkiliya wan bi têgînên ferhengê (an jî peyva) zimanê wan bibînin. Malperên înternetê hene ku ji bo "bêjeyên herî acizker", "bêjeyên bijare", "bêjeyên mirî", "bêjeyên nû", "bêjeyên xwerû" û "klîşe" û gelek mijarên din hatine veqetandin, hemî eleqeya mirovan a di ferhengê de vedibêjin (Burridge, 2016: 28).

Rola çapemeniyê di guherîna peyvan de gelek mezin e. Xwediyê hîlbijartin û berbelavkirina peyvan bi awayekî hêdî û bi bandor dibin sedema bicîkirina peyvan. Loma rojname gelek bandorê li ser zimên dikin. Hebûna nivîsên cûr bi cûr jî dibe sedemeke mezin ku însan tiştên cuda bixwînin û meraqa xwe têr bikin. Herwiha her sal

ji ber sedemên cuda wekî teknoloji, werger, û înovasyona tiştan, ferheng peyvên nû li korpûsa xwe zêde dikin. Peyvên ku bi saya teknolojiyê zêde dibin para mezin digirin û ew rêjeya herî zêde ne ku têne dîtin.

Mînak

Ji peyva “printer”ê peyva “çapker”ê hatiye çêkirin.

2.3.4. Berhevkirin (Compounding)

Berhevkirin pêvajoya çêkirina peyvan e ku bi berfirehî di zimanên li çaraliyê cîhanê de tê dîtin; Bi rastî, Laurie Bauer (1983) îddîa dike ku zimanekî naskirî tune ye ku kompleksên wan tune be. Pêvajo bi tevlihevkirina du (carinan bêtir) formên serbixwe pêk tê û peyvên nû yên ku wateyeke nû didin derdikevin holê.

Mînak

rojbûn – roja bûnê

paşpirtik - paş+pirtik

paşguhkirin - paş+guh+kirin

Mînakên Îngilîzî

Black + board (textê reş)

Football (goga nigan)

Underworld (binê dinyayê)

2.3.5. Pêvekirin (Affixation)

Pêvekirin pêvajoyek wusa ye ku bi yekkirina peyvan ve girêdayî ye û ew parçeyên peyvan ên ku bi tena serê xwe nayên bikaranîn vedihewîne (Burridge, 2014: 33). Ew pêşgirên ku di destpêkê de têne zêdekirin (bê-, ne-, xe- û re- wek di *bêbextî*, *nexweş*), paşgirên ku li dawiyê têne zêdekirin (-î wekî bextewarî û zimanî) û (her çend kêm be jî) di navgirên ku li devereke nîvê stûyê çêdibin ...in – dihewînin.

2.3.5.1. Vegerandin (Backformation)

Vegerandin stratejiyeke dijberî pêvekirinê ye (Burridge, 2014: 34). Peyv dikare bi pêşgir û paşgiran pêk bê, lê bê wan ji ber vê yekê axaftvan wan paş de vedigerînin da ku axaftvan hinek agahiyan paş vegerînin.

Mînak;

Edit – editor

Gelek kes di gelek zimanan de peyvan kurt dikin. Peyva “editor”a îngilîzî di zimên de bi gelemperî wekî “edit”ê tê bikaranîn.

2.3.6. Veguheztin (Conversion)

Veguheztin bêyî ku tiştek lê were zêdekirin beşek ji axaftinê li ya din diguherîne (Burridge, 2014: 35); Di mantiqa zimên de, mirov dikare heman wateya tiştekî yan jî hevokekî bi hinek peyvên din bidin.

Bo Nimûne;

Bavê min av ji nişka vexwar.

Bavê min av ji nişke kişand/daqûrtand.

Ehmedî diziya kîtabên min kir.

Ehmedî cihê kîtabên min guhartin.

2.3.7. Kurtkirina Peyvan (Abbreviation)

Kurtkirin bi her awayî kurtkirina peyvek an jî bêjeyekê ye. Dibe ku ew ji komê herfên wisa pêk hatibe ku ji varyasyona tevahî ya bêjeyê an peyvê hatibe girtin. Kurtkirin bikaranîna tîpên destpêkê ve tene çêkirin (Fabijanić, 2014 : 146).

Bo nimûne;

YE – Yekitiya Ewrûpa

2.3.8. Herfên ewil yê Peyvekî (Acronyms)

Akronîm cûreyek din a vegotina kurtkirî destnîşan dike, ev bi rastî di sedsala 20an de rabûye (Burridge, 2014: 36). Îja vê demê peyv tenê ji destpêkên peyvên din têne çêkirin - peyva akronîm ji Yewnanî acro 'tip, point' û onym “nav” tê. Ferheng her dem nimûneyên nû yê van peyvan di nav xwe de dihevin:

Tîpên ku nû hatine berhev kirin peyvek nû diafirînin ku dibe beşek ji zimanê rojane.

AIDS - Acquired Immunodeficiency Syndrome

Testa wî ya AIDSê pozîtîf derket û wî şandin nexweşxaneyêke din.

LASER - Light Amplification by the Stimulated Emission of Radiation

Pisîka me ya malê bi listîna ronahiya LASERê pir hes dike.

PIN - Personal Identification Number

Ji bo bikaranîna PINê divê tû herî bankê.

YDY (Yekitiya Dewletên Yekbûyî)

YE (Yekitiya Ewrûpayê)

2.3.9. Tevlihevkirin (Blending)

Ev pêvajoya ji afirandina du bêjeyên (an jî carinan zêdetir) peyvên heyî afirandina peyvên nû vedibêje (Burridge, 2014: 37). Peyva nû ya **portmanto** wê hingê taybetmendiyên watedar ji her duyan vedihewîne.

Minak

Motel = **Motor** + **hotel**

Peyva “motel”ê ji biyekkirina peyvên motor û hotelê tê ku ev jî tê wateya otelên li ser rêyan. Bi vî şeklê gelek peyv derdikevin û têdikevin jiyana me. Û ev jî bi rastî gelek cihên giring digirin.

Di van salên dawîn de peyva “sitcom”ê di gelek zimanan de cî girt, herwiha di kurmancî de jî cî girt. Ev peyv ji îngilîzî derbasî gelek zimanên din bû. Di eslê xwe jî peyvên situation (rewş) û comedy (komedî) pêk tê.

Sitcom = situation + comedy

Mehna peyva sitcomê tê “komediya bi rewşê”.

2.3.10. Gelemperîkirin/Hevparîkirina Tiştan (Commonization)

Mîrov dikare vê wekî kirina tiştêkî hevpar, standart, an gerdûnî pê nase bike: çalakiya hevparîkirina tiştêkî (Burridge, 2014: 38). Yan jî mîrov bibêje bi gelemperî navdêrên xwerû dibin navdêrên hevpar.

Bo Mînak;

Asprin

Marksist

2.3.11. Dubarekirin (Reduplication)

Dubarekirin pêvajoyek dubarekirinê ye ku tê de hemû yan beşek ji koka peyvê dubare dibe, û forma ku tê peyda kirin cûreyeke tevlihev e. Yanî dubarekirin pêvajoyeke morfolojîk e ku tê de reh, kok an jî peyv an jî beşek jê tê dubarekirin (Nadarajan, 2006: 39).

Taşê maştê

Zarok marok

Derew merew

Car caran

Ripîreş

Wekî ji peyvên navborî jî tê dîtin, ji koka peyvê peyvên nû çêdibin û wateya peyvê bi awayekî balkêşî dikişîne.

2.3.12. Deyngirtin (Borrowing)

Deyngirtin pêvajoya hinartina (anîna) tiştên lînguîstîkî ji sîstemek lînguîstîkî bo sîstemeke din e, yanî ev pêvajoyek e ku di navbera du çandan de û di nav demekê de pêk tê (Hoffer, 2002: 1). Deyngirtina peyvan pîranî di navbera zimanên ku bi hev re têkildar

in derdikeve. Ziman bi piranî ji hev peyvan digirin. Deyngirtina fonetîk û fonolojiyê kêmtir e. Herwiha bi awayekî xwezayî jî deygirtin di navbera hevoksazî, morfolojî û watesaziyê de jî pêk tê. Nimûneyên ku bi gelemperî peyvan diafirînin pêvajoyên navxweyî yên zimanî ne; bi gotineke din, ew awayên ku ziman peyvsaziya xwe dewlemend dikin bi xemilandina çavkaniyên ku berê hebûne. Rêyeke din ev e ku mirov li çavkaniyên derveyî mêze bike - berfirehkirina peyvsaziyê bi ya ku bi gelemperî jê re **"deygirtin"** tê gotin, pêvajoya ku zimanek hin hêmanên zimanî ji zimanek din werdigire û digire nav xwe. Gelek kes deygirtina peyvan wekî tiştekî neyinî dinirxînin û bertekên cuda nîşanî hev didin. Helbet gelek însan bi armancên cuda têdikevin nav ragihandin û têkiliyên nû ku ev jî bi xwe bi awayekî xwezayî însanan dixê nav rewşa bihîstin, marûzmayîna zimanan û deygirtina peyvan. Di kurdî û zaravayên wê de, piranî em peyvên ji erebî, farsî û tirkî hatine girtin, dibînin lê herwiha hemû ziman ji zimanên din jî peyvên li gorî çanda wan hene digirin.

Bo mînak;

Peyva “cebîr” û “lîmonê” ji erebî

Peyva “kayakê” ji zimanê eskîmoyan

Peyva “mayonezê” ji fransî

Peyva “arîstokrasî” û “ansîklopediyê” ji yewnanî

Peyva “apraxê” ji tirkî

Hinek mînakên ku gelemperî di kurmançî de tên zanîn ev in:

Ji erebî → cebîr, alkol

Ji çînî → çay

Ji çekî → robot

Ji yewnanî → komedî, tiyatro, sembol

Ji îspanyolî → tornado

Ji fransî → tuwalet

Ji îtalyanî → banka

Ji japonî → emoji

Wekî tê dîtîn deynigirtina peyvan bi giştî diyardeyên zimanan gişa ne û gelek caran tê pênasekirin û dîtîn. Li welatên ku zimanê wan almanî ne, kurdîxêv peyvên ku di çanda kurmançî de tune ne ji zimanê din digirin û ev peyvên nû jî rehetiyek dide îfadekirina wan. Sê¹⁰ peyvên ku di almanî de cîhek giring digirin û ji aliyê kurmancan ve pir tîr bikaranîn ev in:

Sîgorta → kasse

Randevu → termîn

Hesap →konto

Mirov dikare peyvek erebî jî bide ku gelek însan di jiyana rojane de bi kar tînin:

în → cim'he

a) pêwîstiyên cuda (kar, betlane, xwestekên rehetkirinê)

b) tîkiliyên sosyal û cuda (sociolects)

c) kontaktên bi civak û çandên din re; piranî kontaktên guherînên cuda (zarava û zimanên cuda)

d) guherîn bi hêsanî dikare di nav erdnigariya cuda û gerên sosyal de pêk bê. Wekî tê zanîn ger ne tiştek nû ye ji berê de ji bona bazirganî, nexweşî û tedawiyê, ji bona sedemên dînî wekî çûna hecê, koçberî, koça ji ber sedemên xwezayê wekî germa, سرما, erdhej, teqîna volkanan û hwd.

2.3.13. Wendakirina Peyvan (Losing Words – Lexical Mortality)

Peyv bi gelek rêyên cuda wenda dibin. Bê guman divê edîtorên ferhengan ji peyvên di xetereyê de ne haydar bin. Hewce ye ku ew her gav biryaran bidin ka gelo ew peyvekê wekî "arkaîk" an jî "kevnar" dabeş dibin an na. Ew biryareke dijwar e - dibe ku peyv êdî ji bo axaftvanên nûjen (roja me / dema xwe) ne tîkildar bin, lê belê ew ji bo

¹⁰Ev peyvên almanî ku di kurmançî de cîyeke giring girtine ji aliyê min hatine tespîtîkirin.

mirovên ku nivîsên berê dixwînin giring in. Berhemên bi bandor ên edebiyatê, peyvên (leksîkên) ku bi awayekî aktîf bi kar hatine yan jî wenda bûne, didin û îro ew di roja me de tenê bi awayekî nivîskî hene (Burridge, 2016: 43).

Mînak;

encambexş (h. 42: 8)

gelparêz (h. 49: 4)

xweşxane (h. 52: 5)

xewgeh (h. 51: 5)

2.3.14. Pasîfbûna Peyvan (Obsolence)

Pasîfbûna zimên ew pêvajoya ye ku tê de zimanek bi awayekî aktîf nayê bikaranîn û ji aliyê axêverên xwe yê zikmakî ve ji bo zimanekî/zimanên din tê terikandin (Swiggers, 2007: 21).

Heke tişt, raman û sazî êdî nebin beşek ji cîhana mental ya axaftvanan, wê demê ew ê bêne jibîrkirin. Di warên wekî xwarin, jiyan, kar, jiyanî şexsî de, kevnbûna leksîkî dibe ku bê guman be û bibe sedema pirsgerêkan.

Mînakên *Hawarê* ji peyvên berê pasîf bûne û dawiyê jî ji ber nebikaranînê wenda bûne. Bi saya kovara *Hawarê* wekî belgeyên nivîskî di destê me de gelek nimûne hene.

Hinek ji wan jî wiha ne:

xwarbar (h.34: 14)

hevêrk (h.34: 4)

pêşnimêj (h.31: 5)

nêrevan; çavdêr, lênehînêr (h. 30: 8)

guhderz – bîrtîj (h.27: 452)

gejgering (labîrent, tiştê tevlîhev) (h.25: 2)

2.3.15. Kuştina Peyvan (Verbicide)

Verbicide di eslê xwe de tê wateya "kuştina peyvekê (Orr, 2011: 7). Di mecazî de, ew tê wateya berevajîkirin an qelskirina wateya peyvekê. Paşgira “-cide”yê di latînî dê tê wateya kuştinê.

Wekî mînak

herbicide (tiştê ku giha dikujê)

genocide (jenosîd, qirkirin)

matricide (kesê ku diya xwe dikuje)

particide (kesê ku bavê xwe dikuje)

suicide (kesê ku xwe dikuje, întîhar dike)

Yanî mirov dikare bibêje kuştina peyvekê ku êdi wê bi kar neyê. Nimûneyên mîna van rastiyek din a jiyana ferhengî jî diyar dikin - peyv wenda dibin an jî dimirin. Hin warên peyvsaziya me hene.

Nimûneyên ku di *Hawarê* de hene

dijûnker (h.57: 1)

navbir - navbeynkar - qasid - navçîn (h.56: 1)

qerqer - kefen (h.54: 15)

kezebxur (h.54: 13)

mîrathiştî - mîratwer - mîrasxwar (h.53: 1)

2.3.16. Kêmkirin (Reduction)

Kêmkirin awayê guherandina forma peyvê ye (Kuznetsova, 2020: 3). Kêmkirinên zimên di peyvan de dengên wenda ne, ku di zimanê axaftinê yanî devkî de bi piranî çêdibe. Ev kêmkirinên peyvan di her zimanê de gelek berbelavbûyî ne nemaze di îngilîzî de, mînakeke herî berbelavbûyî di filîmîn îngilîzî de derdikeve ev e “going to” dibe “gonna”, “let me” dibe “lemme”, “give me” dibe “gimme”

Mînak;

Di kurdî de "min got" diguhere û dibe "mi go".

Wusa dixuye ji bo salixdana fonetîkî, divê peyvên diyarkirî wekî parçeyeke peyvsaziyê tevbigere bîna bikaranîn (Burridge & Bergs, 2017: 44). “Çawa yî?” dibe “çaway?” bilêvkirin û bankirina “çaway” tenê wekî peyvek tê xuyakirin û rehetiyek dide mirovan.

Peyva “vê” bi taybetî li bîriya Mêrdînê pir tê bihîstin ku ev jî kurtkirin û kêmkirina peyva “vê sibehî” ye. Taybetmendiya zimên ji bikarhêneran tê ku însan van tiştan tercîh dike.

2.3.17. Hevdengî (Homonymy)

Dibe ku bi girtina cudahiya nû du peyvên ji hev cuda yê xwemalî bibin xwediyê heman şikilê xwediyê wateya cihê (homonîm). Em her gav guherîna zimên nabînin. Lê gava ku em dibînin, pir kes bi rastî vê guherînê napejirînin. Ji perspektîfeke sosyo-psîkolojîk, her cûre guherîn bi gelemperî dibe sedema fikar, guman û heta tirs û endîşeyê. Herwiha guherîna zimên di vî warî de ne cuda ye. Di lêkolînek navdar a civaknasîyê de, Milroy û Milroy (1999) kevneşopîyeke giliyê didin nasîn. Wisa dixuye ku ev kevneşopî digihîje sedsalên berê, û ew du hêlên cuda, an cûreyên giliyê hene (Burridge, 2016: 21).

Cudabûn û guherîna peyvan di nav guherînan de ya herî zêde ye û bi rehetî tê ferqkirin. Peyvên nû di zimanê zikmakî de derdikevin. Di lîteraturê de, ji peyvên zimanekî re “leksîs/lexis” tê gotin. Guherîna peyvan bi gelemperî bi sê kategoriyan tê senifandin. “Wendabûna hêmanên peyvan”, “guherîna wateyê” û “afirandina peyvên nû”. Guherîna peyvan di navbera herêmanê erdnigariyê de pir têne dîtin.

Bo mînak, peyva “pir”ê xwediyê du wateyan cuda ye û wateya peyvê ji hevokê tê fahmkirin. Herwiha peyva “şevşevokê” li herêmek din dikare bibe “şevrevînk” li herêmek din “çemçemok” an jî “balçimk” li yekî din. Bi heman nêrînê, mînakek balkêş di îngilîzî de vexwarinek di navîna bakur û di rojava de dibe “pop” di bakura rojhilatê de

dibe “soda”, di rojhilata New Englandê de dibe “tonic” û li gelek cihên başûr de jî dibin “cold drink, drink *an jî* dope” (Carver 1987:268).

BEŞA SISÊYAN

HAWAR Û DANÊYÊN GUHERÎNA ZIMÊN

Wekî me di destpêka vê xebatê de jî diyar kiribû, ev xebatek deskriptîf e. Di vê xebatê de pêwîstiya bikaranîna analîza naverokî (content analysis) heye. Li vir, em ê hewl bidin kurteya sistematîk li ser guherînên peyvan û morfolojîyê derxin; herwiha ev agahî li gorî beş û binbeşan hatine kategorîzekirin û kodên ji aliyê lêkolînerên berê hatine derxistin û hatin nirxandin. Lê tiştê herî giring ku zimannasî ferqeke mezin têdixê zimannasiya deskriptîfê ew e ku ew di zimên de çi dibîne bê mudaxale dişayesînê û wekî presikriptîfê hinek qaîde û rêzikên (rêgezên) zimên li ser însan û axêvêrên zimên mecbûr nake. Lêkolîner ji bo analîzkirina daneyên nivîsê, analîza naverokê wekî rêbazeke guherbar dinirxînin (Cavanagh, 1997: 5).

Em ê daneyên xwe li gorî binbeşên zimannasiyê wekî taybetmendiyên fonolojîk û morfolojîk binirxînin. Wekî xuya ye ev kategorîzekirin wê rehetiya nirxandinê bide ku em bikaribin guherîna zimên li gorî du astên navborî binirxînin. Herwiha bandora zimanên din, peyvên wenda, varyasyonên herêmî, kurtkirina peyvan an jî terciha nivîsandina şiklê axaftinê, avêtina dengên, çêkirina peyvên nû bi peyv an jî pêşgirekî, çêkirin û bidestxistina peyvên bi daçek an jî bi navdêrekî jî wê bêne nirxandin.

Bi rastî jî divê her xebat li gorî dema ku hatine nivîsîn û çêkirin bê fikrîn û kovara *Hawarê* çi taybetmendiyên zimên dide me? Dema mirov wê demê difikire ku dinya bi fikira netew-dewletbûnê ji nû ve dihate avakirin û gelek dewlet sînorên xwe ji nû ve xêzdirin û çêdikirin ku ew dem berî şerê cîhanê ya duduyan bû di demek wiha de – derketina kovareke ku ji her aliyê zimên ve hêzek, nûjeniyek û hêviyekê dide tevdê kurdan. Hejayê gotinê ye ku *Hawar* yekem weşana kurdî ya bû ku cîh nedida zimanê

tirkî û dê di vî warî de cudabûneke zelal nîşan bidaya (Aydoğan, 2014: 140). Loma tenê biryara bikaranîna Kurdî û zaravayên wê, nerînek û gaveke pir pêşeng e di nerîna netweperweriyê de. Celadet Alî Bedirxan di hejmarên kovarê de armanca xwe bi awayekî vekirî nîşan dide û armanca xwe wekî manifestoyekê vedibêje (Hej, 1: 1).

Helbet divê mirov bandora êwra Stenbolê û rewşa edîp û ronakbîrên wê demê jî ji bîr neke. Wê demê Stenbol weke paytextê modernîzmê, hûner û edebiyatê tê zanîn. Di wê demê de, hejmara cemiyetên heyî û karên wan û berhemên ku derdixistin wekî kovar û rojnameyan gelek kesan xistin bin bandora xwe û ew dem bû sedema gelek tevgerên fikr û ramanên nû.

Dema mirov kovarê bi awayekî hurgilî dixwîne û dide ber hev bi awayekî zelal dibîne ku armanca *Hawarê* û naveroka wê bi rastî hem ji bo jinûve zindîkirina zimên û ji bo standartîzebûna zimên gelek giring e. Ji ber ewilbûna bikaranîna alfabeya latinî-kurdî gelek pirsgirêk bi xwe û ji xwe ji holê rabûne.

3.1. Naveroka *Hawarê*

Hawar yekemîn kovara kurdî bi herfên latinî-kurdî ye. Ji ber ku di dîroka nivîsa kurdî de destpêka nivîsa alfabeya latinî-kurdî bi *Hawarê* dest pê dike xwediyê giringiyeke gelek mezin e. Kovarê de em cara ewil xebatên *alfabe*, *rêziman* û *ferhengê* dibînin ku ev wekî standartîzekirina zimên tê qebûlkin. *Hawar* di 15'ê gulana 1932'an de li Şamê derket û heta 15'e Gelawêja 1943yan weşana xwe berdewam kir. Kovar ji aliyê pêşengiya Celadet Alî Bedirxan ve hate derxistin. Kovareke huner û edebî ye. Mijar û nûçeyên di *Hawarê* de hene cûr bi cûr in û ku bi mirov dikare wêneyeke giştî bibîne.

Dema naveroka *Hawarê* ya 57 hejmaran tê nirxandin, mirov dibîne ku kovar di warê naverokî de pir kûr e wekî zanîngeheke perwerdeya hêmanên çandî yên kurdî û zaravayên wê ye. Gelek mijar bi awayekî sistematîk ji aliyê rêvebir û nivîskaran ve hatine nirxandin û dayîn lê herwiha gelek nivîsên cuda jî ji aliyê xwendevanan ve hatine şandin. Herçiqas kovar bi alfabeyeke nû ya latinî-kurdî xwe dide nasîn jî em dibînin ku

di warê ferhengê û rêzimanê de jî gelek xebat hene û bi awayekî jî kovareke edebî, zanistî û çandî ye jî. Geleknivîsên cûr bi cûr arşîveke mezin dide.

Mijarên gelemperî hene wiha ne:

- alfabe
- rêziman
- ferheng
- dîrok
- edet û çand
- huner
- bawerî
- erdnîgarî
- folklor
- wêje
- ziman
- jiyana rojane

Naverok û babeta kovara *Hawarê*¹¹:

- Ziman û millet
- Alfabe û Rêziman
- Ferheng
- Edebiyat û folklor
- Danasîna klasîkên Kurd
- Wergerandin
- Tarîx û Erdnîgarî
- Jiyana civakî û neteweyî
- Kitêbxaneya *Hawarê*
- Nameyên xwendevanan

¹¹<http://www.rupelanu.com/celadet-u-kamiran-bedirxan-1913-1923-salvegera-kovara-haware-418yy.htm>

Dema hinek beşên *Hawarê* bên nirxandin, di nav xwe de dibin binbeş. Hebûn û dayîna binbeşan jî karê nivîskarên kovarê nîşan dide ka wan çiqas bi ked û hûrgilî xebat dane. Ji aliyekî kûrbûnek dide ji aliyekî din tahmek dide xwendevan û fêrxwazan. Dema mirov dibîne ku nivîskar ji welatên cuda ne, û zimanê ku bi kar anîne ne tenê hîlbijartina herêmekê ye, hingê nêzîkatiya edîtorî ji bo yekkirina zimên jî derdikeve, ne hewce ye behsa qebûlîkirin û çapkirina zaravayên din jî bê kirin.

Wekî Mînak

1. EDEBIYAT

Helbest

Çîrok (li goristana Amedê, mehfûr, bêhna gûlê, kêroşk û kêso, rêvî û çûk û fîl)

Xebatên Klasîk

- Mela Ehmedê Cizîrî (h. 33)
- Elî Herîrî (h. 33)
- Feqiyê Teyran (h. 33)
- Melayê Bateyê (h. 33)
- Ismaîlê Beyazidî (h. 33)
- Şerefxan (h. 33)
- Miradxan Bayezidî (h. 33)
- Siyehpûş (h. 33)
- Axayokê Bêdarî (h. 33)
- Mela Yehyayê Mizûrî (h. 33)
- Mela Xelîlê Sêrtê (h. 33)
- Şêx Evdilqadirê Gêlanî (h. 33)
- Şêx Riza Talabanî (h. 33)
- Hacî Qadirê Koyî (h. 33)
- Osman Efendiyê Babîj (h. 33)
- Mela Ehmedê Heyderî (h. 33)
- Mela Ehmedê Xasî (h. 33)
- Şêx Evdirrehmanê Axtepê (h. 33)

- Şêx EvdirrehmanêTaxê (h. 33)
- Melayê Arwasî (h. 33)
- Şêx Abdurrahmanî Garisî (h.25: 3)

Werger

- Nivîsên biyaniyan
- Çarînen Omer Xeyyam
- Tefsîra Quranê

2. Dîrok

Tarîxeq (h. 22: 5)


3. Erdnigarî

Li ser erdnigariyê jî nivîsên qedîrmezî hatine weşandin ku mirov herêma ku kurd lê dijîn nas dike. Di hinek nivîsan de mirov dikare cihekî taybet wekî “Çiyayê Sasonê” û carinan jî devereke din bi hurgilî nas bike. Kovar, Kurdîstanê dide nasîn - ji herêman bigirin heya eşîrên Kurdîstanê, agahiyên populasyonê, agahiyên taybet radigihîne însanan.

4. Agahiyên wê demê ku îro cuda ne

Bo nimûne;

Meletî bajarê herî mezin e ku bi kurdî diaxive û di heman demê de mirov derheqê têkilî û jiyana wir de dibe xwedî agahî.



5. Xebatên çandî

Deşta reşbelek

6. Ol – Dîn

- Êzidî
- Zerdeşt
- Elewî
- Kurdên mesihî
- Wergera qur'anê
- Hedîsên pêxember

7. Edeb û Exlaq

- Rabûn û rûniştin
- Exlaq [kurd û terbiyê]
- Ji bo ciwanên kurdan
- Mahzuwanî – mahzûbanî
- Mêvanperî (la hospîtalîte kurde)

3.2. Sedemên ku Bandorê li Taybetmendiyên Zimannasiya Hawarê Kirine

Gelek faktorên cuda hene ku bandorê li ser guherîna çê dikin. Wekî hatibû îfadekirin faktorên gelemperî ev in; **sîyasî, civakî, çandî, teknolojik, jîngeh û exlaqî**. Faktorên wiha di xwêzayê de dibe ku berfireh û kompleks bin, loma em ê faktorên berfireh yê ku ji ber sedemên civakî pêk tên wekî sîyasî, civakî û teknolojik û yê derveyî bidin ber hev: mirov dikare van sedemên jêr wekî sedemên girîng ku di *Hawarê de* tên dîtin nîşan bide.

1. Erdnîgarî û varyasyon
2. Bûyerên civakî
3. Werger û rojavayîbûn
4. Aborî

5. Îdeolojî

6. Erdnigarî

Helbet zimannas bi awayekî dîrokî li ser guherînê sekinîne û guherîna zimanê xwe û zimanên têkildar û netêkildar şopandine û xwestine çarçoveya vê guherînê derxin. Sedemên civakî di konteksa *Hawarê* de ku dibin sedemên guherîna zimên cûr bi cûr in, hinek ji wan wekî jêr in;

3.2.1. Erdnigarî (Coxrafya) û Varyasyon

Dema ku mirov ji deverekî derbasî deverekê din dibe, mirov herdem rastî varyasyonên herêmî û sosyal tê. Formeke ku ji aliyê însanên deverekê yan jî ji aliyê çîneke sosyal ve nayê qebûlkirin dibe ku li derekê din normal û asayî be. Di lêkolîna zimanan de tiştê herî balkêş cihêrengiya wan e - dema ku em ji welatekî diçin welatekî din an ji herêmekî diçin devereke din, cudahiyên zimên xuya dibin (Saussure, 1915; 191). Her deverek ji ber sedemên xwezayî, cihêrengîniyekê dide mirovan û hertim ev bala mirovan dikişîne. Her guherîn dibe sedema varyasyonên cihêreng. Loma di sosyolînguîstîkê de varyasyon tişteki navendî ye û balê dikêşîne li ser ka çima ev wek tişteke giring û temamker tê qebûlkirin. Di 1960an de, William Labov metodên xebitîna varyasyona zimên pêşxist û ev jî weke şoreşa xebata zimên hate qebûlkirin. Yek ji wan xebatên teswîrî li ser cudabûna zimên, varyasyonên zimên di bin du kategorîyan de dabeş dikirin: varyasyona li gorî “bikarhêneran” û varyasyona li gorî “bikaranînê” (Halliday, McIntosh û Stevens, 1964: 87). Varyasyona li gorî bikarhêneran di nav xwe de hinek taybetmendiyan wekî zayend, temen, çîna sosyal, etnîsîte, perwerde jî dihevin. Lê varyasyona li gorî bikaranînê tenê di axaftina kesane de derdikeve ku ev jî girêdayî rewşan e.

Têgeha varyasyona zimên ciyawaziyên herêmî, civakî, an konteksî di awayên ku zimanek taybetî tê bikaranîn de vedibêje. Hemû aliyên zimên (fonem, morfem, pêkhatiyên hevoksazî û wate jî tê de) di bin guherînê de ne (Barzan & Heydari, 2019; 1). Varyasyona herêmî mirovan têdixe nav nîqaşên li ser erdnîgariya zaravayê ji ber ku diyalektên herêmî tê wateya cudahiyan di herêmeke diyarkirî de. Loma gelek zimannas

û zaravanas (dîyalektolojîst) dever bi dever dîyalektan nexşe kirin û dîkin. Ji ber ku însan li her derê ji hev cuda diaxivin, varyasyonên herêmî derdikevin. Ji bona ku mirov vê guherîna bibîne ne pêwîst e ku mirov zimannas be, gelek însan bi awayekî xwezayî ji van tiştan haydar in. Fikra Chambers û Trudgill (1998: 5) wiha ye: “Heger em ji gundekî ber bi îstîqametekê ve herin em cudahîyên zimanî ku her yek ji gundekî ber bi gundekî din cihê dibin, ferq dîkin. Carinan ev guherîn mezin in carinan jî biçûk in, lê bi demê re ev guherîn zêde dibin. Em çiqas ji cihê destpêka xwe dûr bikevin, dê cudahî jî zêdetir bibin.

Wekî xuya ye ku di navbera mesafe û guherîna de têkilîyek heye. Loma zehmet e ku mirov dîyalektan sînor bike, ji ber rasthatina faktorên erdnîgarîyê wekî çîya, çem, deşt, neval û hwd. Cudahîyên leksîkî di varyasyonên herêmî de xwediyê roleke mezin e, dibêjê Bloomfield (1933). Li gorî wî, berbelavbûna peyvên nû di navbera axêvêran de, meyla însanan ji bo pejirandina têgehên nû dibe sedema varyasyonên axaftinê ku ev jî dibe hebûna cudahîya dîyalektan û Bloomfield (1933: 328) wiha difikire: Sedema vê cudahîya herêmî bi awayekî zelal di prensîpa pirbûna (tîrbûn; yoğunluk) axaftinê de dive bê lêkolîn. Her axêver herdem elimandinên xwe yên axaftinê qebûl dîkin û belkî tiştê herî zêde pêk tê wekî ku frekansa formên axaftinê bêyî devjêberdana yên berê yan jî qebûlkirina yên nû ne ku herdem diguherin. Lê ji bo vê guherîna tu rêzik tune ye.

Mînakên jêr guherîna peyvyan wekî hevwaterê didin. Peyv li erdnîgarîyên cuda carinan wekî hev carinan jî bi tevahî ji hev cihê dibin. Li jêr em dikarin peyvên li hin deveran ku çawa peyvên hevwaterê girtine û carinan jî bi guherîna herf û dengên çawa peyveke nû çêbûye bibînin.

Mînak

çilobûn - çawabûn cudahî (h. 29: 1)

mezel -ode jûr (h. 21: 14)

bêhay (ne haydar) (h. 29: 2)

Mînak

Hinek mînakên ku li gorî deveran wiha ne:

Peyv – minmînîk – kîroşk – şevşevok

1. pelîtank, perperok, baperik.
îdîdok, belîtang, bilbilîtank, belatînk, perperok, firfirok, pepûle, mînmînîk, pirpirok, pirpîrk, pînpînik, pelpelîsk, pilpilîng, perperik, pinpinî, sîperik, belbelîtanik, pirpirînk, pîtanok, mînîk, pirik, perpereng zo/m. 2. hebxurî (nexweşîneke ku li heywanên dikayin dikeve, bi taybetî li kezeba wan) bj/m 3. pepûle, mînmînîk, îdîdok, belîtang, belbelîtanik, perperok, firfirok, pirpirok, pirpîrk, pepûle (tiştê di şeklê pepûleyê de) rd
2.
(i) kergoşk, keroşk, kîroşk, kergoşk, kerguh, kîvroşk, kêwrîşk (lepus europus) zo/m (ii) hostayê kolandinê (ê ku li serdar û textan tiştan dikole, nexş û nimûşan çêdike)
3. şevşevok, şevrevînk, şevşevik, şevşevîng, çekçekûle, şibşibênek, baçermok, pirçemek, çîlî çîlî, bacemok, baçimêlk, balçimok, çeçeqole, berçemik, gaperçêvk, dûvmesas, şebşebok, şevêkur, şîvînek, perçîmek, balçimk, pêrçem, pêrçenk, çîl (vespertilio) zo/m

Dema mirov rewşa erdnîgariyê binêre, mirov dizane ku erdnîgarîya ku kurd lê dijîn hem li deştê ne û hem jî li derûdorên çiyê ne. Li kêleka împaratoriyan û xaçerêya şaristaniyan, herêma Kurdistanê, "welatê kurdan" e, bi giştî çiyayekî bi qasî 200,000 kîlometre çargoşe ye ku dikeve nav sînorên dewleta niha yê Tîrkiye, Sûriye, Iraq, Îran, Sovyeta berê, komarên Ermenîstan û Azerbaycanê (Dahlman, 2002: 271). Helbet ragihandin û danûstendina di navbera eşîran de li gorî erdnîgariyê diguhere. Ragihandina ku di navbera eşîrên li serê çiyê pêk tê, li gorî ku yên li deştê tê, ji ber erdnîgariyê, kêmtir in. Loma guherînên cuda di navbera eşîrên çiyayî de pêk tên.

Wekî mînak, li Mêrdînê dema mêvan dere mala eşîrekî cara ewil xwedîyê malê dide pêşîya mêvanan ji bo ku rêya malê û odeya ku wê lê bê rûniştin nîşan bidin. Lê cara

duduyan ku mêvan herin heman malê îja mêvan dide pêş û xwedîyê malê li paş dimîne ji ber ku êdî mêvan malê dizane. Lê ev tevgera ji mêvanan ku tê nîşandayîn dibe ku li eşîrekê li Duhokê yan jî li Mahabadê tune be. Îja ev taybetmendiyên ku ji ber çandê derdikevin helbet xwe di zimên de jî nîşan dide. Lê bandora zimanê eşîrên çiyayî dibe ku li gorî yên deştê kêmtir be. Ji ber ku asta ragihandina deştê bêtir e bandorê li ser civakê jî di hewlekê bêtir de ye. Di ser re, mirov dikare bi rehetî bibîne ku guherîna zimanê li eşîreke çiyayî li gorî ya deştê kêmtir diguhere, dengên xwe diparêze, hevoksazî kurttir e û axaftin bêtir li ser meyla lêkeran e, înovasyona leksîkî li gorî deştê kêmtir e û herwiha drîfta semantîkî xwe di peyvên û wateyê de dikare bide nîşandayîn. Lê li deştê ev rewş cudatir e drîfta semantîkî dikare bibe sedema guherînê. Hevoksazîya axaftinê deştê cudatir in wekî hevokên kompleks, têgehên navdêrî, û cûreyên peyvên zêdetir balê dikişînin. Bandora erdnigariyê bi perwerdeyê jî tê dîtin. Loma li her derê varyasyonên herêmî ji ber faktorên erdnigariyê derdikevin pêşîya mirovan.

Ew li gorî xwe xwedîyê taybetmendiyên xweser in. Ji aliyekê îzolasyonek heye û ji aliyekê din jî ragihandineke din heye. Îzolasyon di navbera eşîran de heye ji ber ku edet û çanda eşîran li her deverê taybetmendiyên çandî dihewîne. Taybetmendiyên ku di devokên yek gundî de tene dîtin, dê dîsa li herêmeke cîran derkeve, lê tiştek tune ku bi taybetî rêjeya vê guherînê zêde ye û nîşanê me bide her taybetmendî wê bigihîje heta ku derê û çiqas dûr e (Saussure, 1915; 201).

Varyasyon di her zimanê de hene, û reng û dengê zimên bi awayekî balkêş nîşan didin. Mirov nikare varyasyoneke herêmekê bi ser yên din re bigire, ji ber ku giş ji ber sedemen xwe rast in û bi wî şiklî di nav civata ku tene bikaranîn de wateya xwe digirin. Di *Hawarê* de, em bi rehetî li gorî nivîskaran dibînin ku her nivîskar peyv an jî hemanên zimên li gorî çand, devok yan jî bawerîya xwe hilbijartine û ji ber terciha peyvên jî ti pîrsgirêk tune ne. Di helbesteke Osman Sebrî de (h. 53: 2) de, ku di *Hawarê* de hatiye weşandin, du peyvên cuda ji bo “pinpinîkê” hatiye bikaranîn, Herwiha di nivîsên din de peyva “pirpirokê” ji aliyê nivîskareke din hatiye tercihkirin û ev nêzîkatîya Bedîrxanî ji bona terciha varyasyonan nîşan dide ku kovar peyv, devok, sentaks û zaravayên gişan wekî rast qebûl dike.

3.2.2. Bûyer û Faktorên Civakî

Guherîna civakî bi entegrasyona civakê di Rojhilata Navîn de roleke giring dilîze û di dewra *Hawarê* de jî ji bo adaptasyona kurd û civakê helbet gelek rewş hatiye nixandîn û pêvajoya bi sedemên faktorên civakî ketine civakê. Guherînên ku di siyaset, aborî û teknolojiyê de pêk tên bi gelemperî dibin sedema guherînên civakî. Guherînên civakî di zimên de guherînan çêdikin. Yanî, gava civakekê dest bi guherînê kir, wê demê guherîna zimên bandorên taybetî çêdike. Hema hema di her civakê de, hin kes xwedan rûmeta civakî, hêz û pereya ne, lê yên din jî di van tiştan de kêmtir in. Dahênana peyvên nû hêsan e: her kes dikare wê bike, û dibe ku her kes bike (MacKenzie, 2014; 91). Di gelek kontekstan de, em dikarin bibînin ku guherîna zimên ji ber sedemên civakî derdikeve hole û ev sedemên civakî peyvên nû li gorî kontekstan derdixin. Ev bûyerên ku pêk tên dibin sedema înovasyona peyvên. Peyvên ferhenga her zimanî dibe mijara herî zêde yê guherînên bilez. Mirov dikare li ser guherînên ku di ziman de çêdibin an jî guherînên di zimanî de, piştî belavkirin an qebûlkirina hinek înovasyonan, rastiyên nû yên zimannasiyê nîqaş bike.¹² Bi saya înovasyona leksîkî hêjmar û rêjeya peyvên jî gelek zêde dibin.

Mirov dikare mînaka spartekê (homework; Hausaufgaben; ödev; (ل واجب يا المنزل) bide.

- Peyva “**spartekê**” di vî deh salên dawî de, di kîtabên nû de hatê nivîsîn û hate tercîhkirin. Piranî wateyeke sekuler dide. Xwendekar jî bo têgihiştîneka fahmkirina baş xwe dispêre spartekê.
- Peyva “**karûmalê**” jî di vî wateyê de wekî alternatîf hatiye dayîn lê bi peyva karê malê re tê tevlihevîkirin û peyva karûmalê wateyeke pir zelal nade.
- Biwêja “**dewrê xwe bixwînin**” peyveke ku koka xwe ji medreseyan girtiye. Ji bona fahmkirina wateya vî peyvê hewce ye sîstema perwerdeya medreseyê bê analîzkirin. Ji ber ku perwerdeya medreseyê li ser zimanê alfabeya erebî bû û perwerdehî girêdayî perwerdahiya zimên bû, perwerdehî bi xwendin û jiberkirinê pêk dihat û mixabin nivîsîn, axaftin û wateya peyv û hevokan bi temamî nedihat

¹² Maria Laura RUS, *lexical innovation* mêjû û seeta gihiştinê 25.08.2021 seet 15:07
http://cis01.central.ucv.ro/litere/onomastica_lexicologie/revista_scol_2008/maria-laura_rus.pdf

hînkirin. Sîstem bi temamî li ser jiberkirinê bû loma hertim xwendekar, şagirt û zarok divê pexşanên dersê dubare bikirina û ev pexşan hertim xwe dewrê demekê din dikirin. Loma ev çalakî wekî “dewrê xwe bixwîn” dihate pênasekirin.

- Mînakek din ji bo vê rewşê jî peyva “**xebata malê**” bû ku ev jî wekî wergera zimanên din an jî alternatîfeke din hate dayîn.
- Peyva “**ödev**”ê jî bi tirkî ye û gelek kurdên bakur li gelek herêman de vê peyvê ji ber bandora perwerdeya fermî ya tirkî bi kar tînin. Û peyvek ku pir bê bihîstîn û gotin êdî dibe malê ziman û çandên din jî. Peyva “ödev”a tirkî ji lêkera “öde”yê tê. Wisa tê îddîa kirin ku ev jî ji “devoir”a fransî ku wateya wê “tê” hatiye.

Mirov dikare bi awayekî zelal bibîne ku gelek sedemên civakî peyvên nû li gorî konteksên xwe xwe didin nîşandayîn. Têkiliyên mirovan di guherîna zimên de bi taybetî di jiyana bajarvaniyê (urbanization; kentleşme) de gelek tê dîtin. AVM, (cihên axaftinên rojane û yên ciyê bazirganiyê ne). Wekî tê zanîn AVM êdî bûne cihê gelek tiştên rojane û sosyal. Loma gelek kes ji bo îhtiyacên xwe êvaran û dawiya hefteyên berê xwe didin AVMyan (Labov, 1966: 169)

Heyranmayîna kesên navdar ku di televîzyonan de gelek caran derdikevin (bi zanebûn yan bêzanebûn) bandorê li ser ciwanan dihêle û zimanê zarokan bi xwezayî diguhere. Kurdiya Televîzyonê û yên saziyên akademîk wekî xwendekar û lêkolînerên akademîk ên Zanîngehên Dicle, Artuklu û yên din bandorê li ser gelek kesên nû dihêlin. Ji ber ku di nav pêvajoya afirandina agahiyên zanistê de ne, bi awayekî xwezayî hem peyvan diafirînin hem jî peyvên nû ji wergere têdixin nav zimane kurmancî, zazakî, soranî û hwd. Peyvên “ezmûn”, “spartek”, “şiyawerî”, “parastina tezê” hinek mînakên afirineriya vê pêvajoyê ne. Tiştê herî zêde bandorê dihêle televîzyon e, ji ber ku însan hemû li malên xwe gelek seetan li ber televîzyonê derbas dikan. Mirov dikare peyva “spas dikim”ê wekî mînakek balkêş bide, di destpêka weşana televîzyonên peykî de ev peyv bela bûbû, gelek kes vê peyvê bi bertekên cuda wekî erênî û neyînî dinirxandin. Lê ji ber ku gelek caran peyv hatin dubarekirin êdî bikaranîna peyvê û peyvên nû bi vî awayî hatin qebûlkirin û niha di nav civakê de cihekî mezin digire.

Parçebûna zimanan û afirandina zimanên nû tiştekî ku ji mêj ve heye û hêj jî didome. Di malbata zimanan de, ev wêrarbûn û parçebûna wan bi zelalî dixuyê. Zimanek dikare bibe du yan jî sê zimanên nû ku axêverên zimên bibin grûbên nû yan jî têkiliyên wan di nav grûbê de nemîne.

Bo nimûne

latinî	>	fransî, îspanyolî, katalanî, romanî, ...
îngilîzî	>	brîtanyayî, amerikanî, afrikaya başurî, . . .
zimanên îranî	>	farsiya modern, kurmancî, ...

Mirov têkiliya di navbera zimanan de ku çawa zimanek bûye sedema afirandin, wêrarbûn an jî guherîna zimanekî din. Minaka latinî pir balkêş e îro wenda bûye, lê di gelek zimanên ewrûpî de bi piranî jî xwe di koka peyvan yan jî wekî herfek kelijandinê xwe nîşan dide.

3.2.3. Werger û Rojavayîbûn

Li gorî Peter Newmark (1988), şopên yekem ên wergerê, di nav Mîrnîşîna Misira kevînar de di 3000 sal BZ de têne dîtin. Yanî ev derûdora 5000 hezar sal in ku werger li gorî zanîna me, di navbera zimanan de aktîf e û zimanan diguherîne. Ev guherîn jî ne tenê zimanî ye. Tiştê ku em baş dizanin ku ew di heman demê de guherîna civakê ye. Gelek nivîskarên neteweyên cuda ên wekî alman, rûs an jî frensî bi nivîsên xwe bandoreke mezin li ser civakên xwe kirine. Lê ev bandor tenê li welatên xwe nemane û li gelek welatên din de jî têne dîtin û belav bûne. Ev guherîn li welatên xwe û yên dinyayê têne axaftin, têne nîqaşkirin. Berbelavbûyîna fikir, raman û xebatên civakî, çandî û edebî bi rêya wergerê pêk tê. Werger tenê wateya hevokan neqil nakê lê di heman demê de zimanêke nû li gorî hişmendiya zimanê çavkanî diafirine. Ew zimanê nû herçiqas li gorî zimanê armanc jî be, peyv û têgehên nû divê ji nû ve bên çêkirin an jî peyvên ku hene li gorî wateyêke nû divê bên organîzekirin. Îja di dema nivîsandina kovara *Hawarê* de, Dewleta Osmanîyan nû hilweşiyabû, Komara Tirkîyeyê jî nû ve hatibû avakirin û دنیا di nav nûçêkirineke civakî de bû. Ev bûyerên civakî divê baş bên îfadekirin loma bi hebûna çapxaneyê jî gotin wenda nedibû û bi rêya nivîsê li her derê dihate xwendin û

bihîstin. Ev pêvajoya guherînê, bi saya wergerê, ji ber sedemên gelo mirov û civak wê xwe bo mînak li Ewropayê adapteyî têgehên nû bikin an nekin di gelek sazî û dezgehên dewletê de pêvajoyeke pir giring bû. Di wê demê de, guherînen sîyasî, bi awayekî, peyvên nû jî afirandin û xwendevanan motive kir ku ev peyv bi kar bînin. Mirovan xwe mecbûrî nirxandin û axaftina van peyvên dîtî. Adaptasyona peyvên, fahmkirina wan û bikaranîna wan helbet ne pêvajoyeke rehet û lezginî ye. Ji bona ku peyv û têgehên ku bi rêya wergerê ketine zimên di nav civakê de bînin axaftin, ku nirxandin bibe xwedîyê wateyê jêner, dem lazim e. Sedemeke giring ya guherîna zimên ji bo kurmancî werger e, anku wergera tegehên nû (Öpengin, 2007: 89). Ji bilî wergerê, hunermend, nivîskar, helbestvan, dersdar, mamoste, civaknas, rojnamevan û akademîsyenên serî li deynigirtina peyvên jî daye. Ji bo parvekirineke global, însanan xwe di nav pêvajoyeke wergerê ya her daîm de dîtine. Yanî yan werger yan jî deynigirtina peyvên alîkarîya îfadekirinê kir lê di heman demê de guherînek jî pêk anîn. Celadet Alî Bedirxan û hevalên wî yê ku di *Hawarê* de werger kirine, bi taybetî jî Kamiran Bedirxan, di vê pêvajoyê de bi saya wergerên ku di *Hawara* xwe de kirin, gihîştin hawara kurdan û gelek peyv, têgeh û bêje hatin çêkirin. Kamiran bi wergera çarînen Xeyyam, wergera Quranê, hedîsên Cenabê Pêxember; Celadet jî bi wergerên ku ji aliyê nivîskar, dîroknas û akademîsyenên biyanî hatine nivîsîn û wergera nûçeyên girêdayî şerê cîhanê ya duyem çêkir. Bi rastî helwesta kovarê sekinek an jî rawesteke şexsî bû, takekesî bû. Lê gelek kesên xwende bi saya wergerê dest bi gihîştina peyamên avantajê wergerê bûn. Ev bi xwe jî, gelek tiştên ku guherîna civakî çawa hatiye îfadekirin, nîşan da. Gelek peyvên nû ketin nav zimên û bandor li şevbiherkên însanan kirin heta ku zarokan bihişmendî an jî bêhişmendî ev peyv bi kar anîn.

Wekî sedemeke vê yekê ku mirov dikare nîşan bide meyla “Rojavayîbûnê” ye. Ev meyl ne şibandina rasterast e, piranî meyleke global e ku kurd bikarin ji fahmkirina bûyer û mirovan dikare bibêje ku ev pêvajoyê bi guherîna alfabeyê ve rehetir bibe. Piştî guherînê jî adaptasyona alfabeyê jî bo adaptasyona perwerdê hewleke giring e. Tê zanîn ku “ziman” jî bo neteweyekê pir jêner e. Her netew bi zimanê xwe derdikeve pêş. Destpêkirina guherîna alfabeya Mîr Celadet Bedirxanî pêşîya guherîna alfabeya Tirkîyeyê ye, lê belavkirina alfabeyê bi weşandina *Hawarê* ye. Bi awayekî, *Hawar* dibe

fermîkirina zimên. Ev meyla *Rojavayîbûnê* ne daxwaza bi tevahî ber bi guherîna Rojavayê ye û ne jî teqlît û wekhevîbûna Rojavayê ye. Armanca vê wergirtina sûdê ji çavkaniyên Rojavayîbûnê ye. Lê li vê dinyaya ku êdî diguhere, asteke nû ye ku *Hawar* hem bi bûyerên dinyayê û hem jî bi perwerdeyê dixwaze kurdan jî ji vê demê kêmtir nehêle.

Her ziman bi nêrîneke bêhempa ya li ser cîhanê, bi pergala bawerî û wêjeyê ve girêdayî ye, bêtir ku wêje were nivîsandin an nenivîsandin. Zimanek, encamdana bi hezaran salan a serpêhatî û bîra gel e. Mirov, bikarhênerên zimên in û kîjan zimanî ew hilbijêrin û çawa bi kar tînin biryarên wan ên şexsî ne - ew tercîh û hilbijartinên ku ew bi kar tînin li ser bingeha takekesî ne û wan rojane dikin. Ev di dawiyê de diyar dike ka zimanên wan dimirin an geş dibin (Kulick, 1994: 7). Werger jî rêyeke ji van e ku tê da ziman xwe dide nîşandayîn û berdewamkirin.

Gelo ev meyla rojavayîbûnê çi ye? Bi guherîna alfabeyê êdî mirovên ku derbasî alfabeya nû bûn, bûn xwedîyê derfetetên nû ya haydarbûna jîyana rojava ku wekî parzemîn xwedîyê dîrokeke dirêj ya edebîyat, hûner, tevgerên mezin û gelek bûyerên civakî ne. Werger hem di *Hawarê* de hem jî bi her awayî êdî dikaribû gelek fikir û ramanan bigihanda kurdan. Di *Hawarê* de, wergerên nivîskarên biyanî di derheqê kurdan de gelek tişt nivîsandibûn, tişteki sereke bû ku di wê demê de hate weşandin. Nêrîn û fikirên wan bi zimanekî din hatibûn nivîsîn, êdî bi saya wergere xwendevan dibûn xwedîyê perspektîfên nû. *Hawar* ne bi tenê manifestoya zimanê kurdî û kurdariyê nû ye û ew herwiha piyê çanda kurdî ya ewropî ye jî (Aydoğan, 2014: 175). Weki Aydoğan îfade dike bi saya kovarê em peywendiya rojavayê bi wergerê bi dest dixin. Li gorî Akbari (2013: 13) hinek binyad hene ku mirov bikare temaya welatan fahm bike, yek ji wan jî çand e. Dibe ku çanda netewekê bi çandên din re têdikeve nav hevragihandinê û ev jî dibe sedema çavvekirina mafên mirovan, û fahmkirina varyasyonên çandî.

Mînakên Peyvan ji Şerê Cihanê yê Duduyan

- hesincawên nû
- stoleke biçûk
- tersxane
- hicûma miqabîl
- cengkeştî
- çek û ceberxinan
- dewletên mihwerê
- balafir-geh - balafirên şer
- noqar
- enî
- keştiyeke balafirhilgir
- ebloqe
- bombavêj
- filûqe
- cenkeştîyên emêrîkanî
- qewetên mekanîkî
- berqerekola amerîkayê
- bin av kirin
- bendera nûyorkê
- aletên torpîlavêj
- barafirhilgir
- noqarhilgir
- mirovdewletên îngilîzî
- kilîta behran
- vapor (a barkêş)
- piştîmêrinê nû
- avteng
- torpiyor û bertorpiyor

- vaporqefleyên me
- xudanbehr
- peraşûtîstên ingilizî
- erkanherbiya emerîka
- bejteng
- balafîrşkên
- torpîlavêj
- hêsirgah
- qewetên bej û behr û hewayê (herbî, behrî, hewayî)
- eskergeh
- deştegah
- girtinhevên
- zirehpûs
- ..rabûn berhicûmê
- perherbûrê (Pearl Harbour)
- vaporên binavbûyî
- petrolkêş
- dewletên mîhwerê
- wezîrxariciyê rûsyê
- wezareta midfehê
- berevanî
- sîwanvaniyan girava giritê
- tîfîngekî timatîk
- balafîreke bombavêj
- îlanherb kirin
- zewiyên lexemkirî
- mitik xistine destên xwe
- pardarî
- bombaran

- şargeh
- pasban û notirvan
- serfermandarê qewetên frensizî
- kûlnêl [colonel ji îngilîzî]

Navê Welat, Neteweû Bajaran bi Kurdî

- Tayla – Îtalya – Talyan
- Rûsya – Êris
- Germenîstan - Eleman
- Hindistan
- Îngilîstan – ingilîz
- Ermenîstan
- Fenlendiya
- Mosko
- Lêneîgrad
- Odece
- Kirim
- Emêrîka
- Okranya
- Japon – nîpon
- Lîbya lîbye
- Verşova
- Polonya
- Romanya
- Norvêç norvêj
- Svîçre
- Denîmerka
- Svêç
- Mirir- şerê mistrê

- Sengepor
- Sîberya
- Pesifik
- Kenadê
- Holende - Holendî
- Ewistralye
- Rohelatê dûr
- Gîna nû
- Menîlya
- Cebeltariq
- Bîrmanya
- Medegeskar - medagaskar
- Filîpîn
- Qevkas
- Ernawidlix - ernewîdlix
- Yewnanîstan
- Hebeşîstan
- Bîngazî
- Trablusxerb
- Brêzilya
- Emazon
- Groznî
- Stalînggrad
- Fas
- Tunis
- Cezaîr
- Efrîqa
- Waşîngton
- Şikago

- Filadalfiya
- Mecarîstan
- Belqan
- Emêrîka
- Frensî
- Qezak
- Ewrope
- Etlantîk
- Birxerîstan-Birxarîstan
- Nû-zeland -Nûzeland - Zelandaya Nû
- Sengepor
- Melêzya

Peyvên ji Wergera Quranê Hatine Qeydkirin

- şikirdar bin
- sondxwarî
- kitêba xwarkirî
- sihrkar û sihrzan
- dînnezan
- tewafker û rûxistiyên di wê.
- dojahketiyan
- peresteşkar û secdekar
- nimêjker
- piyar
- têrçav
- piştixurtî
- têrşerm
- têrxeml
- keremkar

- mehîkê
- xatirniwaz
- pêma xatirniwaz
- pêmayên malbatên mûsa
- abadîn
- dilxwar
- niyazmend
- qencîker
- rêşaşkirî
- ezabdar
- têragir
- qencîker
- şergeh
- di erna xwe de bifetisin
- dilxar
- dilgirtî
- têr êş
- têr ex-zab
- keremkar
- rûspîkirin
- tevlokî
- dayende, ango yê ko dide
- têr tirs
- pêşnimêj
- têr av
- pakbeden û pakdil
- destbelaviyê nekin
- perengên dojahê
- wesiyetdêr

- mirathiştî
- têr kanî
- cegersûz
- behirdar
- dijûnker

Mirov baş dizane ku ji zimanê îngilîzî, fransî û latînî gelek peyv derbasî zimên bûn, hinek bi temasa zimanan hinek jî bi wergerê. Gelek salan latînî li Ewropayê wekî ders dihate xwendin loma îngilîzî û fransî ji latînî gelek peyv girtin (Larsen-Freeman û yên din, 2011; 31). Ev pêvajoya peyvgirtinê yan bi guherînê yan jî bi çêkirina mentîqa zimanan bû. Ji xwe zimanên wekî latînî û yewnanî wekî yên klasîk dihatin qebûlîkirin û hînîkirin. Loma bandora wan li ser îngilîzî gelek çêbû.

3.2.4. Îdeoloji

Pirî caran, guherîna zimên xwediyê cûreyeke rehên siyasî yên wekî koçberî û dagirkirina mirovan e. Gava ku mirov diçin welatekî û zimanekî nû fêr dibin, ew, zimanê xwe yê pejirandî bikêmasî fêr dibin. Dûrre ew van kêmasiyên sivik derbasî zarokên xwe û kesên di çerxa wan a civakî de dikin, û di dawiyê de ziman diguherin (Aitchison, 1991: 109). Wekî dîyar e guherîna zimên di navbera nîfşan de pêk tê, û ziman çiqas bê bikaranîn wê guherîn jî zêdetir bibe. Dema *Hawarê* jî, Bedirxanî hewl da ku kurmancî wekî zimanekî cîhanî (global) di bingeheke wekhev de digel zimanên Ewropî yên ku wê demê di teknoloji (amûrên şerê cîhanê) û çandê de serdest bûn, saz bike. Ji bo vê jî, ji gelek tiştan sûdê wergirt û bi saya nivîsarên kovarê jî gelek peyvên ku afirandîbû di zimên de cî girtin. Helbet destpêka alfabeyeke nû bandorê li ser telafûzê nekir lê ortogirafiya heyî guhart. Alfabeyeke nû ji bo hemû herfan tiştên cuda dida û destpêkirina alfabeyeke nû derfetên nû jî dida însanan da ku herfên xwe bi rehetî bi kar bînin. Alfabeya aramî di hinek herfan de kêma dima, lê adaptasyona latînî-kurdî rêya gelek tiştan vekir. Mirov dikare Başûr û Rojhilat ji ber bikaranîna alfabeya soranî û Bakur û Rojava ji ber bikaranîna alfabeya latînî-kurdî bide berhev û têkilîyên zimên bi vî awayî binirxîne. Helbet alfabeya aramî û latînî-kurdî hinek cudahîyan dide ber çavan.

Alfabe bandora cudahîya hem nivîsê hem jî bi taybetî ya çandê dide û di nav xwe de diheve. Cudahî dibe sedema hayjêbûnê (jêhaybûnê; perception) ye. Nivîs bikaranîna axaftvanan dide, axaftin peyaman di her astê de dide, guherîn ji kesan derbasî civakê dibe, yanî guherîna zimên dawîya dawî dibe biryara civakê ku civak zimanê xwe li gorî daxwaza xwe bi kar bîne. Ev guherîn di axaftin û nivîsê de xwe nîşan dide. Ev guherîna ku di her qada axaftinê de xwe nîşan dide, bi awayekî vekirî û veşartî dê tesîrê li ser mentîqa zimên jî bike û piştî demekî di çandê de jî xwe bi cih dike. Mînakê ku di 30 salên dawî de xwe hem di axaftinê de hem jî di xebatên nivîskî de nîşan dide ev e:

Derûdora 30 salên berê di rojnameyên kurmancî de ji bo nivîsa rojane ya sistematîk îfadeya “rojane girtinê” (to keep a diary; ein Tagebuch führen; günlük tutmak) dihat bikaranîn, dawiyê li gorî mentîqa tirkî ev bû “rojgirtin”. Û ev texmînî 10 sal in ku êdî gelek kes îfadeya girtina rojnivîsk/rojenivîsk an jî rojnivîsê bi kar tînin.

Rojane (günlük; daily)

Rojgirtin

Rojnivîsk – rojenivîs

Mirov di her zimanê de dikare gelek guherîn û varyasyonên wiha bibîne. Loma çavdêriya guherîna zimên di vî warî de gelek giring e.

Dagirkerî sedema asayî ya serûbinbûnê ye, lê dibe ku ew jî bi navgîniya aşitîxwazî di forma kolonîzebûnê de were. An jî eşîrên koçer dikarin zaravayên xwe bi xwe re bibin. Tiştê ku qereçiyên (çîngene) kirin, nemaze yê ku li Macarîstanê bi cih bûne, ku wan li wir gundên tevlihev çêkirin ev bû. Lêkolîna zimanê wan destnîşan dike ku divê ew di demên berê de ji Hindistanê hatibin. (Saussure, 1915; 195). Ev hewldanên ku li jor ji bo ziman, wêje, alfabe, rojavayîbûnê giş bê hişmendî di bin tesîra pêvajoya ku tê de jî dimîne ku ew dewr jî dewra şerê cihanê ye ku gelek netew hewl didin ku welatê xwe ava bikin. Netewbûn bêhişmendî bi rêya ziman, wêje, dîrok, çand û hwd dibe îdeolojiya neteweyan. Carinan tercîh ji zaravayê herêma ku şaristanî lê pêşkeftîr e an parêzgeha ku serwerêya wê ya siyasî heye û hêza navendî digire destê xwe (Saussure, 1915; 195). Hebûna hêzê dibe sebeba bikaranîn û guherîna zimanê ku hêza otorîteyê

dikare ji bo zarava û devokan biryarê bide. Ziman bingeha herî mezin ya neteweyekî ye ku bikaribe çanda xwe bi hebûna neteweyê biparêze.

Wekî berê jî hatibû gotîn, di her zimanî de cûreyên gelemperî ku xwe nîşan didin ev in: cûreyên peyvan (lexîs), watesazî (semantîks), fonolojîk (phonology) û hevokî (sentaksî). Tiştê xwezayî ev e ku ev cûre dibe ku kompleks be.

3.3. Alfabe

Di dîroka mirovahiyê de, hinek netew alfabeya xwe ji ber sedemên ne wekî hev li gora dema ku tê de bûne guhartine. Em dikarin îddîa bikin ku her netew herî kêr du an sê alfabeya xwe bi kar anîne û li gora demê bi biryara sîstem, partiya serdest û serokên xwe alfabeya ku bi kar anîne û guhartine. Yek ji wan jî mînaka guherîna zimanê tirkî ye ku ji alfabeya aramî derbasî latînî bûne û ev guherîn di gelek gotar, tez û pirtukên zimannasiyê de jî cihê xwe girtiye. Mîna keke din ji ku di medyayê de gelek cî girt biryara hikûmeta Kazakîstanê ye ku ji alfabeya kirîlî wê heya 2025an derbasî alfabeya latînî bibe. Kazakîstanê pêşiya alfabeya kirîlî, alfabeya aramî bi kar dianî. Di nav sed salî de ji ber sedemên hukimdariya welatên cuda, bikaranîn an jî mecbûrmayîna hîlbijartina sê alfabeyên cuda ji bo neteweke li Rojhilata Navîn pêkan e. Li ser vê nûçe û agahiya guherîna alfabeyê gelek şîrove hatin kirin û wekî sedem jî di nûçeya jêr de sedemên girêdayî siberoja Kazakîstane hatibûn kirin.

Qazaxistanê biryar daye ku alfabeya xwe heya sala 2025an, ji kirîlî bike tîpên latînî. Piştî dehsalên serdestiya Rusya û Sovyetê, her çend hin ji vê guhertinê aciz jî dibin welat kodên xwe yê çandî pêşve dibin. Lê belê alfabeya latînî dê tenê entegrasyona navneteweyî ya Kazakistanê û pêşkeftina wê ya aborî, teknoloji û zanistî xurt bike.¹³

Cudahiya guherîna alfabeya latînî-kurdî ji bo kurdan li gorî yê din gelek cuda û balkêş e. Biryara guherîna alfabeya tirkî ji aliyê serokê Komara Tirkîyeyê Mustafa Kemal Atatürk, ya Kazakîstanê jî ji aliyê serokkomar Nursultan Nazarbayev lê ya

¹³<https://www.atlanticcouncil.org/blogs/ukrainealert/by-changing-alphabet-kazakhs-take-another-step-toward-the-west/> 14.08.2021 dema gihiştinê 23:47

kurdan ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve bi saya derxistina kovarekê pêk hatiye. Celadet Alî Bedirxan wê demê ne serokkomar an jî serokwezîr e û ne jî serokê partiyeke siyasî yan jî tevgerekê ye. Ew neviyê (torinê) Mîr Bedirxan e û entelektuelekî serkeftî ye ku xwediye gelek şîyanên encamgir e. Loma guherîna alfabeya netewekî bi vî rengî gelek zehmet e û biryara wî li her parçeya ku kurd dijîn û perwerdeyê digirin ne wekî hev e. Ji xwe karê adaptekirina zimên bi xwe jî karekî zehmet e, lê nivîsên li ser alfabeyê hejmar bi hejmar xwendevanan û milletê kurd bi her awayî qanîh dike û rêya alfabeya latinî-kurdî vedike. Sedema wî ji bo guherîna alfabeyê ne tenê ew daxwaza wî ye ku peşveçûna gelê kurd têxe nav têkiliya Rojavayê, lê di heman demê de ji nenivîsandina dengdarên erebî ne. Di zimanê erebî de, peyvek bê dengdêran dikare wateyên şaş bide însanan.

bo mînak;

şer, şor, şûr.

Tenê hebûna herfên”ş” û “r”yê dikare hinek tevliheviyan zêdetir jî bike. Ev nîqaşek e ku di kovara *Jînê* de jî dihate behskirin (Bozaslan, 1985: 6). Li gorî nîqaşê, di zimanên Samî de, hinek dengdar û dengdêrên ku di kurdî de hene, tûne bûn. Dengdêrên kurt, bi gelemperî nayîne nivîsîn. Ev jî herwiha dibû sedema pirsgerêkan.

Hinek peyvên ku tevlihev dibûn wiha ne;

Ker – kir – kur

Şêr – şîr – şer

Şor – şûr

Loma fikra gelek kesan ev e ku alfabeya ku *Hawarê* wekî latinî-kurdî hîlbijart ew tevlihevî giş ji holê rakirin û xwendin û nivîsandina kurdî pir rehet û zelal kir.

Hewldana Celadet Bedirxanî li ser alfabeyê di panzdeh hejmarên *Hawarê* de berdewam kir. Wî herf yek bi yek bi mînakan û li gorî taybetmendiyan xwe da nasîn. Herwiha wî berawirdkirina dengdar û cudahî û taybetmendiya wan nîşan da. Ji bo her herfekî agahiyên wekheviya wan li gorî zimanên din û li gorî devok û herêman diyar kir û da ber herfên zimanên din. Bo mînak “î” ya kurdî wekî “i”ya dirêj ya tirkî tê

nîşandayîn. Em dibînin ku heya ji destê wî hatiyê Celadet Bedirxan alfabeyeke fonetîkî bi kar aniyê da ku herikbariya zimên wenda nabe. Carinan hinek *allofonên* dengan bûne sedema tevliheviyê û wî jî hewl daye ku vê tevliheviyê ji holê rake. Wî bi gelemperî, biryara xwe li gorî kurdî daye lê wek ku ew bi xwe jî dibêje ji bona ku kurdên bakur bi rehetî fêrî alfabeyê bibin, wî di hin tiştan nêzîkatiya alfabeya tirkî kiriye. Helbet di her alfabeyê de pirsgirêka dengan çareser nabin, dengên cuda û herêmî hene û di berhevkariya xebatên folklorê de jî hinek pirsgirêk derdikevin pêşîya lêkolîneran û hêj jî ev nîqaş didomin.

Mînakeke giring ku mirov dikare lê binêre alfabeya Litvanî ye. Ji ber ku gelek deng di alfabeyê de hene (Subačius, 2005: 22); mirov dibêje belkî ev ê bibe sedema hinek pirsgirêkan, lê ji aliyekî din jî pirsgirêkên ku ew ê derkevin safî dibin. Alfabeya wan wekî jêr e;

Lithuanian alphabet (lietuvių abėcėlė) & pronunciation

A a	Ą ą	B b	C c	Č č	D d	E e	Ę ę	Ė ė	F f	G g
a	a nosinê	bê	cê	čê	dê	e	e nosinê	ê	ef	gê
[a/a:]	[a:]	[b]	[t͡s]	[t͡ʃ]	[d]	[ɛ, e:]	[ɛ:]	[e:]	[f]	[g]
H h	I i	Į į	Y y	J j	K k	L l	M m	N n	O o	P p
ha	i	i nosinê	i ilgoji	jot	ka	el	em	en	o	pê
[h]	[i]	[i:]	[i:]	[j]	[k]	[l]	[m]	[n]	[o:]	[p]
R r	S s	Š š	T t	U u	U u	Ų ų	Ū ū	V v	Z z	Ž ž
er	es	eš	tê	u	u nosinê	u ilgoji	vê	zê	žê	
[r]	[s]	[ʃ]	[t]	[u]	[u:]	[u:]	[v]	[z]	[ʒ]	

Wekî tê dîtin di alfabeya lîtvani de, du cûre “a”, sê cûre “e” û sê cûre “u” hene. Li vir dengên ku di axaftinê de hene, lê di nivîsê de tune ne nehatine nivîsin. Alfabe ji 34 herfan pêk tê. Nîqaşên ku girêdayî hejmara herfan baş e yan jî ne baş e nêrîneke şexsî ye lê bi gelemperî divê herfên heyî têra îfadekirina zimên bikin ku însan bikaribin hest û ramanên xwe bînin zimên.

Di roja me de alfabeya latinî-kurdî li Bakur û Rojava, ya aramî jî li Başûr û Rojhilatê tê bikaranîn. Herwiha li Başûr di van deh salên dawî de gelek kes her du alfabeyan jî bi kar tînin; bi taybetî hebûn û tercîhkirina medyayên civakî, torên medyayê, aplikasyon û bikaranîna bernamêyên înternetê û berbelavkirina alfabeya latinî li Başûr

zêde dike. Dibe ku di demeke nêz de alfabeya latinî bêtir bê tercihkirin û belkî biryarek li ser guherîna alfabeyê jî bê wergirtin. Nivîskar û lêkolînerê dîroka kurdî Ferman Hîdaît li ser guherîna alfabeyê fikrê xwe wiha îfade dike¹⁴:

Dema mirov bi çavekî zimannasî li vê rewşê binêre bi zimannivîsî tîpên latînî dikarin deng û fonetîka zimanê kurdî baştir vebêjin. Kurdî, zimanek hindo-îranî ya malbata zimanên hindo-ewropî ye, ji bo tîpên erebî, ku ji bo zimanên semitîk (samî) hatiye çêkirin, ne guncan e.

Çêkirin û danasîna alfabeyeke nû ji bo kurdî di sala 1932an de û berbelavkirina wê bi kovarê re helbet ne tiştêkî demkî bû; pêwistiya wî karî bi demê ve hebû û bikaranîna wê rîskên gelek mezin di nav xwe de dihebandin. Guherîna alfabeyê dikare bibe sedema hinek şaşiyên rastnivîsa peyvên û ji bona adaptasyoneke baş divê di nav demê de her cûre bûnê dîtin. Terciha bikaranîna herfên “q” û “k”yê heya hejmara 24an berdewam kiriye. Di alfabeya aramî de, ji bo “q” û “k”yê herfên din hebûn lê bilêvkirina van herfan û tespîtîkirina jêderka wan ya devê însanan ne rehet bû. Lê bi bikaranînê hinek tişt serarast dibin. Peyveke ku em îro wekî “dijwarê” bi kar tînin, di *Hawarê* de wekî “dişwarê” hatiye bikaranîn. Herwiha em dizanin li hinek herêman ji dêvla herfa “ş”yê herfa “j”yê tê tercihkirin, lê di nivîsê de bi gelemperî terka peyvên resen hate kirin û niha li her derê peyva “dijwarê” tê dîtin û bikaranîn. Herf û dengê “ş”yê di nav demê de pêkan e ku hatibe guherîn û dibe ku êdî herfa “j”yê rehetiyek bide bikarhêneran. Divê hinek xebat li ser etîmolojiya vê peyvê bê kirin ku wêrarbûna wê bê dîtin, herçiqas di nivîsê de, sedema rewşa vê guherînê bê dîtin hinek tişt guherîna xwe naqedînin.

Mînaka herfa “x”yê jî divê bê nirxandin. Ew bi xwe du dengan dide. Dema mirov peyvên “xerîb” û “xelat”ê bi de berhev wê bibîne ku her du dengên “x”yê ji hev cuda ne. Ya ewil dengê “ğ”ya tirkî dide lê ya duduyan dengê “x”yê bi gelemperî tê bikaranîn.

¹⁴ <https://www.sbs.com.au/language/english/audio/latin-alphabet-is-more-suitable-for-kurdish-phonetics-farman-hidait> 16.06.2021 dema gihiştinê 12:54

Çêkirina alfabeyê li gorî dengên girêdana herî xurt e, ew rasterast girêdana netewê ye. Di her zimanê de, cudahiya erdnigariya netewê jî dide. Di nav zimanekî de jî gelek cudahi û varyasyon hene.

Bo nimune;

Xwîn

Xwun

Xwin

Terciha alfabeya latînî û pênivîsîna her tiştî ne hêsan bû berê li Stenbolê jî nîqaş derketine, li Başûr Tewfîq Wehbî hinek xebatan kiriye û li Qafkasyayê Erebe Şemo û Maragulov li ser alfabeyekê xebitîne û rojnameya “*Rya Tezê*” di destpêkê de bi latînî dawiyê jî li ser qedexerina Stalînî bi alfabeya Kirîlî xebatên xwe domandiye.

Têmurê Xelîl (Boyik, 2019: 462) radigihîne “ku weke tê zanîn kurdiya tîpên latînî ne bi govare *Hawarê* dest pê kiriye û beriya hêj *Hawar* derneketî sala 1928’an ji aliyê nivîskarên kurd Erebe Şemo û Îsahak Marogûlovê ve li Ermenîstanê tîpên latînî hatine bikaranîn û ev ji aliyê Ermenîstan û her wiha Yekitiya Sovyetan ve jî hatiye tesdîqkirin”.

Biryara bikaranîna alfabeya latînî ne ceribandineke şexsî ye lê ji bo milletekî ku bikaribe hem li bakur û hem jî li dinyayê bigihîje gelek agahiyên nû, ew jî mudaxeleyek mezin ya lînguîstîkî ye. Ev ne karekî biçûk e lê Celadet Alî Bedirxan ji ber ku hem entelektueleke ku 7-8 zimanan dizane, bi rehetî dikare pirsgirêkên zimên bibîne û li gorî wan jî tevdiaran bigire. Wî bi saya kovara *Hawar* û dawiyê jî *Ronahiyê* alfabeya ku li gorî latînî daniye bi awayekî sistematîk bi kar anî û hertim bi rexne û pêşniyazan re jî xwendevanên xwe motive dikir da ku ew jî nêrîn û dîtinên xwe binivîsînin. Ji ber ku paşxana wî di warê zanebûna zimanan û teoriya zimanan de xurt e, ew bi rehetî dikare zimanan bide berhev û cudahiya zimanan binirxîne û biryarên ji kurdî bi awayekî kontekstî û li gorî zimanan dinyayê û herêmê jî bibîne. Di hejmara sisêyan de, nivîseke wî li ser teoriya mirina zimanan nîşanî me dide ku Celadet Alî Bedirxan di derheqê teoriya zimên de xwedî agahî û wiha dibêje;

“dîroqa dinê ji me re dide zanîn qo heta niho gelek zmanên din hatine kuştin.

Ji wan zmanen re <<zmanên mirî>> dibêjin (h.3: 36).

Mîr Celadet Bedirxan sedema hilbijartina alfabeya latînî, di kovara *Hawarê* de, hejmara 13an de wiha dibêje:

“Ev elfabêya hanê ko îro em zimanê xwe pê dinivîsin paşîya xebateke salên dirêj e. Di sala 1919an de, me dabû çiyayê Meletyê. Mêcer Newel (Îngilîzek) jî digel me bû. Mêcer zarê nivro dizanîbû, dixebitî ko hînî zarê bakur bibe û ji xwe re her tişt dinivîsandin. Min jî hin medhelok, stran û çîrok berhev dikirin.

Carinan, me li nivîsarên xwe çavên xwe digerlandin, dixwend û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer, bi lêvkirineke biyanî, lê bê dişwarî destnivîsa xwe dixwend. Lê belê ez, heta ko min (Û- □) ji (O- □) û (Î- □) ji (Ê- □) derdixistin, diketim ber hezar dişwarî, ma çîman?

Ji ber ko Mêcer bi herfên latînî, lê min bi herfên erebî dinivîsandin. Ser vê yekê, di cih de min qerara xwe da û ji xwe re bi herfên latînî elfabêyek lêkanî.

Sala 1924an de li Almanyayê, min careke din çavê xwe li elfabêya xwe gerand, hûr lê mêze kir û midêkê xweş li ser xebitîm. Elfabêya me paşîya xebateke sêzdeh salî e, li gor zimanê kurdî, li gor dengê zimanê me ye. Herfên elfabê, berî sêzdeh salan hatiye nivîsandin û gora zimên û dengên wî, hin bi hin edilî û kete hale xwe yê îro. Ez vê elfabêyê ji keda xwe bêtir ji keda miletê xwe dihesibînim û pêşkêşî wî dikim. Ji xwe herçî yê wî ye ji yê her kesî hêjatir û sipehîtir e.”

Îbrahîm Seydo Aydoğan (2014: 158) ji bo hilbijartina alfabeya latînî sê hîpotezan pêşkêş dîke:

1. Hevnasîna Mêcer Newel (Major Noel)
2. Nîqaşa di navbera *Rojî Kurd* û *Yekbûnê* de ku digotin alfabeya erebî têra kurdî nakê
3. Guherîna alfabeya Tirkîyeyê Celadet Bedirxan xistiye bin bandora xwe û wî biryar daye alfabeyeke nû çêbike.

Helbet bandora her biryarekê li ser yê din heye û li gorî Aydoğan her sê xal jî, giring in. Hinek sedemên ku Celadet Bedirxan negotibe yan jî nenivîsandibe jî pêkan in lê wekî di nivîsa Celadet Bedirxanî ya jor de hatiye nivîsîn, bandora mezin hevnasîna Major Noel dixuyê. Herwiha sedem çî be ne giring e tiştê giring ew e ku kurmancî derbasî alfabeya latinî bûye. Nivîsandina dengdêr û dengdaran rehetîyeke berbiçav dide.

Di bikaranîna alfabeyeke nû de, tiştê ku derdikeve pêşîya me jî ev e hinek dengdêr nayên bikaranîn. Ev jî divê ji ber elimandina alfabeya erebî be, di erebî de gelek dengdêr (vowel) nayên nivîsîn.

Bo nimune:

Zman (h.1)

Drêj (h.1)

Drêjahî (h.1)

Blûr (h.1)

Zrav (h.4)

Şqestin (h.5)

Bejnzirav (h.8)

Bo mînak dema mirov bi erebî peyva “Kerîmê” binivîsê, wiha tê nivîsîn.

Peyva “كريم”= Krim. Wekî herfa “e”yê wenda dibe. Herçiqas ev nêrînek be. Celadet Alî Bedîrxanî sedema vê guherînê wiha şîrove dike; ew dibêje dengê “i”yê pir zirav e û di gelek zimanên hînd-awrûpî de jî bi vî şeklî ne; dema ku ev deng derdikeve pir zû derdikeve loma mirov dikare vê herfê nenivîse.

Celadet Bedirxan (h.3: 4) ji bo giringiya alfabeyê fikirên xwe wiha îfade dike; “Yekbûna Kurdan jî bi yekitiya zmanê kurdî çê dibe. Yekîtiya zmanî jî bi yekîtiya herfan dest pê dike”

Di beşên li ser alfabeyê û di hejmarên *Hawarê* de, em rastî agahiyên jêr tî;

Di **hejmara ewil** de, rêza alfabeyê dibînin

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z (h.1: r.3)

Di **hejmara duduyan** de, bi awayekî Celadet Alî Bedirxan manifestoya alfabeya ku wê bingeha wê raxe pêşkêşî me dike. Xalên ku wê li ser bisekine wiha ne;

- 1) Sedem û nêzîkatiya alfabeya tirkan
- 2) Wekhevîna herfên kurdî û biyanî
- 3) Sedema hiştina her dengî bî herfekî re
- 4) Nêpêkanîna nîqaşkirina hemû herfan (50-60 herf)
- 5) Sedema bikaranîna bilindekê (kumik)
- 6) Hilbijartina 31 dengên bingehîn di sê zarên kurdî de

Di hejmara **sisêyan** de, behsa terciha “u” û “û” ye dike.

Di hejmara **çaran** de, berhevdayina “v” û “w”yê dike.

Di hejmara **şesan** de, behsa herfên “j” û “g”yê dike.

Di hejmara **heftan** de, behsa herfên “q” û “k”yê dike. Tiştê balkêş ku em lê heyirî dimînin bi lêkolînên xwe zêdebûn û pîrbûna herfên “q”yê li gorî “k” bi îstatîstîkan (h.7: r. 6) dide ber me.

Di hejmara **nehan** de, li ser dengdêrên kin (e, i, u) û dirêj (a, ê, î, o, û) disekine.

Di hejmara **dehan** de, em dibînin ku CAB li cudahiya dengên “e”, “ê” û “ë” dibêje hinek deng li hin deveran hene lê ne berbelavbûyî ne lê wiha didomîne.

“digel vê hindê, madam em îrû elfabeqê ji bona zemanekî – ne ji bona zar û zarawayan – çêdîqin ev dengê ha niqarî bû bête nîşan qirin. Herweqî me jî nîşan ne qir û ne xiste elfabêya xwe”.

Di vê bûyerê de, em rastî tiştekî objektîf jî tên ku CAB dema herfekê hildibijêre tenê bi ya xwe nake lê rêbazeke sistematîk pêk tîne û ji kesên derdorê re jî dipirse û dişewire da ku bigihîje encamekê. Em heman rêbazê di hejmara heftan de jî dibînin, rêbaza wî ji bo tespîtîkirina rastnivîsa herfa “q” yê, li ser lêpîrsîneke berfireh ku danberheva fransî (cable, café, corbeille, corbe, cristal), elmanî (Kable, Korb, Kaffè, Koffer, Kristal), kurmançî û erebî jî dihevine. Wekî hat nîşandayîn, mînakên ji zimanên

din hîlbijartîye û peyvên “cristal” û “krîstal” ê ku bibîne ji aliyê kesên perwerde û paşxanên cuda çawa tê nivîsandin. Em dibînin ku CAB;

- a) ji kesekî kurd ku hînî alfabeya kurdî bûye,
- b) ji hinek xortên kurd ku herfên erebî nas dikin dipirse,
- c) ji kesekî ku bi salan perwerdeya erebî dîtiye dipirse,
- d) ji erebekî ku kurdî nizane dipirse.

Em bi vê rêbazê jî dibînin ku ji bona tespîtîkirina herfê bi awayekî rast li gorî xwendin û nivîsînê ji kesên cuda yên bi paşxan û perwerdeyên cuda dipirse da ku rewşa rast tespît bike. Ev jî hem zanebûna wî ya zimên ku jê re zimannasiya diskriptîf tê gotin nîşan dide û hem jî nêzikatiya wî bi gelemperî bi awayekî zanistî nîşan dide.

Di hejmara **dehan** de, tiştekî din ku CAB dide nasîn bilindek (^) e. Ew sembola ku bi navê bilindekê nav dike û ew sembol e ku îro bi navê peyva “kumikê” tê bi kar anîn.

Di hejmara **yazdehan** de, sedema tecîha herfên “î” û “î”yê şîrove dike û dide ber herfên “i” û “i” ya tirkî. Wekî sedem jî dibêje li hir e, di herfên (i) û (î) de em ji ya wan dûr qetin. (h. 11: 5).

Di hejmara **duwazdeyan** de, danberheva herfên “u”, “û”, “x” û bikaranîna “xw”yê tê dayîn. Mînakên *blûr*, *stûr* û *krênê* ji ber bikaranîna wan bi herfên dengdaran re ku ketine pêşîya dengdêrekê bikaranîna taybet nîşanî me dide (h.12: 4). Herwiha, berhavdana zarên kurmancî û dumilî (dimilî) de, guherîn û ketina deng û herfan jî nîşan dide. Di zarê dumilî de, pîrsa (xweş) buye (weş). “jê xuya ye qo herfa paşîn (w) ye û (x) ji pêşiyê ketiye” (h.12: 4).

Di hejmara **hivdehan** de, şîroveya li ser herfên “u” û “û” yê didome. Nîqaş kinbûna herfan e. Lê hinek ziman, her tiştî bi her awayî di nav xwe de nahewînin û hinek tiştan jî diguherînin. Loma CAB wiha şîrove dike; “*Ji bona vê yeqê jî emê bala xwe ji hin dengdêrên biyaniyan re bidin qo weqê diqevî zmanê me xwe diguherînin. Zman wan napejîrîne (kebûl naqe) dengdêreqê dixê şûna wan* (h.17: 4)

Di hejmara **hijdehan** de, CAB bi pênc mînakên ku bi kurmancî û erebî hatina nivîsîn, analîzekî ser zehmetî û pîrsgirêkên girêdayî wan dinirxîne.

Ew peyv ev in;

Mirad

Midîr

Mihtac

Misilman

Silêman

Li ser van mînakan şîroveya wî ku di jwarbûnê nîşan dide wiha ye:

Ji lewra weqê zmanê me bi herfên erebî dihate nivîsandin di nîşanqirina vî dengî de dişwariyeqe mezin dihate pê. Ji xwe, ev deng di nivîsarên qevn de tucar kenc û rast ne hatiye nîşan qirin. Ji ber qo di nav herfên erebî de jê re berdêlqeq ne dihate dîtîn (h.18: 3).

Dema mirov tenê li van mînakan jî binêre, bi rehetî dikare hem zehmetiya ziman û alfabeya ku bi kar tê û hem jî derbasbûna alfabeyeke nû û adaptasyona nû bibîne. Ji ber ku herfên tune dengên heyî diguherîne û piştî derbasî nivîsê bibe. Li wir dixwazî bi navê standartîzasyona zimên dixwazî, bi navê xwerûbûna zimên an jî çareserkirina pîrsgirêkên zimên mudaxeleya zimên pêk tê û hinek tişt di nav demê de diguherin. Wekî di vê hejmarê de jî em dibînin hem jî ber rehetiya alfabeya latinî û hem jî ber lihevhatina alfabeya latinî bi kurdî re em dikarin sedema terciha alfabeya latinî bibînin. Ji xwe CAB di *Hawarê* de, tîne ser zimên ka çawa biryar dabû bo fikira ewil.

Dema mirov li vê prosesa cudabûna zimên dinêrê; temsîlkirin û bikaranîna herfan di alfabeyeke nû de dibin sedema guherînê, li her deverê herf bi awayekî cuda tên bikaranîn ev bi xwe jî dibe sedema guherîna deng, herf û peyvan. Her herfek nû forma peyveke nû bi xwe re tîne.

Bi nimûne;

govar – kovar

Her deng li gorî herfên heyî tên îfadekirin, loma pêwistiya herfên nû dikare derkeve hemberî mirov, wê demê yan dengên heyî wê ji alternatifên nû bên bikaranîn an jî wê hinek dengên nû li alfabeyê bêne zêdekirin ku ev jî di guherîna alfabeyan gişa de tiştekî normal e.

3.3. Rêziman

Gelek kes, mamoste, hîndekar, sazî hînkirina zimên rasterast bi rêzimanê girê didin loma dema karekî zimên yan jî hînkirina zimanekî plan dikin, ciheke giring ji bo rêzimanê vediqetînin. Herwiha digel mirov zimanê xwe hîn dibe, ew pêvajoya ku bî awayekî xwezayî pêk tê çima dema dibe zimanek din bi nêzîkatiyên cuda rêyek din tê ceribandin an jî tercihkirin? Helbet ev li hemû welatan jî bi vî şeklî jî pêk nayê. Sebeba herî mezin ev e ku sîstem û elimandinên welatan bi rehetî naqedin û elimandin didomin. Bi kurtasî dema em li pênasîya rêzimanê binêrin ew wiha ye: “Rêziman deng, binyad û pergala zimên e. Di hemû zimanan de rêziman heye, û her zimanek xwediyê rêzimana xwe ye (Beverly, 2007: 1).

Beri Celadet Ali Bedirxanî, hinek xebatên rêzimanê di medreseyan de hatibûn amadekirin; ew bi alfabeya aramî û bi zimanê erebî li ser zimanê kurdî bûn; wekî xebata Elî Teremaxî ye ku di sedsala 17an de bi navê “Serfa Kurmancî” hatibû amadekirin. Gaveke bingeîn ya *Hawarê* jî danasîna rêzimana kurmancî ye. Rêziman piştî alfabeyê hate danasîn herwiha di her hejmarê de jî, beşa ferhengokê hebû lê Bedirxan¹⁵ di nivîsa sê tarixên *Hawarê* de, li ser her sê hêmanên bingeîn yê ziman xwe wiha îfade dike: “Hîmê zimanekî, li ser sê hêmanên bingeîn sekiniye. Elfabe, rêziman û ferheng. Elfabe hate çêkirin, rêziman destpê dike, li pey jî ferheng e” (h.27: 5).

Avantaj û cudahiya Bedirxanî ew e ku heft heşt zimanan û çar alfabeyan dizane. Loma bi rehetî rêzimana kurmancî bi awayekî rêk û pêk nivîsandîye û di hejmarên *Hawarê* de pêşkêş kiriye. Em bi rehetî dibînin ku rêgez û qeîdeyên zimên bi şîrove, mînak û bi berhevdayîna herêmên ku cudahî hene şîrove dike. Zanebûna wî ya zimanên

¹⁵Bedirxan, C. (1941). Sê Tarîxên Hawarê, *Hawar*, hj.27, r.5

din, devok û zaravayên kurdî di nivîsîndina rêzimana kurmancî bi awayekî hûrgilî û berfirehkirî xuya dibe (h. 1: 1)

*“Ez qurd û qurdmanczmanim û zmanê xwe rind dizanim.
Min ew bi heft heşt zimanên din daniye ber hev, qitqitên wî hûrhûnandine;
keydeyên wî ji hev derxistine, dikarim ji biyaniyan bêtir û qenctir dehqera
wi bidim xuyakirin û zanîn.*

Piştî Bedirxanî, gelek kesan pirtûkên rêzimanê nivîsîn, gelek gotarên li ser rêzimanê di kovar û pirtûkên akademîk de jî hatin çapkirin. Lê dema mirov li wan nivîskaran dinêre, ew bi gelemperî du zimanî ne û bi awayekî xwezayî ketine bin bandora wî zimanê ku kurdî dane berhev.

Di *Hawarê* de, hejmarên ku cih dane rêzimanê ev in; 27–35, 37, 40, 42–48, 50–51 û 53–54.

Di *Hawarê* de, beşa rêzimanê di hejmara 27an de bi navê “**BINGEHÊN GRAMÊRA KURDMANCI**” dest pê dike. Ji ber ku ev weke yekem xebat tê qebûlkirin, bingeheên rêzimanê bi binbeşan tên sistêmîzekirin û dayîn.

Di hejmara **bîstî heftan** de, pênaseyên ziman û rêzimanê û yên girêdayî *elfabe*, *dengdar* û *dengdêran* hatiye dayîn.

Di hejmara **bîst û heştan** de, berdewamiya mijarên bîst û heftan û beşa *niqteşanî* hatiye dayîn.

Di hejmara **bîst û nehan** û **sihan** de, mijara *navdêran* tê nîşandayîn û pêşkêşkirin.

Di hejmara **sî (sih) û yekan** de, mijara *mêjerê* tê dayîn.

Di hejmara **sî û duduyan û sisêyan** de, mijara *tewang* û *vegetandekê* tê dayîn.

Di hejmara **sî û çaran** de, CAB dest bi mijara *pronavê* dike û di hejmara **sî û pêncan** de jî vê mijarê didome.

Di hejmara **sî û heftan** de, mijara *pronavê* didome.

Di hejmara **çilî** de, mijara *pronavên berbihevîn* û *lihevexistî* tên dayîn.

Di hejmara **çil û didu û sisêyan** de, *pronavên îşarkî* hatiye dayîn.

Di hejmara **çil û çaran** de, *pronavên girêkî* tê dayîn.

Di hejmara **çil û pêncan** de, *pronavên pirsîyarkî û yê nebinavkirî* tên dayîn.

Di hejmara **çil û şeşan** de, *pronavên xwemalîn (possessive)* hatiye dayîn.

Di hejmara **çil û heft û çil û heştan** de, CAB dest bi nivîs û şîrovekirina mijara rengdêran dike.

Di hejmara **pênciyan** de, mijara dereceyên rengdêrên wesfî hatiye dayîn.

Di hejmara **pêncî û sisêyan** de, mijara *rengdêrên nebinavkirî, rengdêrên xwemalîn, jmarnavên binavkirî û tewanga jmarnavan* hatiye dayîn.

Di hejmara **pêncî û çaran** de, CAB li ser jimarnavên “*nîv*” û “*yek*”ê disekine.

Mijarên ku CAB di *Hawarê* de li gorî beş û binbeşên berfireh û hûrgilî dane li jêr in:

I. Elfabêya kurdî

Esas û bingehên elfabêyê

Dengdar

Dengdêr

Nisbeta herfên kurdî

II. Bingehên gramera kurdmancî

Rêmanên berpêkî

Gramêr

Zmanê kurdmancî

Hêmanên zmên

Tîp

Tîpên zmanê kurdmancî

Dengdayiya tîpan

Dengdêr

Dengdar

Doma dengdêran

Xweseriya hin dengdêran

Tîpa dubare

Kît
Bêje
Birên qisetê
Guhêrbârî
Vekît

III. Nîqteşanî

Niqte
Niqtepirs
Niqtebang
Niqtecot
Niqtebihnok
Bihnok
Rewes û vêsîh
Kevanek
Dunik
Xêzek
Bendek

IV. Navdêr

Hevenav û serenav
Hevenav
Serenav
Guhêrbariya navdêran
Zayendê nêr
Zayendê mê
Wezîfeyên navdêrê

V. Mêjer

Yekejmar

Gelejmar

GelejMariya serenavan

VI. Tewang

Tewanga navdêran

Bireserê navdêrê

VII. Veqetandek

Veqetandekên binavkirî

Veqetandek di pêşiya rengdêran de

Veqetandekên nebinavkirî

Veqetandekên nebinavkirî di pêşiya rengdêran de

Tewanga veqetandekê

VIII. Pronav

Zayendê pronavan

Pronavên nêr

Pronavên mê

Pronavên nêtar

Pronavên kesîn

Pronavên kirar

Pronavên bireser

Pronava berbihevîn

Pronavên lihevxiştî

Pronavên îşarkî

Pronavên girêkî

Pronavên pirsîyarkî

Pronavên nebinavkirî

Pronavên xwemalîn

IX. Rengdêr

Rengdêrên wesfîn

Dereceyên rengdêrên wesfîn

Rengdêrên îşarkî

Rengdêrên jmarîn

Rengdêrên pirsîyarkî

Rengdêrên nebinavkirî

Rengdêrên xwemalîn

X. Jmarnav

Jmarnavên binavkirî

Tewanga jmarnavan

Qeyda gelemper

Nîv

Yek

Hezar

Wekî tê dîtîn, mijarên bingehîn wekî mijarên *elfabe, niqteşanî, mêjer, navdêr, rengdêr, pronav, jîmarnav, tevang û veqetandeqê* hatine dayîn. Dema mirov li van mijaran dinêre hinek mijar di nav xwe de dibin binbeşên cuda û berfireh ava dike. CAB gelek mînakên ji herêmên cûr bi cûr mijaran vedikole û jêrxaneke saxlem dihêle. Ji bilî devok û zaravayên kurdî, zimanên din wekî ên ewropî jî di sîstema berhevdanê de ciheke girîng digirin û sîstema avakirina rêzimanê bi rehetî ava dikin. Herwiha mijarên rêzimanê ne temam in, hinek mijar kêr in, yê kêr wiha ne;

Lêker

Hoker

Daçek

Gîhanek

Hevoksazî

Tiştê herî balkêş û giring ew e ku pêşkêşkirin û avakirina rêzimanê bi alfabeya latinî bi saya kovarê pêk tê. Belkî gelek zimannas, perwerdekar û mamosteyan ev pêvajoyên di carekê de pêk anîne, lê rewşa guherîna alfabeyekê û nivîsandina rêzimanekê berfireh bi armanca sedemên cuda (wekî guherîna alfabeyê, perwerdeya milletî, standartîzebûna zimên û hwd.) di nav rûpelên kovarê de beş bi beş hatiye ber destê xwendevanan. Zimanekê standart cûreyekê zimên e ku ji hêla rêziman û bikaranînê de ji pêvajoya kodkirineke giring derbas dike (Finegan, 2007: Richards & Schmidt). Ji bo ku pêvajoya standartîzasyonê pêk bê divê ziman ne tenê ji aliyê ferhengan, lê ji aliyê pirtûkên rêzimanan ve jî bibe bihêzkirin. Di rêzimanê de, sentaks gelek roleke giring digire. Li gorî Azar (2007: 3), bê rêzimanê, mirov ji bo wateyê ragihîne tenê peyv, deng, wêne û zimanê laşî bi kar tîne. Loma şandin an jî dayîna peyaman pêk tê, lê giş bi hev re wateya hevpar û giştî didin.

3.4. Ferheng

Wekî tê zanîn, ji hejmara ewil û pê de di kovara *Hawarê* de beşek bi navê “ferhengokê” heye. Di her hejmarê de, CAB ferhengok amade kiriye, pênasayên peyvan bi kurmancî şîrove kirine, carinan mînak dane û dem bi dem jî beramberê peyvên kurmancî bi fransî nivîsiye. Carinan peyvên herêmî carinan jî peyvên kevnar bi kar anîne. Bo mînak peyva “boş”ê, di wateya “zêde, zehf” de niha li bajarên Şirnex û Colamergê tê bikaranîn lê di hin bajarên din nayê bikaranîn. Bi saya ferhengokê em peyveke herêmî hîn dibin û roja me îro jî em dizanin ev peyv hîna jî hem di jiyana rojane û di gelek xebatên folklorîk te cî digire. Herwiha bi saya ferhengokê em dikarin hem peyvên wê demê û hem jî mentalîte û felsefeya zimên ku wê demê hatiye bikaranîn bibînin. Ev bi xwe jî derfeta dîtina guherîna zimên bi peyvên wê demê dide me.

Gelemperî guherîna peyvan wiha ne;

1. Guherîna peyvan
2. Wendakirina qertafan
3. Sivikbûna peyvan
4. Guherîna herfan

5. Peyvên wenda ku êdî nayên bikaranîn

Gelek peyvên din jî li gorî şert û merca wê demê, li gorî bûyerên civakî hatine fikirîn û peyvên nû derketine yan jî hatine adaptekirin. Pêvajoya Şerê Cîhanê ya Duduyan de, gelek nûçe di beşên bi navê “rewşa cîhanê” û bi navên cûr bi cûr de nûçe, agahî û bûyer hatine nivîsîn û wergerandin. Ew dem bi xwe jî dikare bibe ferhengokeke termînolojîk. Çêkirina ferhengokan di hejmarên cuda de bala însanan bi taybetî dikişîne ser peyvan û her hejmarê de jî tûrikê peyvên xwendevanan roj bi roj zêde dibe. Piştî *Hawarê* 60-70 salan şûn de rojnameya Azadiya Welat jî her hefte beşek bi navê “ferhengokê” çap dikir û gelek însan van xebatan dişopandin û peyvên nû hîn dibûn. Ev bi xwe jî rola modela *Hawarê* nîşanî me dide ku rojnameyek bi xwe vê biryara rêbaza CAB bi kar tîne.

Helbet dema xebateke zimên an jî mijarek din çî edebî çî felsefî yan jî tiştekî din bê kirin, xebatên ewil xwedî giringiyeke mezin in ji ber ku hem ew dibin xebatên pêşeng û hem jî ew dibin modelên bingehîn. Di *Hawarê* de, hem xebatên rêzimanê hem jî yên ferhengê bûne modelên bingehîn, gelek kesan piştî CAB xebatên rêziman û ferhengan çêkirin, lê tu kes jî wan neketin pêşiya wî. Avakirin an jî jinûve nivîsandina ferhengê jî bo her zimanê pevajojek gelek zehmet û dirêj e. Dema mirov pêvajoyên nivîsandina ferhengên fermî binêre, ew bi xwe jî demek bi pirsgirêk e herwiha pêvajoya amadekirin û nivîsandina zimanek ku nebûye zimanê perwerdehî, medya, têkiliyên rojane û hwd pêvajoyeke zehmettir e.

Loma ev hewldan û xebata CAB li gorî xebatên gelek binirx e. Di serî de bi tena serê xwe dawiyê jî bi hebûna hevalan çapkirina koverekî bi gelek nivîskarên ji herêmên cuda rê dide bikaranîn û danasîna varyasyonên zarava û devokan. Dema mirov xebatên ferhengokan jî dibîne ev bi xwe jî zanebûna wî ya berbelavkirina zimên nîşanî me dide. Lê di vê pêvajoyê de rêyeke çawa wê ji bo nivîsandina ferhengê baş bibûya? Metoda ku CAB (h.1: 2) di vê pêvajoyê de ji bo nivîsandinê hîlbijartiyê wiha ye:

1. **Berhevkirina peyvên** ku di jiyanê rojane de, di nav gel de tên bikaranîn.
2. Bikaranîna ew **peyvên xwemalî** yên ku di zaravayên kurdî yên din de hene.

3. Ji nû ve **vejîna peyvên ku di kurdî de hene**, lê di dewsa wan de peyvên biyanî tên bikaranîn.
4. **Derxistina peyvên xwemalî**, yên ku di nav çîrok, pêkenok, helbest, stran û zargotina gel de tên bikaranîn.
5. **Çêkirina peyvên nû**.

Dema mirov li metodolojiya CAB dinêre û dinirxîne bi rehetî dibîne ku rê û rêbaza ku wî hîlbijartîye xwe dispêre parastina zimên. Maddeya ewil – **berhevkirina peyvên ku di jiyana rojane de hene**- xaleke gelek giring e ku em dikarin wekî rêbaza zimannasiya teswîrker (deskirîptîf) pênase bikin. Bi saya berhevkirinê, şansê dîtina peyvên heyî jî derdikeve pêşîya me û senifandina gelek xebatên peyvan wekî termînolojî, varyasyon, devokan jî derdikeve û hazir dibe. Xala duduyan ku **bikaranîna peyvên xwemalî** ji zaravayên din nêzîkbûna zarava û axaftvanan dikin ku giş têdikevin nav hestên hevpar. Wekhevî û nêzîkbûna peyvan bendên derûnî jî kêmtir dike. Bi saya peyvên xwemalî, mirov hîsa xwedîbûna zimanê xwe jî dikare hîs bike. Ev biryar di van 30 salên dawî de jî xwe di pêvajoya amadekirina hînek pirtûkên hînkirinê de xuya kiriye. Di pêvajoya standartîzekirina zimanekî de, peyvên heyî ku di jiyana de tene **bikaranîn** gelek giring in. Bi saya korpûsa heyî mirov dikare peyvên wê demê bibîne, wê demê fahm bike û bi kar bine. Herwiha berhevdan, tespîtîkirin û bikaranîna peyvên xwemalî ku di kurdî de hene rasterast parastina zimên e. **Vejîna peyvên kurdî ku di xebatên berê de hatine bikaranîn** cihekî giring digire. Em dikarin peyva “hevîrê”yê bidin ku di roja me de gelek kes peyvên “rêheval” û hevalrê”yê bi kar tînin. Di ser re, derxistin û **bikaranîna peyvên folklorê** wekî lêgerîna xezîneya peyvan e ku rihê kurdî di folklorê ye. Herwiha xala dawî **çêkirina peyvên nû**, piranî bi wergerê dikevin zimên, wekî di hin beşên wergerê de jî tê dîtin, ew çavkaniyên gelêk kêrhatî ne.

Dema mirov li van metoden gişa binêre bi giştî dikare îddîa bike ku armanca Celadet Alî Bedirxanî avakirina ferhengeke gelek berfireh, mezin û sûdwer e. Bi saya vê ferhengê mirov dikare ferhengeke ku hem peyvên rojane hem jî ferhengeke peyvên xwerû û xwemalî ava bike ku bikare têra xwe bike û herwiha ji bo diyardeyên nû yan jî

nûjen peyvên nû çêbike. Ev jî armanceke gelek mezin e. Avakirin, nivîsîna ferhenga zimanê dayikî hîmek newetewbûnê a standartîzasyonê ye.

Di *Hawarê* de, tê nîşandayîn ku hebûna alfabe, rêziman û ferhengokê gelek giring e. CAB di nivîsa “*Sê tarîxên Hawarê*” de wiha dibêje: “*Ji xwe hîmê zmanekî li ser sê hêmanên bingeîn sekiniye: elfabê, gramêr û ferheng*”. Mirov dibîne ku hem zanebûna heft heşt zimanan û hem jî nasîna teoriya zimên, zimannasî, berbelavkirina wê ji aliyê Celadet ve gelek xurt e. (h.27: 5)

3.4.1. Peyvên Ferhengokên *Hawarê* li Gorî Hejmaran

Hawar 1

Armanc

Bendewar

Erdnigarî

Bingeh

Ciyoq

Dehqer

Dîroq

h.p. heta paşî

jînenigarî

pronivîs

ferhengog

zmanazîn

Hawar 2

azîn

berpê-bûn

binyan

bihemd

boş

bijîşq

dibistan

dişwar

dîl

doz

geşî

gewherîn

havîna-pêşîn

hêsanî

kebalewî
qoteqît
qûvan
nimînende
pejirandin
raveqirin
rehaqar
tol
têgehiştin

Hawar 3

civaqî
zarzarawa
yeqîti
yeqbûn
dotmîr
liserwebûn
xwendaxwendewar
vên

Hawar 4 ferhengog (R.4)

zerdeşt
zendavesta
zendî
qat
gûmiq
tar û po
hepo
zîvarî
hingûr

med
afirandin

Hawar 6

Ev beşa ferhengokê di têdexistên (naverok) kovarê de heye lê di kovarê de tune ye.

Hawar 7

deng
guwah
pêşqî
paşqî
cîhderq
raveqirin

Hawar 8

mêvanxanê
vêsihandin
belq
quta-qirin
agah
xeberdox

Hawar 19 Ferhengog

biyanî
liserwebûn
pispore
kelemrew
nijad
zûbirbirî
tîp

qamiran
nependî
duta
nifş
mivro
qevandin
dilevra
babelîsq
serpilqî
raman
vên
berbînî
berbêjî
pend
çand

Hawar 20

nivîsanoq
hevol
destrêj
lavelav

Hawar 27 Ferhengok

awarte
berpêşkî
bûyer
cenkeştî
gelemper
heyber
hêman

keştî
nêrevan
noqar
nûçe
parkît
pêrkît
rêman
şandiyar
têvel
weşînek

Hawar 28 (beramberê peyvên kurmancî bi fransî jî hatine dayîn)

hevok
mijar
rawes
vekît
vekitandin
vêsih

Hawar 30

dûpaş
folklor
guhêrbar
rayek

Bi kurtasî ev her sê xal (alfabe, rêziman û ferheng) bingeheên standartîzasyonê ne.
Bi saya van xalan hîmên zimên cihê xwe digirin û bikaranîna wan li qadên cuda zimên
pêş dixê.

3.5. Standartîzasyon

Kodkirina pêvajoya standartîzekirin û pêşxistina normekê ye ji bo zimanekî kodkirina zimanekî dikare ji rewşek heya rewşeke din cuda be û ev bi pêvajoya standartîzasyona heye û pê ve girêdayî ye. Ev tê vê wateya ku pergaleke nivîsandinê, bilêvkirinê, hevoksaziyê, sazkirina fermî qaîdeyên rêziman, rastnivîs û peyvسازیê çêdibe û herwiha weşandina pirtûk û ferhengên rêzimanê jî pêk tê.

Ziman, ji ber ku di nav hemû endamên civakê de wekî navgînek (amûrek) ragihandinê tê bikaranîn, di jiyana mirovan de xwedî rola mezin e. Bi xwezayî mirov dikare di nav etnîkên cihêreng de rastî nijad, qebîle û zimanên cuda bê. Ziman ji sistemek ragihandinê pir wêdetir e, ew nîşaneke sembolîk e ku di nav civakê de kî ji komekê ye û kî li derve ye ji hev cihê dike. Ziman bi awayekî kevneşopî ji mêj ve, wekî taybetmendiyeke navendî ya nasnameya etnîkî û neteweyî tê dîtin, ji ber vê yekê, nasname bi zimanê ku bi kar tê tê nîşandayîn. Wekî din, zimanê standartkirî rêyeke ku piştgiriye dide nasnameyeke hevbeş. Divê zimanek fermî bê astekê ku standartîze bibe. Pêvajoyên standartkirina zimên ev in: *hilbijartin*, *kodkirin*, *berfirehkirina fonksiyonê*, û *pejirandin* (Haugen, 1966: 932 - 933). Haugen li vir dibêje ku formên nû yên standart divê bi awayekî xwezayî bêne hilbijartin û derkevin asta formên gelemperî. Haugen (1983: 272) dibêje “berhema tîpîk a hemû kodkirinê rastnivîs, rêziman û ferheng e”.

Ji bo zimanekî neteweyî standart bibe divê fermî bibe. Zimanekî standart bi rastî yek ji zimanên eşîran e, yanî zimanê komek mirovên ji heman nijadê ne, ku xwediyê heman edet, ziman, ol û tiştên din in. Dema mirov li zimanên standartîze bûne wekî îngilîzî û elmanî binêre, heman tişt derdikeve pêşya mirovan.

Standartbûn ew pêvajo ye ku tê de ziman ji bo formên wê yên zimanî û fonksiyonên ragihandinê yên civakî standart dibe. Zimanek di pêvajoya standartîzekirinê de standart dibe. Pêvajoyek bi gelemperî hewceyê hin amadekirinên baş e. Di ser re gavên plankirî û prosedurên sistematîkî ji bo gihîştina wê divê baş bêne nirxandin.

Têkildarî nerîna fermîbûn an standartbûna zimên, mirov dikare zimanan bike du cûre: Zimanê standart û zimanê ne-standard. Holmes (2001) cûreyê standart wiha pênase dike;

“Bi gelemperî zimanê ku hatiye nivîsandin, û ya ku heya radeyekê pêvajoya asayîbûn an jî kodkirinê (wekî mînak, wekî di rêziman û ferhengê de têne bikaranîn) derbas bûye; ew jî hêla civatekê ve wekî cûr bi cûr kodek bi prestîj tê nas kirin”.

Pêvajoya ku zimanekî dike standart wekî “*standartîzekirina zimên*” tê binav kirin. Wardhaugh (2006) standartîzasyona zimên wiha pênase dike: “Pêvajoya ku zimanek bi şiklek kodkirî ye. Ew pêvajo bi gelemperî pêşketina tiştên wekî rêziman, pirtûkên rastnivîsê, ferheng û îhtîmalek mezin wêjeyê jî dihewîne”.

Ev pênase du taybetmendiyên sereke nîşanî me dide: Zimanê nivîskî temsîla zimanek e ku bi navgîniya pergala nivîsandinê û bi rêkûpêkkirinê tê nasîn: armanc ew e ku çêkirina zimanek diyarkirî ku jî xwe qanûnî yan fermî ye. Ji bo ku zimanek jî xwe heye û qanûnî an fermî ye. Ji ber vê yekê, zimanê standart zimanekî taybet e, ku jî hêla pir kesan ve rast û qebûlkirî ye û ew ziman e ku bi gelemperî jî aliyê însanan ve tê bikaranîn. Ew bêtir bi zimanê nivîskî ve têkildar e, ku tê de taybetmendiyên rastnivîsê hene; morfolojî (yanî forma peyvan); û hevoksazî (yanî awayê ku peyv û bêjeyan li hev kom dibin ji bo ku di zimanekî de hevok bîr çêkin).

Mirov dikare îddîa bike ku bandorên erênî yên sereke li ser axêverê wî zimanî bi saya standartkirina zimên çar in:

- 1) modela zimên bi bikaranînê derdikeve
- 2) hîsa yekbûna mirovan zêdetir dibe,
- 3) hebûna nasnameyê derdikeve,
- 4) di hînkirinê de, asteke rehet û hevpar derdikeve.

Gelek pispor hene ku hewl didin kes an jî saziyan diyar bikin ku jî pêvajoya standartîzebûnê berpirsiyar bikin an jî girêdaneke bi hev re çêbikin, yek ji wan jî Duranti (1997) ye ku wiha îfade dike;

"Çêbûna dewletên neteweyî standartbûnê ferz dike. Pêvajoya damezrandina dewletê şertê ji bo bazarek yekbûyî ya zimên diafirîne ku tê de yek cûreyek zimanî statuya standart têdixe zimên."

Ev balê dikşîne ser dewleta neteweyî ku berpirsiyarê standartkirinê ye. Bi gelemperî dewletên neteweyî serî li hikûmetê didin. Herwiha, teorîsyenekî civakî, bi navê Bourdieu (1991: 105), îddîa dike ku zimanek standart encama pêvajoyên sosyo-polîtîk e, saziyên burokratîkî yên wekî dibistanan bi xwe jî girêdayê vê pêvajoyê ne. Nerîna Bourdieu dibistanan wekî standartîzasyona zimanekî bi nav dike. Di vê rewşê de dibistan xwediyê roleke mezin û giranbiha ne ji ber ku ew rasterast bi pisporên zimên an zimannasan ve girêdayî ne.

Li ser bingeha wan ramanên cuda ku li jor hatin şîrovekirin, dewlet an hikûmeta neteweyî û saziyên burokratîk an jî pisporên zimên berpirsiyar in ku hinek plansazî û polîtîkayên di derbarê standartkirina zimên de bifikirin û bi pêş bixin. Ji bo kurmancî kovara *Hawarê*, ji bo soranî Akademiya Zimên ya Başûr xwedî hêzek û bandoreke mezin in.

Standartbûn ne ji zimanê axaftinê bêtir bi zimanê nivîskî re girêdayî ye (mînak peyvsazî, morfolojî û hevoksazî). Bo mînak, taybetmendiya zimanê fonolojîkî bi perwerdeyê standartîze dibe. Ew pêvajo bi gelemperî pêşketina tiştên wekî rêziman, pirtûkên rastnivîsê û ferheng û bi hebûna hêmanên çandî bi taybetî jî wêjeyê di nav xwe de dihevine û bi bikaranîna zimên hinek tişt di nav demê de di nav zimên de li gorî tercîha însanan şiklê xwe dawî digirin û guherîna xwe diguherînin. Ji bo fahmkirina têkiliya di navbera zimên û çandê de, bandora dorhêlî ya wan a li ser nêrîna çandî û dîrokîya civakî bi awayekî cuda giring e. Ragihandina bingehe û belkî ya herî tevlihev bêgûman ziman e ku ev jî kombûna peyvên ku tên ba hev wateyên cuda çêdikin (Geyik, 2020: 162). Standartîzebûn rasterast guherîna zimên kontrol dike û zimanên bê standart ji ber gelek sedemên cuda zûtir û bi awayeke bê kontrol têdikevin nav dirûv û formên nû.

Ji ber vê yekê, li gorî fikir û ramanên ku li jor hatin behskirin, pejirandina hin taybetmendiyên zimên ên standartkirî wiha ne:

- Rêziman
- Rastnivîs
- Peyv
- Bilêvkirin
- Pergala nivîsandinê

Standartbûn di her zimanî de pêvajoyeke pêdivî, jênegar û giranbîha ye. Deumert (2004: 18) dibêje ku nêzîkatiyên zimanparêzî yên ji bo standartkirina zimên bi gelemperî li ser tespîtkirina zaravayên herêmî û/an civakî yên ku bingeha fonolojîk, morfolojîk û sentaktîkî ya zimanê standart pêk tînin, hûr bûne.

Pêvajoya Standartîzasyona Zimên

Ji bo standartîzekirina zimanekî hin gavên bi hev ve girêdayî pêwîst in (Holmes, 2001: 35). Ew gav bi gelemperî wekî jêr in:

Hilbijartin: Hilbijartina zarava yan ji devokê gaveke gelek giring e. Ji ber ku varyasyona ku bê hilbijartin wê gelek bê bikaranîn û pêş bikeve. Ev tê wateya hilbijartina cûreya ku wekî standart dê bê hilbijartin. Divê ev cûre xwediyê giringiyeke sosyal û siyasî be ku di nav axêveran de xwediyê prestîjeke be. Bi piranî, meyla hilbijartina cûreya li ser bikaranînên gelemperî ne.

Berfirehkirin: bikaranîna fonksiyonên zimên qadên nû berfirehtir dike: divê pejirandina wê be parastin ku herkes bikaranîna wê qebûl bike: ji bo na berfirehkirina zimên wekî pêşniyaz divê rûmeta zimên bê dîtî û girtî, û însanên wî zimanî bîr teşwîqkirin da ku bi zimanê xwe serbilind û şanaz bin. Ev hestên pozîtîf têkiliya mirov û zimanê wan geştir dike.

Bo mînak, rûmeta wê divê bê zêdekirin, û mirov bi serbilindî an dilsoziya zimên bîr teşwîqkirin û ev jî bibe sedema pêşvebirina zimên. Zaravayek bi armanca standartkirinê

tê hîlbijartin. Zaravaya bijartî dibe ku yek ji wan zimanên bihêztir be û di nav komên bêtir perwerdebûyî de be ev jî wê rewşa wan ji ber sedemên cuda çêtir bike.

Dema rewşa zimanê kurdî û zarava bîr xandin, ji ber sedemên coxrafyayên cuda, her dever xwediyê bandorên cuda ne. Lê bi gelemperî ji ber ku gelek kovar, weşanxane, rojname standartîzasyona *Hawarê* hîlbijartine, niha ekola *Hawarê* bêtir tê bikaranîn.

Kodkirin

Pîvan û rêzikên rêzîmên, bikaranîn, ferheng û xebatên hwd. divê ji bo siberojê bêne amadekirin. Zaravayê ku bê hîlbijartin wê di belgeyên fermî de bê bikaranîn, li dibistanan bê fêrkirin û ji hêla biyaniyan ve were fêrbûn an fêrkirin (Holmes: 2001). Bi vî awayî bandora zimên roj bi roj wê zêdetir bibe. Ev cûre di ferheng û pirtûkên rêzîmanê de tîr nivîsin da ku formên rast bîr hînbûn û bikaranîn.

Qebûlkirin

Wekî mirov dizane di navbera zarava û devokan de hertim rekabetek heye, û her kes bikaranîna devok û zaravaya xwe tercîh dike. Loma zaravaya ku bê qebûlkirin wê di nav demê de, bibe xwediyê danasîn, berbelavbûn û bihêzbûnê. Ev rewş helbet pîranî bi riya saziyên wekî dibistan, wezaret, medya, û her cûre saziyên civakî, çandî, medyayî çêdibe. Di nav demê de, êdî zaravaya hîlbijartî dibe zimanê hemû qadên jiyanê û wekî ziman bi xwe û cûreyên herêmî hêdî hêdî wenda dibin. Bo mînak, tîrkiya Stenbolê wekî tîrkiya resen tê qebûlkirin û tîrkiya herêmên din di medyaya tîrkan de wekî zaravayên lokal tê dîtin û di gelek fîlman de jî devoka behra reş û herêma rojhilat û başûr rojhilatê wekî kêmbûna rewşa feqîrbûn û sosyopolîtîkê tê dîtin di gelek fîlm û rêzefîlman de devok û zimanê wan dibin sedema henek û qerfan.

Ev pêvajoya standartîzasyonê pêvajoyeke ku gavên tîrê avêtin girêdayî hev in loma divê siyasîmedar, zimannas, kes û saziyên din bi hev re gavan biavêjin. Ev pêvajoya standartîzasyonê di heman demê de tê wateya guherîna zimên bi awayekî kontrolkirî ji ber ku zaravaya hîlbijartî varyasyonên din li paş xwe dihelin û berê xwe fireh dîkin. Ji ber ku standîzasyon di destpêkê de nivîskî pêk tê hinek taybetmendiyên zimên yê peyvkî, morfolojîk û sentaktîk divê li gorî rêgezan bîr qeydkirin.

Li gorî Hudson (1996: 33), zimanek standart dê pêvajoyên jêr bibîne:

Hurgiliya Fonksiyonê: Ev cûre di gelek qadan de têne bikaranîn û fonksiyonên girêdayî dewletê wekî hukuk, perwerde, tendurîstî û li tiştên nivîskî û medyayê de pir tîn bikaranîn.

Ev cûreya ku hatiye hilbijartin divê ji aliyê însanan ve bê qebûlîkirin ji ber ku ev cûre dibe cûreya civatê û di demeke dirêj de dibe zimanê netewî yê wî welatî. Heger ku zimanê ku hatiye qebûlîkirin ku ji aliyê gelek kesan ve neyê fahmkirin û cûreyek cuda be dê gelek problem derkevin pêşberî biryargiran. Loma rola *Hawarê* jî gelek mezin e. Taybetiya rewşenbiriya kurdî bi *Hawarê* re xuya kir û pê re jî hin bi hin formê xwe di kirasekî neteweyî de diyar kir. Lewre em dikarin bibêjin ku *Hawar* bû damezrînera bingehîn di rewşenberiya kurdî ya nivîskî de (Mehmûd, B. 2008:126-128). Kovar bi xwe bû sedema qebûlîkirina alfabeya latînî û bi awayek xwezayî hatiye qebûlîkirin û gelek biryarên wê demê hatine girtin bi awayeke berbelav jî bûye standartîzasyona kurmancî.

Zimanek standart zimanekî wisa ye ku bi piranî ji aliyê kesên perwerdekirî ve tîn bikaranîn û di civakê de di karên muhîm de tîn dîtin; wekî dibistan, zaniyê, wêje, siyasî, dadgeh (mehkeme), qadên perwerdê û zanistî. Holmes (2001: 76) îfade dike ku cûreya zimanê standart bi gelemperî zimanê nivîskî ye û heya astekê guherîna rêzik û kodan dîtiye. Yanî teqez zimanê standart zimanê nivîskî ye û piranî ji zimanê axaftinê rasttir tîn qebûlîkirin û formên axaftinê tîn redkirin.

Zimanê argoyî (slang/vernacular) tîn wateya zimanê ku ne standart e û xwediyê cûreyek axaftina herêmî ya civakê ye. Li gorî Holmes (2001: 74) cudahiya navbera zimanê devkî û standart cihekî baş e ku mirov dest bi xebatê bike. Ji ber ku zimanê argoyî ne zimanekî standart e ne xwediyê statûyeke resmî ye.

UNESCO (1968: 689-690) zimanê argoyî wiha pênase dike:

“Zimanê bav û kalan ku ji aliyê civakî û siyasî ji aliyê grûbeke din tîn serdestkirin. Em zimanê kêmarekê heger ew li welatekî din zimanek fermî be li welatekî wekî argoyî qebûl nakin.”.

3.5.1. Fonolojî

Hemû ziman di nav demê de xwe ji hinek dengan an jî herfan dûr dixin û hilweşîna herfan pêk tê. Sedemên cuda ji bo vê pêvajoyê hene. Mînaka herî balkêş ya îngilîzî ye. Di îngilîzî de, di navbera salên 1400 û 1700î de, hinek guherînên bilêvkirinê pêk hat û gelek herf û deng hatin avêtin. Helbet ev di demeke kurt de pêk nehatiye û nayê, û sedemên tercihkirina avêtina hinek dengan jî pêvajoyeke xwezayî (bêhişî) ye. Her dever an jî heta her kes di nav hewldanekê de ne ku zimanek rehet bi kar bînin û peyvên zimanê xwe bi awayekî rehet bilêv bikin. Di pêvajoya çapkirina *Hawarê* de, zimanek çawa hatiye tercihkirin, peyvên ji wergerê hatin çêkirin an jî yên ku ji çavkaniyeke cuda hatin hilbijartin belkî li gorî hinek kesan bû sedema rexneyê. Lê zimanê wê demê ji bo me daneyeke giring e û em ê bidin ber korpûsa niha.

3.5.1.1. Taybetmendiyên Herfên Dengdêr

Bandorên wekî hawirdor, dem, çand, têkiliya bi netewên din re û taybetiyên biyolojîk bûne sedema guherîna dengên zimanan (Aslanoğlu, 2019: 11). Gelek zimannas bi salan li ser sedemên cûr bi cûr dixebitin û dixwazin bigihîjin agahiyên sistematîk ku bikaribin guherîna zimanan fahm bikin. Guherîna herî biçûk ew in ku di deng û peyvên de tên dîtin. Loma guherîna dengên li gorî cihê ku ji devê mirovan derdikeve (cihderk) têne nirxandin. Guherîna hemû dengên wê li gorî tabloyên jêr bînin nirxandin.

Herfên dengdêran li gorî cihê derketinê (cihderk) û asta dengên tabloya dengdêran bi vî awayî ye (Baran, 2018: 22). Ev tabloyeke giştî ye ku mirov bikaribe cihê dengên bi awayekî şênber bibîne û şîrove bike. Di analîza herfan de, em ê şîroveyên xwe li gorî van tabloyên jêr bikin. Senifandina herfan wê li gorî cihê derketinê û asta dengên bînin nirxandin. Tabloya ku di pirtûka “Rêzimana Kurmancî” ku ji aliyê Bahoz Baranî ve hatiye nivîsîn dê bînin bikaranîn.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i,u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Dirêj-kurt: li gorî domdariya tîpê ye

Pêşdevkî-paşdevkî: li gorî cihê derketinê ye.

Bilind-navîn-nizm: li gorî asta derketinê ye.

	Dûz		Gilover	
	Fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Dûz- gilover: li gorî teşeyê lêvan e.

Fireh-teng: li gorî teşeya çeneyê ye.

Stûr-zirav: li gorî têkiliya zimanî û diranan e.

Ev her du tablo ji cudabûna dengên hinek guherîna li gorî cihderka xwe nîşan bide ku em bikaribin guherîna bi rehetî şîrove bikin. Lê herwiha hinek îstîsna jî hene. Hinek sedemên wekî bandora zimanên din yan jî bandora erdnigariya cihê hene. Em ê hinek guherînan li gorî van tabloyan jî binirxînin û hewl bidin ku gelo însan çawa herfan li gorî cihderkan bi kar anîne.

3.5.1.1.1. Guherîna “o” û “u”yê

Herçiqas ev guherîna herfên “u” û “o”yê li hin deveran guherîna xwe qedandibin jî, li hinek herêman wekî derdora Behdînanê hêj jî wekî forma berê têne bikaranîn. Guherînek biçûk e, lê wekî di her zimanî de sivikkirina bilêvkirinê heye, di kurdî û di zaravayên din de jî ev guherîn heye.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Tablo 1. Guherîna “o” û “u”yê

Dema mirov vê guherîna herfên “u” û “o”yê dinêre, ev guherîneke balkêş e. Ji ber cudahiya gelek tiştan. Li gorî domdariya wan “o” dirêj e û “u” kurt e. Li gorî cihê derketinê “o” û “u” paşdevkî ne. Ev wekhevî (hevşib) ye û li gorî asta derketinê “o” nizm e û “u” bilind e. Tene wekhevîya wan her du jî paşdevkî ne. Sedemên derveyî dikarin bibin sedema guherînê, carinan werarbûna peyvên bi rehetî nayê dîtin ku mirov bikare şopa guherînê bi rehetî bibîne. Herwiha bandora erdnigariyê jî divê neyê piştguhkirin.

	Dûz		Gilover	
	Fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Ji ber ku her herf di heman demê de, dengên cuda jî di nav xwe de dihevin, şîrove û nirxandina herfan hertim divê baş bê nirxandin. Her du herfên “u” û “o”yê li gorî teşeya lêvan gilover in. Li gorî teşeya çeneyê herfa “o”yê fireh e lê herfa “u” yê teng e. Cudahiyeke din jî digel herfa “o” yê li gorî tîkiliya zimên û diranan stûr e û herfa

“u”yê zirav e. Hevparbûna wan teşeya çeneyê ye yanî giloverbûna wan jî dibe rehetiya bilêvkirina wan.

Wekî mînak

roj - rûj (h. 1)

qo – ku (h. 1)

goman – guman (h. 33)

sorgon - surgun (h. 22)

sund – sond (h. 18: 3)

zaruyên - zaroyên (h. 19: 2)

3.6.1.1.2. Guherîna “û” û “o”yê

Guherîna herfên “û” û “o” yê gelek berbelav e û bandora van herfan ne tenê di kurmcî de heta dema ku gelek kurd bi tirkî diaxivin bêhemdî van herfan tevlihev dikin.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Her du herf jî li gorî domdariyê dirêj in, li gorî ciyê derketinê pêşdevkî ne, cudahiya tenê li gorî asta derketinê herfa “u”yê bilind e û herfa “o”yê nizm e û ev taybetmendiyeke hevpar e.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 2. Guherîna “û” û “o”yê

Dema mirov vê guherînê li gorî teşeyê binirxîne jî mirov dibîne ku her du herf jî stûr û gilover in cudahiya wan jî herfa “o”yê fireh e û ya “û”yê teng e.

Bo mînak

rûjkê - rojkê (h. 20: 3)

rûjname - rojname (h. 20: 7)

îrû – îro (h. 20: 2)

robar – rûbar (h. 8: 1)

3.6.1.1.3. Guherîna “o” û “a”yê

Ev deng di nav peyvên de wextê tê bihîstin bi awayekî xwezayî guhê mirovan aciz dike. Gelek însan peyvên xwe girêdayî xwe hîs dikin û yên din herçiqas fahm bikin jî dîsa têkiliyeke di navbera peyv û erdnigariya xwe de hîs dikin. Guherîna herfên “o” û “a” yê jî hinek acizîyeke dengî dide.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Li gorî tabloya jor, herfên “o” û “a” yê bi tevahî di heman cihê de ne. Ji aliyê domdariya herfan dirêj, paşdevkî û nizm in. Di her senifandinê de wekî hev in û ticudahiya wan tune ne. Loma guherîna herfan li gorî domdarî, cihê derketinê û asta derketinê wekî hev in ku ev jî di hipoteza ku hatiye îddîa kirin de tê dîtin.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 3. Guherîna “o” û “a”yê

Herfên “o” û “a” yê li gorî teşeya lêvan ji hev cuda ne, “a” dûz e û “o” jî gilover e. Li gorî teşeya çeneyê jî her du jî stûr û fireh in. Ev guherîna herfên dûz û gilover cudahiyeke mezin e.

Bo mînak

zozon – zozan (h. 10: 1)

niho - niha (h. 10: 2)

3.6.1.1.4. Guherîna “ê” û “î”yê

Guherîna herfên “ê” û “î” yê berbelav e. Helbet erdnigarî û li gorî cihderkê û teşeya herfan hinek tiştan bi awayekî vekirî wekî li tabloyên jêr cî girtine guherînê nîşanî me dide.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Herfên “î” û “ê” yê li gorî domdariya herfan dirêj in, li gorî cihê derketinê pêşdevkî ne lê wekî xuya ye guherîna wan li gorî asta derketina wan bilindbûn, navînbûn û nizmbûna wan e. Herfa “î”yê bilind e û herfa “ê”yê herfeke navîn e.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	î, î		u

Tablo 4. Guherîna “ê” û “î”yê

Li gorî teşeya wan jî em dibînin ku her du herf li gorî teşeya lêvan “dûz” in. Li gorî teşeya çeneyê herfên fireh û teng in yanî ji hev cuda ne. Her du herf jî yê zirav in. Cudabûna wan wekî diyar e tenê di asta firehbûn û tengbûnê de pêk tê.

Mînak

vên - vîn (h. 19: 5)

dêyan – diyan (h.20: 1)

hênikahî – hînikahî- hînikayî (h. 28: 12)

3.6.1.1.5. Guherîna “e” û “î”yê

Wekî ji hejmara mînakên tîn dîtin, di *Hawarê* de, guherîna herî zêde di herfên “î” û “ê”yê de tê dîtin.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		î, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Ev her du herf jî li gorî domdariya xwe herfên kurt in û bilêvkirina wan jî kurt in. Lê li gorî cihê derketinê herfa “e”yê pêşdevkî ye lê herfa “î”yê jî paşiya devî derdikeve. Li gorî asta derketinê jî herfa “e”yê nizm e û herfa “î”yê jî herfeke bilind e.

	Dûz		Gilover	
	Fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 5. Guherîna “e” û “î”yê

Li gorî teşeya lêvan her du herf jî dûz in, di senifandina teşeya çeneyê de “e” herfeke fireh e û “î” jî herfeke teng e û di xala têtîliya zimên û diranan de her du jî herfên zirav in. Wekî tê dîtin guherîn piranî di nav kategoriyeke nêzî hev de pêk tê.

Mînak

merovek – mirovek (h. 54: 6)

têgehiştî - tegihişte (h. 24: 3)

merov - mirov (h. 20: 1)

mejûl - mijûl (h. 24: 2)

rejihan - rijîyan (h. 20: 6)

tejî - tije/tijî (h. 17: 4-21: 4 - h. 27: 2)

perîcar - pirîcar/an (h. 24: 1)

xezanî – xizanî (h. 26: 4)

rojhelat – rojhilat (h. 31: 1)

xesardîtî – xisardîti (h. 41: 7)

mical - mecal 419 (h. 25: 7)

tinê – tenê (h. 26: 10)

niwal-newal (h. 56: 4)

ziwac – zewac (h. 54: 1)

tinê - tenê (h. 26: 8)

xisar - xesar (h. 50: 8)

timam - temam (h. 37: 1)

balgih-balge (h. 24: 1)

Dema ev mînak tên nirxandin, piştî guherînê bilevkirin siviktir û rehetir dibe. Di tercîh û bikaranîna zimên de, bi guherînê bilêvkirin siviktir dibe. Mîrov dibîne ku gelek peyv bi vî awayî guherîna xwe qedandine. Herwiha di hinek peyvên de du herf bi hev re hatine guherîn [nimûne: têgehiştî – tegihişte (h. 24: 3)]

3.6.1.1.6. Guherîna “î” û “ê”yê

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Wekî tê dîtin, cihderka “î” û “ê”yê cuda ne. “î” kurt, paşdevkî û bilind e. Lê “ê” dirêj, navîn û pêşdevkî ye. Ji ber cihê çavkaniyê wan cuda ne, cudabûneke mezin û zehmet e.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 6. Guherîna “î” û “ê”yê

Li gorî domdariya teşeya lêvan “î” û “ê” dûz in. Li gorî teşeya çeneyê “i” teng e û “ê” fireh e. Her du herf jî li gorî têkiliya zimên û diranan zirav in.

Mînak

bihn–bêhn (h.18: 13)

tikûzkirin - têkûzkirin (h.28: 5)

bihindar–bêhndar (h.45: 5)

3.6.1.1.7. Guherîna “î” û “o”yê

Guherîna herfên “î” û “o” yê pir berbelav nînin. Herfa “o”yê herfek pir belavbûyî ye û di guherîna gelek herfên din de jî pir aktîf e, herwiha bi hinekan re herfên bandora erebî, tirkî û bandora erdnigariya hin deverên din jî xwe di herfa “o”yê de nîşan dide.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Herfa “o”yê dirêj û nizm e, herfa “î”yê kurt û bilind e. Xala hevpar ya her duyan tenê li gorî cihê derketinê paşdevkî ne. Her du herf jî li gorî cihê derketinê paşdevkî ne lê ji aliyên taybetmendiyên din ne wekî hev in. Herfa “o”yê li gorî domdariyê dirêj e û li gorî asta derketinê jî nizm e lê herfa “î”yê jî li gorî domdariyê kurt e û li gorî asta derketinê bilind e. Wekî tê dîtin, ji ber ku ji hev cuda ne, cudahiyeke mezin derketiye.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 7. Guherîna “î” û “o”yê

Li gorî teşeya lêvan herfa “î”yê dûz, li gorî teşeya çeneyê teng e û li gorî têtikiliya zimên û diranan jî zirav e û herfa “o”yê li gorî teşeya lêvan gilover, li gorî teşeya çeneyê fireh û li gorî têtikiliya zimên û diranan jî stûr e. Wekî xuya ye bi tevahî ji hev cuda ne û ne wekî hev in.

Bo Nimûne;

bêhoş - bêhiş (h.22: 16)

Şifor - şofor (h.41: 6)

Peyva şofor ê - Chauffeur

Wekî tê dîtîn, peyva şoforê ji fransî, jî wekî peyveke deynigirtî, hatibe girtin jî, dema peyvek derbasî zimanekî din dibe fonetîka xwe li gorî zimanê nû adapte dike û dengê xwe diguherîne.

3.6.1.1.8. Guherîna “î” û “e”yê

Guherîna herfên “î” û “e”yê jî di *Hawarê* de kêm tê dîtîn.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Her du herfên “î” û “e”yê tenê ji aliyê ciyê derketinê wekî hev in, yanî pêşdevkî ne. Lê herfa “î”yê dirêj û bilind e û herfa “e”yê jî kurt û nizm e.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 8. Guherîna “î” û “e”yê

Her du herf jî dûz û zirav in, tenê cudahiyeke wan heye ew jî herfa “î” yê herfeke teng e û herfa “ê” yê jî fireh e.

rîvîna–revîni (h. 21: 1)

3.6.1.1.9. Guherîna “î” û “ê”yê

Sedemên guherîna herf û denga cuda ne. Hinek ji wan jî gelek balkêş in. Carinan sedemên hinekan pir vekirî ne û diyar in, lê yên hinekan vekirî nînin. Herfên “î” û “ê” yê wekî jêderkê herfên pêşdevkî û dirêj in. Cudahiya wan herfa “î”yê bilind e û herfa “ê”yê navîn e. Yanî wekî tê dîtin jêderka her duyan jî heman cî ye. Loma guherînên di heman jêderkan bêtir tê dîtin.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Wekî tê dîtin her du herf jî li gorî domdariyê dirêj in li gorî cihê derketinê pêşdevkî ne lê li gorî asta derketinê “î” bilind e û “ê” navîn e. Her du jî bi awayekî fîzîka devî, nêzî hev derdikevin û dema tîr bilêvkirin her du jî dirêj in. Tu xaleke hevpar tune ye û bi her awayî ji hev cuda ne.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 9. Guherîna “î” û “ê”yê

Li gorî teşeya lêvan her du herf jî dûz in, li gorî teşeya çeneyê herfa “ê”yê fireh e û herfa “î”yê teng e û li gorî tîkiliya zimên û diranan jî zirav in. Li gorî teşeyê tê dîtin ku xalên hevpar hene.

Mînak

pîşqeşî – pêşqeşî (h. 9: 6)

mîvan – mêvan (h. 55: 8)

bigêhin – bigihin (h. 30: 1)

3.6.1.1.10. Guherîna “û” û “î”yê

Di guherîna dengên de wekî hatibû gotin, gelek sedemên cuda hene. Guherîna dengên “û” û “î”yê jî guherîneke wiha ye ku kêma tê dîtin.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Guherîna dengên “û” û “î”yê jî wekî li jor bî tîran hatin nîşandayîn herfên dirêj in lê “î” pêşdevkî ye û “û” jî paşdevkî ye. Dirêjbûna wan wekî hev in lê yek li pêşiya devê mirovan û ya din jî li paş devê mirovan derdikeve.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 10. Guherîna “î” û “û”yê

Li gorî teşeyê lêvan herfa “î”yê dûz e û herfa “û”yê gilover e. Li gorî teşeya çeneyê herfa “î”yê û “û”yê teng in û li gorî tîkiliya zimên û diranan herfa “î”yê zirav e û herfa “û”yê stûr e.

Bo mînak

hêdû – hêdî (h. 6: 1)

hevrûşim – hevrîşim (h. 21: 1)

delûl - delîl (h. 30: 4)

3.6.1.1.10. Guherîna “î” û “û”yê

Di guherîna herfên “î” û “û”yê de bandora zimanên din ên wekî erebî û tirkî tê dîtin. Loma ev guherîn şiklê xwe li gorî bandora dengên zimanên din digirin. Ev peyv di tirkî de “vücut”e, di kurmanci de wekî “wucûd”ê tê gotin. Di erebî de, jî “هَيْئَة” y/e. Guherîna her du herfên navborî wekî cihderkê ji heman cihî derdikevin û paşdevkî ne lê “û” herfeke dirêj e û “î”jî herfeke kurt e.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Guherîna dengên “î” û “û”yê jî wekî li jor bî tîran hatin nîşandayîn herfa “û”yê dirêj e lê herfa “î”yê kurt e. Her du herf jî pêşdevkî ne. Wekheviya wan a hevpar jî li gorî asta derketinê her du herf jî bilind in.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 11. Guherîna “î” û “û”yê

Li gorî teşeya lêvan herfa “î”yê dûz e û herfa “û”yê gilover e. Li gorî teşeya çeneyê her du herf jî teng in. Li gorî tîkiliya zimên û diranan her du herf jî zirav in.

Bo mînak

wicûd – wucûd (h. 6: 1)

3.6.1.1.12. Guherîna “î” û “u”yê

Tespîtkirina sedemên guherîna denga helbet ne rehet e, carinan tenê erdnigarî sedema ewil e carinan jî sedemên derveyî wekî bandora zimanêke din sedem in. Guherîna herfên “u” û “î”yê ji yên din cuda ne. Ev her du herf jî wekî jêderkê pêşdevkî ne û kurt in. Ji ber ku her du jî heman jêderkê derdikevin, bilêvkirina wan wekî hev in loma ihtîmaleke mezin sedema guherînê çavkaniyên erdingariyê ne. Guherîna herfên “î” û “u”yê gelek belavbûyî ne. Cihê derketina wan jî wiha ye:

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Wekî tê dîtin, cihderka her duyan jî paşdevkî û kurt in. Loma mirov dikare bibêje û îddîa bike ku ev her du jî wekî hev tînin qebûlkirin loma divê ev guherîn ne tiştekî ecêb be û wekî normal bê qebûlkirin.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 12. Guherîna “î” û “u”yê

Li gorî teşeyê lêvan herfa “î”yê dûz e lê herfa “u”yê gilover e. Her du herf jî li gorî teşeya çeneyê teng in û li gorî tîkiliya zimên û diranan zirav in.

Bo mînak

siwar – suwar (h. 18: 3)

mîhim - muhim (h. 19: 5)

imîd – umîd (h. 5: 5)

huşyar – hişyar (h. 8: 10)

bulbil - bilbil (h. 22: 13)

wusan – wisa (h. 14: 9)

buhar - bihar (h. 20: 6)

3.6.1.1.13. Guherîna “a” û “e”yê

Guherîna herfên “a” û “e”yê betir bikaranîna herfa “a”yê tîne bîra mirovan ya ku di devoka toriyan de pir e. Ev guherînek wekî guherîneke wisa ye ku bi piranî bi bandora devok û di kêma erdnigariyên de tê dîtin. Rewş û analîza herfan wiha ye:

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Li gorî domdariya herfan “a” dirêj e, li gorî cihê derketinê paşdevkî ye û li gorî asta derketinê jî nizm e. Herfa “e”yê bi du xalan cuda ye. Li gorî domdariyê kurt e, li gorî cihê derketinê pêşdevkî ye û li gorî asta derketinê jî nizm e. Herfên “a” û “e” yê wekî tê dîtin her du jî herfên “nizm” in.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 13. Guherîna “a” û “e”yê

Li gorî teşeya lêvan her du herf jî dûz in û li gorî teşeya çeneyê dîsa jî her du herf fireh in û li gorî têtikiliya zimên û diranan her herfa “a”yê stûr e û herfa “e”yê zirav e.

Mînak

zardeşt – zerdeşt (h. 19: 9)

ziyaretgah - ziyaretgeh (h. 26: 4)

3.6.1.1.14. Guherîna “e” û “o”yê

Guherîna “e” û “o”yê bi vî şiklî guherîneke dijwar e û ev guherîn, ne guherîneke pir belavbûyî ye. Helbet ji ber ku xebate me xebateke nivîskî ye loma mînakên devkî ne di vê analîzê de ne.

	Dirêj		Kurt	
	Pêşdevkî	Paşdevkî	Pêşdevkî	Paşdevkî
Bilind	î	û		i, u
Navîn	ê			
Nizm		a, o	e	

Herfa “o” û “e” li gorî asta derketinê nizm in. Herfa “o”yê li gorî domdariyê dirêj e û li gorî ciyê derketinê jî paşdevkî ye. Herfa “e”yê li gorî domdariyê kurt e û li gorî asta derketinê nizm e.

	Dûz		Gilover	
	fireh	Teng	Fireh	Teng
Stûr	a		o	û
Zirav	e, ê	i, î		u

Tablo 14. Guherîna “e” û “o”yê

Herfa “o”yê li gorî teşeya lêvan dûz e, li gorî têtikiliya zimên û diranan zirav e. Herfa “o”yê li gorî teşeya lêvan gilover e, li gorî têtikiliya zimên stûr e. Ji bo her du herfan, xala hevpar her du jî li gorî teşeya çeneyê fireh in.

Bo nimûne

serek wezîrî - serok wezîrî (h. 46:6)

Nîrxandina Herfên Dengdêr

Weki nîrxandina taybetmendiyên herfên dengdêr, çar (4) bin beş di nav xwe di heman jêderkê de bi tevahî, heft (7) binbeş di nav xwe de wekî nêvî di heman jêderkê li gorî taybetmendiyên fonolojîk hatine guhartin û sê (3) binbeş di jêderkên cuda de hatine guhertin û taybetmendiyên xwe li gorî taybetmendiyên tabloyê girtine.

3.6.1.2. Guherîna Herfên Dengdar

Herfên dengdar, wek ku ji navê wan tê fahmkirin, bi alîkariya dengdêrekê derdikevin. Yanî bê dengdêr dernakevin. Dema ku ev herf bi dengdêra xwe werin nivîsandin wek du herf tên nivîsandin. Wek: B=be, C=Ce. Ev herfên dengdar, bir alîkariya lêvan, diranan, ezmanê dev, poz an qirikê derdikevin (Aslanoğlu, 2019: 16). Loma dema ev herf tên bilêvkirin hertim wekî dengdêra “e”yê jî tê gotin.

Li gorî xebata Baranî (2018: 25)

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

3.6.1.2.1. Guherîna “q” û “k”yê

Di alfabeya CABî de, herfên “q” û “k”yê heya hejmara 24an ji dêvla hev ve hatibûn bikaranîn an jî terciha wî bû ku dawiyê biryara guherîna her du herfan da. Dawiyê, ji denga, ji cihderka wan û berhevdana wan a zimanên beramber yê malbata îndo ewropî, CAB biryara guherîna her du denga da ku di nivîs û axaftinê de wekhevîyeke çêbike. Hinek mînakên ku di serî de herfa “q” û “k” di cîyê hev de hatine bikaranîn wekî jêr in:

vedîqe

nas qirin

qomele

diqare

qurdîtî

çêqirin

lêqirin

şiqle

dîroq

Kedrîcan – Qedrîcan

Qamiran - Kamiran

pêşveqetînê

belavqirinê

qurdîstanê

Ev dengdar bi taybetî di peyvên zimanên derveyê îranî de xuya dibin. Lê kêman caran di peyvên ku raya wan îranî ye de jî xuya dibin (Bedirxan, 2012: 29)

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k , q , x

Herfên “q” û “k”yê ji qirik û arikê derdikeve loma nêzî hev in.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 15. Guherîna “q” û “k”yê

Herfên “q” û “k”yê herfên hişk û nedomdar in û ji ber ku ji heman cihî derdikevin guherîna nav xwe de wekî xwezayî tê qebûlkirin û însan bi rehetî ji hev fahm dikin.

3.6.1.2.2 Guherîna “h” û “y”yê

CAB (2013: 31) herfa “h”yê wiha dide nasîn;

H — domdar nerm/ dengîn. Hûnerînek li peyvira vê dengdarê sudeke taybet dide; bi rastî, ew ji bo taswîrkirina du pêvajoyên herî karakteristik yê geşedaniya fonetîka kurdî imkân dide. Ya ewil giringiya berbiçav ya “h” yê ye, ku cihe gelek fonemên iraniya kevin digire; ya duyem jî, dem bi dem ji hole rabûna vî dengî ye

Ev jî guherîneke gelemperî ye. Herwiha, li hinek deveran ev guherîn hêj neqediya, lê em bi rehetî dikarin di *Hawarê* de terciha wê demê û ya niha bi her du forman jî bibînin.

Bo nimûne

Dihar - diyar (h. 5:7)

Mehir - meyr (h. 5:7)

Giha – giya (giya – giha) (h. 5:7)

Bi rastî jî, piraniya devokên kurdiya roja me, meyil didin ji sîstema xwe ya dengdaran “h” yê biavêjin (CAB, 2013: 31)

Gava ku dengdareke din cihê wê digire.

Mîn: Parkîta *-ahî*, ku : *-ayî*, *-atî* dide.

Qertafa raderî *-ihan*, ku *-iyan* dide.

Meyter, ji bo *mehter*,

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 16. Guherîna “h” û “y”yê

3.6.1.2.3. Guherîna herfa “v”yê bi “d”, “y”, “m” û “b”yê re

Bikaranîna “v”yê di senifandina zaravayên kurdî de krîtereke gelek giring e (Bedirxan, 2013: 20). Mirov dikare herfa “v”yê di nav her sê zaravayan de bibîne. Mînakên ku Bedirxanî (2013: 21) dane wiha ne;

nam (kurm. *nav*), *xam* (kurm. *xav*), *nîm* (kurm. *nîv*), *zama* (kurm. *zava*), *gam* (kurm. *gav*), *amnan* (kurm. *havîn*), *zimistan* (kurm. *zivistan*), *sîm* (kurm. *zîv*). Ser da jî, *byên* iranî ku di kurmanciyê de bi “v” yêhatine guhertin, di dumilî de w dide: *aw* (kurm. *av*), *sew* (kurm. *sev*), *lew* (kurm. *lêv*).

Guherîna herfa “v”yê hem di nav zaravayên kurdî de û hem jî di nav kurmancî de gelek tê dîtin. Em dizanin ku guherîn carinan dibin varyasyon û dawiyê jî varyasyon dibin guherîn. Muhammed di pirtûka xwe de bidextxistina herfa “d”yê wiha şîrove dike.

Di kurmancî de V dikare li destpêk, nav û dawiya peyvê peyda bibe:

- destpêk: van, vebûn, vê, vir, vî...
- nav: bivir, dever, evîn, êvar, revandin...
- dawî: av, çav, dev, ev, sêv, şev...

v-d	tevdîr – tedbîr (h. 9: 10)
v-y	siyavend - siyabend (h. 13: 5)
v-m	netevav - netamam (h. 18: 3)
v-b	pîrhevok – pîrhebok– pîrebok (h. 12: 9)

Di nav van de, guherîna “v” û “b”yê di nav zaravayan de jî bala mirovan dikşîne. Em dikarin hinek mînakên balkêş ji xebateke guherîna dengan kurdî de (Malmîsanij, 2013: 22) ve wiha pêşkêş bikin:

Kirmanckî	Kurmancî
Va	ba
Varan	baran
Veracor	berjor
Vîst	bîst

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Herfa “v”yê bi herfên “b”, “m”, “d” û “y”yê re hatiye guhartin. Herfên “b” û “m”yê lêvkî ne, loma nêzî hev in û em dikarin îddîa bikin ku guherînên heman jêderkan wekî rehetir pêk tên. Lê guherîna “v”yê bi herfên “d”yê ku diranî ye û “y”yê ku pêşarikî ye ji ber jêderkên cuda zehmetir pêk tên.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 17. Guherîna herfa “v”yê bi “d”, “y”, “m” û “b”yê re

Herfa “v”yê wekî herfên “m” û “y”yê domdar û nerm e lê herfên “b” û “d”yê nedomdar û nerm in. Ev herf giş nerm in, wekî tê dîtin di nav xwe de xwediyê hevpariyekê ne.

3.6.1.2.4. Guherîna herfa “w”yê bi “b”, “h”, “k” û “y”yê re

Meyla gelek herfan ji bona guherînê heye û herfa “w”yê jî herfek bi vê potansiyelê ye. Di *Hawarê* de, sê guherînên herfa “w”yê bi herfên “b”, “h” û “y”yê hatine tespîtîkirin û wiha ne:

Mînak

w-b	keywan -keyban(î) (h. 11:11)
-----	------------------------------

Mirov dikare vê guherînê bi rehetî di kirmanckî de jî bibîne. Mînaka herî belavbûyî mînaka peyva “berfê” ye. Ku di kirmanckî de wekî “werfê”tê bikaranîn.

w-h	zuwa – zuha (h. 33:5)
-----	-----------------------

Guherîneke ku deng û herfên soranî tîne bîra mirov guherîna herfên “w” û “h”yê ne. Niha jî rasthatina vê guherîna herfên “w” û “h”yê li hinek deveran wekî cuda pêkan e. Mirov dikare bi esehî bibêje ku rêjeya W di nivîsên soranî de bi ihtimaleke gelek mezin ji rêjeya W di kurmanckî de jî zêdetir e (Muhammed, 2016: 211)

Bo mînak

giwayên-gihayên (h. 5: 7)

bahol- bawol – bawûl

dahol – dawil- dawul (Malmîsanîj, 2013: 56)

w-k	zarowên -zarokên (h. 29: 11)
-----	------------------------------

Guherîneke din a ku dîsa li gorî bilêvkirinê pêk hatiye ya herfên “w” û “k”yê ye. Guherîna herfên “w” û “k”yê ne gelek zêde ye. Em dikarin bibêjin ev guherîn. Di

nav gel de qediyaye û bi piranî peyva “zarokên” tê tercihkirin. Herfa “w”yê dema wekî qertaf tê bikaranîn, ew dikare di bilêvkirinê de hinek zehmetiyan derxe an jî bikaranîna ku bêtir hatiye tercihkirin herfa “y”ê ye. Ev guherîn di nivîsê de bi tevayî wekî forma herfa “k”yê cihê xwe girtiye, lê wekî ku tê zanîn li herêma navçeya Stewrêya Merdînî, wekî li hin gundên derdora Ewîna herfa “w”yê hêj jî tê bikaranîn.

Bo mînak

metrowan – metroyan (h. 6: 1)

zarowên - zarokên (h. 9: 1)

w-y	duwîm -duyem (h. 23: 1)
w-y	bubuwana - bibuyana (h. 21: 8)
w-y	riwê - ruyê (h. 30: 5)
w-y	ordiwa -ordiya (h. 30: 9)
w-y	Xwedê ne biwa - ne bûya (h. 29: 1)
w-y	diduwan (h. 11: 14)

Guherîna herî zêde bi awayekî nivîskî di herfên “w” û “y” de tê dîtin. Sedemek vê guherînê rehetiya bilêvkirina “y”yê ye, loma gelek însan herfa “y”yê tercih dikin. Di hejmara 4an (1932:4) de, CAB li ser guherîna herfên “w” û “y”yê disekine. Di ser re, di hejmara 5an (1932: 7) de, sedema tercihkirinê wiha şîrove dike:

Ji ber qo bilêvqirina “y” ji ya (w) hêsanîtir û (y) dengdareqe nerm e, hêdî hêdî diqeve zarên wan qurdan jî qo dengdêra (û) stûr û (o) weq xwe dixwînin.

Carînan jî di nav pirsan de diqeve şûna (w)

Suwar – siwar – siyar

Li gorî jêderkan tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Guherîna “w”yê bi herfên “y”, “h” û “k”yê re guherîna jêderkê bi awayekî vekirî nîşanî me dide. Jêderka “w”yê ku lêvkî ye derbasî pêşarikê (y) û qirik û arikê dibe.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h , s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w , y, z
Nedomdar	p, ç, t, k , q	b , c, d, g

Tablo 18. Guherîna herfa “w”yê bi “b”, “h”, “k” û “y”yê re

Dema ev tablo tê nirxandin, her herfek wekî bê qaîde derbasî cihên din bûne xuya dike lê herfên “w”, “h” û “y” domdar in, herfa “k”yê nedomdar e. Guherîn li gorî dengên hişk, nerm û domdarî û nedomdariyê diguhere.

3.6.1.2.5. Guherîna herfa “z” û “j” yê

Guherîna herfa “z”y bi herfên din re ji mêj ve tê dîtin. Ew herf dişibe “s” yan jî “ş”ya farisî û herfa “z”yê di dumilî de bêtir tê dîtin (Bedirxan, 2013: 24) Di nav zimanên îranî de, ev guherîn tê dîtin ku em baş dizanin bi taybetî guherîna “z” û “j”yê gelek kevn e û di kurmancî de jî tê dîtin.

Bo mînak;

Îroz → îroj

Ez zî → ez jî (Herêma Licê)

Mînakên *Hawarê*;

j-z	jengdar – zeng (h.20: 7)
j-z	jeng - zeng (h.49: 12)
j-z	jehmet - zehmet (h.12: 14)

Guherîna “z” û “j”yê jî bi rehetî derdikeve pêşiya me

Wekî mînak

z-j	rozname – rojname (h.9: 13)
-----	-----------------------------

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
-------	--------	----------	----------------

b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j , c, ç, ş, y	g, h, k, q, x
------------------	----------------------------	-----------------------	---------------

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j , l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 19. Guherîna herfa “z” û “j” yê

Cihderka wan heman cihê, her du herf jî domdar û nerm in.

Guherîna “d” û “z” yê

Guherîna “d” û “z” yê gelek navdar û belavbûyî ye. Di gelek mînakên de ev cudahî tê tespîtkirin.

Bo mînak;

Ji mînakên “hidmet” û “hizmetê” yek erebî ye سرویسه û yek jî tirkî ye. Hebûna “z” yê di tirkî de ne diyar e. Gelek xebat û rapor ji aliyê Meier (1981, 103-113) ve li ser guherîna d/z yê hatine nivîsîn.

Tiştê ku di belgekirina nivîskî ya pêşîn de dikare were derxistin bi daneyên diyalektolojîk ên nûjen re pir baş li hev dike: peyva xedmat 'xizmet' (← Ar. Khidmat) di zaravayê Xoresanî yê Birjand de guhertoyên xezmad/xedmad hene; ew xezma ye: t li Zāboli (Sistān), xezmat li Mašhadi (Xorās)n, û her weha li Davāni, Zarqāni (Fārs), û Dašttestāni. " (Filippoe, 2008: 187).

Wekî hatibû gotin, peyvên mirad û mirazê wekî heman varyasyonê dişibin hev. Ev peyveke erebî ye. Bi gelemperî di erebî, farsî, tirkî û kurmancî de “d” ye. Lê ev peyva deyngrîtî ya “z” yê nayê fahmkirin. Ev peyvên erebî ne.

“Zana” û “dana” peyvên cuda ne. Wekî guherîna “damat” (zamat) û “zave”. Di Proto Hind û Ewropî de $g' > d$ di farisî de lê di kurmancî de “z” ye. دان سه تن Bi “d” ya ku di kurdî de dibe zanibun.

Peydabûna D ji Z ne di kurdî de lê di farisî de diyardeyeke berbelav e (Muhammed, 2016: 98): ev diyarde jî temasa zimanan û bidestxistina taybetmendiyên nû derdixe.

farisî	avestayî	kurdî
daniştên	zan	zanîn
damad	zamater	zava

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d , l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Herfên “d” û “z”yê wekî tê dîtin diranî ne û jêderka wan yek e. Niha meyla gelemperî di kurmancî de li ser bikaranîna herfa “z”yê ye.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d , g

Tablo 20. Guherîna herfa “d” û “z”yê

Li gorî derketin û asta domdariyê jî herfên “d” û “z”yê ji hev cuda ne. Herfa “d”yê nedomdar û nerm e, herfa “z”yê domdar û hişk e. Di guherînê de herçiqas ji hev dûr jî bin jî, ew xwediyê şibandineke hevpar in.

Mînak;

mirad – miraz (di hin hejmarên *Hawarê* de berovajiya wan hatiye dayîn)

hîdmed - hîzmet (xidmet - xizmet)

dana – zana

kaxid – kaxiz (h.14: 9)

Ader – Azer (h.9: 13)

Lê belê, di kurmacî de gelek peyvên wekî rehên hevpar yê farisî hene, ji ber vê yekê mînakê we yekê di kurmacî de bi gelemperî bi eslê xwe farisî ne. Eleqeya xeletiyên axaftinê bi kêmasî ve heya 1886an dere ku ew dem gava zimannas Hermann Paul pêşniyar kiribû ku ew dikarin sedemek xwezayî ya hin cûreyên cudahiya zimên eşkere dikin derxin (Fromkin, 1973: 13).

Guherîna “z” û “s”yê

Ev guherîna her du herfan jî di *Hawarê* de hatine tespîtkirin û tê dîtin.

Bo mînak

z-s	qereziwan-qeresiwan (h.38: 11)
s-z	paraztin - parastin (h.18: 15)

3.5.1.2.6. Guherîna herfa “j” û “ş”yê

Herfa “j”yê;

Li ser hebûn û bikaranîna herfa “j”yê Husein Muhammed¹⁶ lêkolînên xwe wiha şîrove dike;

Li gor lêkolînên me, rêjeya herfa J di nivîsên kurmacî de 2 % e. Yek ji giring yê zêdehiya herfa J daçeka ”ji, jê” ye ku pirr tê bikaranîn û wisa rêjeya herfa J di nivîsan de zêde dike. Herwiha peyvên “jin, jîyan, jîn” û formên wan yê çemandî we rêjeyê zêde dikin.

Lê wek din J di kurdî de dengê nadir e û kêr peyda dibe. “J” herwiha hem di zimanên cîranên kurdî de (erebî, tirkî, ermenî, aramî) û hem jî yê lêzimî kurdî de (farisî, zimanên din yê hindû ewropî) yan kêr e yan jî heta qet peyda nabe (bo nimûne di erebiya standart û di aramî de).

Herfa “j”yê wekî di rêjeyê de jî tê dîtin ne di rêjeyê zêde de ye. Bikaranîna “j”yê ya daçekan û hinek peyvên pir gelemperî dikare bandoreke wisa bide mirovan wekî ku ew pir zêde tê bikaranîn bide mirovan. Ji aliyê dîrokê ve, J di kurmacî de

¹⁶https://zimannas.wordpress.com/2015/12/16/denge-j-peydabun-u-guherina-wi/#_ftn1

dengekî biserketî ye: wê cihê gelek dengên din girtiye û bergeha xwe berfireh kiriye (Muhammed, 2016; 130).

Herfa “j”yê di gelek zimanan de cihê xwe girtiye û di hin zimanan de balê dikişîne. Tîpa J ya alfabeya latînî ya standart di wan zimanên ku sedsalan e bi vê alfabê tîp nivîsandin de ji bo dengên ji hev cihê tê bikaranîn. Ev tîp di îtaliyanî û almanî da ji bo dengê /y/, di fîrenkî da ji bo dengê /j/, di îngilîzî da ji bo dengê /c/ û di sipanî da ji bo dengê /x/ tê bikaranîn¹⁷.

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y,	g, h, k, q, x

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 21. Guherîna herfa “j” û “ş”yê

Hinek guherînên herfa “j”yê wekî jêr in

ş-j	dişwar - dişwar 582 – 588 (h.5: 4/34:13)
-----	--

Guherîna peyva “dişwarê” di roja me de nayê zanîn. Gelek kes vê peyvê wekî forma niha “dişwarê” bi kar tîne. Berovajîya vê jî tê dîtin. Dengê /J/ di Kirmanckî de carinan dibe /Ş/ (Aslanoğlu, 2019: 21).

Herwiha di roja me de jî, guherîna herfên “j” û “ş”yê di kûşandîna lêkeran de tê dîtin.

Kuş → dikuje

¹⁷<https://raif-yaman.niviskar.org/kurdiya-bilind.html>

3.5.1.2.7. Guherîna herfa “j” û “s”yê

Ev guherînek e ku hêj jî neqediyaye. Em dikarin li gelek deverên nêzî hev ku zaravayên din diaxivin de jî bibînin ku guherîna herfên “j” û “s”yê heye.

Bo nimûne;

hej - hes (h.6:2)

hejî - hes kirin (h.45: 2)

hejkirin - heskirin (h.28: 12)

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 22. Guherîna herfa “j” û “s”yê

3.5.1.2.8. Guherîna herfa “j” û “c”yê

Ev guherîn di îngilîzî de jî di axaftinê de heye. Minakên John (Con) û Jane (Ceyn) tên zanîn. Ev guherîn di kurmancî de jî heye.

j-c	jendirme –cendirme(h.10:11)
c-j	kevcâl-kevjâl(h.12:9)

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Wekî xuya ye, guherîna herfên “j”yê bi “ç” û “ş”yê re ji heman jêderkê derdikevin, lê bi “s”yê re ji jêderka diranê derdikeve. Jêderka “s”yê ji yên din cuda ye û hatiye guhartin.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 23. Guherîna herfa “j” û “c”yê

Guherîna herfa “j”yê bi “s”, “ş” û “ç”yê re pêk tê. Herfên “s” û “ş”yê wekî “j”yê domdar in lê hişk in ne nerm in. Herfa “ç”yê jî nedomdar e, bi tevahî ji yên din cuda ye.

Wekî mînak

roj - roc

erzan – ercan

Herwiha carinan K ya bêlerz jî (ku hevbera wê ya bilerz G ye) J dike Ş (kiriye (Muhammed, 2016: 131):

- kurmanciya navendî: kîjan

- kurmanciya rojhilatî: kîşk

Mînakên ku bi vî rengî hêj guherîna xwe neqedandine li hin deverên derdikevin pêşiya mirovan.

3.5.1.2.9. Guherîna herfa “y”yê bi “h” û “k”yê

Guherîna herfa “y”yê bi sê cûreyên gelemperî derdikevin pêşiya me. Guherîna “y”yê bi herfên “h”, “k” û avêtina “y”yê derdikeve pêşiya me.

Guherîna “y” û h”yê

Wekî tê dîtin, mînakên “giya” û “tevayî”yê de jî tê dîtin, herfa “y”yê bûye “h”.

y-h	giya – giha (h.5: 7)
y-h	tevayiya -tevahiya (h.27: 5)

Herfa “y”yê wekî li jêr jî xuya ye, guherîna “y” û “k”yê dibîne. Li vir divê koka peyvê “zarok” be lê li hinek de vera “herfa “k”yê hatiye avêtin û peyv di axaftinê de bûye “zaro” û dema qertafek lê hatiye barkirin, ji dêvla herfa “k”yê herfa “y”yê hatiye zêdekirin. Herwiha ev bi xwe ji di nav demê de bûye guherîna herfê.

y-k	zaroyên -zarokên (h.31: 3)
-----	----------------------------

Dema mirov li peyva “zaroyê” dinêre, dibîne ku car caran wekî bê “k” tê bikaranîn û herfa “k”yê nehatiye bikaranîn. Ev varyasyon hêj di roja me de jî hene.

y-k	zaroên – zaroyên - zarokên (h.13: 5)
-----	--------------------------------------

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Herfa “y”yê wekî jêderkê pêşarikî ye lê yê din qirikî û arikî ne, ji hev ne dûr in û nêzî hev in. Mirov dikare bibêje ji heman jêderkê derdikevin.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 24. Guherîna herfa “y”yê bi “h” û “k”yê

Guherîna “y”yê bi “h” û “k”yê re wekî domdarî û asta derketinê diguhere. Digel “y” û “h” domdar jî bin, “h” hişk e lê “y” nerm e. Herfa “k”yê wekî “h”yê hişk e lê nedomdar e.

3.5.1.2.10. Guherîna herfa “h”yê bi “y”, “v”, “w” û “d”yê

Guherîna herfa “h”yê bi mînakên cûr bi cûr de jî tê dîtin. Herfa “h”yê ji aliyê Husein Muhammed (2016: 119) ve wiha tê pênasekirin;

Di dengnasiya kurdî de H / h nîşana dengê ”qirrikî-xişok-nevizok-bêlerz” e. Mebest ji ”qirrikî” ew e ku cihê peydabûna vî dengî di devî de li ber qirrikê yan hefikê, gewriyê ye. Xişînek di dema derketina wê de tê bihîstin loma jê re ”xişok” tê gotin. H dengê ”bêlerz” e anku di dema derketina wê de perdeyên dengî di gewriyê de nalerizin. Di hin zimanan de forma wê ya bilerz jî heye.

Mînaka guherîna “h” yê di *Hawarê* de piranî bi “y”yê re tê dîtin;
Mînakên balkêş û cuda wekî jêr in;

h-y	tirsiha – tirsiya (h.14: 5)
h-y	3 gahên wisa - gayên (h.18: 15)
h-y	sih - siha - siya (h.28: 8)
h-y	zêdahî - zêdayî (h.37: 2)
h-y	hindikahî - hindikayî (h.37: 2)

Wekî tê dîtin guherîna herfa “h”yê piranî li kiteya (heceya) dawî ya peyvê de pêk tê.
hindahî → hindikayî
zêdahî → zêdayî

Guherînên herfa “h”yê bi herfên “d”, “v” û “w” yê re jî kêr hatin dîtin.
Mînakên heyî wiha ne;

h-v	hir – vir (h.8: 7; 21: 11)
h-w	hûsan - wûsa - wisa; hinda – winda (h.24: 8)
h-d	azahî - azadî (h.28: 8)

Herwiha herfa “h”yê carinan di dawiya peyvê de tê avêtin û ji dêvla “ih”ê herfa “î”yê tê bikaranîn.

Bo mînak

cih → cî

mih → mî

rih → rî

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v , w	d , l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h , k, q, x

Dema mirov guherîna herfan dibîne bi rastî jî candarbûna zimanan ji ber tercihên bikarhênerên zimên şaş dimîne. Lê ev guherîn jî li gorî terciha însanan pêk tên.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h , s, ş, x	j, l, m, n, r, v , w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d , g

Tablo 25. Guherîna herfa “h”yê bi “y”, “v”, “w” û “d”yê

Li gorî asta derketin û domdariyê herfa “h”yê ku hişk e bi herfên “v”, “w” û “y”yê re ku nerm in diguherin.

3.5.1.2.11. Guherîna herfa “l” û “r”yê

Guherîna herfên “l” û “r”yê hêj jî guherîna xwe neqedandiyê û di nav gel de her du cûre jî tene tercihkirin, herwiha axêver her daîm di axaftin û bilêvkirinê de rehetiyê tercih dikan ku bikaribin lezgîniya axaftina xwe li gorî xwe hilbijêrin. Di gelek mînakên de guherîna *r-l*, di nav peyvê an di dawiya wê de dikare bê dîtin (Bedirxan, 2013: 24):

Kelmêş, ji bo *kermêş* (ji dêvla: mêşa keran kermêş hatiye bikaranîn).

Şelît, ji bo *şerît* (er. شطر).

Hinek mînakên ku îro di nav gel de bi her du awayan tên bilêvkirin û her du jî tên bihîstîn wiha ne;

gilover – girover

bila – bira

bilûl – bilûr

Mînakên di *Hawarê* de bi gelemperî hatine bikaranîn wekî jêr in;

l-r	arîkar - alîkar (h. 11: 14)
r-l	arîqarî - alîkarî (h. 15: 2; 33: 1)
r-l	arî - alîkirin (h.19: 2)
r-l	bila - bira (h. 11: 14)
l-r	bergîr - belgîr (h.34: 9)

H. Muhammed (2016: 119) ji bo peydabûna dîrokî ya “l”yê şîrove û mînakên wiha dide ku têkiliya navbera zimanan jî hem bicî û hem jî teqez bike.

Dengê L di makezimanê proto-hindûewropî de hebû. Em dikarin li vê derê çend nimûne ji zimanê mak û herwiha ji ”keçên wê” jî bidin.

Proto-hindûewropî	kurdî	farisî	latînî	inglîzî
*leb-	lêv	leb	labium	lip
*lek-	ling	leng	lacertus	leg

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Herfa “l”yê heman guherînê nîşan dide her du ji heman jêderkê derdikevin û diranî ne. Jêderka wan naguhêre wekî hev dimînin.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 26. Guherîna herfa “l” û “r”yê

3.5.1.2.12. Guherîna herfa “t”yê bi “s”, “d” û “j”yê re

Guherîna herfa “t”yê piranî guherîneke kevn e û dişibe guherîna “d” û “z”yê. Herfa “t”yê wekî di mînakên jêr de jî xuya dîkin bi herfên “d”, “j” û “s”yê dîkin û em dikarin îddîa bikin ku ev guherînên navborî pêvajoya xwe qedandine.

t-s	mîrat - mîras (h.53: 1)
t-d	tajotin - diajotin (h.50: 3)
t-j varyasyon	nimêt - nimêj (h. 38: 8)

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Li gorî jêderkê, herfa “t”yê û herfên “d”, “s” diranî û herfa “j”yê jî pêşarikî ne. Di van guherînan de, guherîna herfekê fahmkirina peyvê xera nake loma peyvên nû ku formeke û dengeke nû girtine tên fahmkirin.

Bedirxan (2013: 22-23) guherîna “d” û “t”yê wiha dinirxîne; Taybetmendiya “d” yê heye ku di formên racivî de vedimire dibe wek *t* yê. Bi taybetî di rewşên jêrîn de tabî‘ê ve guherine ye:

a) gava *pêşqertafa lêkerî* a di-bi dengdêrekê re dicive.

Mînak: *Têm*, ji bo *diêm* (lêkera *hatin*).

Tînim, ji dê (vî) la *diînim* (lêkera *anîn*).

Têşe, ji dê(vî) la *diêşe* (lêkera *êşin*).

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 27. Guherîna herfa “t”yê bi “s”, “d” û “j”yê re

Li gorî guherîna asta derketin û domdariyê, herfên “s” û “j”yê domdar lê hişk û nerm in; herfa “t” û “d”yê jî nedomdar lê hişk û nerm in. Her herf li gorî asta derketinê û li gorî domdariyê ji hev cuda ne.

3.5.1.2.13. Guherîna herfa “b” yê bi “v” û “k”yê re

Guherîna “b”yê bi gelek herfan re heye, guherîna ya herî berbelav û ya herî ku di pirtûkan de jî hene gelek in. Mînaka “b” û “v”yê gelek tê zanîn.

Bo mînak (Bedirxan, 2012: 18)

“b” û “v” → sibê – sivê, kebanî – kevanî

“b” û “v” → tevdîr – tedbîr, evdîlkerîm – ebîlkerîm

b - v → bab – bav (h.33: 15)

Guherîna “b” û “k”yê wiha ye;

b-k	belbî – belkî (h.30 :9)
-----	-------------------------

Peyva “belbî” hêj jî li derdora Dêrika Mêrdînê tê bikaranîn.

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Guherîna “b” û “k”yê jî ji jêderkên cuda derdikevin. Herçiqas herfa “b”yê lêvkî be jî ku ev hêsanîyeke dide bilêvkirinê jî, niha em terciha însanan bi piranî herfa “k”yê ye.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v , w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k , q	b , c, d, g

Tablo 28. Guherîna herfa “b” yê bi “v” û “k”yê re

Her du herf jî nedomdar in, herfa “k”yê hişk e û herfa “b”yê nerm e.

3.5.1.3. Guherînên îstîsna û kêr tê dîtîn

3.5.1.3.1. Guherîna “f” û “v”yê

Guherîna “f” bi herfa “v”yê re gelek tê zanîn. Ji aliyê dengnasî ve F ji hemû dengên zêdetir nêzîkî dengê V ye. Ew her du dengên lêvî-didanî û xîşokên nevizok in. Tenê lerza wan cuda ye: V bilerz e lê F bêlerz e. Gava ku dengê bêlerz bikeve pey V, hingê V dibe F:

- di-axiv-im à axif-tin
- di-kev-im à kef-tin (à ketin) (Muhammed, 2016: 108)

f-v	dirûf - dirûv (h. 29: 11)
-----	---------------------------

Hinek mînakên ku CABî (Bedirxan, 2013: 19) di kitêba xwe de daye li jêr in;

hefsar – hevsar

ketin – keftin – kevtin – kewtin

mofirk – movik

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Herfên “f” û “v”yê lêvkî ne û di bilêvkirinê de jî ji bo bilêvkirinê gelek nêzî hev in û gelek însan belkî nikaribe ji hev veqetînin.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 29. Guherîna “f” û “v”yê

Herçiqas herfên “f” û “v”yê li gorî asta derketin û domdariyê domdar jî bin, herfa “f”yê hişk e û herfa “v”yê nerm e.

3.5.1.3.2. Guherîna “k” û “y”yê

Peyva “k”yê di axaftinê de dikare carinan bibe sedema hinek dijiwariya bilêvkirinê, bi taybetî jî di nav û paşîya peyvên de. Loma wekî qaîdeyek zimên gelek însan dema axaftinê de herfên din hildibijêrin. Ji bo sivikkirin an jî rehetkirina herfa “k”yê jî herfa “y”yê hatiye tercîhkirin. Mirov dikare îddîa bike ku li gelek deveran guherîna “k” û “y” guherîna xwe qedandine. Herwiha mînak ku hatiye tesptkirin jî wekî mînakeke kevn e.

k-y	awakî - awayî (h. 28: 5)
-----	--------------------------

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Li gorî jêderkê herfa “y”yê pêşarikî ye herfa “k”yê jî qirikî û arikî ye. Herfên ku hertim ji qirikê derdikevin, diwariya bilêvkirinê jî derdixe, loma meyla însanan ew e ku rehetiya telafûz û axaftinê bibînin.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 30. Guherîna “k” û “y”yê

Herfên “y” û “k”yê li gorî asta derketin û domdariyê herfa “y”yê domdar û nerm bû û herfa “k”yê nedomdar û hişk e.

3.5.1.3.3. Guherîna “w” û “y”yê

Herfa “w”yê bi giloverkirina devî pêk tê. Gelek caran ev herf û herfa “v”yê tevlihev jî dibe. Lê herfa “w”yê wekî herf û dengê îngilîzî derdikeve (war/kurmancî; was/îngilîzî).

Bo mînak

w-y	hebiwa - hebûya (h.33 :1)
w-y	duwîm - duyem (h. 23:1)

Herfa “w”yê dema derdikeve ji pêşiya devê mirov derdikeve, lê herfa “y”yê ji heman ciyê dernakeve lê jêderka wan nêzî hev in (Tan, 2018: 49)

Peyva “hebiwa” bûye “hebûya, guherîna herfa “w”yê bandorê li herfa “i”yê jî kiriye. Herfa “i”yê bûye “û” û herfa “w”yê jî bûye “y”.

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Herfa “w”yê lêvkî ye. Di gelek zimanan de herfa “w”yê bi “v”yê tê tevlihevkirin (very - well; vine - wine). Herfa “v”yê di soranî de dibe “w” e. V-ya wê jî bi eslê xwe P bû, paşî bi bûye B û taliyê di kurmançî de bûye V (ve) û di soranî de jî gihiştiye forma W (Muhammed: 2016: 209). Pêşarikî û lêv wekî fîzyolojiyê nêzî hev in loma guherîna ku pêk tê bi rehetir tê fahmkirin.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 31. Guherîna “w” û “y”yê

Her du herf hem domdar û hem jî nerm in.

3.5.1.3.4. Guherîna “g” û “h”yê

Rêjeya cudahî yan jî varyasyona hinek herfan ji yên din gelek kêmtir in. Herfên “g” û “h”yê jî gelek kêmtir e. Guherîna “g” û “h”yê di gelek zimanan de qediyaye.

g-h	sagur-sahur (h. 34: 1)
-----	------------------------

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Herfên “g” û “h”yê qirikî û arikî ne loma guherîna wan bi xwezayî pêk tê. Îfade û bilêvkirina “g” û “h”yê dişibin hev loma dema guherîn pêk tê cudahiya navbera herfan ne pir e û guhdar hev bi rehetir fahm dikin.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h , s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 32. Guherîna “g” û “h”yê

Li gorî asta derketin û domdariya herfên “g” û “h”yê ji hev cuda ne. Herfa “h”yê domdar û hişk e û herfa “g”yê nedomdar û nerm e.

3.5.1.3.5. Guherîna “v” û “f”yê

V ya kurdî bi gelemperî wek “v” ya tirkî tê telafuzkirin. Lê li hin deveran (wekî li Botanê), dulevî ye û dengêkî pir nêzî ya “f”yê dide (Bedirxan, 2012: 19).

Mînakên guherîna “v” û “f”yê wiha ne (Malmîsanij, 2013: 54)

dav – daf (dafik)

hevsar – hefsar – hefser

zaf -zehf – zef – zehv

Mînaka *Hawarê*

change v-f	qevkas - qefkasye (h. 34: 12)
------------	-------------------------------

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f , m, p, v , w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Wekî diyar e, herfên “f” û “v”yê lêvkî ne loma guherîna wan gelek normal e. Dema mirov dengê “v”yê derdixe diranên jor li lêvên jêr dikeve û ev deng derdikeve loma derxistina dengê “v”yê ji “f”yê hinik girantir e.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 33. Guherîna “f” û “v”yê

Li gorî asta derketin û domdariyê jî herfên “v” û “f”yê her du jî domdar in lê herfa “f”yê hişk e û herfa “v”yê nerm e.

3.5.1.3.6. Guherîna “s” û “ş”yê

Guherîna “s” û “ş”yê guherîneke kêr peyda ye. Mînaka jêr jî guherîneke bi vî rengî ye.

ş-s	guhaste - gîhaşte (h. 35: 6)
-----	------------------------------

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Herfa “s” û “ş”yê ji jêderkên cuda derdikevin loma xwediyê jêderkên cuda ne.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 34. Guherîna “s” û “ş”yê

Herwiha li gorî asta derketin û domdariyê jî herfên “s” û “ş”yê domdar û hişk in.

3.5.1.3.7. Guherîna “g” û “k”yê

Bedirxanî (2012: 28) li ser guherîna “g” û “k”yê gelek şîrove û mînakan dane:

Di destpêka peyvan de, *k* carinan dengê *g* yê dide.

Mîn.: *Go*, ji bo *ku*.

Goçer, ji bo *koçer*.

Gopal, ji bo *kopal*.

Helbet li her deveran terciha wan dikare biguhere lê bilêvkirin wan li gorî rehetiya telafûzê diguhere.

Dengdarên *g* û *k* pir caran cihê hev digirin.

Min.: *Punk* û *pûng*.

Rizyang û *rizyanik*.

Zarong û *zarok*.

Çong û *çok*.

Brang û *brak*.

Mang û *mak*.

Mînaka *Hawarê*

g-k	gabûs – kabûs (h.36: 5)
-----	-------------------------

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Her du herf jî qirikî û arikî ne.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 35. Guherîna “g” û “k”yê

Li gorî asta derketin û domdariyê nedomdar in lê herfa “k”yê hişk e û herfa “g”yê nerm e.

3.5.1.3.8. Guherîna “m” û “n”yê

Ji bo herfa “m”yê Bedirxanî (2013: 21) dibêje tu taybetmeniyên balkêş ku divê bêne gotin tune ye.

Em di lêkolîna *Hawarê* de tenê rastî mînakeke guherîna “m” û “n”yê hatin.

m-n	giram – giran (h.10 :14)
-----	--------------------------

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m , p, v, w	d, l, n , r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Wekî tê dîtîn herfên “m” (lêvkî) û “n”yê (diranî) cuda ne.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m , n , r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 36. Guherîna “m” û “n”yê

Li gorî asta derketin û domdariyê, herfên “m” û “n”yê di heman cîyê tabloyê de wekî domdar û nerm cî digirin.

3.5.1.3.9. Guherîna “ş” û “ç”yê

Herfa “ş”yê piranî bi “j”yê re diguhere û ji hinek peyvên ku ji zimanên din derbasî kurdî bûne tê dîtîn.

Mînak

Mijûl, (ji erebî مشغول (Bedirxan, 2012: 25)

Guherîna herfên “ş” û “ç”yê jî gelek kêr in.

ş-ç	şardesalî – çardesalî (h. 14: 9)
-----	----------------------------------

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Her du herf jî pêşarikî ne.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 37. Guherîna “ş” û “ç”yê

Digel her du herf hişk jî bin li gorî asta derketinê, li gorî domdariyê herfa “ş”yê domdar û herfa “ç”yê nedomdar e.

Taybetmeniyêke din ya “ş”yê ew e ku carinan herfa “ş”yê dema di dawîya peyvekê be, dikare bikeve û peyva ku lê ye kurttir bibe.

Mînak

Avêtina “ş”yê	gî - giş (h.25: 3) gişk (h. 26: 6)
---------------	------------------------------------

3.5.1.3.10. Guherîna “g” û “c”yê

Guherînên hinek herfan gelek zêde ne, lê her herf di warê rêjeya guherînê de ne pir in û kêman in, hinek mînakên bi vî rengî û şeklî ku hatine guherîn wiha ne;

g-c	vêga - vêca (h. 26:5)
-----	-----------------------

Ev guherîn ne gelek e û mînaka “g” û “c”yê di gelek peyvan de nayê hemberî me. Di *Hawarê* de, mînakek ku balê dikişîne mînaka “vêga” û “vêca”yê ye.

Li gorî jêderka tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

Lêvkî	Diranî	Pêşarikî	Qirikî û Arikî
b, f, m, p, v, w	d, l, n, r, s, t, z	j, c, ç, ş, y	g, h, k, q, x

Her du herf jî nêzî hev in, herfa “g”yê (qirikî û arikî) û “herfa “c”yê (pêşarikî) dişibin hev jî.

Li gorî asta derketin û domdariyê tabloya dengdaran bi vî awayî ye:

	Hişk	Nerm
Domdar	f, h, s, ş, x	j, l, m, n, r, v, w, y, z
Nedomdar	p, ç, t, k, q	b, c, d, g

Tablo 38. Guherîna “g”û “c”yê

Her du herf li gorî asta derketin û domdariyê nerm û nedomdar in û xwediyê heman taybetmendiye ne.

Di nirxandina taybetmendiye dengdêran de, heft (7) binbeş bi tevahî li gorî jêderkên xwe di nav heman tabloyê de, duwanzde (12) binbeş li gorî jêderkên xwe wekî nîv tablo û pênc (5) binbeş jî qet nehatine guhartin.

Bandora nêzîkbûna jêderkan rêje û têkiliyan guherîn û wergirtina taybetmendiyan diyar dike. Bi tevahî wekî dengdêr û dengdar, em dikarin bibînin ku 11 herf di nav xwe de bi tevahî, 19 herf wekî nêvîhatine guherîn û 8 herf jî ne wekî hev in. Li gorî îstatîstîka hejmara herfan 38 herf bi hev re ketinê têkiliya guherînê ku taybetmeniyên xwe guhartine.

Nirxandin û agahiyên guherînê wiha ne:

Dengdêr

- Tablo 1 nêvî guheriye
- Tablo 2 tevahî guheriye
- Tablo 3 nêvî guheriye
- Tablo 4 tevahî guheriye
- Tablo 5 tevahî guheriye
- Tablo 6 nêvî guheriye
- Tablo 7 cuda guheriye
- Tablo 8 nêvî guheriye
- Tablo 9 tevahî guheriye
- Tablo 10 nêvî guheriye
- Tablo 11 cuda
- Tablo 12 nêvî guheriye
- Tablo 13 nêvî guheriye

- Tablo 14 cuda

Dengdar

- Tablo 15 tevahî guheriye
- Tablo 16 cuda guheriye
- Tablo 17 tevahî guheriye
- Tablo 18 nêvî guheriye
- Tablo 19 nêvî guheriye
- Tablo 20 tevahî guheriye
- Tablo 21 tevahî guheriye
- Tablo 22 cuda
- Tablo 23 tevahî guheriye
- Tablo 24 tevahî guheriye
- Tablo 25 nêvî guheriye
- Tablo 26 tevahî guheriye
- Tablo 27 cuda
- Tablo 28 nêvî guheriye
- Tablo 29 nêvî guheriye
- Tablo 30 cuda
- Tablo 31 nêvî guheriye
- Tablo 32 nêvî guheriye
- Tablo 33 nêvî guheriye
- Tablo 34 nêvî guheriye
- Tablo 35 nêvî guheriye
- Tablo 36 nêvî guheriye
- Tablo 37 cuda
- Tablo 38 nêvî guheriye

3.6.1.1. Avêtina Herfan

Di her zimanî de, mirov dikare rastî avêtina herfan bê. Lê ev pêvajo gelo sistematîk e an jî ji xweber e? Avêtina herfan di nav demê de li gorî pêwistiyên axaftvanan derdikeve.

3.6.1.1.1. Avêtina Herfa “î”yê

CABî di *Hawarê* de, hinek herfên wekî “î”yê nenivisiye ji bo ku wekî ew bilêvkirinê bibine û bi heman şeklî bêne telafûzkirin.

Mînakên vê yekê ku di *Hawarê* ku bi gelemperî hatine bikaranîn ev in;

avêtina “î”yê	zrav (h. 4: 4)
avêtina “î”yê	zraviq (h. 7: 5)
avêtina “î”yê	sîtêriq- stêrk (h. 5:5)
avêtina “î”yê	brayê min (h. 13:3)
avêtina “î”yê	drêjahî (h. 1:3)
avêtina “î”yê	znar (h. 1: 6)
avêtina “î”yê	zman (h. 1: 1)
avêtina “î”yê	zmanî (h. 1: 1)
avêtina “î”yê	blur (h. 1: 5)
avêtina “î”yê	bejnzrav (h. 8: 1)
avêtina “î”yê	drêjqî (h. 8: 1)

3.6.1.1.2. Avêtina Herfa “ê”yê

Avêtina herfa “ê”yê pirani di serê peyvê de pêk tê, bi vê formê hinek mînakan xwe dubarekirine û gelek caran jî tê dîtin. Avêtina herfa “ê”yê bilavkirinê siviktir û rehetir dike.

Mînakên ku me ji *Hawarê* bidest xistine wiha ne;

avêtina “ê”yê	êxistî (h. 21: 10)
avêtina “ê”yê	derêxist (h. 22: 15)
avêtina “ê”yê	êxistî (h. 21: 10)
avêtina “ê”yê	êxisitine (h. 39: 4)

avêtina “ê”yê	êxisrin (h. 21: 18)
---------------	---------------------

3.6.1.1.3. Avêtina Herfa “û”yê

Avêtina “û”yê li gorî yên din kêmtir e. Di her zimani de, ev pêvajo pêk tê. Herfa “û”yê ji hejmaran bigirin heya dubarekirina herfan derdikeve pêşiya me û di nivîsandinê de cihekî giring û berfireh digire.

Mînaka ji *Hawarê*

Avêtina herfa “û”yê	jinûbiyan-jinbiyan (h. 5: 5)
---------------------	------------------------------

Avêtina Dengdêran

3.6.1.1.4. Avêtina Herfa “n”yê

Herfa “n”yê ya ku tê avêtin piranî yan di navbera peyvê yan jî di dawiya peyvê de cî digire û bilêvkirina “n”yê bi vî awayî zehmettir e. Avêtina “n”yê bilêvkinê rehetir dike û peyv bi hêsanî derdikevin. Mînakên jêr dema tînin gotin, ev dijiwarîya bilêvkirina xwe nîşan dide. Meyla hêsanîkirina zimên wekî tînin carinan bi avêtina herfan carinan bi yekkirina du peyvên cuda, carinan jî bi hîlbijartina peyva hevware ya hêsan û bi awayên din derdikevin hemerî me.

Mînakên ji *Hawarê*;

avêtina “n”yê	dîsan – dîsa (h. 9: 7)
avêtina “n”yê	çawan ko - çawa ku (h. 9: 6)
avêtina “n”yê	gornistan - goristan – gor (h. 38: 7)
avêtina “n”yê	tinfin- tiffin (h. 43: 4)
avêtina “n”yê	ruhn - ruh (h. 17: 3)
avêtina “n”yê	gorn - gor (h. 17: 3; h. 22: 3; h.23: 15; h.11: 2)
avêtina “n”yê	êdîn-êdî (h. 8: 15)
avêtina “n”yê	pînc-pîc (h. 4: 3)

Xuya ye ku wêrarbûna peyvan, avêtina herfan bi awayekî sistematîk pêk tên û bawerî ew e ku dê ev guherîn bidome.

3.6.1.1.5. Avêtina Herfa “h”yê

Hinek herf wekî “h”yê di pêvajoya axaftinê de wenda dibin. Avêtin an jî wendabûna herfa “h”yê wekî di mînakên de jî zelal e, di serê peyvan û di navbera peyvan de pêk hatiye. Sedema giring ya avetin an jî wendabûna herfan lêgerîna rêyên telafûz yanî bilêvkirina hêsan e.

Mînakên ji *Hawarê*;

avêtina “h”yê	baz him - baz im (h. 16: 13)
avêtina “h”yê	hawakî - awakî - awayekî (h. 32: 8)
avêtina “h”yê	herêna - erêna (h. 32: 13)
avêtina “h”yê	mamhoste – mamoste (h. 3: 6)
avêtina “h”yê	him - im (h. 16: 13)
avêtina “h”yê	dihejmartin – dijmartin– jimartin (h. 28: 6)

3.6.1.1.6. Avêtina Herfa “r”yê

Zimannasiya dîrokî qadeke nû ye ku dive kurmancî bi gelek tiştan bê analîzkirin û xebatên ku bi dest bikevin bi awayekî sistematîk bîrên senifandin ji bo ku mirov bikare guherîna zimên bişopîne û daneyên girêdayî xebatê di nav zimannasiya dîrokî de cihê xwe bigire. Avêtina herfa “r”yê jî di vî warî de giring e. Ji bo sivikkirina telafûzê, avêtina “r”yê tê dîtin. Peyvên jêr jî bi heman şiklî dijiwarî û rehetiya telafûzê dide.

Mînakên ji *Hawarê*;

avêtina “r”yê	merzel-mezel (h. 41: 11)
avêtina “r”yê	peyar - peya (h. 45: 24)
avêtina “r”yê	pirzik – pizik (h. 55: 3)

3.6.1.1.7. Avêtina Herfa “w”yê

Avêtin, wendabûna herfê an jî guherîna peyvê ya “w”yê kêr hatiye dîtin. Dibe ku ev ne pir belavbûyî be. Dîsa jî di *Hawarê* de, derbarê avêtina vê herfê hinek mînak peyda dibin.

Mînakên ji *Hawarê*;

avêtina “w”yê	taus – tawus (h. 8: 3)
avêtina “w”yê	efiw – efû (h. 17: 10)

Li gorî mînaka duduyan, herfên “-iw”yê veguhestine herfa “û”yê ye. Herfa “w”yê ketiye lê bi guherîneke nû wêrar bûye.

3.6.1.1.8. Avêtina Herfa “y”yê

Mirov bi tevahî nikare îddîa bike ku ev herf bi her awayî hatiye avêtin herçiqas di kovarê de herfa “y”yê nehatibe nivîsîn jî ev herf li hin herêman hêj jî tê bikaranîn loma mirov nikare bibêje ku ev herf êdî nayê bikaranîn. Lê ji ber ku wê demê de hatiye avêtin û bi vî şêklî hatiye qeydkirin.

Mînakên ji *Hawarê*;

avêtina herfa “y”yê	kaîl – qayil (h. 6:4)
avêtina herfa “y”yê	peyaê – peyayê (h. 10:12)
avêtina herfa “y”yê	ewrûpaê – ewrûpayê (h. 10:13)

3.6.1.1.9. Avêtina Herfa “d”yê

Herfa “d”yê ya ku hatiye avêtin wekî tê dîtin di navber û dawiya peyvê de cî digire. Di gelek zimanên de, herfa ku tê avêtin piranî li dawiya peyvê ye.

Mînakên ji *Hawarê*;

avêtina herfa “d”yê	qurdmancî (h. 3: 3)
avêtina herfa “d”yê	gazind – gazine (h. 11: 14)
avêtina herfa “d”yê	rêkird – rêkir (h. 55: 6)

3.6.1.1.10. Avêtina Herfên Cuda

Avêtin an jî wendbûna herfên “b”, “ç”, “g”, “j”, “ş” û “t”yê jî bi mînaakeke hatine dayîn da ku mirov bikare ji ber avêtina herfan, guherîna peyvê bibîne. Cihên wan herfên navborî di peyvê de guherbar in, carinan mirov bandora erdnigariyê, carinan mirov armanca sivikirin û rehetkirina bilêvkirinê dibîne. Helbet gelek mînakên cuda jî hene, lê mînakên *Hawarê* yên ku balê kişandinê hatine tesnîfkirin û dayîn.

Mînakên ji *Hawarê*;

avêtina herfa “b”yê	bêkerb-bêker (h. 11: 9)
avêtina herfa “ç”yê	rêçnas-rênas (h. 31: 3)
avêtina herfa “g”yê	nîzing –nêzîk (h. 15: 2)
avêtina herfa “j”yê	roava – rojava (h. 27: 8)
avêtina herfa “ş”yê	gî - giş (h.25: 3) gişk (h. 26: 6)
avêtina herfa “t”yê	êxistin - têxistin (h. 30: 10)

3.6.1.1.2. Guherîna Peyvan

Tê zanîn ku her ziman her daîm di nav guherînê de ye û hêza guherîna wan jî ne wekî hev in û giş ji hev cuda ne. Ew guherînên peyvan yên ku di *Hawarê* de hene û ji aliyê me hatine tespîtandin bi awayekî senifandî li jêr in;

3.6.1.1.3. Kurtkirin

Kurtkirina peyvan wekî ku di her zimanî de heye, di kurmancî de jî pêk tê. Hebûna mînakên jêr rê dide me ku em bikaribin guherîna kurtkirina peyvan bişopînin.

Mînaakeke tirkî wekî hevok çawa bandora bi awayekî morfosentaktîk pêk aniye wekî jêr e û ev hewldan hertim diguhere.

Gideceğim – Gidecem - Gidcem/gitcem

Ev kurtkirina her cûre peyvan jî di zimanan de tiştekî berbelav û normal e.

hêşîn – şîn (h.6: 2)	Her du herfên ewil hatine avêtin lê herwiha li hin deveran li Mûşê hêj jî ev peyv bi van her du herfan tên bikaranîn.
têdexistiyên kovarê (8: qapax) têxistiyên kovarê (h.10:qapax)	Ev guherîna vê peyvê berê bi daçekê, dawiyê jî bê daçekê peyveke nû ji ber bandora çêkirina peyvekê dîsa derdikeve pêşîya xwendevanan. Niha jî ji dêvla van peyva “têdexistiyê” peyva “naverok”ê tê bikaranîn.
sidpî - spî (h.12: 10)	Bi avêtina herfa “d”yê hatiye, kurtkirina peyvê pêk hatiye û peyva “spî” yê hatiye bidestxistin û ev bûye peyva niha.
navhêncî - navincî- navîn (h.12: 14)	Her du peyvên “navhincî” û “navincî” formê herî ewil yên peyva “navîn”ê ne. Ji xwe ev peyv jî di salên dawî de bêtir tê bikaranîn.
heyiv – hîv (h. 14: 4)	Peyva “hîvê” hem kurtkirin û hem jî varyasyoneke erdnigariya herêmên cuda ne. Lê dibe ku ev guherîn di siberojê de biqede û peyva “hîv”ê ji ber rehetiya kurtkirinê bê bikaranîn.
serxwerabûna - serxwebûna (h. 23: 1)	Peyva “serxwerabûna” wateyeke berfirehtir dide me ku em bikaribin wêrabûna peyva “serxwebûnê” jî bi awayekî vekirî bibînin û fahm bikin.
dîsan dibêjim hêsanî ye (h. 32: 7)	Axêverên zimên di nav demê de, herfa “n”yê di peyva “dîsan”ê de avetine. Loma bilêvkirina “dîsa”yê rehetir û siviktir bûye.
nêzîngî - nêzîkî (h. 21: 11)	Wekî tê zanîn rengdêra “nêzîk”ê hêj jî tê bikaranîn. Dema mirov li kurtkirin û avêtina “n”yê û guherîna dengên “g” yê dinêre dibîne ku peyva “nêzîngî” guheriye û bûye “nêzîkî”.
xweyagir - xwegir (selfcontrol)	Herfên “ya”yê wekî yên kelijandinê hatine bikaranîn û hatine avêtin. Peyva nû “xwegir” jî ne

(h. 21: 1)	peyveke pir belavbûyî ye.
kevoka nûferxîn – ferxik (h. 21: 1)	Peyva “ferxikê” li gelek deveran tê bikaranîn. Peyva “nû”yê ji xwe di warê semantîkê de wateya “nûbûnê”, dide loma ew di eslê xwe de heman tiştî dubare dike.
serê mi têşîhe - têşe (h. 26: 4)	Lêkera “êşandinê” ji peyva “têşihandinê” tê û forma berê bi herfa “t” yê hatiye bikaranîn û bi avêtina vê herfê peyv hatiye kurtkirin.
piçk û parî - piç û parî (h. 29: 3)	Bi saya daneyên berê gelek peyv hatine qeydkirin û hebûna wan jî gelek giring e. Herfa “k”yê hatiye avêtin. Peyva “piçk”ê bûye “piç” û guherîneke kurtkirinê pêk hatiye.
vegertin - vegerîn (h. 32: 12)	Lêkera “vegertinê” herfeke xwe avêtiye û bûye “vegerîn”. Peyva “vegertinê” formeke kevn e.
derêxist -derxist (h. 33: 5)	Herçiqas peyva “derêxist”ê ne pir kevn be jî, guherîna “derxist”ê nîşanî me dide ku hemû ziman ji bo rehetiya îfadeyê û axaftinê kurtkirina peyvan hildibijêrin.
kevenare – kevnare (h. 34: 7)	Bi avêtina herfekê peyva “kevenare” bûye kevnare ku rengdêra wê jî “kevn” û forma navdêrî di vî sî salên dawî de pir tê bikaranîn.
nişkegavî – nişkeva (h. 34: 12)	Ji bo tişteke ku bê plan û di dêma ku însan tê de ne pêk tê peyva “nişkeva” tê bikaranîn. Lê avêtina “ga”ya nav peyvê kurtkirineke baş e ku hatiye tercihkirin û di zimên de cihê xwe girtiye û tê bikaranîn.
leyistin - lîstin (h. 35: 2)	Kurtkirina “leyistin”ê wekî “lîstin”ê guherîna xwe qedandiye.
xeyrtir - xêrtir (h. 35: 2)	Di kurtkirina peyva “xeyrtir”ê de herfên “ey”ê hatine avêtin û ji dêvla wan herfa “ê”yê cihê “ê”yê girtiye. Kêmbûn û avêtina herfan kurtkirineke kêrhatî dide peyvê.

hevu du – hevdû (h. 35: 8)	Du peyvên “hevu du” bûne peyvek û herfa “u”yê hatiye avêtin.
dûrebîn - dûrbîn –dorbîn (h. 36: 9)	Gelek kes dizane ku kesên dixwazin ciheke dûr bibînin, amraza ku dikare dûriyekê nêz bike, bi kar tînin û ji bo vê navgînê “dûrebîn” ku bûye dûrbînê bi kar tînin. Peyv di tirkî de wekî “dürbün”ê tê bikaranîn ku ev peyv jî ji kurdî derbasî tirkî bûye û farsiya wê jî “نیبرود” e.
tirih – tirî (h. 38: 8)	Hinek peyv her dû herfên yên dawiya xwe “ih”ê tavêjin û herfa “î”yê tînin.
şwinê-şûnê (h. 38: 11)	Avêtina herfa “wi”yê jî kurtkirineke din e ku derdikeve pêşiya me, lê di heman demê de ev guherîna herfên dengdar û dengdêr in jî.
şerevan- şervan (h. 39: 9)	Ji koka peyva “şer”ê navdêra ku kesê ku şer dike hatiye çêkirin û herfa “e”yê jî hatiye avêtin.
pardarî kirine par kirine (h. 49: 3)	Peyva “pardariyê” gelek herfan wenda kiriye û kurtkirineke mezin pêk hatiye.
brang - bira (h. 51: 3)	Nayê zanîn ku gelo peyva “brang”ê forma ewil û kevn e an jî xeteyeke çapxaneyê ye. Ku peyv kevin be wê demê herfa “g”yê hatiye avêtin. Lê peyv di nava konteksê de bi awayekî vekirî wateya “birayê” dide.

3.6.1.1.4. Lêzêdekirin

Hinek peyv wekî varyasyona peyvan in, lê di heman demê de jî ew peyv in ku guherînekê di formê de çêdikin û halê dawî jî têdixin nav zimên.

serhatî - serpêhatî (h. 6: 6)	Peyva “serhatî” bûye serpêhatî û niha bi gelemperî ev peyv tê bikaranîn û ciheke gelek giring digire.
gî - giş (h. 21: 16)	Peyva “gî”yê hinek devokî dixuyê, lê niha piranî wekî “giş”ê tê bikaranîn. Ev form piranî wekî varyasyonên cuda ye.

yektî – yekitî (h. 54: 2)	Peyva “yektiyê” bûye “yekitî”û herfa “î”yê li xwe zêde kiriye. Dîsa mînakeke din ku varyasyona peyvê dide me.
---------------------------	---

3.6.1.1.5. Taybetmendiyên Cudahiya Dengan û Varyasyon

Li ser guherînên dengdar û dengdêran, di binbeşa fonetîkê de teori û rêbazên cudabûnna herfan hatibû dayîn. Lê pêwistî bi dayîna mînakên şênber hene ku em bikaribin guherînên texmînî di van 90 salên dawî de pêk hatine bibînin, wan binirxînin û bigihîjin encamên giştî li ser guherîna zimên ya kurmancî. Di vê pêvajoya zimên de wekî em dizanin, her guherîn divê bi sedemên xwe bê nîrxandin lê divê cudahiya wan jî yan jî faktorên ne giştî lê yên taybet jî bêne dîtin da ku mirov bikaribe bigihîje şîrove yên rast û dawiyê vê guherîna di siberojê de bişopîne û bibîne ka meyla zimên li gorî çi diguhere, bandora herî zêde çi ye û zimên ber bi kû ve diçe? Helbet ji ber nebûna xebatên nivîskî yên kurmancî em nikarin bi tevahî salên ku peyv hêdî hêdî diguherin bidin lê bikaranîna wan yên salên *Hawarê* dê wekî dokûman û delîl di destê me de ne ku em taybetmendiyên zimannasiya wê demê binirxînin.

Mînakên ji *Hawarê* yên gelemperî wekî jêr in;

birbang - berbang (h. 53: 2)
jiyîn - jiyan (h. 35: 7)
horqes - herqes (h. 11: 6)
guhast - gihîşt (h. 13: 1)
pêrûz – pîroz (h. 15: 2)
jo bona vê yoqê yekê (h. 17: 4)
ji hulo – loma (h. 14: 5)
rahetî – rehetî (h. 17: 10)
hêsin - hesin (h. 18: 17)
ekbet akubet (h. 18: 17)
îrû - îro - (h. 19: 3)

meriv - mirov (h. 21: 5)
hire – vir (h. 8: 7)
medhlûq/k medhelok (h. 19: 5)
sto - sitû (h. 19: 5)
zaruyên - zaroyên (h. 19: 12)
dehol - def/dahol (h. 20: 7)
ji ber ko - ji ber ku (h. 21: 10)
ruhstên - rihstên (h. 21: 13)
şehar - şar - bajar (h. 21: 16)
qamet - qiyametê (h. 22: 15)
rojhelat – rojhilat (h. 23: 1)
zemt bike - zevt bike (h. 23: 2)
cuht – cot (h. 23: 5)
ruhstîn - rihstên (h. 24: 7)
stihar - stuxwar (h. 26: 3)
swind sond (h. 27: 2)
dih – dihî – doh - do (h. 28: 12)
xwînriz – xwînrij (h. 33: 14)
qubletê – qible (h. 34: 5)
cowa - cuh (h. 34: 6)
serekwezîrê – serok (h. 34: 12)
jû pê - jê pê ve (h. 34: 12)
qevkas qefkasye (h. 34: 12)
swindxwariyên (h. 35: 13)
jiyîn – jiyan (h. 35: 7)
pehiz - payîz 592 (h. 35: 8)
tixwîb – tîxub (h. 36: 1)
şehnişîn - şaneşîn (h. 36: 7)
Dihî (h. 30: 13)
lêhîzvanek – lîstikvan – leystikvan - leyzvan (h. 36: 12)
miratxwer - mîrasxwar – mîratgir – paşmakgir - wêrîs

(h. 37: 1)
rawiş - rewş (h. 37: 10)
hosa – osa – usa - wisa (h. 38: 8)
nih - niha (h. 39: 7)
bigêhinîn - bigihînin (h. 39: 9)
destşîştin - destşûştin (h. 42: 3)
rehelatê nîzing - rojhilata nêzik (h. 42: 7)
pêşnihad - pêşniyaz (h. 44: 19)
digerihayîn - digeriyan (h. 45: 5)
bêxe- têxe (h. 46: 6)
zemt kirin - zevt kirin (h. 46: 7)
bihinfirehî - bêhnfirehî (h. 47: 7)
jeng - zeng (h. 49: 11)
şermisar - şermezar (h. 50: 1)
cêriya - cariye (h. 50: 4)
kehbê - kabê (h. 50: 2)
bijîşk - bijîşk (h. 51: 7)
rîtil - lître (h. 51: 9)
şargeh - şerrgeh (h. 51: 12)
hustiwên - hustiyên (h. 52: 7)
bersef - bersiv (h. 54: 3)
pêxemher - peyamnêr (h. 54: 3)
birbang - berbang (h. 53: 2)
diroje - diroze (h. 54: 3)
pêda - peyde (h. 55: 1)
pispûrî – pisporî (h. 56: 4)
pêşmihad – pêşnihad - pêniyaz (h. 56: 2)
hincaz – incas (h. 13: 13)
zuwa - zua (h. 33: 5)
aşiyê - aşitî - aşî (h. 38: 8)

3.6.1.2. Varyasyon

Ew taybetmendiyeke gerdûnî ya zimanê mirovan e ku axêverên ziman ku heman ziman jî be û li deverên cuda yên herêmekê her daîm bijîn jî, dibe ku bi heman awayî napeyivin (Penny, 2000: 1). Têgeha varyasyona zimên ew e ku zimanek bi taybetî bi cudahiyên herêmî, civakî, an naverokî ve bêtê nasîn û bikaranîn (Trask, 2005: 107). Varyasyon di nav welateki an jî herêmeke de gelek tê dîtin û ev diyardeyeke normal e. Dîsa jî em vedigerin li ser bandora erdnigariyê ku avhewa, çiya, deşt, xwarin, popûlasyon û hêmanên wekî wan li ser zimên tesîrê dikin û zimên diguherînin.

Mînak

- Çawa yî?
- Çawa nî?
- Çawa nî?
- Çilo yî?

Yek ji awayên populer ên biryardayîna sînorê ziman û sînorên di navbera zimanan de ew e ku mirov erdnîgariya wan bide ber çavan (Urszula, 2007: 2). Varyasyon dikare devok an jî zarava be. Lê erdnigarî û herêma ku ew tên bikaranîn zimên diguherînin. Li deşt û beriyê wekî tê dîtin însan ji hev re dibêjin “tu çawa yî” herfa “y”yê heye lê li deşt û çiya herfa “n”yê tê bikaranîn. Loma di siberojê de dibe ku hemû herêm ji dêvla “çawa nî”yê “çawa yî”yê tercih bikin an jî ev guherîn neqede û wekî xwe bimîne. Li Serhedê, li bajar û erdnigariya bilind “çawa nî” tê bikaranîn. Û telafûza wê dirêjtir e; wekî “çawa nî”. Cudahiyên zimên yên giring di nav zimanan de bi giştî hene û lokasyona erdnigariyê an jî cîh di nav cihêrengiya zimên de roleke giring dilîze (Omar & Alotaibi, 2017: 2).

Lê dema ku ev erdnigarî çiqas bilindtir dibe, bilêvkirin zûtir û lezgîntir dibe. “Î”ya dawî wekî nîv “î”yê tê xwendin.

Daneyên Hawarê

Li daneyên jêr, em rastî cudahiyên devokî, guherînên herf û peyvan, hevwateriyên cuda û hwd tên. Mirov dikare bi saya mînakên jêr varyasyonên herêmên

cuda bibîne, binirxîne û texmîn bike ka taybetmendiyên zimên dê çawa biguherin? Di vê guherînê de, meyla însanan ji bo herf, peyv, fonetîk, morfolojî, semantîk, sentaks û tiştên girêdayî wan bi awayên cuda wê derkevin holê. Bi saya nivîsê, em dikarin îspat bikin ku ziman di nav salan de taybetmendiyên zimên digirin û cudahiyên taybet, giştî an jî wekî varyasyonên nû derdixin.

Mînakên ji *Hawarê*;

Wekî ku di mînakên jêr de jî xuya dike, gelek cûreyên vegotinê hene û ji guherîna dengên heta peyv û bandora sedemên cûr bi cûr tê dîtin.

varyasyon	dih – dihî – doh - do (h. 28: 12) (h. 30: 13)
varyasyon	welê - wilo (h. 30: 6)
varyasyon	dîr – dûr - dwir (h. 30: 8)
varyasyon	benefş – binefş - binevş (h. 30: 6)
varyasyon	mikûn - mimkunî (h. 30: 10)
varyasyon	cenet - cinnet (h. 30: 5)
varyasyon	nih- nûh-nû – niho (h. 30: 13)
varyasyon	weko – weku - wekî (h. 38: 7)
varyasyon	mihvan - mêvan (h. 38: 7)
varyasyon	dipişk - dupişk -tupişk (h. 39: 3)
varyasyon	gwîz - gîz-gûz (h. 39: 7)
varyasyon	rohelat – rojhilat (h. 32: 17)
varyasyon	tu kanî - tu li ku yî? (h. 21: 9)
varyasyon	gî - giş (h. 21: 16; h. 30: 13)
varyasyon	geran –geriy/h/an (h. 23: 3)
varyasyon	bêziravî - tirsonekî (h. 23: 4)
varyasyon	wetenekî şêrîn - welatekî şêrîn (h. 25: 10)
varyasyon	tevî vê - digel vê (h. 27: 8)
varyasyon	kijkî - kîjan (h. 32: 1)
varyasyon	guhêrbar – guherbar (h. 28: 9)
varyasyon	qwît - qût (h. 31: 2)
varyasyon	revîn - revîyan (h. 32: 4)

varyasyon	şivere - şivarêk (h. 32: 6)
varyasyon	vegertin - veğerîn (h. 32: 13)
varyasyon	hildavêt - tavêt (h. 33: 4)
varyasyon	derêxist - derxist (h. 33: 5)
varyasyon	rova - rojava (h. 34: 4)
varyasyon	şevêdî - şeva di (h. 35: 8)
varyasyon	adî – tiştê ji rêzê normal iyî (h. 37: 5)
varyasyon	kêrvoşî – kîvroşk û kergû (h. 34: 10)
varyasyon	roava - rojava (h. 27: 8)
varyasyon	dorhêl - derdor – derûdor - dorber (h.27: 8)
varyasyon	heyva agirgon (h. 31: 4)
varyasyon	piyan – qedeh (h. 33: 5)
varyasyon	ajnî – avjenî (h. 33: 5)
varyasyon	feqeh – feqî(h. 33: 7)
varyasyon	lêk vedibe (h. 34: 4)
varyasyon	boş – gelek (h. 2: 7; h. 34: 4)
varyasyon	co - cuh (h. 34: 7)
varyasyon	argûna agirê (h. 36: 8)
varyasyon	qelaçe (h. 36: 8)
varyasyon	tinawir bimîne (h. 36: 8)
varyasyon	dengê box (h. 36: 8)
varyasyon	sergevaz (h. 36: 8)
varyasyon	xwida (h. 38: 8)
varyasyon	zebeş - şebeş (h. 41: 3)
varyasyon	Soberî - avjenî (h. 45: 15)
varyasyon	pinpinî - pirpirok (h. 53: 2)
varyasyon	ferx – çêlik (h. 16: 13)
varyasyon	sund - sond – swind (h. 18: 3)
varyasyon	swiwar - suwar -siwar (h. 18: 3)
varyasyon	nîro - nîvro (h. 22: 12)

varyasyon	kwir – kur (h. 22: 11)
varyasyon	dirêhtin – dirêjînin (h. 6: 1)
varyasyon	deng... kir- ba... kir (h. 6: 4)
varyasyon	bi vîlhawî - bi vî hawî- bi vi awayî (h. 10: 4)
varyasyon	cuhap – cevap - cewap (h. 10: 12)
varyasyon	heyîn û neyîn hebûn û tunebûn (h. 13: 3)
varyasyon	siyamed-siyahmed-siyamet (h. 14: 5)
varyasyon	nave te î xweş - yî /yê (h. 30: 5)

3.6.1.3. Peyvên Guherî û Wendabûyî

Mirov bi nirxandina peyvên jêr dikare guherîna mentîqa zimên jî bibîne ku însan berî 90 salî çawa fikirîne û ji bo xwe îfade bikin kîjan peyvan bi kar anîne. Çavkaniya fikr û mentîqa rêya fikir û hêstan di peyvan de xuya dibe û tê zimên ku peyv îfadeya însanan di her astê de wekî astên taybet an gelemperî, di bazirganiyê de an di perwerdeyê de yanî di her qadên jiyanê de bê diyar kirin.

Mînakên ji *Hawarê*;

xweyagir - xwegir (îng. self-control) (h. 21: 1)	Peyva “xweyagir”ê berê “xwegir”ê ji xwe hebû û dihat bikaranîn. Wateya wê “kontrolkirina xwe” ye.
gilîhçî – gilîvan (h. 25: 7)	Mirov çawa peyva “gilîhçî”yê dibihîse fahm dike ku wateya wê “kesê ku tiştekî yan jî kesekî gilî dike”. Bandora qertafa tirkî “-çî” heye. Qertafa “-van”ê jî kurmancî ye lê wekî her du peyv jî niha nayên bikaranîn, dibe ku ji ber sedemên dijiwariya bilêvkirinê an jî terciha peyvên din bin.

bîrawer – (îng. memorable) (h. 27: 12)	Koka “bîr”ê di peyvê de xuya dike û girêdana wê û ya tiştê ku têdikeve bîra me dide. Gelek kes bi tiştên ku di bîra wan de dimîne tendurîstiya rihê xwe diparêzin. Loma peyva “bîrawer”ê bandoreke erênî li ser însanan dihêle.
hevî - hemû (h. 28: 2)	Peyva “hevî”yê di ferhengan de, di roja îro de nayê dîtin. Di wateya “hemû”yê de ye. Pêkan e ku peyveke wendabûyî û herêmî be. Ji ber bandora tv, medya û zimanê perwerdeyê peyvên wiha yên kêmtê dîtin wenda bibin.
mistemlik (h. 30: 7)	Ev peyvek bû ku di nûçeyên <i>Hawarê</i> de, gelek caran dihate bikaranîn û niha nayê tercihkirin.
lîwan (h. 30: 7)	Peyva “lîwan”ê ji bo zeptkirina hespan tê bikaranînê lê niha ji ber guherîna jiyanê ev peyv jî gelek kêmtê dîtin û li ber mirinê ye.
bê etlahî (h. 30: 9)	Peyva “etlehê” yan jî “etle”yê di wateya “tehtîlê” yan jî “navberdayînê”de tê bikaranîn. Ev peyv ji erebî tê.
nefsmezinî - nefsbîçûkî (h. 32: 8)	Peyva “nefsbîçûkî” di roja me de heye lê mixabin peyva “nefsmezinî” herçiqas bi awayekî vekirî bê fahmkirin jî, nayê bikaranîn.
dehbe (h. 32: 9)	Peyve “dehbe”yê ku ji erebî tê di wateya “hov, wehşî û dirinde”yê de tê bikaranîn niha nayê tercihkirin. Peyva “dehbe”yê bi guherîna dengê “h” û “b” yê pêk tê.

kumet - kîmed (h. 33: 15)	Peyveke ku di nav gelek herêman de nayê bikaranîn lê di nivîsê de heye. Wateya wê cûreyeke hespan e. Mirov dikare hespên kimêd ê wekî “hespê sor” pêname bike. Romaneke Sidîq Hamid Nizarkî bi nave “kimêdê gewre” ye. Pirtûk li Dihokê hatiye çapkirin. Yanî ev pêyv hêj jî li Başurî tê bikaranîn.
paşmexribê - mixrib (h. 33: 15)	Peyva “paşmixrib”ê tê fahm kirin lê ji dêvla wê însan dibêjin “pişt mixribê”. Yanî bi awayekî peyvên “paş” û “piştî” bi hev re guherîne.
bend - nivîs gotar (h. 35: 8)	Mirov dikare di ferhangan de, sê yan jî çar wateyên cuda ji bo peyva “bend”ê bidest bixe. Lê di hejmara navborî de, benda konteksê di wateya nivîs an jî gotarê de ye.
nîşank – not (h. 37: 2)	Dîsa jî mirov li ber wendabûna peyveke ku wenda bûye dikeve. Peyva “nîşank”ê tê wateya “nîşe, têbinî û şanek”ê. Êdî ji dêvla wê peyvên “têbinî” û “not” pir tene bikaranîn.
sirdabên emerîkayê (h. 37: 8)	Koka peyvê ji “sir”ê tê “sirdap” di ferhengan de tune ye lê ji konteksê tê fahmkirin ku tiştên “sirî û razî” vedişêre û yan jî “hevalên ku siran vedişêrê wekî îttîfakên emerîkayê” dikare bê pênamekirin.
hinerwerikê -hinerwêrî (h. 37: 11)	Peyva “hinerwêrî”yê tê wateya kesê bi merîfet an jî jêhatî. Peyva “hinerwerikê” jî wekî forma kevintir e.

	Herfa “k”yê hatiye avêtin û peyv hatiye kurtkirin.
kêmgirti-nî (h. 39: 2)	Wateya wê bi erebî wekî “bi cerehat” û bi wateya kurdî jî ew e ku “ew tiştê ku bi nêma e û ew ava zerik ku binya birînan de heye”.
managiran (h. 40: 2)	Wateya peyvê tê dîtin û wateyeke zelal dide lê mixabin weke peyveke berbelav nayê bikaranîn.
nîvgirav-mîngirav (h. 39: 10)	Wateya wê “yarımada”ya tirkî ye ku ne giraveke mezin e lê di wateya “nêvî” ye yan jî “biçûk” de ye. Her du peyv jî “nîvgirav” û “mîngirav” ji ber nuçeyên <i>Hawarê</i> yên rewşa dinyayê de hene û hatine bikaranîn.
zimanek jihevdeketî (h. 40: 4)	Peyveke ku êdî di zimên de nayê dîtin di ravekekê de hatiye bikaranîn. Peyva “jihevdeketî” êdî bêtir ji bo însanan tê bikaranîn ne ji bo zimanan. Hetta daçeka “de”yê jî ketiye wekî “jihevketî” tê bikaranîn.
kinişt -kenişt – sînagog (h. 40: 5)	Peyveke olî ye ku di gelek xebatên klasîk te hene û niha jê tenê ji aliyê kesên temendirêj ve tê zanîn û peyvek ku êdî di nivîsê de jî gelek kêma tê bikaranîn.
cihbilind (h. 42: 2)	Forma rengdêra <i>cihê bilind</i> e ku wekî rengdêr terka vê peyvê hatiye kirîn.
pêl bibit (h. 44: 11)	Peyva “pêl”ê hêj jî heye lê bikaranîna wê wekî lêkerê gelek kêmtir e.
pirxurtiya (h. 48: 5)	Peyva “pirxurtî” jî peyvek e ku wekî navdêrê wenda bûye û nayê bikaranîn.

	Wateya wê wekî diyar e xurtbûna zêde û baş ê dide.
pardarî kirine (h. 49: 3)	Wateya “pardarî”yê “pişkdarî, hevparî, şirikî, şirkatî û hevbeşî” ye. Niha ev form nema ye hatiye kurtkirin û forma navdêre wekî “par, parity” maye. Lê ev forma ku wekî lêkerê hatiye bikaranîn jî gelek baş e.
firehmezin (h. 50: 3)	Dîsa ev peyv jî wekî wate tê fahmkirin lê mixabin niha ne di ferhengan ne jî û di nivîsên înternetê de tê dîtin. Peywira peyvê rengdêr e.
ibadetgah (h. 51: 6)	Baş tê zanîn ku paşgira “-geh”ê navdêran çêdike. Gelek peyv bi vî şeklî çêbûne. Herwiha mirov peyvên wekî “camî”, “dêr”ê bi kar tîne. Ev peyv gelek nayê tercihkirin belkî weki peyveke wergerê tö dîtin.
xwenav (h. 52: 9)	Peyveke ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
hendesakirî (h. 54: 3)	Peyveke ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
malkambax (h. 54: 3)	Peyveke ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
nuxwerî (h. 55:2)	Peyveke ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
dihêvota (h. 55: 2)	Peyveke ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
xerik - mijûl (h. 55: 5)	Peyveke ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn. Peyva “mijûl”ê niha di gelek zarava û devokan de tê dîtin.
behirdar (h. 56: 1)	Peyveke ku niha wenda bûye û nayê

	bikaranîn.
periya spehîtiya (h. 33: 5)	Peyveke ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
nestandpar (h. 39: 4)	Peyveke ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
asîn (h. 49: 4)	Peyveke ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
xulamkolekî (h. 50: 3)	Peyveke ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
vexwarbar (h. 51: 2)	Peyvek e ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn. Ji bo ku tiştê ku tê vexwarin tê bikaranîn.
qran (h. 51: 3)	Peyvek e ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
xatircem (h. 51: 5)	Peyvek e ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
bervajî (h. 51: 6)	Peyvek e ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
lavelav (h. 51: 7)	Peyvek e ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.
nivînandina nexweşan (bicîkirina nav ciyan / place in bed) (h. 56: 2)	Peyvek e ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn. Forma lêkerê berê hatye bikaranîn û niha wenda bûye. Mirov dibîne ku formên cuda yên çêkirina peyv û formên din di nav demên din de diguherin.
çinkî (h. 43: 3)	Wekî tê fahmkirin peyvek deyingirtî ye. Peyvek e ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn. Formeke “çinkî”yê ji “çima ku”yê tê û di tirkî de “çünkü” ye.
tember - temberî (h. 20: 6)	Peyvek e ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn.

baweşîn - yelpaze (h. 36: 9)	Peyvek e ku niha wenda bûye û nayê bikaranîn. Niha peyva “yelpaze”yê tê bikaranîn.
------------------------------	--

3.6.2. Morfolojî

Morfolojî xebata li ser morfeman û lêkolîna rê û rêbazên hevgirtina wan e. Ferhenga Oxfordê morfolojîyê wiha pênasê dike: “Morfolojî tespîtkirin, analîzkirin û danasîna zimanekî ye ku avahiya morfemên zimanekî diyarkirî û yekeyên din ên zimên, wekî kok, pêvek, beşên axaftinê, întonasyon/stress, an jî kontekseke îndîrekt e.

Pênaseya peyvسازیê ku Samî Tan dide wiha ye;

Her wekî çawa fonem yekeya herî biçûk a denga e, morfem jî yekeya herî biçûk a peyvane. Di kurdî de jî wekî gelek zimanên din morfem dibin du cûre; morfemên watedar û morfemên erkdar. Cûreyên peyvane ên mîna navdêr, rengdêr û lêker morfemên watedar in. Cûreyên peyvane ên mîna daçek, gihanek, cînavk, qertafên kêşane û qertafên bêjesaz jî morfemên erkdar in (Tan, 2011: 57).

Taybetmendiya morfolojîyê dikare di bin beşa rêzimanê de jî bên nîrxandin. Morfolojîya peyvane jî guherîna mezin didin ku mirov dikare guherîna morfolojîyê bi saya peyvane bibîne û wan bisênifîne. Guherîna morfolojîk di nivîsê de, herfan (cihderq - ciherk), guherîna îfadeyê (dehrujki), guherîna yekjimar û pirjimariyê (zaroan - zarokan), avêtin (meşqaz) an jî lêzêdekirina herfan (denggir) de û bi taybetî bi guherîna “pêşgir” û paşgir” de (warkor, wargeh) bi rehetî tên dîtin. Hinek guherîn li hin deveran wekî varyasyonê pêk hatine.

Di pirtûka CAB û Roger Lescot ya bi nave *Grammaire Kurde* de, beşa ku ji bo morfolojîyê hatiye terxandin, beşek gelek berfireh e û gelek mijaran di nav xwe de dihevine.

Li gorî Booiyê (2007; 100) rewşa morfolojiyê ji navdêr: Hejmar (yekjimar, pirjimar, dualî), ji rewşê (nomînatîf, genetîf, akusatîf), zayendê pêk tê. Rewşa îzafeyê jî tê dîtin. Ev giş gelek taybetmendiyan morfolojiya zimanan nîşan didin.

Morfolojî û sentaks hêmanên serekî di rêzimanê de ne. Morfolojî zanista li ser peyvan, wate, çemandina wan û şiyana wan ya hevgirtin digel peyvên din di fraz û risteyan de ye, lê sentaks derbarê hindê de ye ka yekîneyên watedar di fraz û risteyan de çawan kartêkerî û peywendî digel hevûdû hene. Peyv bi ser morfeman de dihêne dabeş kirin. Morfem wekî biçûktirîn yekîneya watedar ya zimanî dihête pênase kirin (Shojaî, 2014: 1).

Peyvkişandina kurdî

Hebûna pêşgir û paşgiran dikarin wateya deme, zayendê, cûreyê, rêzimanê û peyvên nû bidin. Ev guhartin di gelek zimanan de peyvên nû çêdikin û îfadeyên nû derdixin hemberî mirovan.

Di kurdî de 27 yeketeşeyên peyvkêşanê hene (Tan, 2015: 56-60)

1. **Qertafa dema niha (di-):** *di-ç-e, di-kemil-in, di-rev-im*
2. **Qertafa dema boriya berdest (di-):** *di-peht, di-kef, di-şkest*
3. **Qertafên raweya fermanî (bi-, -e, -in):** *bi-cû, bi-kol-e, bi-guher-in*
4. **Cînakên kesandinê (-im, -î, -e, in):** *di-gir-im, di-gir-î, di-gir-e, digir-in*
5. **Qertafên pîledariyê (-tir, -tirîn):** *kevin-tir, hêja-tirîn*
6. **Qertafên gazîkirini (-o, -ê, ino):** *kal-o, pîr-ê, xort-ino*
7. **Qertafên tewangê (-ê, -î, an):** *dolab-ê, sing-î, şêr-an*
8. **Qertafên dema borî (-iye, -e) :** *bihîst-iye, gotin-e*
9. **Qertafên raweya daxwazî (bi-, -a):** *bi-xwar-a, bi-şand-a*
10. **Qertafên neyîniyê (ne-, na-, ni-, me-):** *ne-çîn-e, na-xwaz-in, nizan-in, me-kuj-in*
11. **Qertafên nebinavkirinê (-ek, -in):** *hêl-ek, pirtûk-in*

Mînakên morfolojiya peyvî û rêzimanî

Mînakên Pêşgiran peyvsazi

ber-	bin-	der-	nav-	nîv-	paş-	pêş-	ser-
ber+ketî	bin+av	der+ling	nav+ber	nîv+co	paş+nav	pêş+wazî	ser+hişk
ber+dest	bin+çav	der+dest	nav+ber	nîv+girtî	paş+mîr	pêş+daraz	ser+jinik

Paşgîrên ku navên amûran çêdikin

-ar	-avêj	-bir	-dan	-dirû	-ek	-ing	-jimar
kov+ar	tîr+avêj	av+bir	av+dan	cil-dirû	bir+ek	bêj+ing	dilop+jimar

Pêşgîrên peyvsazi

hel-	kele-	mak-	man-	mê-	pey-	pişt-	wer-
hel+bêz	kele+can	mak+er	man+ker	mê+kund	pey+rew	pişt+derî	wer+ger

Paşgîrên Navçêker yên razberiyê çêdikin

-ahî	-anî	-asî	-atî	-î, -îtî	-înî, -îtî, - tî	-yetî
biçûk+ahî	dost+anî	teng+asî	kurt+asî	mîr+îtî welat+parêzî	şit+înî zer+înî ker+îtî	kurda+yetî

Paşgîrên cihan çêdikin

-geh/-gah	-istan	-xane
jîn+geh	Kurd+istan	pirtûk+xane – xweş+xane (=nexweşxane)

Hevedudanîkirin (Compound)

Carînan mirov rastî du peyvên ku hatine ba hev û peyveke nû çêkirine tê. Ev jî di zimên de rêyek e/metodek e ku bi peyvên zimên ku ji xwe hene hejmara peyvan zêde bike û wateyên nû bi dest bixe. Ji bona vê bi hev girêdana peyvan “hevedudanîkirin” tê gotin. Mirov dikare vê guhartinê wekî teknîkî di hemû zimanan de bibîne. Di kurmancî de jî têra xwe heye.

Ji bona peyva compoundê Husein Muhammed (2016: 13) peyva “pêkanînê” bikaranîye û pênaseya hevedudanîkirinê dide.

“Pêkanîn (bi îngilîzî *compounding*) di peyvsaziyê de tê maneya çêkirina peyvan ji peyvên heyî bi girêdana du yan zêdetir peyvên serbixwe bi hev ve, bo nimûne

serok+wezîr → *serokwezîr*,

dest+pê+kirin → *destpêkirin*.

Ji peyvên wiha re di kurdî de *pêkhatî* tê gotin (carinan *hevedudanî/hevdanî/lêkdayî*)”.

Yılmaz (2017: 49) dibêje ku;

“Di zimanê Kurdî de du yan jî zêdetir peyv dikarin bi hev ve bîn bestandin. Bi vê yekê peyveke nû saz dibe.

- **navdêr + navdêr = navdêr**

Hin Mînak: dest-nimêj, kur-mam, mal-zarok, dar-hinar, ser-tac

- **navdêr + navdêr = rêngdêr**

Hin Mînak: dil-kevir, ser-dîzik

- **navdêr + rengdêr = rengdêr**

Hin Mînak: dest-dirêj, çav-pehn, ser-hişk, stû-xwar

- **rengdêr + navdêr = navdêr**

Hin Mînak: germ-av, sor-gul

- **rengdêr + lêker = lêkerên hevedudanî**

Hin Mînak: kurt-kirin, teng-kirin, reş-bûn,

- **navdêr + lêker = lêkerên hevedudanî**

Hin Mînak: bal-kişandin, bang-kirin

- **rengdêr + rengdêr = rengdêr**

Hin Mînak: reş-tarî, sor-gewez

- **rengdêr + rengdêr = navdêr**
Hin Mînak: reş-belek,
- **navdêr + navdêr + navdêr = navdêr**
Hin mînak: se-dê-bav,”

Kadri Yıldırım (2012: 192) dibêje ku “navên ku herî kêr ji du bêjeyan pêk tên û yek ji wan pêşgir yan paşgir nîne wekî navên hevedudanî tên naskirin. Navên hevedudanî yên sereke ji bêjeyên jêrîn pêk tên”:

Du Nav

<u>Mînak</u>	<u>Wateya tirkî</u>
arav	çamaşır suyu
avdest	abdest
avdev	salya
avgoşt	etsuyu
avpîvaz	soğan çorbası
avrû	yüzsuyu, onur
bakur	kuzey rüzgârı
destbira	dost, ahret kardeşi
dotmam	amcakızı
dotmîr	beykızı
gulav	gülsuyu
marmasî	yılanbalığı
pisaxa	ağa oğlu, soylu
pismam	amcaoğlu
rêhesin	demiryolu

Taybetmendiyeî morfolojiya kurdî li gorî îzafê, hejmar, rewş û zayendê xwe ji zimanên din cuda dikin ku orjînalbûna xwe derdixwin. Heman taybetmendî dikarin di zimanên cuda de jî hebin, lê bikaranîna wan ne wekî hev bin û ji ber sedemên cuda taybetmendiyeî wan ketibin nav erozyona zimanên din û ber bi formeke nû ve guherînek bigirin.

Îzafe

Di kurmanci de, du peyv bi alîkariya hinek qertafan bi hev ve ten giredan ango têne izafekirin, ji wan qertafan re veqetandek te gotin (Tan. 2011: 93). Ev girêdan di binyada peyvan de hinek tiştan diguherîne û morfolojiya peyvan hinek taybetmendiyên nû digirin. Baran (2012: 71) pênaseya veqetandekê wiha dide: “Peyv dema ku bi rêya raveke tên bal hevdu, raveber veqetandekan digire. Ev qertaf di ravekê de mejer û zayenda ravebere diyar dikin.

Vegetandek ev in:

a (*mê*) -e (*nêr*) -en (*pirrjimar*)”

Pêwendiya pêvekirinê êdî ne bi alîkarîya partikên veqetandekê *a*, *ê*, vs., lê bi «izafet», wek di farisî de, bi dengdêreke pevgirêdanê di navbera *i* û *î* tê çê kirin, lê ji van herduyan nezîktirê dengê yekem e lewra jî bi heman qaraketerê/tîpê tê nivîsandin (Bedirxan, 1971: 35).

Qertafên îzafeyê li gor mêjer û zayendê, di kurdî - kurmancî de de di sê kategorîyên cuda da derdikevin hemberî mirovan. Ev qertaf di peyvê de morfolojîyê diguherînin. Yanî êdî ravek li gorî wan çêdibin.

Zayend

Di gelek zimanên hînd-ewropî û erebî de, zayenda peyvan tê dîtin (Toklu, 2018: 86). Zimanê kurmancî zimaneke zayendî ye. Hemû peyv yan nêr, yan mê yan jî netar in. Qada zayendê pêkhatineke zanînê ye ku zayenda zindî bi nav dike (Hamawand, 2011: 229). Ev rewşa fîzîkî û civakî hebûna zayendên cuda dide. Di kurmancî de du zayend, nêr û mê, û du mêjer, yekjimar û pirjimar hene (Bedirxan & Lescot, 1971: 63).

Hejmar

Rewşa hejmarê li gorî yekjimar û pirjimarî xwe nîşan dide. Ev taybetmendi di hemû zimanên dinyayê de xuya dibin. Tiştên likîr dibe ku neyên jimartin û yên din jî

cuda bên nîrxandin. Ev guherîn di însan, ajal û tiştan de derdikeve holê û bandora xwe li navdêran û lêkeran jî dike (Engel, 1977: 55)

Mînak

Xwarina şîr (ji dêvla vexwarinê)

Di vê hevokê de şîr wekî tişteki ku mirov dikare bijmêre dibîne û dinirxîne. Li hinek herêman hine tiştên avî wekî pirjimar dikarin bên îfadekirin.

Li Mêrdînê, însan dikarin bibêjin “xwarina şorbê” lê li hinek deverên din mirov dikarin bibêjin “vexwarina şorbê”. Her herêm li gorî xwe tercihan dike û biryara gişan li gorî herêmê tê dîtin.

Rewş (Case)

Rewş ev hal e ku, bi nîşankirina pêwendiya navdêrek taybetî bi hin hêmanên din re wekî bend an jî hevokekê çêdike. Bi gelemperî, nîşankirina haletê pêwendiya navdêrê bi lêkerê re (wek bireserê wê, bireserê rasterast, an bireserê nerasterast) an jî bi navdêrek din re (wek têkiliyek xwedan an cîhek) destnîşan dike (Lardiere, 2013: 85). Cûreyên rewşê wekî nomînatîf, akûsatîf û genetîf in.

Taybetmendiyek navdêrê ya hevpar a din ev e, ku rewşa peyvên li gorî ka ew di hevokê de çawa têne bikaranîn diguhere (Liddicoat & Curnow, 2004, 59). Rewşa morfolojîyê di navdêr û hevoksaziyê de jî tê dîtin. Ev guherîn û taybetmendiyên rewşê di her zimanê de li gorî taybetmendiyên xweser û giştî derdikevin pêşberî mirov. Di gelek zimanan de, şiklê navdêrekê ji hêla naveroka sentaktîk ve tê nîşankirin û çend rewşên her navdêran hene (Booij, 2007: 30).

Mînakên *Hawarê* li gorî senifandina Morfolojîyê

Peyvên Xwerû

- diran (h. 22: 6)
- dot (h. 33: 2)
- qelş (h. 44: 7)

- haf (h. 44: 2)
- mirûç - rû (h. 45: 2)
- ern (h. 45: 3)
- rêl (h. 7: 2)
- guwah (h. 7: 5)
- tewr (h. 20: 1)

Peyvên Dariştî

- keremkarî (h. 34: 2)
- pêşîger (h. 34: 3)
- gornistan (h. 38: 7)
- qencîker (h. 42.3; 44: 2)
- hêsirgah (h. 43: 7)
- eskergeh (h. 43: 7)
- ezabdar (h. 44: 4)
- kêmtoz in (h. 44: 3)
- xweşxane (h. 52: 5)
- şergeh (h. 45: 1)
- xewgeh (h. 51: 5)
- wesiyetdêr (h. 53: 1)
- kezebxur (h. 54: 3)
- dijûnker (h. 57: 1)
- siparîşker (h. 57: 2)
- berdar (h. 12: 5)
- xêrqar (h. 15: 2)
- bedkar (h. 16: 12)
- mêvanxanê - hotel (h. 19: 13)
- serheng (h. 20: 24)

- gramêrzan (h. 27: 5)
- mînêkar (h. 28:3; 45: 1)

Peyvên Hevedudanî

- gelparêz (h. 49: 4)
- tîravêjî (h. 57: 3)
- dojhnişînan (h. 57: 4)
- singjar(h. 12: 3)
- goştxwur (h. 12: 9)
- giyaxwur (h. 12: 9)
- encamreş (h. 13: 6)
- berxwer (ber) (h. 16: 3)
- anîncîha (h.19: 3; 30: 5)
- şîrmij (h. 19: 15)
- sêling (h. 20: 2)
- qezebhesin (h. 21: 4)
- şehadetname - bawername (h. 22: 13)
- bilindcih (h. 23: 1)
- jinmîr (h. 25: 12)
- çarparsû (h. 24: 1)
- devçirên (h. 29: 3)
- xweşdevling (h. 25: 2)
- xweyhay (h. 26: 10)
- dojhketiyan (h. 31: 1)

Mînakên ji Hawarê;

morfolojî	canda (yê te me) (h. 6: 6)
morfolojî	cihderq – cihderk (h. 5: 7)

morfolojî	herweqî * her wekî (h.7: 6)
morfolojî	dehrûjqî – deh rojan (h. 8: 2)
morfolojî	pisaxa (h. 15: 5)
morfolojî	zaroan- zarokan (h. 30: 15)
morfolojî	meşqaz (h. 38: 11)
morfolojî	meşqetik (h. 38: 11)
morfolojî	meşordek (h. 38: 11)
morfolojî	warkor (h. 38: 11)
morfolojî	wargeh (h. 40: 4)

3.6.3.1. Peyvên ku bi Pêşgira “têr”ê re Hatine Çêkirin

Gelek peyv hene ku di dema kovara *Hawarê* de hatine bikaranîn lê dawiyê wenda bûne. Ev peyv tiştên şênber, dînî, hestiyarî, xwezayî, peyvên girêdayî xwarin û vexwarinê ne. Ger em ew beşa mêjiyê ji bo peyvan wekî tûrikê peyvan bişayesînin an jî binav bikin, mirov dibîne ku peyvên ku di tûrikê peyvan de ne roj bi roj kêmtir bûne. Mixabin ev peyv niha bi vî şeklî û rengî nayên bikaranîn û derfetên însanan ku bikaribin xwe îfade bikin niha qelstir bûye, û biwêsbûna naveroka ragihandinê jî zêf bûye. Digel Wittgenstein (1921: 23) digot, “sînora zimanê min sînora dinyaya min e, Orwell (1954: 258) jî dibêje cewhera zimanekî “ne ji bo berfirehkirinê lê ji bo kêmkirina rêjeya ramanê hatiye sêwirandin” û bi “kêmkirina peyvên ferhengê” derdikeve pêşberî mirovan. Armanca Wittgensteinê ev e “sînorkirina fikran bi kêmasiya peyvan pêk tê. Loma bikaranîna zimên ji bo îfadekirina ramanê, amrazeke ku nexşeya sînorên realîteya zimên derdixe. Yanî Wittgenstein li ser têkiliya ziman û fikirê disekine. Loma tunebûn an jî wendabûna peyvên zimanekî nemaze kurdî-kurmancî bi heman awayî dibe sedema wendabûna hêza zimên. Ev peyvên jêr ku bi “têr”ê hatine çêkirin gelek giring in.

Mînakên ji *Hawarê*;

têr-	têrav û kanî (h. 53: 1)
têr-	têrgiya (h. 52: 1)
têr-	têrşerm (h. 35: 1)
têr-	têrtirs (h. 47: 1)
têr-	têragir (h. 44: 1)
têr-	têrahetî - têrrehetî (h. 44: 3)
têr-	têrdar (h. 43: 4)
têr	têrezab (h. 40: 2)
têr-	têrxeml (h. 40: 3)
têr	têrşerm (h. 35: 1)
têr-	têrxeml (h. 35: 1)
têr	têrkêhnî (h. 35: 1)
têr	têrnan (h. 34: 8)
têr	têrçav (h. 33: 2)
têr-	têrzad (h. 32: 4)
têr	têrpoşmanî (h. 29: 9)
têr-	têrbirin (h. 29: 9)
têr	têrsih (h. 27: 2)
têr	têr-avexarî (h. 24: 1)
têr	têraheng (h. 27: 9)
têr	têrreng (h. 20: 6)
têr	têrbêhn (h. 20: 6)

3.6.2.2. Peyvên ku bi Peyva “xudan”ê Hatine Çêkirin

Morfolojiya peyvan dikare bi herfek kelijandinê, pêşgir, paşgir, an jî berhevanîna du peyvên cuda û hwd. bandorê li ser wateyên nû, çêkirin û lêzêdekirina peyvên nû çêbike. Mirov dikare “xudantiya” tiştêkî razber, şênber, dîtbar, nedîtbar, hêst, amraz û hwd bike peyveke nû ku morfolojiya kurdî bi rehetî hem di warê vegotin û hem jî di ya îfadeyê de rê dide ku mirov bi vî awayî têkeve nava têkiliyên nû ku xwe bi peyvên nû îfade bikin.

Mînakên ji Hawarê;

xudan-	xudankitêb (h. 32: 1)
xudan-	xudansebr (h. 32: 2)
xudan-	xudanbext (h. 40: 3)
xudan-	xudanbehr (h. 41: 1)
xudan-	xudangilî (h. 41: 1)
xudan-	xudankar (h. 42: 6)
xudan-	xudanqudret (h. 40: 3)
xudan-	xudanqelem (h. 40: 6)

3.6.2.3. Peyvên Çêkirî

Çêkirina peyvan ne tenê girêdayê demekê ye; ew kar lê demeke dirêj digire û tiştekî gelek berbelav e. Herwiha hinek dem hene ku bandora xwe li ser çêkirina peyvan zêdetir dike; wekî mînak nexweşî, şer, teknoloji, bûyerên gerdûnî û hwd. Wekî di beşa duduyan de jî hatibû şîrovekirin di dema weşana *Hawarê* de, werger û Şerê Cihanê ya Duduyan bandoreke gelek mezin li ser çêkirina peyvên kurmancî kiribûn. Her sal gelek ferhengên navnetewî listeya peyvên nû ku têdikevin zimên diweşînin û xwendekarên xwe ji vê rewşê bihayê dîkin/dixin. Helbet ji bona zimaneke ku ne zimanê perwerdeya fermî ye, ev rewş gelek zehmet e û rê nade mirov peyvên nû lê zêde bike û yên heyî jî biparêze.

Mînakên ji Hawarê;

peyvên çêkirî	torpîlavêj (h. 38: 5)
peyvên çêkirî	noqarhilgir (h. 38: 5)
peyvên çêkirî	balafirhilgir (h. 38: 5)
peyvên çêkirî	bilindcîb (h. 42: 8)
peyvên çêkirî	kêmsiûd (h. 42: 8)
peyvên çêkirî	erkanherbiya emerîkê (h. 42: 8)
peyvên çêkirî	destşîştin - destşûştin (h. 42: 3)
peyvên çêkirî	guharto (h. 43: 1)

peyvên çêkirî	balafirşikên (h. 43: 5)
peyvên çêkirî	vaporên binavbûyî (h. 45: 10)
peyvên çêkirî	vapora petrolkêş (h. 45: 10)
peyvên çêkirî	hevalbend (h. 30: 9)
peyvên çêkirî	balafirên dûrgêr (h. 30: 8)

3.6.1.4. Peyvên ku bi peyva “kêm-”ê hatine çêkirin

Dema zimanek tenê di asta axaftina rojane de bimîne, hêdî hêdî qels dibe û hêza xwe wenda dike. Di kurmancî de, peyvên ku bi peyva “kêm”ê dest pê dike berê bêtir bûn û ji ber kêmaxaftina kurmancî, bandora medyayê yê zimanên din (ji gundan bigirin heya bajaran) û tunebûna perwerdeya bi zimanê dayikê (zikmakî) bû sedema qelsbûn û wendabûna kurdî û zaravayên wê. Nîfşên nû zimên wekî yê berê bi kar naynîn loma ziman di nav nîfşên nû de gelek lawaz e û ger bi vî awayî bidome pêkan e ku gelek tiştên zimên wenda bibin. Yanî transfera zimên pêk nayê.

Mirov dikare hinek mînakên gelemperî ji bo “kêm”ê bide:

kêmbûn

kêmcîr

kêmaxî

kêmaxî

kêmbîr

kêmhêş/kêmhiş

kêmkêş

kêmnas

kêmxew

kêmaqîl

kêmbûyî

kêmhêvî

kêmhêzî

kêmpirç

kêmxwîn

kêmzana

kêmqewet

Mînakên ji *Hawarê*;

kêm-	kêmedebî (h. 57: 3)
kêm-	kêmgirtinî (h. 39: 2)
kêm-	kêmsiûd (h. 10: 8)
kêm-	kêmtoz in (h. 44: 3)

Ji van mînakên navborî wateya wan diyar e û ew têne fahmkirin lê rasthatina peyva “kêmtoz”ê niha tiştekî gelek diwar e û li gorî agahiyên ferhengan niha ev peyv tune ye, ihtîmaleke mezin di axaftinên rojane de jî cî nagire. Bi vî şêklî peyv nayên bikaranîn û hêdî hêdî wenda dibin.

3.6.1.5. Peyvên bi peyva “dîlê” hatine çêkirin

Helbet mirov dikare bigihijê gelek peyvên din lê tiştê herî giring ku em dixwazin bale bikişînin li ser vê mijarê ev e ku ev korpûsa mezin ku bi peyvên “dîl”ê hatine çêkirin êdî kêmtir tînin bikaranîn û hêdî hêdî wenda dibin.

dîl -	dîlrûba (h. 6: 1)
dîl -	dîlreş (h. 9: 13)
dîl-	dîlhişq (h. 10: 3)
dîl	dîlhilûyî - dîlheliya (h. 12: 2)
dîl	dîlbihewes (h. 14: 4)
dîl	dîlhelalî (h. 14: 9)
dîl	dîlrind (h. 20: 7)
dîl	tengdîl (h. 20: 7)
dîl	dîlateş (h. 21: 4)
dîl	dîlgîr (h. 22: 13)
dîl	hesindîl (h. 23: 5)
dîl	dîlhevîn (h. 24: 3)
dîl	dîlsar (h. 24: 3)
dîl	dîlhişk (h. 29: 11)

dîl	diltengî (h. 29: 11)
dîl	dilrast (h. 30: 2)
dîl	dilpak / dilpakî (h. 30: 2)
dîl-	rastdil (h. 31: 2)
dîl	xweşdilî (h. 34: 1)
dîl	dilrastî (h. 34: 2)
dîl-	dilxwar (h. 40: 2)
dîl-	dilxar (h. 43: 2)
dîl	dilgirtî (h. 45: 3)
dîl-	dilmest (h. 50: 3)
dîl-	dilgirsî (h. 51: 5)
dîl-	dilzeximîn (h. 51: 9)

Dema em li tabloya jor dinêrin, mirov dikare bibêje ev peyvên jêr hema hema wenda bûne û nayên bikaranîn. Qesta me ev e ku êdî ew di nivîsê de an jî li hinek herêmên biçûk mane û bi tevayî yan jî bi gelemperî nayê bikaranîn. Loma dema perwerdeya ziman, edebiyat, hûner an jî tiştekî neyê danîn, ziman qels dibe/dibin û di serî de peyv wenda dibin.

- dilrûba
- dilhilûyî
- dilateş
- dilgîr
- dilhevîn
- dilxwar
- dilmest
- dilgirsî
- dilzeximîn

Hinek peyvên ku hêj jî di nav gel de pir tê bikaranîn, wiha ne

- dilreş
- dilhişq

- dilrind
- dilsar
- dilhişk
- dilrast
- dilrastî
- dilgirtî
- rastdil

Candarbûna zimên wekî girêdan û peywenda însanan, rasterast di peyvan de xwe bi awayekî zelal derdixin.

Peyva “dilrastê” wekî rengdêrê, û peyva “dilrastiye” jî wekî navdêr dikarin bi formên cuda bên bikaranîn ku fonksiyonên wekî tê dîtin hebûna van peyvan semantîk û guhestina wateyê rehetir dike. Hinek peyvên ku mirov bi kar tîne yan jî nayîne wiha ne:

- dilhelalî
- dilbihewes
- tengdil
- hesindil
- diltengî
- dilpakî
- dilrastan
- dilpak
- xweşdilî
- dilxar

Mirov dikare ji dêvla peyva “dilhesin” niha peyva “dilkevîr”ê bi kar bîne. Gelek peyvên bi vî şeklî derdikevin pêşiya me.

3.6.1.5.1. Ji Dêvla Peyveke Guherîna Peyvekê Din

devkenok - rûken (h. 19: 13)	Peyva “devkenokê” hê jî heye lê gelek kêr tê bikaranîn û ji dêvla wê peyva “rûkenê” yan jî “devliken”ê tê tercihkirin. Herçiqas wekî hevwaterên hev jî bin, kirpandina peyva “devê” (devkenok) û ya “rûyê” (rûken) tê dîtin, lê di ware semantîkê de digihîjin hev.
nivîsevan – nivîskar (h. 15: 1)	Wekî tê dîtin koka her du peyvan ji lêkera “nivîsê” derdikeve û du peyvên nû hatine çêkirin. Qertafên “van” û “kar”ê navdêran çêdikin. Lê berî derdora 90 salan peyva “nivîsevanê” cihê xwe daye “nivîskarê” û peyv niha berbelav bûye. Ji ber ku bi awayekî nivîskî weşanên wekî rojname û hwd. ji wê demê heya niha tune ne em nikarin vê guherîna vê peyvê bi rehetî bişopînin. Mirov dikare bi saya rojnameyên vî 30 salên dawî peyva “nivîskarê” bibîne û bişopîne.
gicok (şibat) - sibat (h. 10: 14)	Peyva “gicok”ê niha di ferhengan (ferhengên Mukriyanî, Îzolî û Farqînî) de nayê dîtin. Ji dêvla wê peyva yên “sibat” û “reşemî” gelek tên bikaranîn.
rojnamenivîs - rojnameger (h. 19: 14)	Peyva “rojnamenivîs” jî yek ji wan peyvan e ku wenda bûye an jî êdî nayê tercihkirin. Îhtîmaleke ku wateya ewil “nivîskarên rojnameyê” bi xwe ye û ya duduya ihtîmaleke mezin ev peyv tenê ji bo “rojnameger” wekî kar hatiye bikaranîn. Lê peyva rojnameger wekî karê ku kesek bi tevahî ji bo rojnameyek an jî ajanseke dixebite tê bikaranîn. Mirov gava peyvê binirxîne dikare wateya “nivîs”ê jî bifikire lê konteksa hevok û nivîsê di wateya rojnamegerî de ye.
berbînî - pêşbînî (h. 19: 5)	Her du pêşgirên “ber-” û “pêş-”ê di warê wateyê de

	nêzî hev in. Koka peyvê “bîn” e. Peyva “berbîn”ê di wateya “öngörülü”ya tirkî de ye ku ew ji hevwatera “pêşbînî”yê ye. Her çiqas em dikarin bibêjin peyva “berbinî” ji ya “pêşbînî”yê kevntir jî be, di axaftinê de rêjeya bikaranîna wan gelek kêr e.
şehmêr - şahmeran (h. 20: 5)	Ji dêvla peyva “şehmêr”ê peyva “şahmeran” ê hatiye bikaranîn. Peyva duduyan wekî pirjimar e û kirpandîna şahê bi hebûna pirjimariya mêran xwe derdixwe pêş.
tu bihay î (tu haydar î) (h.25: 8)	Peyva “bihaybûnê” di wateya “awareness”a îngilîzî û “farkındalık”a” tirkî de ye. Di wan demên dawî de, di konteksên akademîk de peyveke gelek populer e. Îja niha ji dêvla wê peyva “haydarbûnê” pir tê bikaranîn.
heyîn - hebûn (h. 26: 7)	Herçiqas ev her du peyv ji me re nas bixuyên jî peyva “heyîn”ê kevintir e û ya “hebûn”ê di roja îro de berbelavtir e. Peyva “heyîn”ê wekî koka peyvê hatiye bikaranîn.
anînciha - pêkanîn (h. 28: 5)	Di gelek zimanan de rê û rêbazên çêkirina peyvan dişibin hev, lê hinek ziman ji ber ku pir tîr bikaranîn û di weşan, tora civakî û perwerdeyê de cihekî giring digirin peyvên xwe zêde dikin. Peyva “anînciha” tiştêkî cî ji peyva “cî anîn”ê pêk tê. Wekî navdêr peyvek hêza zimên nîşan dide û bi vê forme mirov dikare hinek peyvên nû çêbike û li zimên zêde bike.
asêgeh – qele (h. 30: 8)	Mirov ji peyva “asegeh”ê bi rehetî wateya wê derdixwe ku asêbûna kesekî li cihekî nîşan dide. Herwiha niha peyva qelewê tê bikaranîn û ev peyv ji peyva erebî ji “qal‘at” لَعْلَعَة ê tê. Peyveke kurmancî hatiye terkkirin û ya erebî cihê xwe girtiye. Ev jî

	nîşanî me dide ku çanda wan di van demê de hem di perwerdehî, hem jî di hûnerê de peyvên xwe berbelavtir kiribin.
nêrevanî - nobedar (h. 30: 8)	Peyva “nêrevanî” hêj di ferhenga de tê dîtin û di wateya “nobedar, parêzvan, çavdêr, şopîner”ê de tê bikaranîn. Ew ji koka “nêrînê” çêbûye.
dibihnijîn – bêhnijîn - pişkandin (h. 30: 14)	Ev her du peyvên “bihnijîn û bêhnijîn”ê êdî nayên bikaranîn, lê li hin deveran peyva “bênijîn”ê û “pênijîn”ê, di wateya “pişkîn”ê tên bikaranîn. Peyva niha ya herî zêde berbelav “pişkandin” e.
hevalkarî – hevalbendî (h. 32: 3)	Dîsa bi du qertafên cuda peyvên nû çêbûne. Peyva “hevalkarî”yê weke peyveke samîmîtir û ya “hevalbendî”yê jî weke peyveke wateya hevaltî û dostaniya saxlemtir dide ku bi “bend”ê hatiye girêdan. Lê di roja îro de ji dêvla her du peyvan jî peyva “hevaltî”yê bêtir tê tercîhkirin û bikaranîn.
jûvan - ciwan (h. 34: 6)	Di ferhengên modern de, wateya “jûvan”ê wekî “kesê poşman” tê dayîn. Lê di kovarê de konteksa “jûvan”ê wekî ciwanê hatiye dayîn. Dibe ku CAB herfa “j”yê wekî xwendin û bilêvkirina “c”y tercîh kiribe. Ev taybetmendî di zimanên ewropî de gelek caran tê dîtin.
dawî dawî -dawiya dawiyê (h. 34:12)	Her du peyvên “dawî dawî” weke biwêjeke hatiye dayîn. Lê di nav demê de peyv bûye “dawiya dawiyê”
mêjîçeçilyayî - serî tevlihev (h. 35: 7)	Mirov di gelek zimanan de dikare bi rehetî wate û formên berê ku hatine bikaranîn û ketine zimên fahm bike, lê terciha mirovan jî bo peyv, qalib û lêkirina wateyên nû li peyvên heyî jî bo însanan tiştekî jêneger e.
bingetîn - bingehîn (h. 35: 7)	Herçiqas ev guherîn weke guherîna du peyvan jî be, di eslê xwe de guherîna dengî ye. Lê ji ber ku êdî

	peyva “bingetîn”ê nayê bikaranîn û ji dêvla wê peyva “bingehîn”ê tê tercihkirin, me pêwistî bi dayîna wê dît ku em bikaribin her duyan bidin ber hev.
çarçik - kare (h. 36: 9)	Niha di roja me de ji bo qareyê di ferhengan de em dikarin rastî peyva “çargoşe” û “çarçuhê” bibin. Lê di <i>Hawarê</i> de peyveke kevintir “çarçik” hatiye bikaranîn û îhtîmaleke mezin di wê demê de jî peyveke wisa bû ku ji aliyê xwendevanan dihate zanîn û fahmkirin.
baldirêj – bisebr – baldarbûn (h. 39: 2)	Ew kesek <i>baldirêj</i> e. Ev hevoka ku ji “ew” kesê sisêyan ku wateya “bisebir, bêhnfireh, sebirdar” e tê dayîn wateyeke zelal dide me. Û dibe ku ev peyv bi ya “baldarbûnê” jî bê tevlihevkin. Di ferhengan de, ev hêj jî tê bikaranîn.
rûniştiman - niştecih (h. 39: 7)	Wateya “rûniştimanê “niştecih, warnîş, xwecî, şênî, daniştî û niştiman” e û wekî tê dîtin bi “rûnişt+î+man”ê pêk tê. Di bihîstina ewil de wekî fonetîka soranî li ber guhê me dikeve lê di heman demê de ev peyv di nav xwendevanên <i>Hawarê</i> de jî tê fahmkirin ku dîbe ku li rojavayê jî hatibe bikaranîn.
Hewcedar/an –mihtac (h. 37: 3)	Ji koka hewceyê bi lêzêdekirina qertafa nav û rêngdêrê çêbûye. Peyva “hewcedar”ê û bi lêzêdekirina qertafa pirjimariyê jî bûye “hewcedar”. Niha dîsa peyva erebî ya “mihtacê” bêtir tê bikaranîn.
eqildaran bigerin - baqilan (h. 37: 3)	Niha di roja me de peyva “eqildar”ê nayê bikaranîn, ji dêvla wê peyva “baqil, bîaqil”ê cihê xwe bêtir girtiye.
danezanek belav kir –	“Dane + zan” bûye “danezanek” ku wateya

belavok (bildiri) danezan –dane (h. 50: 9)	“daneyê” (data/ <i>ing</i> ; veri/ <i>tur</i>) cihê xwe daye peyva “belavok”ê ku ew jî ji lêkera “belavkirinê” hatiye çêkirin. Niha peyva “danezanekê” nayê bikaranîn lê di konteksên akademîk de peyva “daneyê” pir tê dîtin û bikaranîn.
bîrok û serhatî - bîranîn (h. 39: 7)	Peyva “bîr”ê koka peyva “bîrok”ê ye û “bîrok” bi saya <i>Hawarê</i> bi wateya “bîranînê” xwe gihandiye roja me. Di ferhengan de wateyên “nêrîn, helwest, bawerî, qenaet, boçûn û bireweriyê jî tê dîtin.
bişûndemayî - paşmayî (h. 39: 11)	Peyva “bişûndemayînê” ji daçeka “bi + navdêra “şûn”ê + daçeka “de”yê + lêkera “mayînê” û partîsîpa “yî”yê hatiye çêkirin û piştî 90 salî jî tê fahmkirin. Niha ji dêvla wê peyvê peyva “paşmayî”yê (paşdemayî) tê bihîstin û bikaranîn. Wekî mînak; Welatên paşmayî X welatên pêşdeçûyî. Kesên paşmayî û hwd.
bijîr - bi jîrî (h. 40: 2)	Peyva “bijîr” wekî rengdêr di wateya zîrebûn û “jîrbûnê” de hatiye bikaranîn lê niha meyla însanan ku bi kar bînin kêmtir e û nayê bikaranîn.
zorker - zilmkar - zordest (h. 40: 5)	Her sê peyv jî bi awayekî vekirî wetayên xwe didin, lê tiştê giring ew e ku sedemeke guherînê axêverên zimên bi xwe ne ku terciha xwe dema li ser peyvekê dikin û bi awayekî nivîskî an jî axaftvanî têdixin nav jîyanê. Koka “zor” û “zilm”ê rê dide gelek însanan ku mirov peyvê demildest fahm dike û bi kar tine. Herwiha peyva “zorker”ê ew kesê ku tiştêkî bi zorê dide çêkirin, peyva “zilmkar”ê ew kesê ku wekî bi hêzekê zilmê li însanan dike û zordest jî wekî têgeheke razber lê bi pratîkên cûr bi cûr kû li ser însanan tê şopandinê nîşan dide. Peyva “zorker”ê êdî kêmtir tê bikaranîn.

beristan - berî (h. 41: 3)	Peyva “beristan”ê di wateya “deştîn, berin, çolistan”ê hatiye û tê dayîn (ovalîk, çöllük/Tür). Niha ev peyv weki “berî”yê hatiye kurtkirin.
bandêr - bandor (h. 41: 4)	Peyva bandêrê wekî “bikêrhatî” hatiye bikaranîn niha bi guherîna herfa “ê” û “o”yê peyva bandore li gelek qadan xwedî bandoreke mezin e û tê bikaranîn.
tirsiyar - bitirs (h. 42: 1)	Ji dêvla peyva “tirsiyarê” ku wateya wê vekirî ye peyva ku bi daçekê hatiye çêkirin “bitirs cihê xwe girtiye.
temaşager-temaşevan (h. 44: 3)	Dîsa guherîna daçekê kok wekî hev hiştiye lê peyva dine guhartiye. Temaşevan peyvek berbelavtir e û piştî kenalên televîzyonên peykî gelek cihê xwe girt û bi saya TVyê gelek peyvên nû wekî “ast, şano, aborî û hwd” ketine nav zimanê jiyana însanan. “Temaşager” niha li bakûrê weke peyveke mirî ye.
temaşagah - dik (h.44: 3)	Dik tê wateya cihê temaşekirin/sêyrkirina tiştekî. Berê peyva “temaşagah” hatiye bikaranîn. Paşgira “-gah”ê navdêrên cihî çêdike loma diyar e ku ev peyv behsa cihekî dike.
şikirdar - keremkar (h.45: 2)	Niha em dikarin îddîa bikin ku her du peyv jî li gorî konteksta ku tê de tên bikaranîn û wateyekê digirin; 1.konteksên dînî 2. konteksên têkiliyên însanan her du wateyan zelal dikin. Niha peyva “şikirdar”ê li gorî “keremkarê” bêtir tê bikaranîn. Peyva “şikr”a erebî di kurmancî û tirkî de cihê xwe girtiye û xwe bi rehetî nîşan dide.
bişundevegerandin - paşvekişîn (h. 45:11)	Mirov dibîne ku dema zimanek pir bê bikaranîn wê demê hejmar û rêjeya peyvan jî zêde dibin û axêverên zimên peyvên nû bi rehetî çêdikin. Peyva “bişundevegerandin”ê jî yek ji wan peyvan e ku tê bikaranîn. Ji dêvla wê peyva “paşvekişînê heye.

ne anî der - dernexist (h.46: 2)	Lêkera “derxistin” an jî forma neyinî “dernexistin”ê bi awayekî din ku ji hev veqetiyane mirov dikare bi hal û forma berê bibîne ku ew jî “ne anî der” e. Di vê forma kevin de wekî tê dîtin, qertafa neyiniyê, lêker û navdêr giş ji hev cuda ne.
bi darî çavan e - li ber çavan ev (h. 45: 11)	Îfadeya “bi darî çavan e” wekî biwêjeke hatiye bikaranîn. Bandora folklorê di zimên de wekî hêmanên çandî xwe nîşan dide. Ji dêvla wê êdî îfadeya “li ber çavan”e tê bikaranîn û dîtin.
evîner - evîndar (h.49: 4)	Peyva “evîner”ê wekî wateya kesê ku evînê çêdike dide. Mirov dikare fikir û hîssa ku tiştê candar an jî ne candar wekî xwezayê jî nîşan dide bifikire. Lê ev peyv êdî nemaye ji dêvla wê peyva “evîndar”ê heye ku tê wateya kesê ku dil daye tê bikaranîn.
bextçakî (talihli) - bextreşî (h. 49: 4)	Peyva “bextçakî” êdî nayê bikaranîn û ji dêvla wê hevokên girêdayî başbûna bextê weke “bextê wî/ê baş e, Ev peyv jê çêbûne; <i>bextbireş bextbireşî bextçak bextçakî bextçê bextçêyî bextewar bextewarî bextewer bextewerî bextfire bextfireyî bextiyar bextiyarî bextparêz bextparêzî bextreş bextreşî bextxweş bextxweşî bextyar bextyarî bêbext bêbextî bibext bextdar bextdarî xweşbext xweşbextane</i> . Peyvên bextçak û bextçakî li vir jî cî digirin. Lê wekî gelek peyvên din, ev peyv ji aliyê kesên temenmezin û kurdîaxêv ve tên bikaranîn. Divê ev peyv bi awayekî sistematîk û bi nivîskî têkeve nav çerxa perwerdeyê ku ev peyv bên parastin.
serwext kirin - agahdar kirin (h.49: 10)	Ev peyva “serwextkirinê” hêj bi tevahî wenda nebûye û cihê xwe diparêze lê ne wekî berê pir tê bikaranîn. Ji dêvla we peyva “agahdarkirin”ê bêtir tê tercihkirin.

qutbiriya xwe - xwe jê qut kir (h. 30: 11)	Forma navdêra “qutbiriya xwe” niha nayê bikaranîn herwiha forma lêkerê tê tercihkirin.
berpêyî -pêşkeşî (h. 50: 9)	Herçiqas qaliba “berpêbeyûbûnê” ne kevn jî be, mixabin niha bikaranîna wê li ber qedandinê ye û di rêjeyeka kêm de tê dîtin.

3.6.1.5.2. Guherînen Peyvan

Hinek peyv di her zimanî de diguherin wekî xuya ye di nav demê de ciyê xwe bi peyvên din re diguherin. Carinan hewcedariyên civakî dikarin guherînek berbelavtir di lêzêdekirina peyvên nû de derxin holê (Refnaldî, 2012: 11). Mirov dikare guherîna semantîkî jî bibîne û guherîna terciha peyvên nû jî bibîne.

Mîna keke ku di vî 30 salên dawî de wiha ye;

- Rojanegirtin
- Rojane
- Rojenivîsk

Di destpêka rojnameyên kurmancî de, li Tirkîyeyê, peyva “rojanegirtine” dihate bikaranîn û di nav deh salên pey de rewşa bikaranîna wê peyvê guherî û peyva rojane hate tercihkirin. Lê wekî tê dîtin, li gorî fikira gelemperî ev her du jî weke werger û bandora tirkî hatin nirxandin û di vî deh salên dawî de jî peyveke nû “rojenivîsk” ket zimên û hate tercihkirin. Sedemeke din jî mirov dema diaxivin, bi gelemperî wateyên nû li peyvan bar dikin û peyvên heyî jî li gorî xwe diguherînin ku ev jî pêvajoyeke gelek normal e. Ji xwe sedemeke din jî “pêvajoya hînbûna zimên ji bo zarokan” pêvajoyeke giring e. Di wê demê de zarok watêyên nû li peyvan dikin û li gorî fahmkirina xwe zimanê nû çê dikin, û têdikevin nava ragihandinê û xwe îfade dikin. Bi rastî jî, çavdêr û qeydkirina wê pêvajoya ku zarok zimên hîn dibin û xwe îfade dikin ku tê behskirin gelek giring e. Zarok bi xwe dibin sedema cudahiya taybetmendiyên nû yên zimên. Mirov dikare bibe şahîdê pêvajoya gelek metod û tezên pêvajoya hînbûna zimên û gelek çavdêriyên giranbiha qeyd bikin.

Hinek mînakên balkêş wekî jêr in;

xemgîr - xemgîn (h. 28: 1)
didevanî - çavdêrî (h. 51: 6)
pištenî - piştevanî (h. 50: 20)
pereng - pêlik (h. 53: 1)
piring - pêl (h. 54: 3)
nivîsar - gotar (h. 54: 6)
ajotek - ajovan (h. 54: 6)
nuhroz - newroz (h. 54: 6)
xatirat - bîranîn (h. 54: 2)
gurçîlik - gurçik (h. 54: 3)
sindûrîk - sindoq (h. 56: 6)
bîrewer - bîrmend - zana (h. 20: 1)
şerê brûskîn - şerê bi lez (h. 38: 7)
ji berêve xwe - ji ber ve xwe (h. 23: 3)

3.6.2.4. Daçek

Guherînên daçekî an jî nêrîn û fahmkirina daçekan ji aliyê însanan di dewr û dema ku tê de ne dikarin hinek nêrînan bi awayekî vekirî bidin. Mînakên jêr di *Hawarê* de, nivîsa daçek û peyvên din bi hev re didin û niha ev nivîs ji hev cuda ye, di rastnivîsa kurmancî de, tenê lêker bi hev re tê nivîsîn herwiha daçek, rengdêr û navdêr ji hev cuda tên nivîsîn. Bi awayekî veşartî nivîsandina morfolojiya peyvan dikare bi nivîsa şaş bê guhartin. Loma gelek kes dema vê guherînê dibînin bi awayekî xwezayî dikarin nivîsa daçekan di îngilîzî, almanî û fransî de bifikirin û ew giş ji hev cuda tên nivîsîn. Dibe ku hevparbûna malbata zimên rê dabe vê meylê.

	Kirde	Lêkera alîkar	Daçek	Navdêr	
Îngilîzî	He	is	at	home	
Almanî	Er	ist	zu	Hause	
Fransî	Il	est	à	la maison	
Kurmancî	Ew		li	malê	ye (lêk.alk.)

Wekî ji tabloya jor tê dîtin, daçek di her çar zimanan de ji hev cihê tîn nivîsîn. Herçiqas li vir mînakên erebî û farisî tune bin jî, mirov dikare rastnivîsa wan jî binirxîne. Her wiha lêkera alîkar ya kurmancî tê dawiya hevokê lê di her sêyên din de ew piştî lêkerê tê bikaranîn. Loma ihtîmaleke mezin bandora zimanên malbata hind û ewropî li ser nivîsa kurmancî kiriye.

Mînakên ji *Hawarê*;

daçek	lijêr (h. 6: 5)
daçek	limin (h. 6: 5)
daçek	jiber (h. 6: 5)
daçek	destbî (h. 6: 5)
daçek	bihev re (h. 6: 5)

Ev mînakên navborî wekî tê dîtin bi hev re hatine nivîsîn û ji rastnivîsa îro jî cihê ne. Guherîna qeîdeyên zimên bi bikaranîn û tercihan diyar dibe.

3.6.2.4.1. Şaşnivîsîn an jî bi hev re Nivîsîna Daçekan

Di *Hawarê* de, hinek daçek bi hev re û hinek jî ji hev cihê hatine nivîsîn. Pirsgirêka rastnivîsê carinan li gorî îfadeya kurmancî û carinan jî li gorî zimanên din xuya dibe. Ev binbeş ji aliyê me wekî “şaşnivîsê” hate binavkirin, lê mirov dikare wekî “terciha nivîsa daçekan” jî binav bike.

şaşnivîsa daçekê	dinav - di nav (h. 16: 13)
şaşnivîsa daçekê	dinêv - di nêv 261 (h. 17: 3)
şaşnivîsa daçekê	limin - li min (h. 10: 2)
şaşnivîsa daçekê	liba - li ba (h. 20: 4)
şaşnivîsa daçekê	wirjî - wir jî (h. 20: 4)
şaşnivîsa daçekê	lijêr (h. 6: 5)
şaşnivîsa daçekê	jiber (h. 6: 5)
şaşnivîsa daçekê	destbî (h. 6: 5)
şaşnivîsa daçekê	bihev re (h. 6: 5)
şaşnivîsa daçekê	biqul (h. 11: 1)
şaşnivîsa daçekê	biqeser (h. 11: 1)
şaşnivîsa daçekê	liser (h. 19: 2)
şaşnivîsa daçekê	biderqive- derkeve (h. 14: 4)

Mirov dikare gelek çewtiyên mentîqa zimên jî bide. Mînaka bikaranîna daçekan jî bi rastî ji aliyê kurdên Tirkîyeyê ve pir tê bikaranîn (Geyik, 2020: 82).

Mînak:

- **Di** romana kurdî **de** nivîskarî (Kürt romanında Yazarlık)
- **Di** romana kurdî **de** çîroka neteweperwerî (Kürt romanında Ulusalcılığın Hikâyesi)

Divê ya rast wiha bûya:

*Nivîskarî di Romana Kurdî de - *bi kurmancî*

(*Authorship in Kurdish Novels*) - *bi îngilîzî*

[Das Schreiben (Literatur) in Kurdenroman] - *bi elmanî*

*Çîroka Neteweperwerî di Romana Kurdî de - *bi kurmancî*

(*The story of Nationalism in Kurdish Novels*) - *bi îngilîzî*

[Die Geschichte des Nationalbewusstseins in Kurdischen Roman] - *bi îngilîzî*

Mînakên Hawarê

daçek	bikrêj (h. 9: 2)	Cilên wê a bikrêj Ciln wê yê kirêj (di forma roja me de, daçek hatiye avêtin, ku nehatibe avêtin jî ji hev cihê tê nivîsîn.
daçek	lihevtewandî (h. 9: 2)	Bi saya bikaranîna daçek û lêkerê peyveke nû çêbûye ku ev jî fonksiyonelbûna zimên nîşanî me dide.
daçek	rûjqe (h. 9: 7)	rojek – rojeke
daçek	dive tu ji goristanan <i>bi derkevi</i> dema niha yan ji daçek (h. 21: 13)	Li vir jî daçeka “bi”yê hatiye avêtin. Rewşa daçekê ku hatiye avêtin yan jî wendabû ye li hinek herêman hêj neqediya.
daçek	xuda <i>di gunehen</i> evden xwe dibore (h. 33: 2)	Li vir jî daçeka “di”yê dîsa wenda bûye.
daçek	bere xweda - xwe da (h. 21: 4)	Li vir jî daçeka “da”yê bi hev re hatiye nivîsîn û di nav demê de ji hev hatiye veqetîn û forma herî dawî girtiye.

3.6.2.4.2. Daçeka “di”ya ku hatiye avêtin

Tiştêkî gelek eceb ê ku bala me dikşîne, avêtin an jî terkkirina daçeka “di”yê ye ku bi rastî jî hem mirov dikare forma berê bibîne û hem jî mirov dikare rehetiya avêtinê ji bo bilêvkirin û axaftinê bibîne. Ji dêvla avêtinê ger mirov bibêje ya wendabûyî wê çêtir be. Ji ber biryara gelî, di nav demê de ku terciheke wiha daye, em dibînin ku sivikkirina hevokan carinan bi avêtina daçekê û carinan bi avêtina herfan pêk hatiye.

daçeka wendabûyî	avên di sar (h. 19: 2)
daçeka wendabûyî	mirovên di xwe hes bikin (h. 33: 3)
daçeka wendabûyî	emelên di wan heye (h. 32: 1)
daçeka wendabûyî	çêliyên di wî bijartî bûn (h. 32: 1)
daçeka wendabûyî	pêxemberê di wî (h. 48: 1)
daçeka wendabûyî	gunehê di wan (h. 49: 1)
daçeka wendabûyî	pêxemberên di wî (h. 49: 1)
daçeka wendabûyî	eskerên di wî dest bi şer kirin (h. 37: 2)
daçeka wendabûyî	mirovên di xwe (h. 38: 6)
daçeka wendabûyî	çêliyên di wî (h. 41: 2)
daçeka wendabûyî	peyayên di wî (h. 46: 1)
daçeka wendabûyî	mirovên di wî felitandin (h. 28: 2)
daçeka wendabûyî	derdê di dila ye (h.30: 5)

Di gotara “di”ya kirpandinê/tekîdê di kurmancî de, ku ev xebateke berfireh e li ser bikaranîn, nebikaranîn û rola ku dilîze em dibînin ku di gelek qadên cuda (pirtûkên rêzimanê, helbestên klasîk û xebatên folklorîk) de hatiye bikaranîn (Kızıl, 2019: 47-74).

3.6.2.5. Wendabûn

Wendabûna peyvan dikare wekî wendabûna navdêr, rengdêr, lêker, hokeran di her qadên zimannasiyê de bi taybetmendiyan beşên semantîk, morfolojî, sentaks û fonetîkê de bî. Ondřej Tichý dibêje wendabûna peyvan ji ber sedemên hûndirîn û derveyî ne ku ev jî di gelek zimanan de diyardeyên ku zêde li ser nehatine xebitîn (2018: 3). Têgihîştina me ya wendabûna peyvan bi giringî bi xwezaya çavkaniyan ve girêdayî ne, rêbazên ku çavkanî rê didin analîzê çi bi kar anîbin, û meylên bingehîn ên sosyolînguîstîkê çibin, nêrîna me lêkolîneran jî ew e. Mirov dikare wendabûnê wekî taybetmendiyeke xwezayî ya zimanan binirxîne.

Mînakên ji *Hawarê*;

wendabûna herfa “i”yê	dranê - diranê (h. 22: 6)
wendabûna navdêrê	keremkarî (h. 34: 2)
wendabûna navdêrê	pêşîger xaniyên xwe paqij bikin- pêşiya (h. 34: 3)
wendabûna lêkerê	cirm fikir (h. 34: 11)
wendabûna navdêrê	vaporqefleyên (h. 36: 6)
wendabûna navdêrê	piştixurtî (h. 34: 1)
wendabûna navdêrê	xulkfirehî (h. 38: 7)
wendabûna navdêrê	dilbirehmî (h. 38: 7)
wendabûna herfa “n”yê	gornistan - goristan (h. 38: 7)

Hinek peyv wekî navdêr êdî nayên bi kar anîn, lê wekî lêkere hêj jî têne bikaranîn. Wekî mînak; “xulkfirehî” û piştixurtî” do forma lêkerê de hene û ji aliyê bikarhêneran ve têne bikaranîn.

3.6.2.6. Peyvên Wenda

Wateya hinek peyvan bi rehetî tên fahmkirin, herwiha ku bên fahmkirin jî êdî tunebûna wan a nivîskî û devkî wendabûna wan nîşanî me didin ku em dikarin peyvan bişopînin. Peyvên wendabûyî li gorî fahmkirin û zanîna wateya xwe û nefahmkirin û nezanîna xwe hatine senifandin û wekî jêr in.

3.6.2.6.1. Peyvên ku wendabûnê lê wateya wan tên zanîn

Mînakên ji *Hawarê*;

peyvên wendabûyî	şahinet dîkin (h. 42: 6)
peyvên wendabûyî	qencîker (h. 42: 3; 44: 2)
peyvên wendabûyî	encambexş (h. 42: 8)
peyvên wendabûyî	hêsirgah (h. 43: 7)
peyvên wendabûyî	eskergeh (h. 43: 7)

peyvên wendabûyî	ezabdar (h. 44: 4)
peyvên wendabûyî	kêmtoz in (h. 44: 3)
peyvên wendabûyî	deng û berdengîn (h. 44: 7)
peyvên wendabûyî	bajar û destegahên wan (h.27: 10)
peyvên wendabûyî	şergeh (h. 45: 1)
peyvên wendabûyî	havîngeh (h. 48: 2)
peyvên wendabûyî	gelparêz (h. 49: 4)
peyvên wendabûyî	xewgeh (h. 51: 5)
peyvên wendabûyî	xweşxane (h. 52: 5)
peyvên wendabûyî	erebekêş (h. 52: 12)
peyvên wendabûyî	wesiyetdêr (h. 53: 1)
peyvên wendabûyî	xûnrêj (h. 54: 3)
peyvên wendabûyî	mîrathiştî mîratwer - mîrasxwar (h. 53: 1)
peyvên wendabûyî	kezebxur (h. 54: 3)
peyvên wendabûyî	navbir - navbeynkar - qasid - navçîn (h. 56: 1)
peyvên wendabûyî	dijûnker (h. 57: 1)
peyvên wendabûyî	siparîşker (h. 57: 2)
peyvên wendabûyî	tîravêjî (h. 57: 3)
peyvên wendabûyî	dojehnişînan (h. 57: 4)
peyvên wendabûyî	rêl (h. 7: 2)
peyvên wendabûyî	banker (h. 6: 4)
peyvên wendabûyî	guwah (h. 7: 5)
peyvên wendabûyî	singjar(h. 12: 3)
peyvên wendabûyî	berdar (h. 12: 5)
peyvên wendabûyî	duyîtî dudilî (dilemma) (h. 10: 13)

peyvên wendabûyî	goştawur – giyaxwur (h. 12: 9)
peyvên wendabûyî	encamreş (h. 13: 6)
peyvên wendabûyî	berxwer (ber) (h. 16: 3)
peyvên wendabûyî	xêrqar (h. 15: 2)
peyvên wendabûyî	bedkar (h. 16: 12)
peyvên wendabûyî	serjorek – serjêrek (h. 19: 1)
peyvên wendabûyî	anîncîh - pêkanîn (h.19: 3; 30: 5)
peyvên wendabûyî	mêvanxanê - hotel (h. 19: 13)
peyvên wendabûyî	şîrmij (h. 19: 15)
peyvên wendabûyî	tewr - çeşîd – cûre (h. 20: 1)
peyvên wendabûyî	sêling - sê ling (h. 20: 2)
peyvên wendabûyî	serheng (albay) (h. 20: 24)
peyvên wendabûyî	qezebhesin (h. 21: 4)
peyvên wendabûyî	xwîstan (h. 21: 17)
peyvên wendabûyî	şehadetname - bawername (h. 22: 13)
peyvên wendabûyî	bilindcîh (h. 23: 1)
peyvên wendabûyî	dilê we bila tucar sist nebe (biwêj) - xwe netirsînin (h. 23: 8)
peyvên wendabûyî	çarparsû (h. 24: 1)
peyvên wendabûyî	jînmîr (h. 25: 12)
peyvên wendabûyî	xweşdevling (h. 25: 2)
peyvên wendabûyî	xweyhay (h. 26: 10)
peyvên wendabûyî	rastker – durist (h. 27: 1)
peyvên wendabûyî	gramêrzan (h. 27: 5)
peyvên wendabûyî	mînêkar - mînak - model (h. 28:3; 45: 1)

peyvên wendabûyî	devçirên (h. 29: 3)
peyvên wendabûyî	zimandar (h. 30: 8)
peyvên wendabûyî	dojehketiyan (h. 31: 1)
peyvên wendabûyî	çarnikarên îngîltereyê (çar alî) (h. 30: 9)
peyvên wendabûyî	ewlegeh (h. 31: 1)
peyvên wendabûyî	nimêjgeh (h. 31: 1)
peyvên wendabûyî	ruxistî (h. 31: 1)
peyvên wendabûyî	peresteşkar (h. 31: 2)
peyvên wendabûyî	nimêjker (h. 31: 3)
peyvên wendabûyî	gazinker (h. 31: 3)
peyvên wendabûyî	pêşnimêj (h.31: 5)
peyvên wendabûyî	hesincawên (h. 32: 12)
peyvên wendabûyî	berhicûm (h. 32: 5)
peyvên wendabûyî	dot (h. 33: 2)
peyvên wendabûyî	xwînriz (h. 33: 14)
peyvên wendabûyî	şikirdar (h. 34: 2)
peyvên wendabûyî	seyrangeh (h. 34: 4)
peyvên wendabûyî	çekhilgir (h. 34: 6)
peyvên wendabûyî	avdiza tehtë (h. 34: 7)
peyvên wendabûyî	asêgeh - senger- çeper-kelhe-qale (h. 34: 8)
peyvên wendabûyî	xwarbar yên ko tên xwarin (h. 34: 14)
peyvên wendabûyî	keremkar (h. 35: 1)
peyvên wendabûyî	agirketî (h. 35: 2)
peyvên wendabûyî	xwîndar (h. 35: 7)
peyvên wendabûyî	mehik (h. 36: 1)

peyvên wendabûyî	xatirniwaz (h. 37: 1)
peyvên wendabûyî	emîrname (h. 37: 10)
peyvên wendabûyî	berqerekol (h. 37: 12)
peyvên wendabûyî	xêrxwaz û xêrkar (h. 38: 5)
peyvên wendabûyî	pakdil û pakziman (h. 38: 6)
peyvên wendabûyî	mirov dewletên - dewletvan dewletmedar-siyasetvan-siyasetmedar (h. 38: 10)
peyvên wendabûyî	mêvanhewin (h. 40: 5)
peyvên wendabûyî	reşehiv (h. 14: 10)
peyvên wendabûyî	xwînrej - xunkar (h. 30: 6)

Peyvên ku wendabûnê lê wateya wan nayên zanîn

peyvên wendabûyî	hafa min (h. 44: 2)
peyvên wendabûyî	hevî – wekhev (h. 42: 2)
peyvên wendabûyî	hinkufên xwe (h. 42: 6)
peyvên wendabûyî	tilnivîs (h. 42: 6)
peyvên wendabûyî	nimînende (h. 31: 12)
peyvên wendabûyî	nîv tobak e (h. 44: 2)
peyvên wendabûyî	kuştarek (h. 44: 5)
peyvên wendabûyî	qelş (h. 44: 7)
peyvên wendabûyî	qewî bûn (h. 44: 8; h. 44: 11)
peyvên wendabûyî	girtinhevên pêşîn (h. 44: 11)
peyvên wendabûyî	erna wan (h. 45: 3)
peyvên wendabûyî	mirûç - rû (h. 45: 2)
peyvên wendabûyî	xwerinmayî (h. 46: 8)
peyvên wendabûyî	civatnişîn (h.48: 2)

peyvên wendabûyî	nûxwirî (h. 48: 2)
peyvên wendabûyî	giyanermik (h. 48: 2)
peyvên wendabûyî	spîker in (h. 48: 2)
peyvên wendabûyî	vehesînê (h. 48: 8)
peyvên wendabûyî	xilxila xilikên (h. 48: 4)
peyvên wendabûyî	gihanheva (h. 48: 7)
peyvên wendabûyî	xwahişger (h. 49: 7)
peyvên wendabûyî	hawil jê ne kirin (h. 49: 8)
peyvên wendabûyî	birînên me daxevînî (h. 49: 9)
peyvên wendabûyî	zeviyên lêxemkirî (h. 49: 10)
peyvên wendabûyî	ji vî awirî ve (h. 49: 12)
peyvên wendabûyî	xeyalxan-e (h. 50: 4)
peyvên wendabûyî	hewilnak (h. 50: 4)
peyvên wendabûyî	bişivişk (h. 50: 4)
peyvên wendabûyî	zêrheli (h. 50: 5)
peyvên wendabûyî	hewranikî reş - cil (h. 50: 4)
peyvên wendabûyî	kişwerkişayi (h. 51: 3)
peyvên wendabûyî	zirehpûş (h. 51: 3)
peyvên wendabûyî	terilandin (h. 51: 5)
peyvên wendabûyî	hevalcêw (h. 51: 6)
peyvên wendabûyî	xeribxilqet (h. 51: 6)
peyvên wendabûyî	hêrgiz hîç- eger (h. 51: 9)
peyvên wendabûyî	sergevaz (h. 51: 10)
peyvên wendabûyî	mirarî - încî (h. 52: 5)
peyvên wendabûyî	şûrhingêv (h. 52: 8)

peyvên wendabûyî	pag ên xirbê (h. 52: 12)
peyvên wendabûyî	hezrîng (h. 54: 2)
peyvên wendabûyî	pirxend (h. 54: 12)
peyvên wendabûyî	gurmên - gur (h. 54: 14)
peyvên wendabûyî	qerqer - kefen (h. 54: 15)
peyvên wendabûyî	tewîtîn (h. 55: 8)
peyvên wendabûyî	kêfxo (h. 57: 2)
peyvên wendabûyî	qesdegah (h. 57: 2)
peyvên wendabûyî	hêwerk - mintîqa (h. 57: 6)
peyvên wendabûyî	nemsewî (h. 57: 7)
peyvên wendabûyî	dengîn (h. 6: 3)
peyvên wendabûyî	gergerok (h. 13: 12)
peyvên wendabûyî	dexs (h. 14: 2)
peyvên wendabûyî	wirga (h. 17: 11)
peyvên wendabûyî	newzar (h. 18: 13)
peyvên wendabûyî	avdeyn (h. 18: 28)
peyvên wendabûyî	nigardar (h. 19: 2)
peyvên wendabûyî	paqhilanî (h. 19: 2)
peyvên wendabûyî	kelemrew (h. 19: 4)
peyvên wendabûyî	berder (h. 19: 15)
peyvên wendabûyî	hûrmûr 314 (h. 20: 1)
peyvên wendabûyî	gilacî (h. 20: 5)
peyvên wendabûyî	tirîjtav (h. 20: 6)
peyvên wendabûyî	bêhevî (h. 20: 6)
peyvên wendabûyî	nivîsanok (h. 20: 7)

peyvên wendabûyî	tevol (h. 20: 7)
peyvên wendabûyî	xirhe (h. 20: 7)
peyvên wendabûyî	xerçeng (h. 20: 24)
peyvên wendabûyî	xweyrûmet (h. 21: 1)
peyvên wendabûyî	xwehrûviç (h. 21: 3)
peyvên wendabûyî	şûncivîn (h. 21: 11)
peyvên wendabûyî	menihêre - nemêre (h. 21: 11)
peyvên wendabûyî	libat (h. 21: 11)
peyvên wendabûyî	xebergihan (h. 21: 9)
peyvên wendabûyî	mezincarekê (h. 21: 11)
peyvên wendabûyî	şermîsar (h. 21: 14)
peyvên wendabûyî	zêvarî (h. 21: 14)
peyvên wendabûyî	kuşrin (h. 22: 11)
peyvên wendabûyî	ceban - xirgelek (h. 22: 13)
peyvên wendabûyî	seza ye - heq dike (h. 23: 2)
